Ekrem CEMÎL PAŞA

# DÎROKA KURDISTAN BI KURTEBIRÎ

Institut kurde de Paris




ENSTITUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ

Institut kurde de Paris

K.L. 3848

# DÎROKA KURDISTAN

## BI KURTEBIRÎ

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

LIV.KL, 3848
17/10/2017
1020 CEM DIR

Ekrem CEMÎL PAŞA

# DÎROKA KURDISTAN

## BI KURTEBIRÎ

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris

ENSTITUYA KURDÎ YA BRUKSELÊ

Institut kurde de Paris

Çile 1995

D/1995/5799/6

© Enstituya Kurdî Ya Brukselê

4, rue Bonneels – 1040 Bruxelles

Tel. 02/230.89.30

Fax. 02/230.34.02

Çapxane : Acco - Leuven

# PÊŞGOTIN

Ekrem Cemîl Paşa ev pirtûk di sala 1972 de, ango du sal berê mirina xwe, di 81 saliya xwe de, piştî xebat û lêgerîneke 14 salan, li Şamê nivîsî û li Beyrûtê weşand. Piştre, di wê salê de, wî ew wergerand zimanê tirkî. Her du pirtûk jî bi navê C.P.B., ango Cemîl Paşa Burc, weşandin û ji wan jimareke piçûk, nêzîkî pêncî tene, gihandin Ewropayê. Wî gelek dixwest ku vê pirtûkê wergerîne zimanên farisî û fransî jî. Lê, mixabin, temenê (umr) wî ferzend ne da ku vî barê giran biqedîne.

Ji bo ku em vê berhemê ji aliyê dîrokî gelek giring dibînin, nemaze ji aliyê lêgerîna li ser riha (esl) Kurdan ku heta nuha ne ji aliyê Kurdan û ne ji yê Ewropiyan baş hatiye zanîn, û ji bo ku ev cara yekemîn e ku nivîskarekî kurd dîroka Kurdistanê ya kevn bi zimanê kurdî, zaravê kurmancî, dinivîse, me pêwist dît ku em wê ji nuh de, bi kurdî û piştre bi tirkî, biweşînin. Û nuha jî em wê werdigerînin zimanê fransî.

Mixabin, di dawiya vê pirtûkê de, Ekrem Cemîl Paşa rexneyên gelek giran ji malbata Bedir Xan re dike. Ev yek dubendiyên ku hergav di nav van her du malbatan û di nav wan û hogirên din, weka Osman Sabrî, Memdûh Selîm, Nûreddîn Zana ..., de dibûn xuya dide. Ev dubendî ne tenê ji bo nav û kursî bûn, lê usa jî ji sedema cihêtiya zihniyet û dîtinên siyasî bûn. Em îro jî nimûneyên ewha, lê yên bi awayê "nûjentir" dibînin. Em hêvî dikin ku ronakbîr û berpirsiyarên me yên siyasî yên dema me ji şaşîtiyên bav û kalên me fêr bibin û wan dûbare (tekrar) nekin.

Institut kurde de Paris

Li gel ku di nivîsîna çavkaniyên ku nivîskar di dawiya pirtûkê de pêşan dide hin kêmasî hene, ango navên hin berheman, mêjû (tarîx), navnîşan û sala weşandina wan ne hergav xuya ne, ewê xwendevanên me yên hêja bibînin ku ev xebateke gelek ciddî û zanyarî ye û ku ji bo kirina wê nivîskar bi sivikî tişt ne gotine, gelek westiyaye, xwendiye û lêgeriyaye. Em gelek hêvî dikin ku nivîskarên me yên nûjen bikaribin ji vê xebatê kelk (istifade) bigirin û wê bi awakî ronaktir û kûrtir û bi zimanên cihê jî dewam bikin. Daxwaziya me ew e ku hem gelê kurd û hem zanayên cihanê dewlemendî û reseniya (esalet) dîrok û çanda kurdî nas bikin û têbigihêjin ku Kurdan di dîrokê de rolîne giran û mezin lîztine û hîn jî dilîzin.

Ji bo ku xwendevan bikaribe vê pirtûkê bi hêsanî bixwîne, me li ber hin gotinên nenaskirî, ku nivîskar bi kar anîne, stêrkek (*) danî û ew li dawiya pirtûkê, tevî rêzayê (ma'na) wan, nivîsîn. Bi ser de jî, me kurteyeke kronolojîk ragihand wê.

Ji bo nîşandana dewlemendiya Kurdan, me ji derveyî nexşeyên (xarite) ku nivîskar bi destê xwe çêkirine, hin nexşe û fotoyan ji pirtûkên dîrokê yên ewropî xistin nav rûpelên wê.

Em bawer dikin ku piştî xwendina vê pirtûkê ewê gelek xwendevan û ronakbîrên me yên giranbuha gotûbêjên germ û dirêj li ser riha gelê kurd bikin. Daxwaziya me jî ew e ku meydana lêkolînê li ser babeteke ewqas giran karibe bi vî awayî firehtir bibe û ku dîroka gelê me ya dewlemend ciyê xwe yê bilind di dîroka cihanê de bistîne.

Pervîn CEMÎL

Institut kurde de Paris

## AMERZIŞ

(Beyanê uzur)

Di destpêka nivîswara (*) xwe da me newîd (*) kiribû ku em dîroka Kurdistanê ya giştî - ji Berê Zayîna Îsa bi 10.000 sal ta îro - binivîsin. Gelek muxabin, ji hin engîzên (*) ku em li vira nikarin bêjin me newîda xwe ne anî cî.

Gertevên (*) ku me di nivîswara xwe da derbend kirin ji B.Z. 10.000 sal dest pê dikin û di 1918 da radiwestin. Dîroka Kurdan a pey vê hengamê, ano (*) pey sala 1918, em dê wê di derpêça (cild) duyim da binivîsînin.

Em pir niyazkar in ku îcar em newîda xwe pir zû bi cî bînin û di derpêça duyim da dîroka Kurdistanê payan bikin.

C. P. B.

Institut kurde de Paris

# KURTEBIRA DÎROKA KURDISTAN

## Pêşgotin

Ji berê da dîroknivîsên roava û rohilat di nivîswarên xwe yên dîrokan da li ser Kurdan peyivîne. Lê, heya van demên nêzîk tu nivîswar li ser dîrokgişa kurdî ne hatibû çap kirin.

Bi zanîna me, kesê ku cara pêşîn "dîrokgiş"a kurdî nivîsiye û belav kiriye ronakrewan (merhûm) Emîn Zekî Beg e.

Emîn Zekî Beg kî ye û li ku xwendiye ? Emîn Zekî Beg Kurdê Iraqê ye, di dema Osmaniyan da ji debistana (*) "Ruştiye" ya Suleymaniyê û debistanên Istanbûlê yên şerevanî (harbiye) û bingehceng (erkaniharbiye) guwahnave (şehadetname) biriye.

Berê şerê gişkî yê 1914, li Parîs, London, Berlîn û Viyana, di balyozgehên (sefaretxane) Osmaniyan da "ataşê leşkerî" bû.

Di van paytextan da, demên xwe yên vala bêhûde, di çayxane û derûberan da, derbas ne kirine, bi xwendekariya danişmendî (ilm) kariwer (meşxûl) bûye. Nemaza, ji hûrbûna (tedqîq) dîrokî ra pir baldarî kiriye, ji nivîswargehên (kutubxane) wan paytextên mezin çiçend jê hatiye ewçend behremend (mustefîd) bûye.

Hezaran spas, Emîn Zekî Beg ! Emegên ku dabûn, roniyên çavan ku rijandin, beyhûde ne çûn, meyweyên xebata xwe berhev kirin.

Institut kurde de Paris

Pey gelek salan, gava Emîn Zekî Beg ji Awrûpa vegeriya Istanbûlê, ji bo dîroka Kurdistanê bi baxolan û bi têran hînave (wesîqe) û zanişwerî (malûmat) anîn. Ew li vêrastên (heqîqet) ku heta wê gavê ji me veşirî (mechûl) bûn û ku ji me vedişartin : buhêrka (mazî) Kurdistanê ya deh hezar sal, ronakbûn û behadiriya Kurdan ku cihan di matê da hiştiye, cihangîrî (futûhat) û şehrevaniyên (medeniyet) wan geriya, peyda kirin, nivîsîn û bi nîşane (delîl) û aşkariş (isbat) ji me ra anîn.

Emîn Zekî Beg di wan salan da ku li Awrûpa dijiya welatine ava, geline şehrevan û serazad didîtin, wan bi Kurdistana wêran, bi Kurdên ku di bin dîlî de dinaliyan dihendizandin (muqayese) û bedbextiya gelê xwe çêtir fehim dikir : Kurdistan ji sedsalan ve di bin leyandin (îstîla) û talankeriya bêdadan da mabû, ji avahî û abadaniyê bêpar bû.

Emîn Zekî Beg gava hêj zarû bû rewşa perîşanî û cefakêşî ya Kurdan dîtibû. Li Suleymaniyê, li debistana "Ruştiye askeriye" cirên (muamele) giran û zivir ên mamosteyên ne Kurd dîtibûn, di rewanê (rûh) wî yê ter û taze da kîn û rikên tal hişyar kiribûn.

Van xoceyên biyanî çima ji wî ra û ji hevalên wî ra zivrayî û nedadî dikirin ? Van "muallim efendiyan" çi kesên qurre bûn ! Zimanê wan, tevgerên wan bicarekê biyanî bûn !

Nivîswarên cografî û dîrokî ku dixwendin tê da danava (behs) "Istîmar, Mustamere û Mustamer" hebû. Van xoce efendiyan ji koloniyên Fransiz, Ingilîz, Belçîkî, Hollandî .... peyv û danav dikir. Bêdadiyên ku di van koloniyan da çêdibûn dûr û dirêj digotin û dijimartin.

Emîn Zekiyê xortik mat (heyirî) mabû ! Tiştên şayan ên gendgenî (nefret) ku xoceyên wan li ser koloniyan digotin her roj li Suleymaniyê, li ber çavên wî çêdibûn : Walî, Muteserif, Qumandan,

Paşa û Beg, Polîs û Jenderme ...... yên biyanî tûde (ehalî) dêşandin, ziyan didane wan û ew bêrûmet (tehqîr) dikirin.

Emîn Zekiyê xortik hûrik hûrik diponijî : Gelo dibe ku ev biyaniyên ku ji Istanbûl û Anadolê hatine ne kolonîker bin ? Û Suleymanî û Kurdistan ne kolonî bin ? ...

Emîn Zekî Beg di zarotiya xwe da yek caran diçû gundan û zozanan jî. Gundî û çiyayiyên ku li van deran bi jîneke sade û asûde dijiyan ew dilda û mat kiribû. Jin û mêr bi hev ra, li van ciyên tenha, lê dilferib, çi jîneke sade û dilkêş derbas dikir ! Livên wan, tevger û rewşên wan çiçend çalak û ahengdar bûn ! Lê, dîlanên wan ? Keç û lawên çeleng, wek selwan bejnzirav û bedew, rûken û ronak, dest didan hev, govend û bazdan û dîlan dikirin. Te digot qey van lîz û bazdan ji ferişte û periyan hînbûne ! Lê, bezên hespan, hunerweriyên nîşandarî û yên şûr û mertalan?

Emîn Zekî Beg dipirsî : Ma ev tiştên serfiraz û bedew û candar giş ên wî ne ? giş ên gelê kurd in ? Ma gelê wî ev çend hunerwer û dilber û çalak û hêja ye ? ....

Gava ku Emîn Zekî Beg li Istanbûlê li debistana Herbiyê dixwend, xweşber (tebiî) bi awakî pejilî (mufassal) dîrok û cografya dixwendin : Dîroka kevnare, dîroka sedsalên pêşîn, dîroka sedsalên navîn, a sedsalên nû. Giş bûyerên dîrokî ku di van nivîswaran da hatibûn nivîsandin, nemaza gertevên sedsalên kevnare, li deşt û çiyayên ku îro Kurd tê da dijîn, ano di Kurdistanê da, derbas dibûn : Akad, Sûmir, Elam, Kûtî, Kasî, Lolo, Mîtan, Hûrî, Kildan, Asor, Mad, Paris ... vana giş di welatê îroj ê Kurdan da rahiştibûn hev. Lê, nivîswarên ku ji Emîn Zekî Beg ra dabûn xwendin ji bo Kurdan tiştekî ne dinivîsandin. Di nav van nivîswaran da



Institut kurde de Paris

yek pirs ji Kurdan derbas ne dibû ! "Muellim efendîna" yek pirs ji bo Kurdan ne digot.

Weyla ! Di wan hengaman da, gelo Kurd li ku bûn? Ma li ser ruyê erdê hîç Kurd tu nebûn ? !! Hêj do, li Suleymaniyê, li gundên dora wê û di zozanan da, Kurdên ku dîtibûn ma ji ku hatibûn ? Ji ku çêbûbûn ? Wan Kurdên candar û jînde, çalak û neşerêj, jîr û hişyar, behadir û cuwanmerd, ma paşê hatibûn meydanê ? Yan li van ciyan, li bajaran, li gundan, li deştan, li çiyan ji xweber, wek kivarkan, ji erdê şîn hatin ?!!

Mejiyê Emîn Zekî Begê cuwan ê gelek jîr aram û asûdegiya xwe hunda kiribû. Li bersîvên van pirsan digeriya. Dawiyadawî, mejiyê wî yê çalak bersîvên ku lê digeriya peyda kirin : belê, di wan deman da, ano berî zabûna Îsa bi sê, çar hezar sal, li Mêzopotamya (navbera her du çeman), li Araratan, li Zagrosan û Torosan, li kenarên Deryayê Sipî, li sînorên Hindistanê, Filistîn, Sûriya û li Misrê pevçûnine dijwar çêbûne. Têkildarên van şeran yek jî Kurd bûn.

Çi sûd (feyde) ! Padişahên Osmaniyan, Şahên Eceman û ferwerên (hukûmet) wan di nivîswarên dîrokan da li ser pirsên Kurd û Kurdistan xêzeke reş kişandine, herifandine, hunda kirine.

Emîn Zekî Beg, hêj ku li ser texterêzên debistana Herbiyê dixwend, rind baweriya xwe anîbû ku têgihîştina gotina "Kurd" di destên zanayên Awrupiyan da bû û ku ji Rohelatiyên paşverû, zorba, bawerhişk, şoven û çewtbawer (xirafeperest) tiştek umîd kirin ne durust bû, bê hişî bû.

Loma, Emîn Zekî Beg, li ser vê baweriyê, li Awrupa çû pirtûkxanan, geriya, koşiya, peyda kir û nivîsand. Lê, çi kenz û veşare, çi enbareyên (xezîne) giranbeha derveanîn !

Emîn Zekî Beg, pêy Şerrê Gişkî yê 1914, xwe ji xizmeta dewleta Osmanî kişand û çû welatê xwe,



Institut kurde de Paris

zanînên ku li ser Kurd û Kurdistanê dabûn hev çap û belav kirin [1].

Min jî, di vê nivîswarê da, ji bo Kurdan û heta ji bo heweskarên ne kurd jî şîrava dîroka Kurd û Kurdistan pêşkeş kir. Ez pir xebitîm ku qoqkirin û rêzandina nivîswara min gelek sazdar û tekûz be. Gelek nivîswarên dîroka kurdî ku beriya vê pirtûka min çap bûne ji rêzandin û qoqkirinê ra guh ne dane. Pir dîrokzan hene ku nivîswarên xwe bi zanînên gir û hûr dagirtine, lê pir guh ne dane rêzandina wan.

Di nivîswara min da, nîşaneke din a xuya û yekta heye : Min rastiyên dîrokî bê perwa nivîsandine. Rastiyên dîrokî rasterast, ne kêm û ne zêde, bi zimanekî vekirî û eşkere hatine nivîsandin.

Ez vêya jî pêş we deynim : Min nivîswara xwe ne bi tenê ji Emîn Zekî Begê ronakrewan girtiye. Lê, ji nivîswara Hezretî Ayetullah Aqayê Şêx Muhemmed Merdûxî Kurdistanî ku bi zimanê farisî, li Tehranê çap bûye jî stendiye. Ji xeynî van her du peyagewreyan (zat), min ji nivîswarên din jî pir tiştan stendine: Ji Şerefname, dîroka mîrên Kurdan ku ronakrewan Şeref Xanê Bedlîsî bi zimanê farisî nivîsandiye; ji Rîşeyî Nejadî Kurd ku qehremanê çiyayê Agirî, Ishan Nûrî Paşa li Tehranê, bi zimanê farisî nivîsandiye; ji nivîswarên dîrokî yên fransizî, îngilîzî, farisî, erebî û tirkî jî pir tiştên hêja berhev kirine. Nemaza, birrên ku di gihaja "aîd" kişwergîriyên (fûtûhat) li ser vegirtinên islamî ne, min ew ji nivîswarên kevnare yên Ereban stendine. Ev nivîswara piçûk meyweya xebata min a 13 salan e.

Bi destûra xwendevanan, ez hinek ji dîroka Merdûx û ji Hezretî Ayetullah Aqa Şeyx Muhemmed Merdûxî Kurdistanî behs bikim : Hezretî Ayetullah di nivîswara xwe da erebbûna xwe dinivîsîne. Mala Merdûx di sedsala sêzdem a mîladî da ji Erebistanê hatiye Kurdistana Îranê û li wir bi cî bûye. Ev xanedan hezkirin û payekariya (hurmet) Kurdan kar kiriye.

Institut kurde de Paris

Ji vê malbatê gelek zana û xudancah gihîştine. Hezretî Ayetullah bi xwe peyagewrekî zana û xudancah e. Çawa ku kurdî, farisî, erebî zane, wusan jî li çend zimanên Awrupayî jî agah e.

Dîroka Merdûx ku bi zimanê farisî nivîsandî ye, meyweya renc a gelek salan e. Hezretî Ayetullah bi sedan nivîswar, kovar û pelikan xwendine û xwendekariyeke zor kiriye. Pêy zorwest û koş, ev manivîsa (eser) giranbeha aniye meydanê.

Dîroka Merdûx du derpêç (cild) in. Derpêça yekem, ji Pêşdîrokê heya dawiya leyandina (*) Ereban, çi li Kurdistanê qewimiye nivîsandiye. Derpêça duyem, pêy islamiyetê heya îro li Kurdistanê çi çêbûye nivîsandiye.

Ev kesbilind û payepak di pelên yekem ên nivîswara xwe da çavkaniyên xwe yên bergiran (muhîm) danîne. Min jî, ew bê guhertin xistin nivîswara xwe. Tê da navên 94 zanayên dîrokê hene. Ji wan jî 25 Awupayî ne. Ên mayîn Kurd, Faris, Kildan, Asor, Ermen, Ereb û Tirk in.

Kurdên îro, li cihanê di koşeke tenha da, stemkêş, ji her mafî bêpar, dîl û jar, perîşan, nezan, bê weşan, bê xwendegeh, bê nexweşxane, bê derman, pir caran birçî û bê nan, tazî û bê kiras, bê xwendin û bê radyo, û bê hertişt dijîn. Gelo ! çawa dibe, ev Kurdê dîl û belengaz, xwediyê vê bilindayî û ronakiya geş bû ? Hûn dê çawa bawer bikin ku buhêrka Kurdan evçend navdar û bi deng bû, xudanê gurz û xencerên çirsavêj, birûskrêj bû ? Hîç newêrî (tereddud) mekin ! rind bawer bikin ! Van nivîsandinên han rastî bixwe ne. Bi hezar sond û peyman tê da çilwerî (mubalexe) jî nîne.

Ez - çêtirê wî - em bi kêlên miriyan xwe napesinînin. Tu hawar û gazî ji kêlên miriyan naxwazin. Umîda me jîndarî, zindegiya gelê kurd e, jêhatîbûn û haydariya wî ye.

Kurd, li gel nezaniya xwe, xizaniya xwe, bê xwedîbûna



Institut kurde de Paris

xwe, gava ku ferzend bikeve destê wî, do jî û îro jî mûcize çêkirine, ew dê cardin çêbike !

Kurdno ! Dîroka ku hûn dixwînin jê şîretan bigirin! Yek dem bê umîd mebin !

Kurdê cuwanmerd û navdar ! Bikoş ! Bixebit ! Mand ji Kurdan ra ye !

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# BEŞKIRINA NEJADÊ ENZAN (2)
# Û
# KURD JI KÎJAN NEJADÎ NE

Beşkirina nejadê enzan (*) li ser du punwerî (nezeriye) çêdibe : ya yekim xwe dispêre nivîswarên kevnare. Punweriya duyim xwe dispêre zanişweriya Antropolojî û Êtnolojî.

Çawa ku di Tewrat û Quranê da hatiye gotin, paş Tûfana Nûh sê kurên peyxember Nûh, ku ji lehiyê reha (salim) mabûn : Ham, Sam, Yafes, sê nijadên enzan serrast kirin : Reşên ser ruyê erdê zaruyên Ham in. Ereb, Ibran, Asor, Aram ... zaruyên Sam in. Nijadê sipî jî ji Yafes çêbû ye.

Di Tewrat û Quranê da, ji nejadê Zer û yê Sor ê Amerîkayê tu gotin nîne. Di beşkirina antropolojîk û êtnolojîk da, nejadê enzan pênc bir hatiye kirin : Arî, Samî, Mongol (nijadê zer), Reşên Afrîqa, Sorên Amerîka.

Kurd, li ser punweriya yekim neviyên Yafes in. Li ser a duyem Arî ne: ano, Endo-Awrupayî ne, ji nejadê sipî ne. Ev tefsîlatên han ji me ra nîşan didin ku bi Samî û bi Mongolên Tirk ra hîç tevheviya Kurd nîne.

Pirsa "Arî" gotineke kurdî ye. Arî, ano "Arparêz", bi farisî "Ateş perest". Ji mêj va ola Endo-Awrupayiyan "Arparêzî" bû û pirsên "Ar" û "Agir" du pirsên kurdî ne, û bitenê di zimanê kurdî da hene. Di Parisî, Efxanî, Hindî, Ingilîzî, Fransizî ... û zimanên din ên Endo-Awrupayî da tu nene. Kurd reha nejadê Endo-Awrupayî aniye meydanê. Eger ev



Institut kurde de Paris

angaşt (iddia) rast be, giş Endo-Awrupayî ji reha Kurd birr bûne.

Min ev pejl( izahat) li ser pirsa "Ar" da, çima ku ez dixwazim hiş û nêrtinên agahdar û zanayên fîlolog, antropolog û etnologan bikişînim ser pirsa "Ar", ji bo ku baş lê hûr bibin û baş pîşe (tedqîq) bikin.

## ÇEND PIRS JI BO ÇEWTBAWERIYA LI SER NEJADÊ KURD

Berê islamê navên kurdî giş navên arî bûn : navên dewletan, êlan, malbatan, jin û mêran, der û beran, deşt û çiyan, bajar û gundan ... Îro jî pirên van navan arî ne.

Gerdişên (adet) Kurdan jî pirên wan ariyane ne. Kurd hêj ew ji bîr ne kirine û ji bîr nakin.

Eger em qenc binêrin, em dê bibînin ku rûçik, ziman, ol, nav û gerdişên Kurdan ne wek ên Ereban, ne jî yên Tirkan in. Kurd arî ne, Ereb Samî ne, Tirk Mongol in.

Li ser nejadê Kurdan pir efsane û çîrok hatine gotin :

1- Pêxember Suleyman, fermandarê gişî jîndaran bû, ê ins û cinan, tebayên bi bask û bê bask û dêwan jî. Wî rojek çil dêw bang kirin û ji wan ra got : hûn dê herin Awrupayê ji min ra çil keçên dîlber û bijare dê bînin. Her çil dêw jî jê ra temenne bûn û gotin : fermana te ser seran û ser çavan û çûn, berê xwe dan Awrupayê.

Em dizanin, dêw riya salekê di saetekê da distînin. Loma, her çil dêw tavil gihiştin Awrupa û li her alî belav bûn. Her yek keçeke dîlber û bijare peyda kir û bi hev ra vegeriyan welatê xwe Filistînê û dîtin ku pêxember Suleyman miriye. Her çil keçên dîlber ên Awrupayî man ji dêwan ra. Keç û dêw

Institut kurde de Paris

hevûdu mar kirin, ji wan zaro çêbûn û ev zaro bûn bapîrên Kurdan !

Ma çîrokên ewha hêja ye ku bikevin nivîswarên dîrokan ? Zarû jî bi çîrokên ewha dikenin. Kurdan, hezaran sal berî padişah Suleyman, di ciyên xwe yên îro da fermandarî dikir.

2- Efsana duyem jî çîroka Dehak e ! Goya li ser milên Dehak du mar peyda bûne. Diva bû ku her roj ji van du maran ra du mejiyên zarûkên enzan bidin xwarin. Yek kur û yek keç. Bi salan ev her du mar bi mejiyên zarûkên enzanan hatin xwedî kirin. Lê, Dehak ji bo vê yekê wezîfe da du wezîrên xwe. Wezîrê dilovan gava ku dora wî be, ji dêlva mejiyê enzan mejiyê pez dida maran, û zarûkên ku reha dikirin berdidan çiyê. Ji van Zarûkên revoke gelê Kurd çêbû !

Hinek dîroknivîsên Rohelatê van çîrokên beredayî wek rastî girtine û di nivîswarên xwe da nivîsandine!

Carek, di nivîswarên dîrokan da nivîsandine : 2.500 sal berî mîladê, Kawayê Madî, ano Kawayê Kurd, dijî Dehak rabû. Lê Kurd berê Dehak bi 4.000 sal fermandarên Mêzopotamya bûn.

3- Ev jî çîrokek din e : Xwedê giravî Kurd ji nejadê Ereb in !! Ji nejadê Sam nevîkî pêxember Nûh hebûye, navê wî jî Kurd bûye. Ev xortê samî û ereb ji Yemenê bar kir, çû Kurdistanê û Kurd ji vî xortikê ereb çêbûn !!

Xwejber (tebîî), ev çîrok jî wek her du çîrokên din efsaneke bê sûda (mana) ye.

Pirsa "Arî" gotineke kurdî ye; ano "Ar parêz", bi farisî "Ateş perest".

Ji mêj ve ola Endo-Ewrupayiyan "Ar parêzî" bû, û pirsên "Ar" û "Agir" du pirsên kurdî ne û bitenê di zimanê kurdî da hene. Di parisî (farisî), efxanî, hindî, îngilîzî, fransizî û zimanên din ên Endo-Awrû-payî da tu nene. Ano, Kurd reha nijadê Endo-Awrû-

Institut kurde de Paris

payî aniye meydanê. Eger ev îddîa rast be, giş Endo-Awrûpayî ji reha Kurd bir bûne.

Min van îzahatan li ser pirsa "Ar" da ji bo ku ez dixwazim bala fîlolog, antropolog û êtnologan bikişînim li ser wê, ji bo ku ew lê hûr binêrin û baş pîşe (tedqîq) bikin.

## ZIMAN, OL Û TEVGERÊN KURDAN

Zimanê Kurdan zimanekî arî ye. Giş gelên arî, yên Asyayî û Awrûpayî, berî zayîna Îsa bi deh hezar sal, yek ziman dipeyivîn. Paşê ev ziman bû du bir : Awrûpayî û Asyayî. Ji vî zimanî ra "Anzanî" digotin. Paşê ji zimanê anzanî gelek birên zimanan çêbûn. Kurdî jî yek ji wan biran e.

Lê pir lehçeyên zimanên kurdî hene. Lehçeyên bingehî yên kurdî sê ne : Kurmancî, Soranî, Zazakî. Giş rojhilatzan pezilandine (qebûl kirine) ku ev her sê lehçe ji rehekê cuda bûne.

Eger îro em rind bala xwe bidin sazmendiya hevokan, kesandina lêkeran, yekbûna hezaran pirsan, wekheviya navên rojên heftê û yên hemû jimaran, em dê qenc bibînin ku lehçeyên kurdî yên îro ji yek bingehê tîş bûne.

Ji bo ku em zanibin ku firehî û giranberiya zimanê kurdî berê sê hezar sal çiçend bûn, ez ji nivîswara dîroka "Merdûx" rêzên jêrîn, ji farisî, pirs bi pirs, li kurdî vedigerînim : Dîroka Merdûx, derpêç 1, rûpel 41 : "Ji serekaniyên Dicle û Firat heya rexên Deryayê Faris, zimanê kurdî dihat peyivîn. Germiçanka (mîhwer) vî zimanî berê Ararat bû, paşê Zagros, paştir Isfehan, paştira paştir Hemawend û Medayin bû".

Hin kes dibêjin ku zimanê kurdî zirzimanê (lehçe) parisî ye. Rastî ne were ye. Nîşaneyên dîrokî berepaş in. Dîrok diaşkirîne ku Kurd ji Parisan, Eceman, Efxanan kevintir in û gelek jî kevintir in. Fîlolog û dîrokzan yekdeng in ku zimanê kurdî ji zimanê parisî kevintir e û zimanekî bi serxwe ye.

## NIVÎSANDINÊN KURDÎ YÊN KEVNARE

Di destpêkê da, ano çar hezar sal berê mîladê, tîpên mîxî ku Sûmir û Akad dişorandin (îstîmal), Kurd jî pê dinivîsandin. Paşê, berî mîladê bi hezar sal, merivekî bi navê Misîsûrat tîpên din çêkirin. Îcar Kurd bi van tîpan nivîsandin. Gava Ereban Kurdistan da ber lingên xwe, tîpên Kurdan Misîsûrat bûn. Pey Islamê, bivê nevê tîpên kevnare berdan, bi tîpên Ereban nivîsandin. Îro li gelek ciyên Kurdistanê bi tîpên latînî dinivîsînin.

## OLA KEVNARE YA KURDAN

Berî koçbariya gişkî (muhaceretî umûmîye), ano berî ku Kurd ji Iskandinavya rabin bên Kurdistanê, ol û ayinên Kurdan çi bûn, tukes nizane. Ev dem pir dûr, kevin û tarî ne.

Lê, pey ku Kurd hatin welatê xwe yê îro – berî mîladê bi şeş hezar sal, belkî jî deh hezar sal – nîşane (delîl) û şope xuya didin ku Kurd "Ahûra" parêz bûn, ano ronayî û agir diparastin. Ji tariyê dilreş bûn û jê ditirsiyan.

Dereng dereng, wan pirsa Ahûra guhart û di dewsa wê da Ahûra Muzd got. Pirsa Muzd di zimanê kurdî yê kevnare da "xurt" e. Ano, Ahûra Muzd "Xudayê Xurt" e. Bi dem û gavan, Ahûra Muzd bû Hurmuzd. Hurmuzd jî paşê guherî, bû Hurmuz, ano Xudayê Xurt, Xudayê her tiştî, Xudayê ronayî, Xudayê Qenciyê.

Kurdên berê bawer dikir ku rastî ji agir hatiye der. Loma agir diparast, loma agir li ba wan pirfiraz (muqedes) bû.

Kurdan hij ji tariyê ne dikir, jê dilreş bûn, ji kaniya tariyê ra "Ehremen" digot. Ji Ehremen ditirsiyan, bawer dikir ku tarî û neqencî û çepelî Ehremen diafirîne.

Bi vî awayî, du Xudayên Kurdan hebûn : yek Xudayê



Ji ola Kurdan Berê Îsa : Ahûra Muzd, yan Hurmuz, Xwedayê Qenciyê yê Zerdeştiyan. Ew dijî Ehremen, Xwedayê neqenciyê, hergav şer dikir.

qenciyê, ano Hurmuz; yek jî Xudayê çepeliyê, ano Ehremen. Di ola Hurmuz da, ji mezinên olê ra "Pîr" digotin. Bi tenê Pîran nimêj dikir. Kesên mayîn, ano tûde (xelk), ji nimêjê wareste bûn.

Paşê, hêdî hêdî, Pîran ola Hurmuzparêzî ji rê derxist: çewtbawerî (xirafe), afsunbazî (sihir), cadîkerî, firîbbazî (hîlekarî), derewkerî xistin nav ayinên ola Hurmuz.

## XUYABÛNA ZERDEŞTAN, PÊXEMBERÊN KURDAN

Ji bo ku ola Hurmuz vegerînin ser riya berê, riya rastî û qenciyê, bi navê Zerdeşt sê pêxemberên kurd hatin.

Zerdeştê yekim, li bajarê Belxê xuya bû. Dîroknasan ji dema hatina Zerdeştê yekem ra 3.000 sal berê mîladê gotine.

Zerdeştê duyim. Bi gotina dîroknasan, ew Padişah Ferîdûn e. Dema xuyakirina wî berê mîladê 2.040 e.

Zerdeştê sêyim li bajarê Urmiyê, di sala 660 berê mîladê da bûye.

Ev her sê Pêxember ji Kurdên Mad çêbûne. Her sê Zerdeşt jî xwediyên mejikên (fikir) bilind bûn. Armanca wan aştî, asûdegî, bextiyarî û rehayiya enzên bû.

Zanebûna me ya pir li ser Zerdeştê sêyem e. Di nivîswarên dîrokan da li ser Zerdeştên yekem û duyem pir zanînên me nîn in. Ustubara Zerdeştê sêyem ev bû ku gend û kirêtiyên ku ketibûn nav ola pak a Hurmuz jê biderxîne û ola ronak a Hurmuz vejîne. Ji bo vê yekê, Zerdeştê sêyem gund bi gund, bajar bi bajar digeriya, şorindî (weîz) dikir û şîret didan. Lê, Pîrên wê gavê - ku ew engîzên (sebeb) wê gend û çepeliyê bûn - guh ne dan şîretên Zerdeşt. Ev şîretên hêja ne bi

Institut kurde de Paris

qiyima Pîran bûn. Dilxwaza wan dagirtina zik û bêrîka wan bû. Loma, Zerdeşt ji neçarî çû aliyê Belxê.

Li bajarê Belxê, dest bi şîretên xwe kirin. Gotin û şîretên wî ketin serê Belxiyan û dora Zerdeşt guloriyan, alîkariya wî kir. Bi hevaltiya wan Zerdeşt xurt bû. Nemaza, Padişahê Belxê "Key Lehraseb" hevaltiya Zerdeşt kir û da ser şopa wî. Piştî vê hevaltiyê, jimara hevalbendên wî bû hezaranhezar. Êdî Zerdeşt zor da xebat û şîretê û meydana xwe fireh kir, cardin vegeriya Urmiyê. Îcar kesên Urmiyê bi ya wî kir, şîretên wî ketin serê wan, ew jî giş bûn hevalên Zerdeştê olpaqij û dan ser şopa wî. Ola Hurmuz, bê efsûnkerî, bê derew, bê vajbawerî, gihîşt sadegî û paqijiya xwe ya berê. Ola Hurmuz xurt û gûmreh û geş bû.

Çar aliyên Kurdistanê : Ji Belxê ta Araratan, ji Deryayê Kasî (Qezwîn) ta Deryayê Sipî, bi ola pak a Hurmuz kamiran bûn.

Her sê Zerdeşt jî xudan nivîswar bûn. Navê nivîswara Zerdeştê yekim "Zend" bû. Îro li destê Zerdeştiyên Hindistanê ji vê nivîswarê çend pel hene. Ji nivîswara Zerdeştê duyim, îro tu tişt di destê me da nîne.

Navê nivîswara Zerdeştê sêyim "Awîsta" ye, li ba Zerdeştiyên Hindistanê Awîsta heye. Awîsta bi kurdiya kevnare hatiye nivîsandin.

Li demên kevn, ano berî Îsa û berî Islamê, nivîswarên Kurdan ne bitenê yên olê bûn. Kurdan hergav hij ji zanistî û hunerweriyê kir. Padişahê Asor hergav hunerweriyên Kurdan pesinandine. Zanistî û hunerwerî bê nivîsandin nabe. Loma, di bajarên kevnare yên Kurdistanê da, nivîswargehên gewre hebûn. Di wan da bi hezaran nivîswar hebûn : yên ola Hurmuz, rêziman, qanûn, hesab, hendese, dîrok, cografya, tib, stêrzanî, felsefe ....

**Lê hezaran mixabin ! B.Z. di sala 331 da Iskenderê Mezin, paşê jî, P.Z. di sala 637 da, xelîfeyê duyem**



Ji ola Kurdan berê Îsa : Zerdeşt, Pêxemberê ola Zerdeştiyê.

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

ê misilmanan, Omer Ibin Xettab, ordiya xwe şand ser Kurdistanê, Kurdistan payimal kir, agir berda li nav nivîswargehên (*) giranbiha û nivîswarên wan giş şewitandin. Nivîswarên Zerdeştî yên ola Hurmuz jî tevde şewitîn !!

Di ola zerdeştiyan da agir pirfiraz (muqedes) e, lê ne Parastek (me'bud) e, ano ne xwedê ye. Xwedayê kurd ê kevnare yek bû, navê wî Hurmuz bû. Lê van navên jêrîn jî giş navên Hurmuz bûn : Yezdan, Ezed, Ezîd, Xweda, Hay, Homa, Homan ...

Bingeha ola Zerdeşt sê tişt in. Ponja qenc, Peyva qenc, Karê qenc (3). Di wan deman da ola Zerdeşt ola fermî û ya tevayiya Kurdistan û Parisistan bû. Ji kenarên Deryayê Sipî heya Hindistanê ola Zerdeşt hatibû pejirandin.

Îro di Hindistanê da hindikek Zerdeştî hene. Li Îranê jimara wan ji Hindistanê hindiktir e, nêzîkî 200.000 e. Zerdeştiyên Hindistanê, ji camêriya hindî ya azadîperwer, bi serbestî ayîn û nimêjên xwe dikin, xwenda ne, tuwanger in, pêşveçûyî ne û "modêrn" in. Pir mixabin ! Zerdeştiyên Îranê - li gel nejadê wan ê îranî - ji birayên xwe yên misilman hergav zivrî û neqencî dibînin. Zerdeştiyên Îranê pir belengaz û perîşan in.

Berî ku em behsa Zerdeşt biqedînin, divê em çend pirs ji ola Êzîdiyan jî bêjin : Êzîdî ji zerdeştiyên kevn mane. Ola êzîdiyan celebekî ola zerdeştî ye.

Me li jor gotibû ku di kurdiya kevnare da pir navên xwedê hene. Yek ji wan navan Êzîd e. Êzîd, ano Xweda. Êzîdî, ano Xwedanparêz. Li nav tûde (xelk) ji bo êzîdiyan nefehmiyek çêbûye. Tûde çewt fehim kiriye. Goya êzîdî Ehremen (Iblîs) parêz in ! Na-xêr, êzîdî ne Ehremenparêz in. Êzîdî Xwedaparêz in. Bitenê, ew ji ziyandariya (şer) Ehremen ditirsin, naxwazin navê wî bibihîzin.

Hurmuz di ola zerdeştiyan da Xwedayê qencî ye, Ehremen jî Xwedayê ziyankarî ye. Di ola êzîdîyan

da, Êzîd Xwedayê qencî ye, Ehremen Xwedayê ziyankariyê ye. Bingeha ola êzîdiyan Qencîxwazî ye, çawa ku Qencîxwazî bingeha ola zerdeştiyan e. Êzîdî pir hij ji kirina xêrûberan dikin û pir lê go didin. Wek zerdeştiyan, li ba êzîdiyan Pîrên wan bitenê nimêj dikin. Kesên din ji nimêjê wareste ne. Lê, her kes, jin û mêr, salê sê roj divê rojî bigire.

## GERDIŞÊN (ADET) KURDÊN KEVNARE

Kurd, berê hertiştî, koçer bûn. Bi keriyan terşên wan hebûn, barbirên wan erebe bûn, hesp yan ga girêdidan. Paşê, dereng dereng, gava li welatê xwe yê îro bi cî bûn, bajar û gund ava kirin, cot kirin, bax û baxçe serrast kirin. Lê, berê hertiştî Kurd şerevan bûn, şerker bûn, Mertalgêr bûn, Şûrhingêv bûn, pehlewanên hesinbazû bûn !

Kurdên berê, karibûn ji yekê bêtir jin bînin. Tiştên pir şerm û kirêt jinperestî û kurperestî bûn. Mahr birrîn tu nebû, erêkirina dê û bav, dilxwestina keç û kur bes bû. Kur, heya ne bûna mêr, kemer girê ne dida. Keç ne bûna jin, derpê li xwe ne dikir, bitenê kirasekî dirêj li xwe dikir. Kurdan berê miriyên xwe venedişartin. Termên miriyan li ser darên bilind, zinarên bilind datanîn, dilxwaza wan ev bû ku termê mirî cardin jîndar bibe. Paşê dev ji vê gerdişê berdan û termên miriyên xwe dixistin kûzan û li ciyên bilind vedişartin.

Kurdan pir hij ji mêvanan dikir, ji mêvanên xwe ra pir mêvannazî û ciwanmerdî dikir. Îro jî, mêvanperweriya Kurdan li cîhanê bi nav û deng e, ev camêriya Kurdan ji bav û kalan gihîştiye wan. Jin, li dema kar, bi mêran ra dixebitîn, alîkariya mêran dikir, serazad û serbest bûn, keybanû, ano mezina malê, bûn, ji hundirê malê keybanû berpirsiyar bûn. Kurdên îro ji keybanû ra kevanî dibêjin.

## PADÎŞAH, FERWERDAR (HUKUMDAR) Û SEREKÊN KURDÊN KEVNARE

Di ezbeta xanedanan da, mezintirê gişa dibû serekê ferweran (hukûmet). Gava karekî bergiran ê xwehermendê (dewlet) heba, ferwerdar bergerişa (muracaat) rîsipiyan û mezinên êlan dikir. Gelek caran, padîşahên wan jî hebûn. Padîşah, di demên dijwariyê da bi serekên birran diencumand (şêwra xwe dikir). Padîşah têkilê tiştên giran, wek şer, aştî, berevkirina bêş û leşker ... dibû. Karên mayîn di destên serek û rîsipiyan da bûn. Rîspî encumendên (muşawir) serekan bûn, karîbûn têkilî hertiştî bibin.

## ÇEKÊN KURDÊN KEVNARE

Çekên Kurdên wan demên kevnare ev bûn : Tîr û Kevan, Şûr û Mertal, Gurz, Rim, Xencer, Teber, Kemend, Kevir-kanîk ...

Institut kurde de Paris

## KURD JI KÊ DERÊ HATIN KURDISTANÊ Û ÇI GAV HATIN ?

## KURD ÇEND EZBET Û BIR BÛN ? ÇAWA ERD FIREH KIR ?


## PAŞÊ ÇAWA ÎMPERATORIYA KURDISTAN WENDA BÛ ?

Me berê gotibû ku Kurd ji nejadê endo-ewropî ne. Endo-ewropî hezaran sal berê mîladê - 10.000 sal, dibe ku hîn bêtir - ji Isandinawya - bi engîzê ku em pê nizanin - koçûbar kirine û hin ciyên Asya û giştikê Awrupa girtine. Di nivîswarên dîrokan da ji vê koçbariyê ra Koçbariya Gişkî dibêjin. Kurd jî di vê koçbariya gişkî da ciyê bav û kalan hişt û ji Iskandinawya berbijêr bûn û riya Qafqasan girt.

Wek îro, di wan demên kevn da jî Kurd xwediyên keriyên terşên bê jimar bûn - hesp, pez, ga û çêlek -. Kurd bi milyonan terş diçêrandin, war diguhartin û berbijêr, ber bi Qafqasan dihatin. War bi war, hêdî hêdî, bê lez û bez, terşên xwe diçêrandin û tim dadiketin.

Ev koçbarî bi sedsalan, dibe ku bi hezaran sal, dirêj kir. Kes nizane Kurd kengî, di kîjan salê da gihîştin Qafqasan. Lê, Kurd li Qafqasan ne sekinîn, berbijêrtir daketin, gihîştin Araratan = ALARODAN, Niştimanê xwe yê îro, Kurdistana Rengîn û Dengîn.

Kurd ji mêj ve du ezbet bûn : Kûtî û Kurtî. Ezbetên Kurdan ji birran çê bûbûn. Kurd gava gihîştin Araratan bûn du tîş. Ev du tîşbûna wan ji bo bidestxistina çayirgehên firehtir bû. Kurd xwediyên keriyên terşên giran bûn, Araratan bitenê têra wan




Nexşeya E. Cemîl Paşa, N° 1 : 10.000 sal Berê Zayîna Îsa. Koçbariya giştî û hatina Kurdan ji Skandinavya bo Araratan.

ne dikir. Loma, tîşa yekem ku ezbeta KÛTÎ bû li Araratan ma. Tîşa duyem, ezbeta KURTÎ, Araratan berdan, çûn aliyê rohilat, dora Deryayê Kaspîn = Kasî.

## ERDFIREHKIRINA KURDAN

### Kûtî : Kurdên Araratan

Paşê, bi bîhna fereh, Kûtiyan ji Araratan, bi sê milan, berê xwe da nîvro û roava, û li çarmedorên xwe belav bûn. Ev belavbûna Kûtiyan bi sedsalan ajot. Milê yekem ji bakurê serê kaniyên Dicle û Ferêt, Mêzopotamya, ano navbera du çeman, dest pê kir, da ber xwe heya Deryayê Faris û van dor û beran girtin.

Milê duyem Araratan û zozanên ku serê kaniyên Dicle û Firêt ji van ciyan difijikin kirin sernîveka (merkez) xwe û paşê ber bi rojava ve şemitîn. Ji van zozanên bilind, heya çiyayên Torosan, ji Antîto-rosan heya Deryayê Sipî û ji bakurê Iskenderûn heya Lasqiye, Tirablûs û Şam tevde girtin (4).

Paşê dereng dereng, Kurd gihîştin Misrê û rexên Deryayê Sor. Kurd di van kişweran (*) da hezaran sal ferman ferma bûn. Wan di van Ciyan da gelek şope (eser) hiştine, wêranên wan heya îro xuya ne.

Milê siyem ji Araratan berê xwe daye Zagrosan û daketiye rexê Diclê, çepê çem girtiye û çûye, xwe berdaye heya kenarê Deryayê Faris û van kişweran giş leyandine.

### Kurtî : Kurdên dora Kaspînê

Kurtiyan ji Araratan koç kir hatin dora Deryayê Kaspînê = Qezwîn û li dora vî deryayî bi cî bûn. Paşê, ber bi roava û ber bi nîvro belav bûn û kişwerê Azerbaycan girt (5). Ji Deryayê Kaspîn heya Deryayê Paris û Deryayê Umman leyandin. Îcar berê xwe da rohilat, heya sînorê Hindistanê

Institut kurde de Paris

girtin. Bajarê Belx bû paytextê yekem ê Kurtiyan.

Di cihanê da, gava karûger (hadise) çêdibûn - berî mîladê 4.000 sal - ji Asor, Kildan, Paris, Ecem tu nav û nîşan tu nebû. Ermenî jî ji Kurdan 5.500 sal bi şûnda li van deran xuya bûn. Ermenî berî mîladê bi 600 sal li van deran xuya bûn. Ermeniyan berî mîladê di 600 da ji Yewnanistana îro, ji Trakya, koç kir hatin dora Erîwanê = Rewanê.

Weka ku em dê paşê bi zûlandin (tefsîlat) bibînin, berî mîladê bi 6.000 sal, gava ku Kurtî hatin vî Niştimanê xwe yê nû, li Mêzopotamya û li dora wî rastî sê fermanwer (hukûmet) û gel hatin : Elam, Akad, Sûmîr. Ji van pêve li roava û rohilatê nîvroyê ciyên Kurdan du hukûmetên xurt jî hebûn : Hîtît û Misir.

Kurdan gelek sedsalan bi van xwehermendan (dewlet) ra pev çûn û li hev xist, şer kir. Bi hinekan ra hevaltî kir, bi hinekan ra neyartî û dijminayî kir. Carna kar kir, carna wunda kir ...

Çawa ku em dê paşê bi givrik (teferruat) bibînin, Kurd berê her xwehermendê bi Akad, Sûmîr û Elam ra şer kirine. Lakaş, Babîl û Suweş, paytextên her sê xwehermendan, bi destê Kurdan pelişîne û wenda bûne.

Xwehermendên Asûr û Kildan ku ji wan karûgeran bi 1.500 sal şûnda peyda bûn rahişt Kurdan. Rahiştinek 2.000 sal pir dijwar û dirêj bû. Lê, li dawiya dawî serdestî li ba Kurdan ma. NÎNWA û BABÎL bi gelên xwe va wunda bûn.

Kurdan, pey van şerên Asûr û Kildan, 300 sal di kişwerekî fireh de jîndarî kir - ji Hindistan heya Deryayê Sipî, ji Qafqasan heya Hebeşistan -. Padîşahên wan xudan dad, welatê wan ava, gelê wan bextiyar û di aştiyê da bûn.

Institut kurde de Paris

Muxabin ! Hezar muxabin ! Ev bextiyarî pir ne ajot! Iskenderê Mezin, ano Iskenderê MAKDONÎ, hat Kurdistan payimal kir ! Kurdan ji Iskender û generalên wî ziyanên mezin dîtin.

Pir ne çû, Kurdan ordiya xwehermenda SELEFKOS ku yek ji generalên Iskender bû şikênand, xwehermenda Selefkos wenda kir. Kurd cardin 600 sal gihan azadî û serxwebûnê. Lê, di nav van 600 salan da bê serêşanî ne man. Îcar dora Roma hatibû. Roma li cihangîrî digeriya, pir caran rojavayê Kurdistanê li bin lingên leşkerê Roma dima, gellek caran jî Kurdan ordiya Roma dişkênand, bera wê dida, ew diavêt derya.

Lê, bobelatê mezin bi şûnda mabû ! Bobelatê Ereban ! Di sala 637 Mîladî da, leyandina Ereban dest pê kir. Ereb bi xwînrêjî, bêdadî, destdirêjayiya namûs, talankirin, wêrankirin û şewitandina bajar û gundan evçend pêş ve çûn ku meriv nikare van dijwarî û çepeliyan bîne ber çavên xwe, bixe mejî û bîra xwe.

Hêj ku ji birîna cîgeran xwîn dihat, ji dilan pêtên agir hil dibûn, Selçûqên Tirkistanê û Tatarên Mongolistanê û Qaraqoyun, Aqqoyun, Qayxanî bi ser Kurdistana bedbext wek kuliyan bariyan, bi sedsalan di Kurdistana birîndar û dil bi kul da man, kuştin, talan kirin, wêran kirin, şewat û agir kêm ne kirin.

Van bajargîran (fatihan), nijdevanan, talankeran, giş bi ordiyên xwe va, bi şahînşahî û mezinatiyên xwe va wunda bûn û çûn ! Bi tenê maf (heq) û rastî payidar ma ! Dê wê bimîne. Kurd hêj meydana pencekerî û pehlewanî bernedaye ! Helbet, dê rojek wê bê, Kurd ji Kurdistana xwe ya giranbiha biyaniyan bavêje derve ! Ew di Kurdistana xwe da serazad û bi serxwebûnî dê bijî !

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

**Ezbetên (qebîle) Kurdan û ferweriyên wan ên kevnare**

Kurdên Araratê, ano Kûtî, sê ezbet bûn : Lolo, Kasî, Sûbarî. Kurdên Kaspînê ku ji wan ra Mad jî dibêjin 7 ezbet bûn : Partas, Bûz, Astroşat, Arûzand, Bûdî, Maj, Dîlam. Ji van pêve, ezbetên din jî ku girêdayî yên Mad bûn hebûn : Mannaî, Simrî, Sît, Amerdî ...

Berî ku em li ser ferweriya hukûmetên Araratiyan ku li Mêzopotamya û dora wê çêbûne tiştek binivîsînin, divê ku em hinek li ser ferweriyên Sûmîr, Akad û Elam bibêjin. Kurd, berî mîladê bi 4.000 sal, gava ji serê kaniyên Dicle û Ferêt ber bi nîvro daketin, rastî sê Ferweriyan hatin : Sûmîr, Akad û Elam. Ev her sê ferwerî pêşveçûtirên dema xwe bûn : cotkarî, kankerî (maden), avadanî (mîmarî), pûteraşî ... li ba van her sê gelan pir pêşveçûyî bûn, bi tîpên MÎXÎ dinivîsand. Tîpên mîxî deranderiya (îcad) Sûmîran e.

Heya 1.840 piştî mîladê, di nivîswarên dîrokan da li ser van her sê gelan zanebûneke pir hindik hatibû nivîsandin. Lê, paşê bi xebatên arkêolojîk pir tişt derketin meydanê û hîn jî dertên.

Van nivîsandinên jêrîn ku têkildariya Kurdan û van her sê gelên Mêzopotamî û dîroka wan dike, ez ji nivîswara MERDÛX, derpêç I, rûpel 133, distînim û li kurdî vedigerînim : "Me ji bo vê yekê Ferweriyên Sûmîr, Akad û Elam gotin. Dîroka hawişê (qewm) Kurd ji dîrokên hawişên Asorî û Kildanî pêştir e, çima ku şope û nîşaneyên Kurdî ku derketine ji me ra nivîsandine ku gilorka (kitle) Zagrosê - Lolo, Kûtî, Kasî, Hûrî - ku nejadên wan Kurd in, bi ezbetên Sûmîr, Akad û Elam ra hemdem (di eynî demî de), hemdasitan û hemceng bûn. Di wan deman da navê Asor û Kildan tu nebû. Padîşah Kiyomers hêj di zikê diya xwe da bû".

## FERWERIYÊN KURDÊN ARARATAN : LOLOBÛM, GÛTYÛM, KARDÛNYA, HÛRÎ, MÎTANÎ, NEHRÎ, MÛŞKÎ, XALTÎ, ALAROD

Ji Kurdên Araratan, ano ji Kûtiyan, 9 Ferwerî derketin. Mîtan, ji van neh ferweriyan, xwehermendeke mezin bû, ji gişan xurtir bû, bi rastî împeratoriyeke fireh, ava û şehrevan (medenî) bû. Nehrî jî bi dijwarî û mêrxasiya xwe nav û deng dabû. Pir caran Xwehermenda Asor anîbû emanê. Eger em rastî bêjin, tev jî, her neh jî xwehermendên xurt û hêja bûn. Mêr bûn, şerker bûn, jêhatî û xebatkar bûn. Hunerwer û hişdar û zanayên wan pir bûn. Lê zaf muxabin ku kêmşans bûn ! neyarên wan pir bûn : Akad, Sûmîr, Elam, Kildan, Asor, Hîtît, Misir, Lîdya ... Paşê jî Iskender û Roma, Ereb û Tatar û Tirk !

Min ji neçarî ev çend gotin nivîsandin. Îcar ez dê dest pê bikim yek bi yek, serhatiyên her neh xwehermendan û ferweriyan û mîran binivîsim.


### FERWERIYA LOLOBÛM

Berî mîladê, di 3.700 da, Loloyan li navbera Kermanşah û Bexdê cî girtibû. Ji kişwerê wan ra Lolobûm, ano xwehermendê Loloyan, digotin. Padîşahê Lolobûm Lasirab û padîşahê Akad ê bi nav û deng, Sargûnê yekem, hemdem bûn.

Padîşahê Lolobûm, Satûn, û Padîşah Naramsîn, kurê Sargûnê yekem, şer kirin û Satûn şikiya. Lê, paşê,



Institut kurde de Paris




Nexşeya E. Cemîl Paşa, N° 2 : 4.000 sal Berê Îsa. Dewletên Kûtiyûm û Lolobûm.

Institut Kurde de Paris

bi alîkariya Kûtiyan, leşkerê Naramsîn şikand û ji hev xist, û Akad û Sûmîr seranser girtin ... Di van salên nêzîk da, li heldora (mintiqa) Zihabê, bi kolan û xepirandina arkêolojîk çarkuncek (lewhak) peyda bûye. Ev çarkunc gihajî (aîd) padîşahê Kûtî û Loloyan, ANOBANÎNA, ye. Berî mîladê, di 2.800 da hatiye nivîsandin. Wê gavê navê heldora Zihabê Hatan bû û di bin destê Loloyan da bû.

Bi gotina rohilatzan Dr Spayzar, berê mîladê, di 1900-1800 da, hin padîşahên Asor jî Lolo bûn. Navê yek ji van padîşahan Lolola bû. Li gora nivîswara Spayzar "Mêzopotamya", Lolo li Sûrya jî ferweranî kirine.

Li gora Rojhilatzan Olmistid, li nivîsandinên çend çarkuncên padîşahê Asoran, Asor Nazîrbal, xuya ye ku Lolobûm pir ava bû, di şehrevanî û hunerwerî da pir pêş de çûbû, ewçend ku Asor Nazîrbal ji Loloyan pir hunerwer biribûn Nînwayê. Asor Nazîrbal çar caran leşker şandibû ser Loloyan. Berî mîladê, di sedsala 9 da, paytextê Lolobûm bajarê Nimrî bû. Paşê Asor Nazîrbal ev bajar stand. Padîşahên Asor: Tîlatpalazar, Adadnîrarî, Toqoltînînota bi Loloyan gelek şer kirine.

Pey wendabûna Asor bi destên Kurdan di sala 612 da berî mîladê, Lolobûm bi xwehermenda Kurdan, bi xwehermenda Medan ra yekîtî danî.

## FERWERIYA KÛTIYAN (6)

Kûtî kevintirê birên Kurdan e. 4.000 sal berê mîladê ji Araratan heya Zagrosan pahn bûbûn, heldora Şehrezor = Suleymaniyeh ferweranî dikir. Paşê, Antîtoros û kenarên Deryayê Sipî jî girtin û gihîştin sînorê Misrê.

Berî mîladê, di 3.700 da, Padîşahê Kûtî yê birrê Zagrosan, ANRIDAPRIZ, gava ku Lolobûm şerê Naramsîn, padîşahê Akad û Sûmîr, kir, çû gaziya

Institut kurde de Paris

Lolobûm û leşkerê Naramsîn şikand. Ji vir pêda, Lakaş bû paytextê Kûtiyûm.

Naramsîn Padîşah, kurê Sargonê yekim ê cîhangîr, berê vê şikestinê pir caran wek bavê xwe gelek şer kar kiribûn, xebatên giran biribûn serî. Lê, îcar li ber êrîşên Kûtiyan ling ne da ber xwe û şikest. Xwehermendên kevnare yên Akad û Sûmîr wenda bûn, ji ruyê cîhanê rabûn.

Padîşahên Kûtiyan bi sedsalan navbera Dîcle û Ferêt, ano, li kişwerê Akad û Sûmîr ferweranî kir. Lê ev demên dîrokê tarî ne, di destê me da şope û nîşanên kevn hindik in. Em dizanin ku jimarên padîşahên Kûtiyûm 41 in, lê em navê gişan nizanin.

Di van çil salên dawîn da, bi kolana arkêolojîk, dîrokên Kurdistan û Mêzopotamya hinek ronak bûne. Em hêvîdar in ku di nêzîk da nîşaneyên pirtir bikevin dest û tarîtiya dîrokê ronaktir bibe.

Zanînên ku heya îro di destê me da ne evana ne : Di sala 310 Berî Mîladê da Elam direjî bajarê Lakaş, paytextê Kûtiyûm, kir. Wê gavê Anatomê Yekim padîşahê Kûtiyûm bû. Kûtiyan êrîşa Elam şikand, ordiya Elam perîşan bû û reviya. Kûtiyan ketin pey revokeyan û bicarek ew pelixand, ordiya Elam bi kişwerê xwe va girêda. Berî Mîladê bi 3000 sal, ANATOMê Duyim bû padîşahê Kûtiyûm. Elam serê xwe ji nû va rakiribû. Anatom leşker kişand ser wan û ew pelaxt. Di 2900 Berî Mîladê da, Padîşah Lokalzakis erdê Kûtiyan firehtir kir, Kildanistana jêrîn jî bi ser kişwerên Akad, Sûmîr û Elam da berda.

Di van salan da, bi kolanên arkêolojîk, li heldora Lolobûm, ano navbera Suleymaniye û Bexdê, nivîswarek derket. Di vê pirtûkê da xuya bû ku 2500 sal Berî Mîladê, li Sûmir û Akad, ANOBANINA, ferweranî dikir. Pey Anobanina, padîşahekî din ê mezin hat, navê wî KUTIA bû. Wek padîşahên din bajarê Lakaş paytextê wî bû.

Institut kurde de Paris

Di van salên nêzîk da, Rohilatzanê fransiz, M. DE SARZK, di wêraneyên Lakaş da şopeyên hêja yên padîşahên Kûtiyan peyda kirine.

Rojhilatzan Profesor SPYZAR di nivîswara xwe "Gelên Mêzopotamya" da nivîsiye : "Di welatên Akad, Sûmîr û Elam da, yek ji padîşahên Kûtî ku ferweranî kirine Padîşah Tîrkan e. Di 2800 Berî Mîladê da, padîşahê Asor SARGONê duyim, dirêjî bajarê Lakaş kir. Padîşahê Kûtiyan, Sarlak, bi Sargon Padîşah ra şerrên dijwar û xwînrêj kirin. Lê, paşê şikiya û piraniya Kurdan bi xwe ra hilanî û kişiya çiyayê Zagrosê. Paşê Kûtî û Kasî li bakurê Elam xwehermendeke nû pêk anî : "Anzan".

Ferweraniya Kûtiyan li Mêzopotamya, ano li kişwerên Akad û Sûmîr û Elam, bi sedsalan ajot. Herçend ku şehreyariya Kûtiyan li Lakaşê û Mêzopotamya ket destê Asoran, gelê kûtî li Anzan, li Zagrosan, li Torosan û li Sûriya cardin bi mêranî û zîndegî ferweriyeke xurt û serfiraz derbas dikir.

Ji wan deman heta 1100 sal, ano heya wendakirina xweherenda Asor û serrastkirina xwehermenda MAD, Kûtî navbera Araratan û Torosan, li Sûriya bakur, ji kenarên Deryayê Sipî heya sînorên Misrê, xuhermenda mezin a Mîtanî anî meydanê û çend mîrî jî serrast kirin û di gellek keysan da navê xwe bi merdî, cengawerî û mezinî di dîrokan da dane nivîsandin. Padîşahê Asor SALMANZAR, ku di 1180 Berê Mîladê da bi Kûtiyan ra gellek caran şer kiriye, ji bo Kûtiyan ewha dibêje : "Kûtiyûm ji Araratan heya Torosan dirêj dibe. Gelê Kûtî di ezmanên wan deman da wek stêran diçirisîn. Ne bitenê di zîweriyê da, lê di mêranî û wêrankeriyê da jî bi nav û deng bûn".

Rohilatzan Dr. Spayzar ewha dibêje : "Kûtî di van kişweran da berî Sargonê yekim bi cî bûbûn. Eger em rind çav li hinek nîşaneyan bigerînin em dê bibînin ku Kûtî, ji van deman bi gelek sedsalan bertir, pir caran kişwerên Akad vegirtine".

Nivîswara dîrokê ya Ibrahîm Heqqî, derpêça yekim, rûpel 66, 71 û 74, dibêje : "Gava ku Misriyan dirêj dikir - ano dirêjî Sûrya - ev gever di destê sê hawişan (*) da bû : li aliyê bakur Kûtî bi cî bûn. Kûtî milletekî mêr û dilîr (cesûr) e. Kûtî heya deryayê Ege daketibûn, ji êrîşên Misriyan ra demeke dirêj ber danîn.

Di hengama ezbeta 19'im da, mîrê Kûtî hatine Misrê, bi Firewnan ra peymanên êrîş û parêziyê girêdane. Mîrê Kûtî keça xwe ji Firewn ra mahr kiriye".

FERWERIYA ANZAN

Me berê nivîsandibû : Gava ku di 2800 Berî Mîladê da Kûtiyûm li ber Asoran şikestin, padîşahê Kûtiyûm, Sarlaq, piraniya Kurdan hilanîn û birin Zagrosan û bakurê Elamê û ji nû va ferweriyekê danî. Kurdan navê vê ferweriyê kir ANZAN.

Anzan bi kurdiya kevn çiya ye, bi kurmancî zozan e. Ferweriya Anzan nêzîkî du hezar sal payidar bû. Paşê Anzan ji gellek birrên Kurdan ra rûniştgeh bû : Kûtî, Kasî, Amerdî ...

Di van salan da, li heldorên Bextiyarî, di sê ciyan da : Mala Mîr, Gola Fireh û Şkefta Suleyman, hin nivîstek peyda bûn. Ev nivîstek ên sedsalên 12 û 13 Berî Mîladê ne. Ji padîşahê Kûtî Amerdî, Texî-Xî, mane. Rohilatzanê hollandî, Profesor SAYIS, dîtine. Vî padîşahî, di nivîstekên xwe da, ji xwe ra padîşahê Anzan gotiye. Ji Parastekên (Mabût) ku jê ra kişwerê Anzan bexş kiriye spas û şabaşan dike. Li ser pûtên ku ji bo navê parastekên xwe danîne û ji wan ra dîwan û surûde (qesîde) li dora dîwanên nimêjgehê dane kolan, dûr û dirêj nivîsiye.

Di van nivîstekan da, ji avakirina welatê xwe û çêkirina riyan qisse kiriye.

Li Anzanê, Texî-Xî Kûtî-Amerdî Padîşahê Xenî derket meydanê, nediyarî (tarîtî) ji dora KÛRÎŞ rabû. Baweriya rohilatzanên îro bi nehrevaniya

Institut Kurde de Paris

(şehadet) nivîstekên padîşahên Anzan ev e : Pirsa Hexamenşî çewtnivîsa Texî-Xî padîşahê Xenî ye. Bi dem û gavan dîrokzanên Ereb û Ecem pirsa Texî-Xî padîşahê Xenî kirine Hexamenşî. KÛRÎŞ, padîşahê Anzan, ji malbata Texî-Xî Kûtî-Amerdî, padîşahê Xenî ye. Kûrîş ne padîşahê PASARGAD e, ne Ecem, ne jî Paris e.

Çawa ku - em dê paşê bibînin - gelê Kurd KÛRÎŞ kiriye padîşahê gişî Kurdistanê. Paşê Kûrîşê Mezin Lîbya û Babîl jî standin, împaratoriya Kurd anî meydanê, ji Kurdistanê gişî ra bû şahînşah.

ŞEHRIYARIYA KARDÛNYA

Berê jî me dîtibû, Kasî, Kurdên Araratan, ji birrên Zagrosan in. Kasî, di 1977 Berî Mîladê da, gava ku AMIZADOGAyê çarim ferweranê (hukumdar) Babîl bû, pir caran dirêjî Babîlistanê dikir. Wan Babîlistana Rohilat heya kenarê Dicle vesend (zabt kir).


Ferweranê Babîl, AMIZADOGA, ji bo ku karibe li ber êrîşên Kasiyan bisekine, bi Elaman yekdestiya parêzî çêkir.

Kasiyan, di 1960 Berî Mîladê da, di dema ferweraniya SEMOILON da, dirêjî Babîl kir. Lê, ji vê dirêjkirinê tiştek ne bir serî. Pey 200 salên din, Kasiyan bi hevaltiya hemnejadên xwe, Kûtî û Lolo, di bin fermandariya KANDIJ, Padîşahê Kasiyan, da cardin êrîş bir ser Babîlê. Îcar di 1760 B.M. da wan Babîl vekirand (fetih kir). Di 1760 B.M. da, Padîşahê Kasî li ferweriya AKAMIL, ku hêj nû li tenişta Sûmîr çê bûbû, dirêj kir û ew kişwer vekirand.

Çend sal şûn da, padîşahê Kasiyan AKUM-AKRIM kela Duraa, bajarê dawîtir ê Sûmîran, ku li ser Dicle mabû, dorpêç kir. Bajarê Duraa li ber xwe da, pêy dorpêçeke dûr û dirêj bajarê Duraa pes (*) kir.

Kurd, bi vî awayî, gava ku bûn xwediyên rexê avê,

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Nexşeya E. Cemîl Paşa, N° 3 : 2.000 sal Berê Îsa.
Du Imperatoriyên Kurdan : Kardûnya û Mîtan.

navê xwehermenda xwe kir xwehermenda KARDÛNYA, ano xwehermenda Kurdan.

Xwehermenda Kardûnya bû yek ji çar Imparatoriyên ku li cihanê hebûn. Ev çar împaratorî ev bûn : KARDÛNYA, MÎTAN, HITTÎT û MISR. Em dibînin ku ji çar împaratoriyên ku di van sedsalan da li cihanê hebûn dudu yên Kurdan bûn : KARDÛNYA û MÎTAN.

Kurdên Kasî ku Sûmîr, Akad û Elam bindest kiribûn 700 sal li vê împaratoriya fereh, bi navê KARDÛNYA, ferweranî kir. firehbûna kişwer ji yê HAMORABÎ, Padîşahê KILDAN, bêtir bû.

Li Babîlê, 35 Padîşahên Kasiyan şehreyarî ajot. Ji hemû padîşên Kasiyan ê bi nav û dengtir KAKÛM-AKRÎM bû. Kasiyan pir caran ji Asor ra padîşahî kir. Yek ji van Padîşahan ADAS Padîşah bû ...

Paşê, di 1171 B.M. da, di hengama TÎKLATNÎN, Padîşahê Asor da, ji netîceyên hin gerdişên (hadise) ku heya îro nivîswaran ji me ra ronî ne kirine, Kurd Babîl û Babîlistanê berdan, kişiyan çiyayê Zagrosê û Anzanê.

Asor seraser Babîlistan vesend. Lê, Kurd li çiyê pir ne sekinîn, wan rind karê xwe kir, qenc xwe pêk anî û vegeriyan ser Asoran. Leşkerê Asor şikand, Babîla rengîn ji destê Asoran deranî. Li Babîl ji nû da bi cî bûn. Rohilatzan Mr. Hol, di nivîswara xwe ya Milletên Kevnare yên Rojhilata Navîn da, nivîsiye: " SENEXRIP, Padîşahê Asor, di 805 B.M. da dirêjî ferweraniya Kardûnya kir. Ew, ano Kasî, ji çiyê vegeriyabûn, ji nû da Kildanistan vekirandibû, li ber leşkerê Senexrip şikiyan. Senexrip Babîl talan kir, xelkê Babilê kire dîl û bi xwe ra bire Asorê. Kurd bi padîşahê xwe va kişiyan Zagrosan û Anzanê. Lê Kurd, pey vegera Senexrip, dageriyan Babîlê û ji nû da ferweraniya xwe ajot".

Kurd ji wê demê û şûn da bi Kildan ra dostanî û

Institut Kurde de Paris

aşîtî danîn. Dostaniya wan heya hevalbendiya Kildan û Mad ajot.

Em dê paşê bi givrikî (tefsîlat) bixwînin ku Kildan û Kurd bi hev ra yekîtî danî û dirêjî Asor kir, paytextê Asor NÎNAWA dorpêç kir û vekirand. Xwehermenda Asor bicarek wenda bû. Pey van gerdişan, xwehermenda Kurdan "Kardûnya", mîna (*) hemî xwehermend û mîrên Kurdan, bi Madan ra yekîtî danî. Kurdan giş xwe da dora MADAN, yek xwehermenda mezin serrast kir. KURDISTAN ! Imparatoriya KURDAN !

ŞEHREVANIYA KASIYAN


Ev çend rêzên jêrîn di şehrevanî û pêşveçûna Kasiyan da xweş nehrevan (şahid) in :

1- Serkargerînê (mudîrê umûmî) giştî yê Muzeya Tahranê, Mr. ANDEREK, di sala 1310 ya Îranî, ya salnama Tahranê da nivîsiye : Hûrûmûrên ku li Kurdistanê ji bin erdê hatine deranîn kardestên (eser) wan kesên ku, li hengamên ku em jê ne agah in, li aliyê Deryayê Kaspînê bi cî bûbûn van çiyayan in. Ji ber êrîşên ku herdem, ji bakur, li wan dihatin kirin, ciyên xwe berdane, berî 4000 sal hatine Loristanê. Ev Kasî ne, di dîrokan da naskirî ne. Ev hawiş Babîl vekirandiye, di Babîlê da 600 sal fermanferma bûye, paşê vegeriyaye çiyayên xwe. Ew bi bazirganiya terş, nemaza bi firotina hespan ji Asoran ra, tuwanger (zengîn) bûne.

Ev hûrmûrên delal ên hundirên malan, ev çek û rext û zînên nazenîn, ev gewher û firaqên rengareng ji çesindarî (zewq), tuwangerî û geşdariya wan, huner û pîşevaniya wan, şarezayî û hunerweriya wan ra numûne ne".

2- Margueritte RUTTEN, Babilon, rûpel 27. Presses Universitaires de France : "Di van deman da, Hitîtan Babîlî şikandibûn, Babîl standibû û seraser wêran û talan kiribû, pûtê MERDÛX rakiribû, biribû. Padîşahê Kasiyan Akûm-Kakrîm putê Merdûx ji Hitîtan

Institut kurde de Paris




**Übersichtsskizze 1:** *Die turano-pontischen Indogermanen in Vorderasien im 2. Jt. v. Chr.*

**Schraffiert:** Kerngebiete der Hethiter, Mitannaer, Urartaer, Assyrer, Kassiten und Elamiter.

**Abkürzungen:** As = Alaca Huyük, Ar = Alisar Huyük, H-B Hattuscha-Boghazkoy, K = Karkemisch, Ker = Kermanschah, La = Lagasch, Mar = Maras, N = Niniveh, Q = Quadesch, TH = Tell Halaf, Z = Zencirli.

şûnda stand, bi ayinên giran û bi helehelan anî Babîlê.

Kasî, ji bo vegerandina nav û dengê Babîla kevn û ji bo avayiya wê pir koşiyan û xebitîn, Babîl rêzand. Babîl vegeriya û bû Babîla berê, çeleng û lewend.

Padîşahê Kasiyan, NAZÎ-MAROTAS, ji bo MERDÛXÊ PARAZTEK (mabûd) nêzîkî Babîlê, zevî û erd diyarî kirin û navên diyariyên xwe li ser abîdeyan kolan".

3- Ge. CONTENEAU, Les Civilisations Anciennes du Proche-Orient, rûpel 100 : "Bicîbûnên Kasiyan li Babîlê, di adetên Babîliyan da pir guhartin çê bûn. Li Babîlê, kincên neqşîn, ustupêçên rengîn xuya bûn. Ji berê, Babîliyan hesp kêm zanîbûn. Kasî hesp anîn Babîlê, li erebeyên şer hesp girêdidan. Erebekêşên Babîliyan ker bûn. Yek ji engîzên serdestiya Kasiyan li ser Babîliyan ev bû".

4- ÎRANNAME, yan Karname î Îraniyan der esrî Aşkaniyan, Derpêç 3, birrê yekim : "Kasî, ku di 1800 B.M. da li Babilê ferweranî dikir, bapîrên Kurdên îro ne, ji nav wan merivne mezin, feylesof û zanayên xurt rabûne".

Lê dema zanayên ewrûpayî û yek jî ji zanayên Îranî ku di şehrevanî, tuwangerî, geşdarî (refah) û dilaweriya wan da, di gezdika (derece) pêşveçûna Kasiyan da nehrevanî dikir, em dê binêrin zanayê dîroka Tirkan, Ahmet REFIQ Beg, ji bo Kasiyan çi dibêje ? "Tûdeyên Mêzopotamya li nîvro Sûmîr, li bakurr Akad bûn. Ev her du hawiş ne indoewrûpayî bûn, Tûranî bûn (7). Li aliyê din ê Dîcle ji nejadê indoewrûpayî Kasî hebûn, yanî Kurdên nuha. Hîn berjêr jî Elam, yanî çiyayî hebûn. Paytextê vana bajarê Sûz bû. "Qissî" ta îro di hovîtiyê da mane ...".

Tirkê fêris rik û kîna ku ji bo Kurdan ji bapîrên xwe mîrate girtibûn nikarîbû veşêre û eşkere neke. Zanayên Fransiz û Îranî evçend Kurd pesinandine. Zanayê tirk jî Kurd bi hovîtî şermisandine (ittiham). Hatta nivîskarên dîrokan giş ji vî hawişî ra Kasî



Institut kurde de Paris

gotine, lê Refîq Beg Kasiyê narîn kiriye Qissî, ano kiriye stûr û kirêt.

Tirk dibêjin : "bi jêkirina şift (zebeş) dilê meriv hênik nabe" û Kurd dibêjin : "rim di têran da nayê veşartin". Ahmet Refîq Beg hingî eniriye, xwe ji bîr kiriye, di nivîswara xwe da ne nivîsiye ku Kurdan Babîl vekirand û 700 sal li Babîlê fermanferma bûn.

Hitîtên zorba ji ciyê xwe 2000 kîlometre dûr hatibûn, Babîl standibû, talan û wêran kiribû û pûtê Merdûxê parastek jî biribû. Gelek salan bi şûnda padîşahê Kasiyan, şahînşahê Kurdan, Akûm-Akrîm leşker kişand ser Hitîtan û ew şikandin, Pûtê serfiraz (muqeddes) ê Merdûxê parastek şûnda anî Babîlê û danî ciyê wî yê bilind û pir homan. Bi vî awayî, padîşahê Kurdan, Akûm-Akrîm, camêrî û çelengiya Kurdan eşkere kir, danî meydanê.

Kurd ne hov û kûvî ne. Kurd li pîrejin û kalemêran, jin û zarokan, dîl û birîndaran destê xwe bilind ne kirine, vê rûreşiya hanê bi ser xwe da ne anîne. Zanayê Tirk baş bîr dibe hov kî ye û kî bê dilovanî ye, bi sungiyan zikê diyan didirrîne ! keleşmêran, selûbejnan kî ji zinar û fîsan gêr dike, kadînan bi hezaran zarûkên yeksale û dusale tijî dike, bi ser wan da gaz dirijîne û agir berdide û dişewitîne ! Li Dêrsimê hivdeh şkeft ji jin û zarok û pîr û kalan tije dike û derê şkeftan bi çimento û keviran dihûne û dipêçe ! Ey zanayê Tirk ! Te îcar nas kir hov û cenawer kî ye ? Kurd e yan Tirk e ?

## HÛRÎ : MÎRIYÊN HÛRIYAN

Hûrî birrekî Sûbariyan in. Bi nivîsandinên dîrokan ji gelên Kurdan ku bertirê gişan bajaran ava kirine, bûne xwediyên şehrevanî, Hûrî ne.

Hûrî li zozanên bakurrê Mêzopotamyê, li Amed (Diyarbekir), Xarpêt, Dêrsim cî girtibûn. Paşê Asor û Sûriya jî xistin bin destên xwe (8).



INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHEQUE ·



Institut kurde de Paris

Ji hunera Hûriyan : Şêrek ji bronz li ser nivîseke li ser kevir a padîşahê Hûrî "Ûrkiş".
Nêrgiza Torî, Kürtlerde sanat

Hûriyan ji 4000 sal B.M. heya 2000 sal B.M., ano 20 sedsal li wan derên ku navên wan li jor derbas bûbûn mîriyên bê jimar serrast kirin, jîneke bextiyar û geş derbas kir.

Di wan deman da, Mîtaniyan, ku ew jî birrekî Sûbariyan in, xwe da xuya kirin. Hûriyan xwe gihand birayên xwe yên Mîtanî û bi awakî nîv-serbixwe bi Mîtaniyan ra hemjîndarî kir.

Evçend ku Hûriyan bi Mîtaniyan ra yekîtî çêkiribû, cardin erdên xwe fireh kirin, li Sûriya û Filistînê pir ciyan vekirandin.

Gava ku di 1483-1466 B.M. da Fîrewnê Misrê Tûtmezê sêyim dirêjî Filistîn û Sûriya kir, mîrê Hûriyan ferweranê bajarê Kadeş, li Sûriya, li ser çemê Asî bi pêşberê Fîrewnan ra şer kir û bajarê Mêcîddo 7 mehan ji Firewnan parazt. Bajarê Mêcîddo li Filistînê di bin ferweriya Hûriyan da bû.


Hûriyan bi Mîtaniyan ra wek yek xwehermend, heya sedsala 12yim B.M., bi yekîtî û xurtî hemindarî kir.

Pey Mîladê, di sedsala 12yim da, Hitît, hevsiyê (cîran) Hûrî û Mîtaniyan, pir xurt bûbû, hergav êrîş li ser wan dibir. Van êrîşên hergave xwehermenda Mîtan û Hûriyan wenda kir. Paşê, Mîtan û Hûriyan xwe gîhand Araratan û xwe tevî Nehriyan kir. Nehrî jî birrekî Sûbarî ne, di van salan da li Araratan ferweriyeke bi nav û deng û xurt serrast kiribû.

## ŞEHRIYARIYA MÎTAN

Mîtanî jî Kurdên Araratan in û birrekî Sûbarî ne. Bêtirê sedsala 20im B.M. belav bûbûn, gihajtibûn Antî-Torosan.

Ji sedsala 16im pêda, bi lez û bez bi pêşve çûn, di demeke dindik da împaratoriyeke xurt, ava û şehrevan




Institut kurde de Paris

anî meydanê. Çawa ku me berê gotibû, Mîtaniyan di van sedsalan da yek ji çar împaratoriyên mezintir ên cihanê serrast kir. Ev dewlet Mîtanî, Kardûnya, Hitît û Misr bûn. Paytextê Mîtaniyan bajarê Waşqanî (9) bû. Rojhilatzan JONSON dibêje : "Mîtan navê ezbet e, navê hawişê wan Sûbarî ye".

Di van salên dawîn da, li Kerkûk, Hewlêr, Boxazkoy, Serê Kanî û Cerablûs kolanên arkêolojîk çêbûn. Bi van ger û kolanan, bi hezaran perçeyên eserên kevn ên Mîtaniyan peyda bûn. Hîn paştir, kaxizek li ser navê TOSARTA, Padîşahê Mîtan, derket. Ev kaxiz bi 600 rêze e, bi zaravê Mîtanî hatiye nivîsandin. Rojhilatzan POREKS ji bo wê kaxizê dibêje : "Zimanê ku di vê kaxizê da hatiye nivîsandin hevrêsî (terkîbî) ye, ango ji Kurdiya Ararat û Qafqas e".

Nivîswara Tarîxî Ûmûmî Muerrixîn dibêje : "Di 1600 B.M. da, ferweriya Mîtan jêhatî, şehrevan û pir xurt bû. Ji alîkî Kurdistana roava gişî : Sûriya, Amûra, Arafa (Ankara, Anadol) û Asor li bin destê Mîtan bû û ji Mîtan ra serfirû dibûn".

Mîtanî gelek sedsalan ferman-fermayên rohilat û roava bûn : Asor bicarek ji Mîtan ra serfirû bûn.

Hitît û Mîtan gelek salan neyartiya hev kir û di navbera wan da şerne dijwar çê bûn. Ji bo navçeya Sûriya, Misr û Mîtan ji hev pir xwîn rêtin. Mîtan, bi sedsalan, ji bo pêşhatina Misr ber bi rohilat bendeke xurt bû. Misr bi sedsalan nikarîbû rohilat bide ber xwe û bileyîne. Paşê, Misr û Mîtan bi hevra aştî, yekdestî û dostanî girêdan.

Di 1483 B.M. da, Fîrewn Tûtmêsê sêyim ket sewda vekirandina Rohilatê, bi leşkerine xurt dest bi êrîşa Filistîn û Sûriya kir. Mîtanî, bi alîkariya Hûriyan, bi mêranî li ber êrîşên Fîrewnan sekinîn. Lê, li ber piraniya leşkerê Fîrewnan, sekna wan heya dawiyê bê îmkan bû. Mîtanî ji bo ku karibin li ber êrîşên Fîrewnan bendeke xurt deynin, li çareyên hevalbendiya ferweraniyên dorê geriyan, lê











Institut kurde de Paris

Ji hunera Mîtaniyan : pûlên madenî, 1.200 Berê Îsa
Nêrgiza Torî, Kürtlerde Sanat

mixabin ! Mîrên dorê, ji bo ku mafê xwe biparêzin, bi diyarî û pêşkêşan xwe avêt dest û piyên Fîrewnan !

Ji Mîtaniyan pêva, berî gişan Hitît, paşê jî gir û hûrên xwehermendên dorê, giş heta Qibris bixwe li ber Fîrewnan stuyên xwe xwar kirin û çekên xwe danîn.

SOSATAR, Padîşahê Mîtan, berî her tiştî bi Asoran kariwer (meşxûl) bû. Jixwe Asor li bin ferman û ferweraniya wî bûn. Sosatar Asor kirin bin rêzaneke tekûz û bawermend. Lek (tabûr) ên ku ji Asoran berbihev anîbûn kirin bindestên fermandarên Kurd. Bi vî awayî, leşkerên asorî xistin bin rêzan, bin serfiruyê (îtaat) xwe (10).

Sosatar, gava ku bi vî awayî rewşa rohilatê navçeya xwe serrast û tekûz kir, ji bo ku bi Misriyan ra şer bike, ji wan ra yekdestî û hevalbendî pêşxwaz (teklîf) kir. Fîrewn Tûtmêsê çarim pêşxwaza Sosarta pezirand. Herdu xwehermend bi aşîtî û xweşî li hev hatin. Sûriya Bakur ji Kurdan ra ma, Sûriya Nîvro bû ya Misriyan.

Paşê, Fîrewnê Misr, Tûtmêsê çarim, xwest ku vê yekdestiyê dostanîtir û xurttir bike û bi padîşahê Mîtaniyan ra mervantî deyne. Tûtmêsê çarim, di 1405 B.M. da, bi neviya Sosarta, keça ARTAMA ra mêrjinî (zewac) kir. Ji vê mêrjintiyê Fîrewn AMÊMO-FÎSê sêyim hat cîhanê. Paşê, ev Fîrewn jî bi mîreke din a Kurdan ra mêrjinî kir. Navê mîrê JÎLÎ-HÊPA bû. Ber bi dawiya jîna xwe mîreke din anî. Navê vê mîrê TADÛ-HÊPA ye. Ev şabanû NEFERTÎTÎ ye. Nefertîtî di dîrokan da nav û deng standiye. Fîrewn navê wê kiribû Nefertîtî. Îro li ser navê Nefertîtî, li Misrê, kulukparsuyek (ehram)

heye. Di mirina wê da, ji bo wê ava kiribûn.

Zaf muxabin ! Ji van yekdestî û merivantiyan tu berxwedarî çê ne bû ! Bi gav û deman, Hitît pir xurt bûn. Mîtan û Hûriyan li ber leyiya Hitîtan

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Tadû-Hêpa, yan Nefertîtî. Mîreke Mîtanî.
Jina Firewnê Misrê, Amêmofîs III. Sedsala 14. Berî Îsa.

nikaribû bisekinin. Fîrewn ji Kurdan ra alîkarîke xurt ne dikir.

Mîtan êdî ber bi nişîv bûbûn. Ji aliyê din, Asor hişyar bûbûn, serê xwe bilind kir, şoriş ji nav wan kêm ne dibû. Evçend malmîratî ne bes bû. Li Serayê Mîtan jî dolavgerî, entrîka û hevdukuştin dest pê kiribû.

Dawiya dawîn, ji van bûyerên cigersuz xwehermenda çarsed salî ya Mîtanan, împaratoriya zorawer û şehrevan a Kurdan ji meydanê rabû !

Di van deman da, ano di 1200B.M. da, cardin ji Sûbariyan ferweraniya NEHRÎ nav û deng stand. Bermayên Mîtaniyan xwe gîhand Nehriyan.

## FERWERANIYA NEHRÎ

Me nivîsandibû ku birrê mezin ê Araratiyan Sûbarî ne. Nehrî birrekî Sûbarî ne. Pey Mîtaniyan, Nehrî ferweraniyeke din li Araratan serrast kir. Nehrî di 1500 B.M. da, ji Araratan heya Torosan ferweriyekê saz kiribû û navê Nehrî ketibû dewsa navê Sûbarî.

Rojhilatzan MAJERSON ji bo Nehriyan ewha dinivîsîne : "di sedsalên 15im û 12im B.M. da, eger em rind li heldorên Kurdistanê temaşa bikin, em dê bibînin ku Nehrî berî Madan hatine van heldoran". Û cardin Majerson dibêje : "Navçeya Nehriyan ne bitenê dora çemê Zab e. Padîşahê Asoran Tiklat Palazarê yekim û neviyên wî dibêjin ku gelê ku li serê kaniyên Dîcle û Ferêt û bakurê çiyayê Nîfast - Bedlîs, Diyarbekir, Xarpêt, Dêrsim - û çiyayên Torosan ferweranî dikir ..." "ev welatê Nehriyan e, di hengama Iskenderê mezin da navê Kurdûwan standibû. Nehrî bapîrên Mad û Kurdên îro ne".

Padîşahê Asoran TÎKLAT PALAZARê yekim ku di 1128 B.M. da xuya bûbû şerine dijwar bi Nehriyan ra kirin, şerrên han di dîrokan da bi nav û deng in.

Institut kurde de Paris

TÎKLAT PALAZARê duyim di 1278 B.M. da împaratoriya Asor vejand. Ev padîşahê Asor jêhatîtir, dijwartir û binavûdengtirê Padîşahên Asor e. Di hengama xwe da, ji cihanê ra şahînşahiya xwe bang dabû, ji serkaniyên Dîcle û Ferêt heya dora Şamê xistibû bin destê xwe, daketibû kenarên Deryayê Sipî, Kurdistana bakurr di wan hengaman da ji Asor ra bac dida. Lê bi Nehriyan ra pişo-pişo dikir.

Dîrokzan ZAGOJIN dibêje : "bi Nehriyan ra xweş derbaskirina padîşahê Asor Tîklat Palazar tiştekî pir haykêş e. Hîç dudiliyan mekin, guhartina Tîklat Palazar ne ji dilpaqijiya wî ye, ew bitenê li benda kêys û fesala xwe ye".

Ev nivîsandina jorîn gezdika xurtî û tuwandariya Nehriyên zorbazû xweş nîşan dide. Şahînşahê cihan Tîklat Palazar ji Nehriyan ra pişo-pişo dikir !

Bermayên wan Nehriyên cengawer û ciwanmêr li dora Hekkarî heya îro bi zindeganî paydar in.

Padîşahê Asor TOKOLTÎ—NÎNÎB, di 890-884 da, bi Nehriyan ra şerine dijwar kirine. Gelek padîşahên Asoran bi van Nehriyên şerevan ra li meydana mêraniyê cengbazî kirine.

Di 740 B.M. da, Nehriyan ji bakurê rojhilat dirêjî Asor kir û ketin hundirê kişwerê Asor. Tîklat-Palazarê duyim bi zorê Nehrî ji sînorên xwe derxistin.

Senexrîb ji vî şerî ra geştecenga (sefer) pêncim gotiye.

Nehrî, heya wendabûna Asor bi destê Medan, ji Asoran venegeriyane, tim bi Asoran ra şer û ceng kirine.

Pey wendabûna Asor di 612 B.Z. da, Nehrî jî tevî yekîtiya Mad bû. Nehrî bû perçeke imperatoriya Kurd.

Institut kurde de Paris

FERWERANIYA MÛŞKÎ

Mûşkî jî, wekî Nehriyan, Kurdên Araratan in û Sûbarî ne. Dîrokên kevn nivîsandine ku Mûşkî B.M. bi 1100 sal û virda li Kurdistana bakur ferweranî kiriye, heya Kapadokya û Kîlîkya xistine bin destê xwe. Bajarê Mûşê ji Mûşkiyan yadîgar maye. Tewratê navê Mûş Maş nivîsandiye. Bi gotina Tewratê, Mûşkiyan li bakurê Mêzopotamya jî ferweranî kiriye.

Di van salan da, ji kolanên arkêolojîk hin kevnerêç (asar) ketine dest. Ji van kevnerêçan xuya dibe ku di 1800 B.M. da navê Padîşahê Lîdya Mîtayê Mûşkî bû. Di wan salan da, Mûşkiyan li Kapadokya û Lîdya hukumdarî dikir. Çawa ku Mûşkî û Mîtanî ji yek gel, ji yek hawiş in, Kurd û Sûbarî bûn, ewha jî yekdest û dost bûn.

Mûşkiyan, di 770 B.M. da, bi Kurdên Araratan ra bûn yek, şerê Sargonê duyim, padîşahê Asor, kir.

Zanibûna me li ser Mûşkiyan ev çendik e. Em hêvîdar in ku ji nû da xebat û kolan û xepartinên din çêbibin û dîroka Mûşkiyan çêtir ronak bibe.

FERWERANIYA XALTÎ

Xaltî jî, wek Hûrî, Mîtanî, Nehrî û Mûşkî, Sûbarî ne, Kurdên Araratan in. Xaltî di 1500 B.M. da li Araratan û Kurdistana navîn ferweraniya Xaltî serrast kir. Ferweraniya Xaltî jêhatî, tûwana, hişdar û cengawer bû. TOSPA WAN paytextê Xaltiyan bû.

Paş ku Xaltî li Araratan û li Kurdistana navîn bi cî bûn, pir ne çû baş xurt bûn, erdê xwe fireh kir, gihiştin Antî Torosan û milekî wan xwe gihand Deryayê Reş. Îro bixwe li Kurdistanê, li gelek ciyan, bermayên Xaltiyan hene.

Dîrokvanên rohilat û roava di Sobarîbûna Xaltiyan da yekdest û yekdeng in. Lê, vê rastiya eşkere Ahmet Refîq Beg, Dîrokzanê Tirk, napezirîne (qebûl



INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

nake), ew nabêje erê. Ahmet Refîq Beg di nivîswara xwe ya dîrokê "Büyük Tarihi Umumi" da, derpêç I, rûpel 346, ewha dibêje : "Asoriyan ji vê heldorê ra ORARTO, Israîl jî ARARAT digot. Ermenî ku ji nejadê endo-ewrupayî ne, berî ku li van deran bi cî bibin, hawişekî din li van doran rûdinişt. Navê vî hawişî Xaltî bû. Ev hawiş bermayê Hitîtan bû".

Ahmet Refîq Beg ji alîkî ji Xaltiyan ra bermayên Hitîtan dibêje, ji aliyê din jî pirsên Heredot (11), dîrokzanê yewnanî yê bi nav û deng, dipezirîne û dinivîse : "Xaltî bejndirêj, zînde, tendurust û xurt bûn".

Cardin ev Ahmet Refîq Beg di nivîswara xwe da, derpêça yekim, rûpel 330, ewha dibêje: "rûçikê Hitîtan ne dilkêş bû, bejna wan kin, hestiyên hinarokên ruyê wan derketî, lêvên wan ên jorîn daketî ...".

Gotinên dîrokzanê Tirkan hevdu nagirin : ji alîkî ji Hitîtan ra bejnkin, lêvdaketî, rûçik ne xweşik dibêje, û paşê xwe ji bîr dike, ji bermayên Hitîtan ên Araratan ra bejndirêj, zînde, tendurust û xurt dibêje ! Ev nîşanên han li Hitîtan tên ? Tukes bi Hitîtên bejndirêj bihîstiye ?

Dîrokzanên cihanê hemî Kurdbûna Xaltiyan peziranddine. Îro Xaltî li Kurdistanê hene û li Kurdistanê wek berê zînde û çalak dijîn. Lê dîrokbêjê tirk Ahmet Refîq Beg pirsa kurdî nikare bîne devê xwe ? Ev çi hişkbawerî (taassub) e ? Ev çava serhişkî ye ? Ew bi Hitîtkirina Kurdan bitenê qîma xwe nayne, Ermeniyan jî tîne Araratan ! Li niştimanê Kurdan ê deh hezar salan bi cî dike ! Ya Ahmet Refîq Beg ! Dîrokzanên cihanê gişan nivîsandine û pezirandine ku Kurd berî Mîladê bi 6000 sal, dibe ku bi 8000, 9000 yan jî 10.000 sal, ji Iskandinavya hatine û li Araratan bi cî bûne.

Cardin wan dîrokzanan - hetta Ahmet Refîq Beg jî di nivîswara "Büyük Tarihi Umumi" da - nivîsandine ku Ermeniyan ji TRAKYA berî Mîladê bi 600 sal

Institut kurde de Paris

koçûbar kiriye û derbasî Bosforê bûne û hatine Asya biçûk, li dora Qars û Eriwanê bi cî bûne.

Ahmet Refîq Beg di nivîswara xwe ya dîrokê da, derpêç I, rûpel 347, dinivîsîne : "ber bi sedsala şeşim a berî Mîladê, Ermenî, ku ji nejadê endo-ewrupayî ne, gava ku tev Firîkyayê derbasî Asya biçûk bûne, hatine van heldoran, tevî hawişê Orarto bûne. Wuha ye. Pey sedsala şeşim, kesên Orarto ji Xaltiyên kevn û ji Ermeniyan, ku ji roava hatine, çê bûne ...".


Di van gotinên Ahmet Refîq Beg da yek pirs rast heye. Ev pirs jî hatina Ermeniyan li vî erdî Berî Mîladê bi 600 sal e. Pirsên mayîn, giş Ahmet Refîq Beg ji ber xwe gotiye, ano ne rast in, neyartiya Kurd in ! Ahmet Refîq Beg yekî bawerhişk e. Wî biryar stendiye ku pirsa "Kurd" ji nivîswaran derxîne. Lê ew wek me agah e û baş dizane rastî çawa ye : ew dizane ku Xaltî Kurd in. Ermeniyên ku ji rojava hatine tevî Xaltiyan ne bûne. Cardin ew dizane ku Xaltî îro li Kurdistanê hene û xurû Kurd in !

Ahmet Refîq Beg bi vî awayî bi kevirekî du çivîkan dikuje : 1- Xaltiyên Kurd dike Hitît, Kurdan pê qels dike. 2- Ermeniyan dureh dike, xwîna Ermenî û Hitîtan tevhev dike !

## CÎBÛNA ERMENIYAN LI ARARATAN

Dema koçûbarbûna Ermeniyan ji Trakyayê, "Sît" — ku ji nejadê Kurd in - di wan salan da ji rohilat ber bi Kurdistanê hatibûn û ta Lîdya vekirandibûn: wek leyiyek serejêr bûbûn ji jorê Deryayê Kaspîn, hin ciyên Qafqasan û Araratan, Gurcistan û ciyên ku Ermenî nû tê da bi cî bûbûn - Ermenî nû hatibûn, hêj Ermenistan çê ne bûbû -, Pont, Kapadokya dabûn ber xwe, dest pê kiribûn Lydia jî bistînin.

Sît tu rêzan û rêdar (qanûn) nizanîbû, çaralî dabûn ber xwe, talan û wêran dikirin. Ermenî ku ji Trakya koçûbar kiribûn û nû hatibûn van deran hê rind bi cî ne bûbûn, gund û bajar ava ne kiribûn, kel û




Institut kurde de Paris

burc çê ne kiribûn. Loma ji bo Sîtan nêçîreke pir hêsan bûbûn.

Paşê hûn dê bixwînin, me di zûla Ermenî û Kurdan da ser vê çîrokê dûr û kûr nivîsiye.

FERWERANIYA ALAROD

Di nivîswarên dîrokan da, ji xwehermenda ALAROD ra ORARTO, ORARDO, ARARAT jî dibêjin. Xwehermenda Alarod, ano xwehermenda SÛBARÎ. Ev xwehermenda ha bi gihandina hemî birrên Sûbariyan serrast bûye : Hûrî, Mîtanî, Nehrî, Mûşkî, Xaltî.

Li gel vî çendî, di nav van xwehermendan da, di wan demên dawîn ên navpêketî da, Nehrî û Xaltî bûn. Pir caran padîşahên Ararartê ji xwe ra padîşahên Nehrî digot. Paytextê xwehermenda Alarodê bajarê Tospa-Wan bû.

Xwehermenda Alarod hergav bi xwehermenda Asor ra şer dikir. Di sala 829 berî Mîladê da, padîşahê Alarod, Mînwaş, nîvro û rohilatê Urmiyê vesend, hawişên Kurd ên Parsuwa û Mannaî, ku li van deran cî girtibûn, xistin bin parazta xwe û bi vî awayî bendeke xurt li hemberê Asoran tekûz kir.

Di 773 Berê Mîladê da, padîşahê Alarod, Sardorîsê yekim, bi padîşahê Asor Salmanazarê sêyim ra şer kir. Navê padîşahê Alarod ê paşîn Mina-Ari bû. Gava ku di sala 612 B.M. da Key Aksar Nînwa vekirand, hemî xwehermendên Kurdan kirin yek, Imperatoriya Mezin a Kurd serrast kir. Xwehermenda Alarod jî, wek xwehermendên din ên Kurdan, bi xwehermenda Mad ra bû yek.



Ji hunera Urartu : mixfera padîşah Sardûrî.
Nêrgiza Torî, Kürtlerde sanat.

Institut kurde de Paris

# FERWERANIYÊN KURD ÊN KASPIYÊN MANNAÎ, MADÊ BIÇÛK Û MADÊ MEZIN

## FERWERANIYA MANNAÎ

Mannaî bixwe birrekî ji Mad in. Ji kevn da, li dora Urmiyê bi cî bûne. Paytextê wan bajarê Urmiyê bû. Mannaî, Parsuwa, Kimrî û Sît gihîştibûn hev, ferweriyek çê kiribû. Ew hawişên ku li dora Mannaiyan xwe dabû hev ji Mannaiyan ra pir bi kêr dihatin. Padîşahê Araratan Mînwaş bi wan ra yek dest bû. Di 829 B.M. da, padîşah Mînwaş şerê Salmanazar, padîşahê Asor, kir, ew şikand û li "Geliyê şîn" ji bo yadîgara vî şerî stûnek daçikand.

Di nivîswarên dîrokan da navê 5 padîşahên Mannaî nivîsandine : ARTSARI, IRANZO, ARA, LOSUNA û DIAKU (DOGO). Diakû di 715 B.M. da bi padîşahê Asor Sargûn ra şer kir. Sît ku hevalbendên Diakû bûn dereng hatin meydana şer, leşkerê Diakû loma şkest û Diakû dîl ket destê Asoran. Asoran ew dûrand (nefî kir), şand aliyê Şamatê. Di wan salan da, bakurê Sûriyê di destê Mîtaniyan da bû. Bi hêsanî, Diakû xwe gihand nav Mîtaniyan. Wan Diakû şand û ew çû, gihîşt welatê xwe.

Ihsan Nûrî Paşa, Qehremanê Çiyayê Agirî, di nivîswara xwe "Dîroka Rîşeî Nejad î Kurd" da, nivîsandiye ku Diakû Key Kubbad bixwe ye. Lê, gelek nivîswarên dîrokan nivîsîne ku Key Kubbad ne Mannaî ye, Madî ye. Diakû ferweranê Mannaiyan bû. Key Kubbad mîrekî Mad bû.

Institut kurde de Paris

## FERWERANIYA MADÊ BIÇÛK

Birrek ji Mad li "ATOPRATKA", ano li Azerbaycana îro, bi navê Madê Biçûk ferweraniyekê serrast kiribû. Di nivîswarên dîrokan da ji bo ferweraniya Madê Biçûk zanîneke aşkere û ronak tu neye. Madê Biçûk pey padîşahiya Key Kubbad xwe tevî imperatoriya Madê Mezin kiriye.

## ŞEHRIYARIYA MADÊ MEZIN

## FERWERANIYA KEYANIYAN

Berî ku em dest pê bikin bişkartina (îzahat) xwehermenda Mad, em çend pirsan li ser Medan bibêjin. Mad, hê paştir Kurdên Kurtî, di wan salan da, ano ji hindikî 4000 sal B.M., erdê ku xistibû destê xwe pir fireh bû : ji sînorê Hindistanê heya Zagrosan, ji Urmiyê heya Deryayê Umman giş Madistan bû, kişwerê Kurdan bû.

Di nav vî erdî da Faris hebûn. Faris jî Arî bûn, pismamên Kurdan bûn.

Hinek ji dîrokzanan gotine ku Kurtî ji aliyê Hindistanê hatine wan doran. Lê, baweriya pirtirên zanan û koş û xebata me ev e ku Kurtî, wek birayên xwe yên Kûtî, raste-rast ji Iskandinavya hatine çiyayê Agirî. Di koçbariya giştî da, ew berê hatine Çiyayê Agirî, paşê, ji bo peydakirina çêrgehên fireh, ji keriyên xwe yên giran û bê jimar berê xwe dane rohilatê, dora Deryayê Kaspînê û heya Deryayê Paris û Umman belav bûne. Ev kişwer bûye rûnişgeha Kurtiyan.

Ev hatina Kurtiyan ji Araratê û belavbûn û firehbûna wan heya Ummanê hêdî bûye û bi sedsalan çê bûye. Li gel vê yekê, hin rojhilatzan xwe dispêrin nîşane û kevnerêçan, û gotine ku çend tîrên Medan (Kurtiyan) li bakur, li zozanên serê kaniyên Dicle û Ferêt cî girtibûne.

## SAZMANIYA XWEHERMENDA MAD

Kevnerêç û nîşaneyên dîrokî ji me ra didin zanîn ku Mad berê Mîladê 4000 sal di navbera Kaspîn û Dicle da ferweranî kirine. Lê nivîswarên dîrokan hebûna ferweraniya Mad bi awakî vekirî di sala 2800 berî Mîladê da nîşan didin: 3700 B.M. da Kûtî. Akad wenda kiribû, lê di 2800 B.M. da ji nû da Akad bûn xudan zordarî û cengawerî, û bi alîkariya Asor êrîş bir ser Kûtiyan, welatê xwe ji destê wan derxist. Gava ku Akad serdestî li Kûtiyan kir, dest avêt ferweraniya Mad jî. Di navbera Akad û Mad da şerên dûr û dirêj çê bûn. Li dawiyê leşkerê Mad şkest. Madistan jî ket bin lepê Akad. Mad bi salan ji Akad ra bac da. Bi vî awayî, cara bertir nav û pirsa ferweraniya Mad bi aşkaftî û pejilandî di sala 2800 B.M. hatiye bihîstin.


Cardin nivîswarên dîrokan nivîsîne ku di 2100 B.M. da di navbera padîşahê Asor, Nîne, û Mad da şerên dijwar bûne.

Ji van her du gertevan tê fehm kirin ku Kurdên Mad berî van sedsalan xwedî ferweranî û sazemendiyê bûn, ku di salên 2800 û 2100 B.M. karibûn bi ferweraniyên Asor û Akad ra şer bikin.

Gelo di hengamên kîjan padîşahên Mad da ev şer çê bûne ? Navê pêşberê padîşahên Mad çi ye ? Ev padîşah di kîjan hengamî da ferweraniya Mad daniye ? Dîrok ji me ra bersîvên van tiştan nade. Dîroka Mad a wê hengamê di nav tarîtiyê da ye. Em hêvî bikin ku li hin deran nîşaneyên nû derkevin û di vî warî da me ronaktir bikin.

Ji 4000 heta 856 B.M., ano dema padîşahiya Key Kubbadê Kurd, ano ji 30 sedsalî bêtir ji Medan û ji gelên dora wan çi gertevên aşkaftî û ronak me berhev kirine, eva em dinivîsînin. Çawa ku em navê padîşahê yekim ê Mad nizanin, ewha jî em dema sazmendiya xwehermendiya Mad jî nizanin. Padîşahê bertir ê Mad ku Dîrok ji me ra gotiye Padîşah

Institut kurde de Paris




Übersichtsskizze 1: *Die sprachliche Indogermanisierung von Ostanatolien, Kurdistan und Iran im 1. Jt. v. Chr.*

**Erläuterung:** dick umrandet die taurisch-armenisch-kurdischen Berglandzonen und die kurdisch-lorische (altmedisch-altpersische) Grenze. Unterbrochene Linien deuten die modernen Ländergrenzen an, ● antike Städte, O moderne Städte.

Institut kurde de Paris

TOSE ye. Nivîswarên Yewnaniyan ji Tose ra DIYOKES gotine. Di 1878 B.M. da, bajarê BELX paytextê Padîşah Tose bû.

## SAZIMANIYA XWEHERMENDA ASOR

## XURTBÛNA PADÎŞAH KEY KUBBADÊ KURD Û WENDABÛNA ASOR

Xwehermenda Asor di 2400 B.M. da sazemend bû, bi sedsalan di bin destê Mîtan da ma. Paşê Mîtan bi êrîşên bê dawî yên Hitîtan qels ket, Asor ji bin nîrê Mîtan reha bû, ji berêva bû xwehermendeke xurt û zorawer. Çend sedsal şûnda bû şahînşahiyeke yekta û cihangîr.

Padîşahên Asor pir rencdar û xwînxwar û xwediyên ordiyeke mezin û rêzan bûn. Ordiya Asor bi çekên bijare û tebûtên wê hengamê çekdar bû : bê jimar erebeyên ceng, lekên siwaran bi gurz, bi rim, bi şûr, bi tîr û kevan. Lekên peyan jî wek ên siwaran bi çek û rextan karûbar kiribûn. Leşker lek bi lek parkirî bû : fermandarê her leşkerî cihê bû, her cengawer fermandarê xwe nas dikir. Fermandar gezdik bi gezdik bûn. Di nav wan da biçûk û mezin hebûn. Her yek ji mezinê xwe ra serfirû bû. Bi yek gotin leşkerên Asor wek leşkerên îro bûn : bedenbaz, çekbaz ji mezinê xwe ra serfirû ...

Xwehermenda Mîtan û Mad û xwehermendên Kurd ku berî hînga me xwendibûn 2000 sal sîngên xwe dan ber vê ordiya zorawer û canbizar. 2000 sal şerkerê kurd zînê hespê xwe dananî, pişta xwe venekir, xencer û şûrê xwe ne kir kalê. Di van 2000 salan da xwîna Kurd wek leyiyan dişîçikî (diherikî). Qedxen û berxwedana Kurd, xurtiya Kurd, cengawerî û mêraniya Kurd ev ordiya Asor a fêris û zorbaz û zorawer hêdî hêdî, bi salan, bi sedsalan, êşand, birîn lê vekir, ji hev xist û paşê ew şikand û li dawiyê jî cihanê rakir û nabedîd kir!

Institut kurde de Paris

Em vêya bêjin : ev kamwerî (serfirazî) bi lêrasthatinekê ne ketiye dest, bi fedakariyên mezin, bi ponjên mêrxas ên bîrbir û dûrbîn, bi merdî û xebatên bican û dil hatiye meydanê. Nemaza ji berî Mîladê 900 sal virde, di hengama Asor Nazîrbal û kurê wî Salmanzarê yekim da, Kurdistan di nav xwîn û agir da bû. Di hengama her du Padîşahan da mezinayî û xurtiya Asor gihîştibû bilindtira gezdika xwe. Dawiya şer û cengên wan ne dihat.

Asor Kurdistana roava kiribû bin baca xwe, pênc caran êrîş biribûn Zagrosan. Kildanistan giş stand, walîkî asorî danî Babîlê. Elam û Paris jî ketin destên Asoran ...

Em werin dîroka Kurdên Kaspînê : gerdişên (hal) Kaspînan jî ji Kildan, Elam û Paris ne çêtir bûn. Ji xwe di vê hengamê da Madistan seraser li mîriyên biçûk parkirî bûn (12). Ev mîriyên perakende li hemberê Asorên yekdest û yekxwehermend bê nerx û bê baha bûn.

Ji vê aşkaftina dûr û dirêj tê zanîn ku li Kurdistanê Asoran bê perwa hespên xwe dibezandin, dikuşt, talan dikir û Kurdistanê wêran dikir. Li meydanê, li hemberî vê xwehermenda zorbadzû û wêranker û herasawer (ditirsîne) bikaribe bisekine tukes tu nebû.

Diva bû ku lez bikin, bilezînin, ji vê gerdişa herasawer ra çarekê peyda bikin ! Eva ! Kurdê ciwanmêr ji vê gijokî û malmîratiyê ra çareya dawîn peyda kir : Kurdên Kaspînê civiyan, mîr û rîsipî bîrewer û kardîtî gihîştin hev, derdên dilsûz ji hev ra vekirin, dûr û dirêj peyivîn. Civîna wan dirêj kir, axaftinên hovnak û dilhejok bi rojan ajot. Berî gişî, diva bû ji nav mîran peyakî hêjatir bibijêrin û paşê vî prensê bijare ji xwe ra bikin Padîşah û bi sergedorî, ano bi dilpakî û bi fermanberî, li dora wî bicivin. Pey axaftinên pir dilhej û peyvine kûrûdûr, bi piraniya dengan mîr ARBAS, bi navê KEY KUBBADÊ KURD, Padîşah bang kir. Bi vî awayî Kurd bûn xwediyên padîşahekî wek Key Kubbadê Kurd.

Institut kurde de Paris

## XWEHERMENDA KEYANIYAN

## ŞEHRIYARIYA KEY KUBBADÊ KURD


Key Kubbadê Kurd padîşahekî zana, dûrendîş, bedenxurt û rewanxurt, mêr û xebatker bû. Di 853 B.M. da, bi dengê gişkî yê Kurdên Kaspînê, li textê şehriyariyê rûnişt. Berî hertiştî, wî merivên seguzeştger, tevhevîker û çepelkar ji meydanê rakirin. Gelê Kurd di bin fermandariya xwe da giş civand, rêdarên hêja rêzandin, di welatê xwe da dad û asayiş pêk anîn.

Paşê, bi van çareyên hişmendî û zîrekî Kurdistan seraser bû ava û gumreh, tuwanger û bextiyar. Key Kubbadê Kurd gava ev tiştên bingehî pêk dianîn, karê xwe yê leşkerî jî ji bîr ne kiribû. Dilxwaza wî ya mezin ev bû ku ordiyeke xurt, rapêçayî, karûbarkirî, bedenbaz, şûrhingêv û mertalgêr, tîravêj û gurzgerîn, lewend û kok û pir azmade, terube bîne meydanê, û bi vî awayî karibe li ber leşkerên zorawer ên Asor cengbazî bike, Asor bişkîne û tolên nû û kevn bistîne.

Leşkerên kurd ji berê da cengawer, mêr, zorbazû, çalak, lewend, şerevan, karzane, bedenbaz û mertalgêr bûn. Lê sazemendî û rêzana ordiya kurd wek Asor tekûz û tebût ne bû. Key Kubbadê Kurd ev pitika qels fehim kiribû. Loma wî dest pê kir sazemendiya ordiya xwe. Berî hertiştî, rahişt vê pitika qels. Armanca wî serrastkirina ordiyeke saz û tekûz bû. Diva bû bi şerevaniya leşkerê kurd rêzan û bend û best (dîsîplîn) jî tevê bibe. Ano, Kurd çawa şerker e, ewçend jî divê rêzvan, tekûz, tebût û bi dîsîplîn bibe. Key Kubbadê Kurd zanibû kîjan roj karibe ordiyeke bi dîsîplîn. bi rêzan û bedenbaz û bindestên serdarên pirspor cengbaz bîne meydanê, wê rojê ew dê bigihîje armanca xwe. Wê gavê, ji padîşahên Asor ên zorba û rencdar êdî pax nake.

Key Kubbadê Kurd bi vê projeyê bi salan koşiya. Ordiya wî ji sê birrên bingehî saz dibû : I- Lekên gerdûneceng. II- Lekên siwaran. III- Lekên peyan.

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Lekên siwar û peyan jî bi birran beşkirî bûn : birrên tîravêjan, ên gurzan, ên riman, ên şûr û mertalan, ên kemendavêjan, ên kevirkaniyan.

Key Kubbadê Kurd ev ordiya xwe spart destên fermandarên karzane, hunerwerên şeran û şebxûnan, cengawerên rojên giran û meydanên mêran !

Key Kubbadê Kurd, gava bi van karûkoşan : şehrevanî, bazirganî, dadkerî kariwer dibû, xebata balyozî (*) û konevaniyê (*) jî ji bîr ne kiribû. Berî her tiştî, veşartî, ji bin de, bi waliyê Babîlê ra yekdestiyê danî. Paşê, Elam jî xiste nav vê yekdestiyê. Jixwe, bi rûniştina Key Kubbadê Kurd li ser textê Mad, Paris ketibû bin destê ferweraniya Mad.

Key Kubbadê Kurd ev karên evçend giran di 88 salan da anîn Meydanê ! Belê, Kubbadê yekta, Padîşahê Mezin, 120 sal temen kir ! 94 sal Tacidarî kir !

Berê paytextê Medan bajarê Tesfûn bû. Paşê, ji bo ku welatê xwe çêtir bike, ji Asoran biparêze, Hemedan kire paytextê xwe.

Kubbadê pîr gava van karûbarên giran bire serî, da pêşiya ordiya xwe ya ciwan û 400.000 cengawerên Kurdan riya Asoran girt. Babîlî, Paris û Elam ku yekdestên Mad bûn, wan jî xwe tevê ordiya Kurdan kir.

Gava padîşahê Asor, Sardanapal, vê peyamê stand, bi ordiya xwe gişî derket derveyê bajarê Nînwa.

Her du ordî jî li hemberî hev rêzana cengê girt. Her du alî jî êrîşine dijwar dikirin. Her du alî jî di mêranî û hunerbaziyê da kêmanî ne dikir. Şerên xwînrêj pênc roj ajot. Lê, li paşiyê, ordiya Asor a giran û xwînvexwar, ordiya du hezarsale şkest. Asor ji neçarî ji meydana cengê vekişiya, xwe avêt paş bedenên Ninwayê.

Leşkerê Kurdran, teva leşkerên hevalbendan, Nînwa dorpêç kir. Dorpêçiya ha du sal ajot. Sala sisiyan,

Institut kurde de Paris

dema buharê, ava çemê Dicle û çend têkilên wî rabûbûn. Dorpêçkeran bend çê kirin, cuh vedan, ava Dicle û çemên din bi aliyê bedenê Nînwa berda. Bedenê Nînwa nikaribû li ser leyiyê çeman ber xwe bide. Cî cî, dîwarên beden herifîn û hilweşiyan.

Padîşahê Asor, Sardanapal, li ber vê gerteva cangizok (fecî) û malwêraniyê bicarek bê umîd bû û, ji pirxunî, xwe tevî jin û zaruyên xwe, bi hemî fermandar û karweş û beniyan, bi rext û çekên giranbûha, kenzên gewher û almas û mirariyan ket serayekê û agir berda seraya xwe û gişkî merivên xwe, mal û kenzên xwe şewitandin.

Kurd, Kildan, Paris û Elam, hetta enzanên cihanê giş, ji van padîşahên xwînxwar û zordar reha bûn. Key Kubbadê Kurd di 759 B.M. da, rewanê (*) xwe yê pak da Homan (Xwedê), 120 sal temen kir, 94 sal bi ferweranî û serfirazî şehriyarî kir.

Key Kubbadê Kurd gava mir 5 kurên wî hebûn : Key Kawus, Keyapû, Key Ariş, Key Armîn, Key Pasîn.

## ŞEHRIYARIYA KEY KAWUS

Di 759 B.M. da, kurê Key Kubbadê Kurd, Key Kawus, li textê Mad rûnişt. Key Kawus bilindkesekî pir noûmêr bû. Berê geştecenga Hindistanê çê kir, ji Hindistanê gelek ciyan vesendin. Paşê, ber bi Hamawranê (Yemen) liviya. Pey gelek ceng û şeran, bi padîşahê Yemenê, Zu-El Azar, ra aşîtiyê danî, bi keça wî, Sudaba, ra mêrjinî kir. Paş çendakî, bi kara giranbuha Sudaba anî û vegeriya Kurdistanê. Key Kawus 44 sal bi berxurdarî û mezinayî şehriyariyê ajot. Di 725 B.M. da giha dilovaniya Xwedê.

## PEY MIRINA KEY KAWUS

**Key Kawus warwenda mir. Ji bo bijartina padîşahê**

Institut kurde de Paris



Ji hunera Medan : traşkêşî li ser zinaran, li Çiyayê Zagros.
Selaheddîn Mihotulî, Arya Uygarlıklarından Kürtlere.

nû, li navbera gel serêşaniyên mezin çê bûn : du mîr dilxwaziya padîşahiyê kir. Her du jî ji malbata Key Kubbad bûn. Yek ji wan Mîr Tos bû û yê din jî Mîr Lehrasep bû. Mîr Tos ji padîşahiyê ra hêjatir bû; dûrbîn, karzana û xebatker bû. Li ba Lehrasep ev nav û nîşan tu nebûn, lê ji aliyê mîratxuriyê Lehrasep kirasekî nêzîktir bû û zavayê Key Kawus bû.

Têkoşîna bijartina Şahane gelekî dirêj kir. Li dawiyê, bîrewer û rîsipiyan ji vê karbenda dilgivêş ra çareke munasib peyda kir : Lehrasep bajarê Belx ji xwe ra dê bike Paytext û li heldora Belxê ew dê ferweranî bike. Tos jî Hemedanê ji xwe ra dê bike Paytext û dê bibe ferweranê gişî Kurdistanê.

## PADÎŞAHIYA KEYANIYÊN HEMEDANÊ

### ŞEHRIYARIYA KEY TOS

Key Tos di 715 B.M. da li textê Medan rûnişt. 60 sal bi tuwandarî, bîrewerî û mezinayî şehriyariyê ajot. Di wan deman da firehiya Kurdistanê ji sînorê Hindistanê digihîşt heya Deryayê Reş, ji Deryayê Kaspînê heya kenarên Deryayê Ummanê.

Dilxwaza mezin a Key Tos ev bû ku di vî kişwerê xwe yê fireh da bi dad û asayiş û aşîtî padîşahî bike. Ji bo vê yekê, rêdar (qanûn), rêzan (nizam) û bernameyên (program) hêja danîn. Ji bo dîwana Padîşah ketina hundir, navesazekê (talîmat) ji bo rûniştin, rabûn, peyvîn danî.

Konevaniya Key Tos a balyozî pir bi hoşmendî bû. Key Tos aştîperweriya ku nîşanê xwehermendên hevsiyên xwe dikir heya wê gavê padîşahên din ne kiribû. Key Tos tucar dirêjî hevsiyên xwe ne dikir. Xwehermendên dorê jî ordiya Key Tos a xurt û rapêçayî û hergav amade ji ber çavên xwe dûr ne dikir.

Key Tos bajarê Tos, ano Xorasana îro, ava kir.

Institut kurde de Paris

Bajarine din jî perdax kirin û xemilandin. Nemaza, ji paytextê xwe Hemedan ra pir emek dabû.

Semîramîs, Şehbanuya Asor, Hemedan ava kiribû. Paşê Key Kubbadê Kurd Hemedan xemiland û fireh kir. Key Kawus jî di hengama xwe da guh dabû Hemedanê, kolan û şeqam vekiribûn, serayine zîwer û bedew ava kiribûn. Lê Key Tos di bajarvaniyê da pêşiyên xwe şûnda hiştibûn : meydanên fireh vekirin, bi baxçe û gulistanên dilrevîn xemilandin, bajar fireh kir, kele û beden serrast kirin, serayine bêheval tê da ava kirin. Bi gel vana, dora paytextê fêris bi heft bedenan dorpêç kir. Ev heft beden nîşana heft birrên Kurtiyan bûn. Rengê her bedenekî cihê bû. Bedenê şeşim zîvreng bû, bedenê heftim rengzêr bû (13).

Di hengama Key Tos da, Kurdistan ava û Kurd gumreh û geş bûn. Di nav aştî û asûdegiyê da, çandvanî, pêşwerî û bazirganî gellek bişkivî bûn, pêşve çûbûn. Di van salan da, tuwangerî û dastê kurd ku ji keriyên terşên xwe didan hev bê jimar bûn. Di van deman da, Kurd xwediyên hezaran keriyên hesp û pez û çêlek bûn. Her sal bermayên terşên xwe difrotin hemsiyên xwe. Ji hezaran salan ve, hespên Kurdan di nav Akad, Sûmîr, Elam, Kildan û Asor da bi nav û deng bûn. Kurd her sal têra xwe ji çêtirên hespan ji xwe ra dihiştin, ên mayîn difrotin xwehermendên hemsî yên xwe. Kirîndarê meztir ê Kurdan Asor bû.

Gotina dawîn : Key Tos yek ji mezinên padîşahên Kurdan bû. Di hengama şehriyariya xwe da navê Kurdistanê gihandibû perê azmanan. Şahînşahê mezin Key Tos di 655 B.M. da gelê kurd purxun û pirgirîn hişt û çû ! Rewangehê wî ronak û rewanê wî şah be !

## ŞAHÎNŞAHIYA KEY FERÎBREZ

Key Ferîbrez, kurê Key Tos, di 600 B.M. da li



Institut kurde de Paris



Ji hunera Medan : taseke zêrîn. Sedsala 7mîn Berê Îsa. Nêrgiza Torî, Kürtlerde sanat.

Institut kurde de Paris

textê Kurdistanê rûnişt. Ev padîşah jî padîşahekî bi nav û deng, pir dadker û hoşimend bû. Di hengama wî da sînorên Kurdistanê (Kurdistana Kaspîn) li rohilatê gihîştibûn çemê Ceyhûnê û Hindistanê, li roava gihîştibûn Mêzopotamya û Torosan. Lîdya, Kîlîkya û Fînîkya bac didan Kurdan. Ibran û Misr bi Kurdan ra yekdestî girêdabû û ketibûn bin parastina wan.

Key Ferîbrez ji ordiya xwe ra ji dil û can guhdar bû. Bajarê Hemedanê, paytextê wî, hîn çêtir xemilandibû. Sernîveka ola Zerdeşt li Bajarê Belx, ano Hemedan, bû.

Vê paşiyê Asor ji nû da serê xwe bilind kiribû. Key Ferîbrez dixwest ku wek kalê xwe Key Kubbad Asor şerde bike, bi ordîke mezin çû ser Asoran. Bext ji Kurdan ra nebû yawer. Ev padîşahê pehlewan di meydana serfirazî û mêraniyê da bû goriyê Kurdistanê. 625 B.M.

## ŞEHRIYARIYA KEY AKSAR

Di meydana mêraniyê da, kuştina Key Ferîbrez hindik mabû bobelateke mezin bîne serê gelê kurd.

Nêzîkî 2000 sal, Kurd bi şilfa xencera xwe, bi penc û neynûkên xwe êrîşa Asoran şikand û gihîşt serxwebûna xwe. Bi sedhezaran canbêzar, pêşmergeyên kurd, di vê meydana pehlewanî û mêraniyê da xwe kir goriyên Kurdistanê.

Kurd du 2000 sal pêsîr bi pêsîr, gewrî bi gewrî, cengbazî, şerevanî kir. Kurd wek çeman xwîn rijand û paşê Kurdistanê ji destê Asorên zorba stend. Ev Kurdistana evçend giranbeha dikira cardin ji dest biçûya ! Kurd careke din jî bibûya dîl û belengaz, girtiyê destê Asor !

Baş bû ku rîsipiyan, camêrine dûrbîn û karaşîna, zû bi zû xwe gihand Key Aksar, kurê Key Ferîbrezê ronakrewan, û ew kir padîşah, li textê Madan



INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

rûniştand. Ew karazmûdeyên niştimanparêz li dora padîşahê xwe yê cuwan civiyan û wek hengama bavê wî, ji dil û can, bi rastî û camêrî ji fermana wî ra serfirû bûn.

Key Aksar di 625 B.M. da tacê Keyan danî serê xwe û bû padîşahê Madistanê. Key Aksar bi yek endîşe rûdinişt û radibû, ku bi şev û roj ji bîr û hoşê wî dernediket. Bi tenê ev endîşe bû : çawa tola bavê xwe ji Asor bistîne !

Lê, ev tola serfiraz bi ah û fîganan, bi gazin û girînan ne dihat standin. Standina vê tola giran û cangudaz ne hêsan bû. Ev karekî giran û dijwar bû. Rakirina vê tolê girêdayî gelek tiştan bû : hoşmendî, pojnên karsaziyên giranber, canbêzariyên cuwanmerdan, koş û xebatên ji dil û can.

Çawa ku Key Aksar giranberiya vê tolstandinê baş bîr dibir, gewremerdên emekdar, serleşker û fermandaran, heya giş ordî û gel giranberiya vê tolhildanê bîr dibir.

Gava ku di 625 B.M. da Key Aksar bû padîşah, tevgera Madistanê wuha bû : ordiya gel, biçûk û mezin, yekgotin bû, can û mal, hertiştî dabû ber çavên xwe ! Diva bû Asor careke din jî pê li welatê wan neke. Dê Kurdistan heya roja piştdawiyê serazad bibe ! Bi serxwe be !

Padîşahê ciwan jî vê dilgermiya giştî bi awakî hêja û bi merdî bersivand : tavil dest bi karûkoşên konevanî û leşkerî kirin. Gel, bi gişî, yekdest û yekdeng bû. Di vî karûbarî da, tu tiştekî dirix ne kir. Ordiya Key Aksar çi diva, gel xwe bi şûnda ne girt : çek û rext, zêr û zîv, mal û can ... Gelê kurd tiştine nedîtî anîn meydanê. Key Aksar di demeke hindik da ordiyeke giran berbihev anî. Ordiya Key Aksar di kok û rêzaniyê da, bedenbazî û hunerweriyê da, ji ordiya Asor bi gelekî buhart.

Ji bo ku em zanibin Key Aksar xebata xwe çiçend bire serî, ordiya xwe çiçend tebût û tekûz kir, em

Institut kurde de Paris



Ji hunera Medan : xemla cil li Hemedanê (paytexta Medan), du şêr di nav gilovereke ji tayê zêrîn. Sedsala 5mîn Berê Îsa. Nêrgiza Torî, Kürtlerde sanat.

Institut kurde de Paris

van rêzên jêrîn ji nivîswarên du dîrokzanan distînin û dinivîsînin :

Tarîxa Merdûx, derpêç I, rûpel 175 : "Siwarên Kurd ên rêzanî di hunerweriyê da ji siwarên Asor pêşvetir bûn, çima ku siwarên Kurdan di bezê da û di êrîşê da bi hunerbazîke mezin tîravêjiyê dikir. Û yek jî, hespên Kurdan di bedewbûn û bez û çalakiyê da li cihanê gişî naskirî bûn".

Tarîxa Ibrahîm Heqqî, derpêç I, rûpel 120 : "Key Aksar, ji bo ku karibe kişwersendiyê bike, bi bingehî rahişte kar û xebatê : Key Aksar leşkerê xwe pir baş rêzand û kok kir. Ji bo her çekî lekên cihê durust kirin. Ji bo her birrî fermandarên cihê danîn. Bi vî awayî, xwehermenda Mîdya ku mêraniya gelê wî ji berê da naskirî ye, di ser da jî bû xwediyê ordîke rêzan û tekûz".

Key Aksar, gava bi ordiya xwe evçend bi giranberî kariwer dibû, li meydana konevaniyê jî ji xebata xwe şûnda ne dima : ji ferweranê Babîl, Nabopalasar, ra şandî birêkirin. Xuya kir ku dîtinên Babil û Hemedanê weke hev bûn. Di navbera herdu xwehermendan da bi parêzî û êrîşî yekdestî çê kir. Ji bo ku vê yekdestiya xwe çêtir û xurtir bikin, Key Aksar keça xwe da Boxoto-Nesir, kurê Nabo-Palasar, ferweranê Babîlê.

Institut kurde de Paris

## WENDABÛNA ASOR

Gava Key Aksar kar û koşên xwe yên leşkerî û konevanî bire serî, ordiya Babîl teyî ordiya xwe ya giran kir û ajot ser Asor. Di navbera her du ordiyan da çend roj şerine xwînrêj û dijwar çê bûn û di dawiyê da ordiya Asor şkest û xwe avête paş bedenên Nînwayê. Ordiyên Mad û Kildan Nînwayê dorpêç kir. Di vê navê da, Key Aksar peyxamek stend ku Sîtan dirêjî Kurdistana bakur kirine û ji berêva pêş ve tên (14).

SÎT ku Arî ne û ku birrekî Kurd in, ji Qafqas dest pê kirine, Kurdistan, Gurcistan, Ermenistan, Kapadokya û Lîdya dane ber xwe, gihîştine Deryayê Sipî.

Key Aksar dest ji dorpêça Nînwayê berda û çû Kurdistana bakur, alîkariya Kurdên Arirartî. Wî bi Sîtan ra cengine dijwar kirin. Lê, kir-ne kir, Sît giş ne karibû ji Kurdistanê derîne. Key Aksar bi salan derdên Sîtan kişandin. Li dawiyê, şevekê, wî sergerdeyên Sîtan kire mêvanên xwe. Ji her celebî xwarin, mêze û meyên şahane danîn ber wan. Sergerdeyên Sîtan Key Aksar pir dilxweş bûn û ji wan xwarin û vexwarinên şahane gelek xwarin û vexwarin. Giş serxweş û bêhiş bûn, wek miriyan ketin û veketin. Key Aksar ferman kir merivên xwe ku serên wan gişan jêbikin. Sîtên mayîn jî ji Kurdistanê qewirandin û ji van çepelan pak bû.

Ji bo şahiya vê kamweriyê, heya îro, li Kurdistanê, di 31 Tebaxê da cêjna Agirdadanê çê dikin. Ji vê cêjnê ra "Cêjna Tolhildanê" yan jî "Cêjna Kurd" dibêjin.

Gava ku ev gertev çê dibûn, Şaraku-Sarakus bûbû padîşahê Asoran û keysa xwe li Babîlê anî bû, çima ku ordiya Mad bi Sîtan ra şer dikir. Şaraku dikira Babil ji nû da bistîne. Lê gava ku Key Aksar ji serêşaniyên Sîtan wareste bû, zû bi zû çû alîkariya dost û yekdestê xwe Nabo-Palasar. Ordiya Babil tevî ordiya xwe kir û di bin fermandariya xwe da dirêjî Asor kir.

Asor ji bo rehayiya xwe yek çare dît : xwe bavêje paş bedenên Nînwayê. Ordiya yekdestan Nînwa dorpêç kir. Dorpêçî pir ne ajot. Ordî beden cî cî qul kirin û herifandin. Padîşahê Asor Şaraku umîda rehabûnê birrî û wek pêşiyê xwe Sardanapal kete serayekê, xwe û jin û zarokên xwe tevde şewitandin.

Xwehermenda Asor a dijwar li ber bînfirehî û berpêdarî û zoraweriya cengawerên kurd ji bingeha xwe hilweşiya û nabedîd bû û di 612 B.M. çû.

Institut Kurde de Paris



Ji hunera Sîtan : Xezaleke zêrîn, sedsala 7-6 Berê Îsa
L'Or des Scytes, Muzeya Qralî ya Huner û Dîrokê, Bruksel


Institut kurde de Paris

Piştî ku xwehermenda Asor herifî û wenda bû, Mad û Babîl yekdestiya xwe ji hev ne xist, çêtir û xurtir kir.

Pey vê servebirina giran û dîrokî, Kurd tevde li hev civiyan, xwehermendeke yekta çê kir. Kurdên Araratan gihîştin Kurdên Kaspînan.

Kurd giş, Kûtî û Kurtî, navê Mad an navê Kurd stand. Ew imperatoriya dijwar û nû bû imperatoriya Kurdistan, an imperatoriya Madistan. Ji xwe ji bo vê yekê Tarîxa Merdûx pir caran nivîsiye : "Em dikarin li ciyê Kurd Mad bêjin, wusa jî em dikarin li ciyê Mad Kurd bêjin. Kurd Mad e, Mad jî Kurd e. Ji bo vêya tu gûman naxwaze". Em jî vê ponjê rast û li cî dibînin û carna Kurd û carna Mad dinivîsînin. Dîroknasên rohilat û roava giş ji vê rastiyê ra erê gotine : Mad Kurd e, Kurd jî Mad e. Çawa ku Madistan Kurdistan e, Kurdistan jî Madistan e.

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Nexşeya E. Cemîl Paşa, N° 4 : sala 612 Berê Îsa. Imperatoriya Mad "yan Med" û hilweşana Asor.

## FIREHKIRINA IMPERATORIYA KURD

Kurdên wan sedsalan jî vê rastiye bîr kir. Loma, Kurdên Kûtî û Kurtî tev bi hev ra li dora padîşahê xwe Key Aksar civiyan. Bi mejika wan hengaman Kurd dest bi firehkirina kişwerê xwe kir.

Kurdan Sît ji Ermenistan û Kapadokya qewirandin û derxistin. Ev her du kişwer bi ser Kurdistanê ve berdan. Bi vî awayî sînorên Kurdistanê gihîştin çemê Halis (Kizil Irmaq).

Gava Key Aksar Sît ji welatê xwe derxistin, hin serekên Sîtan bûbûn penahvêjên (dexl) padîşahê Lîdyayê, Aliyat. Key Aksar ev bextekiyên Aliyat jê xwestin, lê Aliyat xwestina wî bi cî ne anî. Key Aksar bang li ceng kir, bi leşkerine pir ajot ser Lîdyayê. Lîdiyan bi mêranî bi Madan ra şer kir. Her du alî jî şerevanên hêja bûn, yek bi yekê din nikaribû. Şerên wan şeş sal dirêj kir, paşê di sala heftan da, rojekê, di germayiya cengê da, ro hate girtin, ruyê ezmên reş û tarî bû. Girtina rojê nîşaneke ne qenc bû. Ev şer ne dilxwaza Xwedê bû. Loma, her du ordî ji hev vekişiyan, dev ji şer berda.

Padîşahê Babil, Boxoto-Nesir, di navbera xwehermendan da rûnişt, her du xwehermend li hev anîn. Çemê Halis bû sînorê wan. Ji bo ku aştî û dostaniya xwe xurtir bikin, padîşahê Lîdya keça xwe Artînî da kurê padîşahê kurd.

Pey van şeran, xwehermenda Kurdistan bû mezintira xwehermendên wê sedsalê. Hêrodot, dîroknasê yewnanî yê bi nav û deng, sînorên Kurdistanê yên

Institut kurde de Paris

wê gavê weha nîşan dide : li rohilat Çemê Ceyhûn (Amoya); li roava Çemê Halis; li bakur Deryayê Kaspîn, Çemê Aras, Çiyayê Araratan, Deryayê Reş; li nîvro Deryayê Paris (Faris), Deryayê Ûmman.

Çawa ku paşê em dê bibînin, Kurd ji van sînorên ku Hêrodot nehrevanî dike wêdatir jî çûne, Misr standiye, ji Hebeş û Yemen û Hind ra geşteceng kirine. Kurd di dîroka cihanê da lîzine mezin lîstine. Îro bixwe, li welatê xwe yê kevnare da bi gilorkî dijîn û jimara wan jî gelek e. Li gel vê yekê, nivîswarên dîrokan li ser Kurdan kêm caran dinivîsin. Ji hin dîroknas û rojhilatzan pê ve, hayê kesî ji Kurdan tu neye. Em dixwazin engîza vê guhnedanî û nenêrtiniyê bi çend pirsan bidin zanîn : Key Kubbadê Kurd di 853 B.M. da bû padîşahê Mad. 94 sal li textê Kurdistanê şehriyarî ajot ! Welatê xwe ji keşmekeşî û bê ferûtabiyê reha kir û xwehermendeke mezin serrast kir, ji tunebûnê ordiyeke dijwar deranî, ordiyên Asor kişandin, Kurd bûn serazad û serbixwe.

Padîşahên kurd ku di pey ra hatin şopa Key Kubbad ajot, Kurdistan ava kir, jîndar kir.

Asor ku cardin serê xwe rakiribû, Key Aksar ew wenda kir, Nînwa bi axê ra kire yek. Babîl, Israîl, Kurdistan, hetta cihan giş ji destên padîşahên Asor ên zorba û xwînrêj reha kirin.

Key Aksar Kurdistaneke yekdest, gumreh, geş, xurt û bextiyar serraşt kir û di 584 B.M. da temenpayan bû. Key Kubbadê Kurd û paşhatiyên wî heya temenpayaniya Key Aksar 269 sal di împeratoriya Kurdistan a mezin û fireh da, ku sînorên wê ji Hindistanê ta Deryayê Reş, ji Araratan ta Deryayê Ûmmanê digihîştin, bi serwerî û bîrewerî şehriyarî ajot.

Pir muxabin ! Ji van gertevên dîrokî yên Kurdan, kesên agah gellek kêm in. Di gel vê yekê, dîrokzanên Yewnan, Asor, Kildan, Îran û yên diger gelan, ji van gertevan ra nehrevanî kirine. Rojhilatzanên

Institut kurde de Paris

Awropî jî di nivîswarên xwe da ji van gertevên Kurdan ên bilind û dengîn qisse kirine.

Gelo çima ji dîroka kurdî herkes agah ne bûye ? Em dixwazin bersîva vê pirsa han bi kurtî bidin zanîn. Padîşahên Kurdan, wek neviyên xwe yên îro, merivine zîravpaye bûn, mîna padîşahên Akad, Sumîr, Kildan, Asor, Hitît, Misr ... xwe ne dipesinand, payesuturî hez ne dikir. Loma, şikandinên dijminan, karkirinên şeran û cengan, stendinên kişwer û bajaran, şehrevanî û hunermendiyên xwe, dadkerî û dilovanî ku li bin destan re dikirin, jînên xwe yên hezaran sal ku bi mezinatî, bi serfirazî, bi paydarî derbas dikirin li ser kevir û zinaran, li ser çerm û qermîtan ne nivîsandin, stûnên şadimanî daneçikandin, pût û nîgar ne terişandin, şahînşahî û mezinatiyên xwe bi çar alî bang û qêr ne kirin. Ew li xwe bawer bûn, mêr bûn. Ew rastgo û dilpaqij û dilovan bûn ...

Ma evçend bilindayî û serfirazî ne bes e ? Deng û qêr û gazin ji çira ye ? Mezinatiya kerr û lal ne xweştir e ? Belê, ev mezinatiya kerr û lal tiştekî pir xweş e, lê konevaniyeke çewt e. Paşhatî û neviyên wan şahînşahan, wan box û beranan ji vê konevaniya çewt îro ziyanên dijwar dibînin. Belê, payenexwazî (tewazu') tiştekî xweş e, lê pirtirî (ifrat) hergav malwêraniya mezin tîne pêşiya meriv.

Bavpîrên Kurdên îro : Kûtî, Kurtî, Lolo, Kasî, Sûbarî, Hûrî, Mîtanî, Nehrî, Mûşkî, Xaltî, Alarod, Mannaî, Anzanî ... Paşê jî Mad li xwe daniyana, wek ên hemsiyên xwe : Misr, Hitît, Asor, Kildan, çend perçe kevir daçikandana, neviyên wan, Kurdên îro, evçend belengaz û malwenda ne dibûn, hebûna wan, şehrevaniya wan, zimanên wan ne dihatin şerandin (inkar kirin) : "bi navê Kurd gelek tune ! Zimanê kurdî ne tu ziman e ! Kurd çi gavê ferweraniyekê saz kiriye ? Kurd Tirkê çiyayî ye ! Kurd çengeke kûvî, rêbir û diz in ! ...". Gotinên ewha ne dibûn devgerkên nezan û kindaran û Kurd bi sedsalan

ne dibûn armanca kirêtiyê û bi sedsalan bindestên zordaran û bêbad û xwînrijan, ne diêşiyan, ne dinaliyan.

Di van salan da Tirkan, bê şerm û fedîkarî, ji ber xwe gotinekê derxistine. Goya Kurd Tirkên çiyayî ne !! Gelo bi wijdan bêjin, ma Kurd bitenê li çiyan dijîn ? Li deştan, li bajaran, li gundan ma najîn ? Ji hezaran salan da gund û bajar ava ne kirine ? Kilîs, Xozat, Erzerom, Xarpêt, Amed ... Mûş, Wan, Bedlîs ... Amedî, Hevlêr ... Medayin, Kermanşah, Nehawend, Hemedan ... Rey, Qezwîn, Isfahan, Belx, berê ne bajarên Kurdan bûn ? Dibe ku van bajaran cenabê Tirk bi koçbariyên Qayxaniyan, bi xwe ra ji Tirkistanê anîn !!

Li Tirkiyê, li bajarên Bayezîd, Erdehan, Qars, Erzerom, Ezirgan, Dêrsim, Melete, Meraş, Entab, Ruha, Mêrdîn, Hekarî, Wan, Bedlîs, Sêrt, Amed, Mûş, Bîhngul, Xarpêt, Maden, gelo ne Kurd in ? Ev bîst satrap (wilayet) bi sernîvek (merkez) û qeza û gundên xwe va ne rûniştgehên Kurdan in ?

Ev milyonan kes ma ne Kurd in ? Japon in ? Alman in ? An Tatar in ? Ji van bîst satrapan pêve, Kurdên ku li pênc qezayên Sêwazê - Kangal, Gurun, Suşehir, Zara, Koçgirî - û li satrapa Ankara - Konya, Kayserî, Adana, Iskenderûn - û di satrapên din ên Tirkan da bi piranî û gilorî rûniştgeh girtine ma ne Kurd in ? Lê çi ne ? Qey Tirkên çiyayî ne ?

Ey kargerînên Tirk, Ereb û Ecem ! Ey konevan ! Wijdan bikin, vegerin ser rastiyê ! Ji Kurdan ra şepa (mecal) jînê bidin ! Bira ev gelê belengaz û pejmurde jî wek merivan bijî. Bira ew jî bibe xwediyê debistan, nivîswar, ziman, wîje (edebiyat), çapxane, rojname, radyo ...

Bira Kurd jî bigihîje mafê xwe yê merivatî, şehrevanî, konevanî. Me di despêka nivîswara xwe da gotibû ku di van çil salên dawîn da arkêologên Amerîkayî, Ingilîz û Fransiz di erdên împaratoriya osmanî ya

Institut kurde de Paris

kevn da û di derên Îranê da, li gellek ciyan, geriyan, kolan û xepirandinên arkêolojîk çê kirin ... Xebatên wan pir meyedar bûn ji bo ronakkirina dîroka Kurdan, pir kevnerêç peyda kirin.

Ji van kevnerêçan pêva, nehrevaniyên din jî hene : stûnên yadîgarî yên ku padîşahên Asor û Kildan daçikandine ji şerên Kurdan û ji tevgerên Kurdan pir tiştan dane zanîn. Hemj, gerdiş, şehrevanî, mêrxasî, cengawerî, bedewbûn û zîweriyên Kurdan pesinandine.

Hezretî Ayetullah Aqa Şeyh Muhamed Merdûxê Kurdistanî di nivîswara xwe ya dîrokê da çend nav nivîsîne. Ev kevnerêçên Mad in : li Hemedanê "Senge-şêr", li navbera Kermanşah û Qesrî-Şîrîn "Dukana Dawûd", li Loristan "Dexmeyê Duab", "Taqê Ferhad", nêzîkî Kermanşah "Dexmeyê Dilo", li Awşarê "Textê Suleyman", li Saqiz "Kela Ma", li Pilingan "Dexmeyê Sirtaw", Kela Girîftew", "Kela Zerîm", Serwanser" ...

Bi awayê dilbaweriya me, ji bo ku buhêrka Kurd baş bête zanîn, divê di Kurdistana îro û di Kurdistana kevnare da jî ji xebatên arkêolojîk ra pir guh bidin. Divê bi sermayeyên xurt, arkêologên hêja, xebatker û jêhatî dakevin nexên (tabaqa) kûrtir û kevnerêçan derxînin, dîroka Kurdan ronak bikin.

Eger hin nîşane û kevnerêç ji bo ronayiya dîroka Kurdan di destê me da ne, ev qencî û camêrî ji zanayên Awrupayî gihîştine me. Ên ku çendikek ruyê me kenandine roavazanên biyanî ne. Kurd ji van zanayên rewanbilind û enzanperweran ra çiçend spas û şabaş bike hindik e.

Li gel vê yekê, tiştên ku Kurd dilxwaz e, evîndar e, umîdwar û bi diltengiyeke bê pîvan bendewar e, ne bitenê ev çendik e. Xwestina Kurd wekî din e :

1- Kurd divê mafê xwe bistîne, lê ne dereng, di demeke nêzîk da divê bistîne.

Institut kurde de Paris

2- Deverên ku îro piraniya wan Kurd in û di bin destên Ereb, Ecem û Tirkan da ne, divê vegerin ji Kurdan ra, xwediyên wan ra. Maf divê bigihîje xwediyên xwe ! û bê entrîka, bê konevanî, bê lîzbazî, bê rik û bê kîn !

3- Kurd, di Kurdistana xwe da, xwediyê serxwebûna xwe be ! serazad bibe ! dilşa û bextiyar be !

4- Kurd, bi vî awayî, ji her bendê azad, dest bi jînê bike, li avakirina Kurdistanê bi geşî û gumrehî - şênber û razber (maddî û manewî) - li qenciya welatê xwe bikoşe.

5- Di vê navê da, bi rêberiya zaroyên xwe yên kurd, ku ji universiteyên Emerîka û Awrûpa û Sovyetan guwahnave birine, bi hoste û şagirt û rêncberên kurd, hawcarên (alet) modern, bi bend û rêzan û zanayî, bi pîvaneke fireh, ger û kolanên arkêolojîk bikin, ji bin kûrayiya zerzemînan nîşane û kevnerêçan derxînin, kuncên tarî yên dîroka Kurd ronaktir bikin.

ŞEHRIYARIYA KEY AZDIYAK

Di 584 B.M. da, Key Azdiyak, kurê Key Aksar, pey mirina bavê xwe, tacê Keyanî yê Mad danî serê xwe û li ser textê Keyan rûnişt.

Lê sedhezaran muxabin ! Xûy û bunyadên bilind û hêja ku di malbata Key Kubbadê Kurd da hebûn, yek ji van xuyên paqij li ba Key Azdiyak nebû ! Pênc şahînşahên Keyaniyan ku berî Key Azdiyak şahînşahî kiribû - Key Kubbadê Kurd, Key Kawus, Key Tos, Key Firîbrez, Key Aksar - bi zanewerî, bi zîrekî, werzimedî (gayret) û mêrxasî, di karûbestên niştimanî yên xwe da - hundirî, derveyî, leşkerî ... - tiştine derberz (harika) anîbûn meydanê. Bi van kamweriyên xwe cihan giş mat û dilda hiştibû.

Azdiyak = Ixtoviko, di demeke hindik da, da zanîn ku ne hêjayê textê van fêrisan e. Ixtoviko li pey

Institut kurde de Paris

gewz, serxweşî û zirbaziya xwe digeriya û ji gelê kurd ra jî ji renc û êş û zorbatî pêve tiştek ne dikir.

Ixtoviko, dêlva ku, wek van cihangîrên ku berî wî hatibûn û şahînşahî kiribûn, di meydana mêranî û cengê da hesp bilîzîne, di seraya xwe da dîlber û dîlbaz didan lîstin. Ixtoviko yekî kêmpaye bû, şev û roj di dîwana wî da ji dildarî, evînbazî, meyxurî pêve tu karekî din tu nebû.

Ji alîkî hebûnên welat di riya kirêtî û gemariyê da bela bela dikirin, ji aliyê din jî ordiya neyarheras û şêrlez, li ordiya zorawer û dengdar, li ordiya parazva a Kurdistanê mihrivanî ne dikir. Ev mêrikê bedaferde, meyxur û gewzeger berê gelê kurd dabû qilafîskan, dikira gelê kurd ji zinaran werbike û wenda bike.

Pêştirî herkesî, serek gewremerd (wezîr) Alpag û gewremerdên din, serleşker, giş fermandar, rîsipî û giregirên welêt hemiyan, ji vê tevgerê ra li çarakê digeriyan. Gişan zanîbû ku dawiya vê rêçûnê malmîratî, malwêranî ye, wendabûna gel, gelê kurd e, wendabûna cîgehê kurd e. Diva bû ku ji vê serpêhatina reş û tarî û purxun ra havilekê bikin.

Mezin û giregir rûniştin û paşîkê, ji bo xweşî û candurustiya Kurdistanê, Ixtoviko ji textê Keyaniyan anî xwarê û neviyê wî Kurîş, ku padîşahê Anzan bû, kir tacidarê Kurdistan, şahînşahê Kurdan, di 560 B.M. da.

Ev tevgera daxistina Ixtoviko ji tu tevheviyê ra meydan ne da, bi hêsanî derbas bû, çû. Key Xusrew = Kurîş li textê Mad rûnişt. Azdiyak jî hat avêtin zîndanê. Gel û ordî xweşgewz û dilşa bûn. Pir muxabin, ev şadimanî pir ne ajot - em dê paşê dûr û dirêj binivîsînin - hûn dê nankoriya Ecem, lîzbaziya Paris bibînin.

Serkar û karsazên wê hengamê, ku Azdiyak ji text xist, hîç gûman nîne ku di vê tevgera xwe da

Institut kurde de Paris

dilaqij bûn, yegane dilxwaza wan camêran ev bû ku Imparatoriya Kurd ji qiyafiskê gijok rizgar bikin. Lê, hezaran esef ! Pirsa malê û çarşiyê li hev derneket. Paris paşê, dereng dereng, bi awakî werê çiv da xwe û hoqabaziyek lîst ku ev encam nikaribû bê bîr û bala tukesî. Imparatoriya Kurd, gelê kurd, şerevaniya kurd, navê bilind ê kurd, ji meydanê rabûn, li ciyê Kurdê fêris Parisê cotkar û pepûk rûnişt.

Lê Ecem ne şerevan bû. Kurdistan bê ordî û paraztvan ma. Iskenderê Makedonî, Omer Ibn Xettab, Selçûkên tirk, Cengîz û Hulakû yên Tarar, Qayxanî û yên din û yên din Kurdistana pir pertav, xurt û ava leyand, wêran kir, wenda kir. Paris jî perîşan û şerpeze bû.

Paşê, ceng û xerpişîn û xebatên çar hezar sal ên Kurd, xwîna kurd, pehlewaniya kurd, giş bûn ên Ecem. Lê Ecem ji cî ne liviyan, dilopek ji xwîna xwe ne rijand ! Ecemên şivan û cotkar li ser cengawerî, ciwanmerdiya Kurd venişt ! Navê Kurdê qehreman hate ji bîr kirin. Belê, zanayên fêris, zanayên rohilat û roava yên dîrokê, mezinatiya Kurd, karûkoşên wî yên giran û firazbaz ji bîr kirin, mezinatî û firazbaziya Kurd li pelên dîroka Paris nivîsîn.

Eva me ponjên xwe yên canxipar li ser dek û fûtên dilsûz ên Eceman, ku ji bo Kurdan lîstine, nivîsandin. Lê, paşê, em dê cardin vegerin vê qissê, ji nû da bigrin destên xwe, kûr û dûr binivîsînin. Û em dê li maf û vêrastê bigerin, em dê bi rêberiya nivîswarên dîrokan, bi nehrevaniya kevnerêçan, bi hiş û hayên weyîn (musbet), wek pişaftina qisseke aljêbrîk mafê Kurdan biaşkirînin, derînin meydanê.

Enzanîtî ku, bi xwestin an bê xwestin, gêr bûye çewtiyeke dîrokî ya mezin, em dê wê ji vê çewtiyê reha bikin. Pirsên "Ancienne Perse", "Furs î Qadîm", "Eski Faris" efsane ne, mîna şapînozên pîravokan in. Ev "Ancienne, Qadîm, Eski", ano "kevnare", gelê



Institut kurde de Paris

kurd e, ne şehriyariya Paris e. Parisê kevnare şivan bû, cotkar bû, tucar şerevanî ne kiribû û ji şehrevanî dûr bû.

## PADÎŞAHÊN KEYANIYAN ÊN BELX

Me hînga xwendibû ku Key Kawus, kurê Key Kubbadê Kurd, 44 sal padîşahî kir û warwenda mir. Ji bo bijartina padîşahekî, gel li hev ne kir. Li dawiyê, li ser sazkirina du padîşahiyan li hev hat : padîşahiyek bû Hemedan, a din jî bû bajarê Belx.

Padîşahên Hemedanê me xwendin. Padîşahên Belxê jî em dê nuha bixwînin.

INSTITUT KURDE de PARIS • BIBLIOTHÈQUE •

## KEYANIYÊN BELXÊ

### ŞEHRIYARIYA KEY LEHRASEB

Key Lehraseb di 795 B.Z. da, li bajarê Belxê, li textê Keyaniyan rûnişt. Key Lehraseb di dirêjiya şehriyariya xwe da tiştekî hêja ne kir. Navê ku di dîroka Kurdan da hişt ev e : ji Zerdeştê sêyim ra piştevanî kir, firehkirina ayîna Zerdeşt xurt kir û ji bo belavkirina ola Zerdeşt pir xebitî. Di 667 B.Z. da, wî text û tacê Keyaniyan ji kurê xwe Kiştaseb ra hişt.

Institut kurde de Paris

### ŞEHRIYARIYA KEY KIŞTASEB

Key Kiştaseb di 667 B.Z. da, di jîndariya bavê xwe da, li Belxê, li textê Keyaniyan rûnişt. Çend sal bi şûn da, bajarê Belxê berda, bajarê Istexîr (Persepolîs) ji xwe ra kire paytext. Li Istexîr şêst û çend sal bi firazbazî û kamwerî padîşahî kir, paytextê xwe fireh kir û xemiland û seraser kişwerê xwe ava û geş kir. Di hengama Kiştaseb da gelê kurd bextiyar û serazad û xurrem bû. Ev padîşah rêznave û rêdar (nizamname û qanûn) sazandin û durust kirin. Rêdar û saznaveyên Kiştaseb ên dadwerî (adli)

û şehrevanî (medenî) di nivîswarên dîrokan da bi xweşperî (husnu qebûl) nivîsandine.

Bi vî awayî xuya dibe ku Key Kiştaseb di avakirina welêt û sazandina rêdarên dadwerî û şehrevaniyê da ji Key Darayê yekim ra rêberî û mamostatî kiriye. Key Kiştaseb 150 sal berî Key Dara ji Kurdistanê ra, ji enzanîtiyê ra riya şehrevaniyê vekiriye. Hin ji avadaniyên Key Kiştaseb heya îro payîdar mane : Kela Semerqend û Dîwarê Xawer.

Kiştaseb 66 sal şehriyarî kir. Di 671 B.Z. da temen payan bû, li bajarê Şîrazê hat veşartin.

## ŞEHRIYARIYA KEY BEHMEN

Key Behmen di 602 B.Z. da bû padîşahê Kurdan, li ser textê Keyanî rûnişt, bajarê Şewêş (tenişta Bexdê) kir paytextê xwe. Ev padîşahê jêhatî xwediyê çend navan bû : Behmen, Erdişêrê Dirêjdest, Axşewîros, Behmenê Madî.

Key Behmen li Kurdistana rohilat serxwebûneke tumî diajot. Ev padîşahekî cihangîr bû. Nivîswarên dîrokê nehrevan (şahid) in ku Key Behmen ferweranê 127 kişweran bû (15). Ji Hindê heya Habaşistanê vekirandibû.

Ev Padîşah zana, hişdar, karaşîna, dadker û mêrxas bû. Di hengama xwe da, bi bendûrêzandarî û karsaziya xwe bi navûdeng bû. Key Behmen Israîl (Cihû) ku li Babîlê dîl bûn, di aşîtî û gumrehiyê da hiştin. Kurê Buxtunnesir, Bileser, ku Key Behmen ew kiribû waliyê Babîlê ji Benî Israîl ra neqencî dikir û ew diêşandin. Loma Key Behmen ew rakir û di şûna wî da kurê Camas, Kûrîş, kire waliyê Babîlê ((16).

## ŞEHRIYARIYA KEYBANÛ HÛMAY

Keybanû Hûmay keça Key Behmen e. Ji bo ku



Institut kurde de Paris

birayê wê tu nebû, ew bû şahbanû û di 533 B.Z. da li ser textê Kurdistanê rûnişt. Keybanû Hûmay çil sal Banûşahî kir.

Weka ku dibêjin, Keybanû Hûmay ji bavê xwe xeyidîbû û bajarê Şewêş berdabû, hatibû bajarê Tîsfonê. Navê Tîsfon paşê bû Medayin. Medayin nêzîkî Bexdê ye. Keybanû Hûmay zîrek bû, tebût bû, xebatker, xêrxwaz û dilovan bû.

Şehriyariya Keybanû Hûmay bi şahînşahiya Kûrişê Mezin hemdem e. Di 494 B.Z. da Keybanû gihîşte dawiya temenê xwe.

## ŞEHRIYARIYA KEYANIYAN LI HEMEDANÊ

## ŞEHRIYARIYA KEY XUSREWÊ MEZIN

Gelê kurd di 558 B.Z. da Padîşahê xwe Azdiyak (Ixtovîko), ji bo ku çepelî û bêdadî dikir, ji Textê Keyaniyan anî xwarê û di şûna wî da neviyê wî Key Xusrewê Mezin kire Tacîdarê Kurdan.

Key Xusrew xwediyê çend navan e. Navekî wî jî Kûriş e. Awrupayî "Cyrus" dibêjin. Lê navê rast, navê ku bavê wî lê kiriye, "Agirdad" e. Agirdad navekî kurdî ye, ne parisî ye. Eger parisî ba, ê biba Ateşdad. Malbata wî jî Kurd e, ji Xandedana Texîxî- Xenî ye, Kûtî-Amerdî ye. Ew Kurd e, ne padîşahê Ecem e, ne jî Pasargad e. Ew Padîşahê Anzan e.

Me di qisseya şehriyariya Anzan da ji bo vê malbatê hûr û kûr nivîsiye. Em lê vegerin. Azdiyak kurê Madan bû. Kûriş neviyê Madan e. Azdiyak çepel bû, bêdad bû. Kûriş dadker bû, camêr bû.

Me xwendibû ku kargerînên wan deman di rakirina Azdiyakê meyxur û gewzende da tu neweyî (mahzûr) ne dît. Wan nizanîbû paşê çi bobelat û bedbextî dê bê serê gelê kurd ! Wan bîr ne biribû ji vê guhartina bêteşe (adî) çi gijokiya (wehamet) dijwar wê bê

Institut kurde de Paris

meydanê. Tucar ne hatibû bîr û bala wan ku ji vê guhartina sade û malbatî serxwebûn û serazadiya Kurd dê wenda bibe. Ev serxwebûna serfiraz û giranbuha ku Kurd bi şilfên xencer ên Nêrizî û Soranî, bi şûrên devbixwîn û serfirîn, bi gurzên rustemî, bi ceng û şer û mêranî bi dest xistibû ! Kurd 2000 sal bê rawestan, bê bînvedan, pêsîr bi pêsîr, gewrî bi gewrî, bi neyaran ra pev çûn. Carna bê xencer û şûr û çek, bi penc û neynûkan, bi dev û diranan êrîş biribûn ser neyaran. Berê xwe ji tutiştî, ji mirin û agir, ji talanî û wêraniyê ne guhart. Wek leyî û çeman xwîna xwe rêtibûn. Me berê jî gotibû Kurd şerên pir dirêj û bê dawî kiribûn. Ne rojek û dudu, ne salek û deh, 2000 sal ! Çar aliyê Kurd neyar bûn û neyarên xurt û pir xurt ! Akad, Sûmir, Kildan, Asor, Hitît, Misr...

Lê dijwartirên wan Asor bûn. Asor neyarekî xwînrêj, xurt û çavsor bû ! Lê paşê pehlewanekî Kurd derket meydanê ! Ev pehlewan ne Zalê bavê Rustem bû ! Ev pehlewan ne Rustemê kurê Zal bû. Ev pehlewan Rustemê Rusteman, mêrê mêran, şêrê şêran bû. Ev Key Aksarê Dengîn bû, şahê şahan, padîşahê Kurdan ! Key Aksarê Cengû bû ! Key Aksarê şerevan û cengbaz bû !!

Ev Key Aksarê yekta û bê heval ordiyeke berbihev anî, ordiyeke nûjen û taze, kok û sazkirî. Ev ordiya Kurdan ji brûsk û bager û leyiyan, ji pola û mifriqan, ji zinar û goman çê bûbû. Nînwa li ber vê bobelatê, li ber vê sosretê ling ne da ber xwe ! herifî, hilweşiya, bû axpîng !! li nav pêlên Dicle wenda bû !

Kurdên Kûtî û Kurtî bi yekdestî û bi yekdilî ceng dikir, serxwebûn û serazadiya xwe û imperatoriya gewre û firazbaz û nûjen a Kurdistanê serast kirin. Lê gelo çawa bû ? Kurd bi wergerandina padîşahekî gewzeger (sefîh) û payepes, bi gertevekî bê teş ev firawanî (nîmet) çawa ji destên xwe revandin ?! Mafê xwe bi gişkî ji nû va wenda kir ?!!

Institut kurde de Paris

Gelê Paris ku tengava kenarê Deryayê Paris rûniştgeha wan bû û ji şer û ceng û tol û dozan tim dûr bû, û ji cot û şivaniyê pê ve tutiştî nizanibû, yek dilop ji xwîna xwe ne rijand û rojekê xencer û şûrê xwe - eger xencer û şûrê wan hebû - ji kalan dernexistibûn !!

Lê çawa bû ? Kurd 2000 sal xerpişî, koşiya, ranewestiya, şev û roj şer kir, ceng kir, wek leyiyan xwîna xwe ya sor rijand û di cihanê da imparatoriyeke mezin û bê heval anî meydanê. Navê Kurd bi serfirazî û bilindayî gihîşte felekan, navê Kurd ewçend brûskjen û gurîpaş bû ku padîşahên Asor bi van peyvên buhadar Kurd pesinandin : "Kurd wek stêrên ezmanan diçirisin, ne bitenê lewendî û zîwerî, bi xurtî û dijwarî û mêranî jî..."

Îro Kurdan ev tiştên hêja, navên bilind : mezinayî, firazbazî, navbilindî, geş û gumrehî, şehrevanî ... giş wenda kirin !

Îro Ecem, Ecemê cotkar û şivan vê mêrxasî û cengawerî û cihangîriyê, hemî kiriye dastê (mal) xwe.

Me berê jî gotibû ku em dê paşê jî li ser vê qissê binivîsînin, em dê dûr û dirêj, bi pejilandin, mafê Kurd derxînin meydanê. Ecem biraderan em dê bînin ser rastiyê.

Me ji bo bedbextiya Kurdan, ji bo kul û derdên Kurdan têra xwe got. Em dê cardin vegerin li ser dîroka Key Xusrewê Anzanî, ji Malbata Texîxî-Kûtî-Amerdî-Xenî. Gava ku ew li ser Textê Mad rûnişt, tacê şahînşahiya Kurdistanê danî serê xwe, tucar ji bîr ne kir ku xwîna ku di rehên wî da digere xwîna Kurd e. Ev şahînşahê Medan e, ano şahînşahê Kurdan e û padîşahiya Kurdan dike. Piraniya gelê wî Kurd in. Nemaza leşker û ordiya bin destê wî giş Kurd in. Key Xusrew gerdişên kevnare yên şer yên Mad ne guhartin, ayîn û rêzanên padîşahên Madan ji destê xwe bernedan. Kurê Azdiyak, Key

Institut kurde de Paris




Institut kurde de Paris

Nexşeya E. Cemîl Paşa, N° 5 : sala 550 Berê Îsa. Firehbûna Imperatoriya Mad di bin Key Xusrewê Mezin û Kurê wî Key Kawus de.

Aksarê duyim, kire Fermandarê ordiya xwe, neviya Azdiyak, şahbanû Sipînûy, mar kir. Kûrişê Mezin heya mirina xwe bi navê Mad, bi navê Kurd şahînşahî kir (17).

Key Xusrewê Mezin zana, mêr, xuynerm, comerd, bilindpeyker, xebatkar û karaşîna bû. Textê imparatoriya ku li ser rûniştibû giranbarî û buhadariya wî qenc bîr dikir. Di karên hundir yên welat û derveyê welat da pisporiya xwe, sezawariya xwe xweş nîşan da.

Gava Kûrişê Mezin li ser Text rûnişt, karê wî yê pêşîn ev bû : Wek ên Bextereyî, Ermenî ... û yên din, ji berê da binestên Mad bûn, îcar serê xwe hildabûn. Wî ev giş sernişiv kirin û anîn ser rê. Paşê, Key Xusrew haydar bû ku Padîşahê Lîdya, Krêzos, û Padîşahê Babîl, Nabonîd, ji bo neqenciya Mad yekdest bûne û Misr û Yewnan jî kirine hevalên xwe.

Kûriş bilez û bez, bi leşkerekî pir, dirêjî Lîdya kir. Gava gihîşt çemê Halis (Kizil Irmak), ordiya Krêzos ji çem derbas bûbû. Dema êvarê bû. Dereng bû. Leşkerê Kûriş mehek bû ku li rê bû, westiya bû. Lê, Kûrişê fêris bîhnek ne da Krêzos, tavil di tengayiya êvarê da êrîş bire ser neyarê xwe. Di wan deman da, li cihanê, leşkerê Lîdya bi çekên xwe, bi bedenbazî û bendûbestên xwe, bi mêraniya xwe bi navûdeng bû. Lê vê ordiya yekta ya cihanê li ber êrîşa nişkayî ya Kûriş û li ber cengaweriya mêrxasên Kurdan ling ne dan ber xwe û şikiya.

Ordiya Krêzos kişiya, xwe avêt paş bedena bajarê Sard, paytextê Lîdyayê. Leşkerên Kûriş Sard dorpêç kir. Dorpêçiya Sard pir dirêj ne kir. Ordiya Kurd bajarê Sard - li cihanê yekta û dengdayî - bi êrîşê stand. Lîdya bû perçeke imparatoriya Kurdistanê.

Key Xusrew Krêzos ne êşand, jê ra mihrivanî û nazenînî nîşan da, Krêzos li xwe hişt, ew kire bergeştmendê (şêwirdar) xwe. Pey vê kamweriyê,

sînorên Kurdistanê gihîştin Deryayê Marmara û Deryayê Sipî.

Ev kopişa (darbe) malwêranî ya Kûriş Yewnanî giş hejandin û mat kirin ! Giravên Deryayê Egê, ji girava Sîsam pêve, giş ketin destê Kurdan. Du bajarên kenarên Deryayê Sipî, Fûçê = Folêa û Mîlas = Mîles, jî bûn ên Kurdan.

Bi bîrewerî û karsazî, Krêzos kesên Lîdya bê çek kirin. Lîdî, ku heya nuha şerevanên zor bûn, ji vir pêda bûn bazirganên dengdayî. Kûriş, ji bo ku karê vê kişwera nû bi hêsanî bigerîne, ji malmezinên xwe satrapvan bi nav kir. Kûrişê mezin gava ev karûkoş birin serî, vegeriya, berê xwe da Babîlê.

Israîlî = Cuhû yên ku ji salan ve li Babîlê dinaliyan bi dilgeşî û şadimaniyên bê payan riya Kûriş dipan, bi bîntengî û dilhejî li benda ordiya Kurd a kişwergîr û Kûrişê firazbext (galib) û cihangîr bûn.

Padîşahê Babîlê, heval û yekdestê Kurdan, Nabonîd, ji Kurdan ra bêbextî kiribû. Ji bin da bi Lîdya ra yekîtî danîbû, diva bû ku Kûriş jimarteka vê guneh-kariyê ji Nabonîd bipirse.

Kûriş rasterast ajot ser Babîlê û Babîl dorpêç kir. Kûriş, bi dilovanî û mêranî, di nav çend rojan da Babîl ji Kildaniyan stand, bext da bajêr, tukesî ne êşand, Babîl ne herifand, ji parazgehan (mabed) ra pir firazî kir. Ji Israîlan ra jî bo vegera welatê xwe destûr da û alîkariya wan kir, ew şandin Filistînê.

Kûriş çendakî şûnda, ji bo ku sînorên Kurdistanê yên rohilat bigihîne ciyên stratêjîk ên bi keys, berê xwe da Hindistanê. Hindistan tu şerê hêja bi Kûriş ra ne kir. Kûriş heya çemê Sendê vesend. Kûriş û Hind zûka li hev hatin. Kûriş bi vê geştecengê sînorê Kurdistanê heya Sendê fireh kir.

Kûriş ji Hindistanê vegeriya, berê xwe da Qafqasan û Deryayê Reş. Dilxwaza Kûriş ev bû ku çend

satrapên xwe - Armenya, Pond, Kapadokya - têke bin penah û baweriyê û ji Qafqas û Deryayê Reş ziyana tukesî negihîje wan satrapan. Kûriş Gurcistanê jî stend û kire satrapeke imparatoriya Kurdistanê. Bi vî awayî, sînorên Kurdistana xwe sparte çiyayên Qafqasan.

Key Xusrewê Mezin di şerê Masajêtan û çend mîrên din da birîndar bûbû. Çend roj bi şûnda, di 521 B.Z. da, temenpayan bû.

Key Xusrew enzanekî, şahînşahekî mezin bû. 29 sal bi serfirazî û bi kamiranî, bi kamwerî, şehriyarî ajot. Çawa ku cengawer û stratêj bû, ewçend jî dilovan û mihrîvan bû. Key Xusrewê Mezin Kurd firazbaz kirin, Israîl ji dîlbûnê rizgar kirin û Yewnanî bindest kirin.

Institut kurde de Paris

## ŞEHRIYARIYA KEY KAWÛS

Key Kawûs di 529 B.Z. da, pey mirina bavê xwe Key Xusrewê Mezin, li Textê Mad rûnişt.

Key Kawûs di zarotiya xwe da baş şerde ne bûbû. Bavê wî hergav jê dûr, di şer û cengan da dikoşiya. Loma Key Kawûs li ber destên jinan mabû, pir nazenîn û rûstandî bûbû. Key Kawûs pir payxwaz (qurre) û tengxuy (asabî) bû, û hergav wek qîma xwe dikir. Çi biketa serê wî, jê venedigeriya.

## ŞERÊ KEY KAWÛS BI MISRIYAN RA

Di dema Key Xusrew da, gava ku Krêzos bi Babîl ra yekîtî danîbû, ferweranê Misrê, Amazîs, jî tevî vê yekîtiyê bû.

Key Xusrewê Mezin, hêj di jîndariya xwe da, pir dilxwaz bû ku tola xwe ji Amazîs, Fîrewnê Misrê, bistîne. Key Xusrew ji bo vê karbestê xebitîbû û xwe pêk anîbû. Bi kesên giravên Yewnaniyan ra yekîtî danîbû, girava Qibrisê ji Qibrisiyan bi zora

xwe standibû. Lê, Key Xusrew di dilxwaza xwe da kamiran ne bû. Berî ku şerê Misriyan bike temenpayan bû û çû.

Kurê wî Key Kawûs, gava bû Padîşah, karê wî yê pêşîn ev bû : xwe zû pêk bîne û dirêjî Misriyan bike.

Key Kawûs di sala 524 B.Z. da, ano 5 sal pey rûniştina Text, bi ordiyeke mezin geşta Misrê kir.

Key Kawûs hêj ne ketibû erdê Misrê, Amazîs temenpayan bû. Di şûna wî da kurê wî Pîsamîndê sêyim bû Firewn.

Pîsamînd li Polozê çû pêşiya Mad. Lê Misriyan li ber êrîşên nû û dijwar ên Kurdan xwe ne girt. Misrî zû şikiyan û reviyan, xwe avêt paş bedenên bajarê Menfîsê. Key Kawûs beyhûde rijandina xwînê ne xwest û ji Fîrewn ra encumenek şand, jê aştî xwest. Misriyan bêdadî û bêbextî kirin, şandiyên Key Kawûs kuştin û avêtin karên (bir) avê. Cengawerên Kurdan ji van çepelî û kirêtiyan ingirîn, dilreş û tengxuy bûn, êrîş bir ser birc û baruyên Menfîsê. Bi zora gurz û xenceran bajarê Menfîs vekirand.

Key Kawûs rewanbilindiya xwe nîşan da : Pîsamînd kirêtî û bêbextî kiribû, şandiyên Key Kawûs kuştibûn. Lê, Key Kawûs kirêtiya Pîsamînd bi qencî lê vegerand : Menfîs hilneweşand, ji Pîsamînd ra xweşdarî kir. ji Misriyan 600 peya bijartin, bi Pîsamîn ra şandin Kurdistanê, bajarê Sûzê.

Key Kawûs livleşkeriyên (herekatî askeriye) xwe herdemandin (dewam kirin) û Misir seraser vekirand. Key Kawûs navmalbatên (leqeb) Fîrewnan girtin, ji Misriyan ra xweşdarî kir, tevger û rêzana Misrê ne guhartin. Bitenê di çend birc û baruyan da leşkerên Mad bi cî kirin. Lîdya û heldorên wê dîtin ku Key Kawûs padîşahekî dilnerm û mihrîvan û enzanperwer bû, pê ra şer ne kir, bê ceng û teqereq ketin bextê Key Kawûs, welatê xwe spart wî.



Institut kurde de Paris

Key Kawûs paşê ket sewdayê vekirandina Qartaca. Lê Fînîkiyên ku ji Key Kawûs ra deryavanî dikir, ne xwest şerê hemgelê xwe bikin. Loma, ev dilxwaza Key Kawûs ne çû serî.

Paşê, Key Kawûs leşker kişand Hebeşistanê. Hin ciyan vekirandin. Lê, di vegera xwe da pir tengayî kişand û pir ziyan gihîşt leşkerên wî.

Key Kawûs gava li Misrê karûbarê xwe bire serî, berê xwe da welatê xwe Kurdistanê. Dema ku gihîşt Sûriyê, di laşê wî da hin birîn çê bûn. Ji ber van birînan, di 521 B.Z. da, temenpayan bû.

## ŞEHRIYARIYA KEY DARAYÊ YEKIM

Key Kawûs warwenda mir. Key Darayê yekim, ano Darayê Mezin, bi bijartin bû padîşahê Mad. Key Darayê yekim jî mîrekî Anzanî bû, ano Kurd bû. Darayê Mezin di sala 521 B.Z. da bû padîşahê Medan. Key Kawûsê kişwergîr ê Misr û Afrîka ji Dara ra imparatoriyeke mezin û ordiyeke bê heval û yekta hiştibûn. Di van deman da, sînorên Kurdistanê ji aliyê rohilat digihîşt pehnava (wadî) Send, ji bakur digihîşt Deryayê Kaspîn, çiyayên Qefqasan û Deryayê Reş, ji roava digihîşt Deryayê Marmara û Deryayê Sipî, ji aliyê nîvro kişwerên Misrê û Lîdya standibûn hundirê xwe û ketibû nav Hebeşistanê.

Le !! Ordiya Kurdistan ! li cihanê, ne li Rohilat û ne li Roava, ne jî li tu ciyan ordiyeke evçend xurt, evçend navdar û sazidar hebû ! Ev ordiya fêris, Asor û Babîl wenda kiribûn, bi bînekê Anadol û Misr vekirandibûn. Ev ordiya Kurd li cihanê bê heval bû, yekta bû. Lê, çi sûd ! Dara, Darayê Mezin vê firavaniya ku bûbû miratxurê wê rûmeta wê nizanibû. Dara serekanayî û xurtî û cangehê wî dezgehî li ku ye, çawa ye, ne didît.

Dara kete çewthişî û çewtbinî : hinek gewremerdên Parisî û biyanî di seraya xwe da civandibûn, peyv û

Institut kurde de Paris

şîretên wan gewremerdan kire serê xwe, riya şoveniyê girt, ji fermandar û gewremerdên kurd vekişiya, veciniqî, ji Kurdan tirsiya, keça xwe li yekî ûrim mahr kir. Navê vî ûrimî Mardonyos bû. Paşê jî Mardonyos kire serekleşkerê xwe. Fermandariyên gezdik biçûk jî dan Ermeniyan û biyaniyên din. Fermandarên kurd ku Key Xusrewê Mezin û kurê wî gihandibûn şahriya vekirandinê ji ordiya Dara bi dûr xistin. Dara fermandar û leşkerên Ermenî, Yewnanî, Kapadokî, Gurcî, Lîdî, Finîkî, Misrî, Hebeşî ji Kurdên qehreman çêtir girt û Kurd ji xwe bi dûr xistin.

Dara rêke xwar û çewt girtibû. Dara di bin destê gewremerdên parisî û biyanî da gûj bûbû, riya rast berdabû, berê xwehermendê dabû qilafîskan ! Dara bi bingeha xwehermendê dilîst ! Kandijê wendaker ê Sûmir û Akad û Elam. Key Kubbadê Kurd ê bingehdarê xwehermenda Mad; Key Aksar, bajargîrê Nînwa; Kûrişê Mezin û kurê wî Key Kawûs, her du kişwergîrên Rûm û Babîl, Misr û Afrîqa ev xwehermend ava kiribû. Dara bi bingeha vê bilindseraya gûripaş û ronak a şahînşahan dilîst. Lîstina vê bilindserayê çiçend malkuj û malwêranî bû, Darayê mezin ne didît !!!

Dara seraya xwe bi biyaniyan tije kiribû. Welatparêzên rast, welatparêzên bi dilûcan, xwediyên vêrastên vî welatî, ku giş Kurd bûn, ji wan tiştên cangudaz pir diêşiyan, bêzar û purxûn bûbûn. Bi rastî, gel giş ji van tevgerên çewt ên Dara dilşikestî bû. Dara ji şîret û hişyarkirinên rîsipiyan û emekdaran ra, ji gewremerd, fermandarên karasîna ra guh ne dida. Li hundirê welat dilnexweşî ji berê va pirtir dibû. Lê, Dara ser riya rastiyê venegeriya, li ser gotina xwe serhişkî kir û ma !! Loma, pir ne ajot, li gelek ciyan şoreş û tevdaniyan dest pê kir. Dara şoreşên Babîl, Sûz, Belx, di du salan da vemirandin. Dara ji van serhilanînan pir endîşnak ne bûbû.

Şoreşa ku Dara dilhej û pirxûn kiribû şoreşeke din bû. Ev şoreş li nîvekê welêt rabûbû : du mîrên



Institut kurde de Paris

Mad ji rêçûna Dara ra qîma xwe ne anî. Dara ziyankariya welêt dikir. Loma, van her du mîran, Çetertexme û Ferwertîş, şoreş rakir. Ev her du mîr ji neviyên Key Kubbadê Kurd bûn. Dara ji bo vemirandina van şoreşan sê caran di bin fermandariyên ermenî leşkerine giran şandin. Her sê caran jî leşkerên Dara şikiyan. Dawiyê, Dara bixwe ket pêşiya ordiya xwe, leşker û cengawerên xwe giş bi xwe ra hilanîn, ajot ser her du mîrên Mad. Herdu mîr, ku ji bo rizgariya welatê xwe rabûbûn, şerine dijwar kirin, bi mêrxasî di meydana cengê da pehlewanî û qehremanî kirin. Lê, sêwlekên sedhezaran ku Dara dabûn hev bi kuştin û jêkirin ne diqediyan. Paşê, Çetertexme di meydana mêraniyê da bi serfirazî hate kuştin. Firawertîşê bedbext bi birîndarî ket destê neyarê xwe. Dara Firawertîş bire Hemedanê, bi renc û îşkence ew kuşt !!!

Ev tevgera Dara bêdadî û nakorî bû. Dara, bi van kirinên xwe yên ne enzanî, bingeha Kurdistanê hilweşand, împeratoriyê davête qilafîskan. Lê, Dara ji çavsorî û payexwazî riya rast wenda kiribû !! Diva bû Dara ji van mîrên Madan ra mihrivanî û nermayî nîşan bida.

Dara ji bîr kiribû ku xwîna ku di rehên wî da digeriya xwîna kurd bû, tacê ku danîbû serê xwe tacê kurd, textê ku li ser rûniştibû textê kurd bû. Dara gewremerdên kurd ji seraya xwe, cengawerên kurd ji ordiya xwe dûr kirin, ne dîtin, xwe ji imparatoriya xwe jî, tac û textê xwe jî di zinaran da wer kir.

Dara wek padîşahên pêşiya xwe - Key Kubbad, Key Aksar, Kûrişê Mezin - di ordiya xwe da li dildarî, bendûbest û fedakarî ne digeriya. Van tiştên ku rewan û canê ordiyê ne, Dara guh ne didayê. Dara digot qey bi gihandina jimara ordiya xwe li milyonan dikare cihanê gişî têxe bin lepê xwe. Dara pir xapiya !! Dara bû engîza wendabûna imperatoriyeke xurt û fêris. Ji ruyê Dara, ji bîrnebirina Dara, imperatoriya mezin a Kurd wenda bû.



Institut kurde de Paris

Ji ruyê Dara Insekenderê Makdonî Kurdistan da ber lingê xwe ! Ji ruyê Dara Omer Ibn Xettab Kurdistan û Parisistana biçûk bê rûmet kirin û di xwîn û agir da hiştin. Ji ruyê Dara Mongol, Tatar, Tirk û Tacik Kurdistan talan kir, wêran kir !!!

Dara, pey vemirandina şoreşên her du mîrên Medan, Çetertexme û Firawertîş, dest pê kir karûkoşên hundir û derveyê welêt : şehrevanî, kargerînî, leşkerî, konevanî, bazirganî ...

Dara, berî hertiştî, ji bo ku imparatoriya xwe ya fireh, bi bawermendî, asûdegî û rêzandarî bigerîne, welatê xwe bi 23 satrapan, ano wilayetan, beş kir. Her satrap satrapdarekî wî hebû, di her satrapê da, ji satrapdar pêve, fermandarekî leşkerî û jimardarek hebû. Ev her sê fermanberên mezin xwediyên serxwebûnê bûn, ano bi serê xwe bûn.

Satrapdar ji xebtûkarên hundir ên satrapa xwe û ji berhevdana derd û bela berpirsiyar dibû, bendekariya (wazîfe) fermandarê leşkerî, nêrtin û xwedîkirina sînorên satrapa xwe bû. Jimardar jî di hundirê satrapa xwe da kargerînî, leşkerî, konevanî, bazirganî ... çi bibûya, çi biqewimiya, çi bidîta, çi bibihîsta, diva bû tavil ji Dara ra binivîsîne û Dara ji her gertev û bûnişan agah bike.

Dara, ji bo ku di imparatoriya xwe da xebtûkarên bazirganî û leşkerî û bajarvanî bi lezûbez û bi bawermendî, bi ewlemendî bigihîne, Kurdistan seraser bi riyan xemiland. Di cihanê da birîdevanî (posta) Dara saz kir. Di dirêjayiya riyan da seraser venîştegahan (menzîl) çêkirin, karwanseray, birîdegahan ava kirin. Li her venîştgehê fermanbir û peymanbir bi nav kirin.

Birîdevanî ku di şehrevaniya îro da rolekî mezin dilîze li cihanê bingehdarê wê yê pêşîn Darayê Mezin bû.

Dara, gava van xebtûkarên bergiran bire serî, dest pê kir sînorên imparatoriya xwe bigihîne derên

ewletir û tebûttir. Berê, ji bo ewlemendiya sînorên rohilat, karê geştecenga Hindistanê kir. Endezvan (muhendis) û osteyên Finîkî anîn. Keştiyên cengê ku Finîkan çêkirin ji Babilê berê xwe dan Deryayê Hindê. Dara jî bi ordiyeke giran di reşayiyê ra gihîşte sînorê Hindistanê. Pehnava çemê Sendê ji Hindiyan stand û berda ser kişwerê xwe û çendakî bi şûn da vegeriya Babîlê.

Pey ewlemendiya sînorê Hindistanê, Dara xwest sînorên roavayê imparatoriya xwe, ano aliyê Yewnanistanê, jî têke bin ewlemendiyê. Berî ku rasterast direjî Yewnanistanê bike, diva bû rêvegera xwe bixe bin ewlemendiyê.

Sît ji rohilata kenarê Daryayê Reş heya devê çemê Tunayê (Danûb) belav bûbûn û li van doran cî girtibûn. Van Sîtana ji bo Dara metirseke (tehlike) mezin bûn. Sîtan, di hengama Key Aksar da, Kurdistan, Qafqasya, heya Lîdya girtibûn û ew der pir êşandibûn. Rohilatzanên îro bi nehrevaniyên nû Sîtan birrekî Kurd dizanin. Sît mêr bûn, dijwar bûn, di bin dest û lepan da ne dihatin girtin, şerevanên bijare bûn. Lê, hij ji bendûbest û rêzan ne dikirin. Gava keys û şep û fesal diket destê wan, ji Awrûpa heya Qafqasya didan ber xwe û talan dikirin.

Dara, ji bo ku li geştecenga Yewnanistanê ji Sîtan serêşaniyekê nebîne, xwest berê bajo ser Sîtan, wan şerde bike.

Dara, ji bo şerdekirina Sîtan, bi ordiyeke 800.000 leşker, ji Babilê berê xwe da geliyê Istanbûlê. Endezvanên Finîkî li geliyê Istanbûlê pirek danîn, gava pira Istanbûlê li ser sazkirinê bû, pireke din jî li ser çemê Tunayê girêda.

Ordiya Dara ji geliyê Istanbûlê derbas bû. Berê kişwerê Trakya vekirand, paşê berê xwe da rohilat. Pira ku li ser çemê Tunayê ava kiribû, ordiya Dara jê derbas bû, heya çemê Dinyesper ajot. Dara ji

Institut kurde de Paris

Sîtan ra wekî ku diva bû, şerdeke xurt nikaribû bide. Dara dev ji Sîtan berda, vegeriya Trakyayê, hin ji leşkerên xwe li Trakya hişt û berê xwe da Babilê.

Dara, bi standina Trakya, êdî bi firêqetî karibû dirêjî Yewnanistanê bike û ji Sîtan tu paxî neke.

Dara, piştî saleke din, di bin fermandariya zavayê xwe Mardonyos, 100.000 leşker li keştiyan siwar kirin û ji bo vekirandina Yewnanistanê şandin. Keştiyên di bin fermandariya Mardonyos da gihîştin Yewnanistanê. Li tengava Maratonê lengerendaz bûn û ordiya Mardonyos derket deştika Maratonê.

Ev şerê ku di dîrokan da binavûdeng e di 12 Îlon 490 B.Z. da, di navbera Yewnanan û Madan da, çê bû.

Ordiya ku di bin fermandariya zavayê Dara Mardonyos da bû diva bû Maratonê bistîne, paşê berê xwe bide Atîna û Yewnanistanê vekire. Ordiya biçûk a Yewnanistanê ! Ordiya mêrxasan ! Ordiya welatparêz û cengaweran ne hişt ordiya Dara ya sed hezarîn ji Maratonê gavek pêş bavêje !!! Çengek cengawerên Yewnanî mîna şêrên ingirrî êrîş bir ser ordiya Dara ya sed hezarîn !!!

Ordiya mezin, ordiya Darayê Mezin ku ji heftê û du gelan berhevhatibû li ber kopa êrîşa dijwar û noyên qehremanan û canfeşanên Yewnaniyan ling ne da ber xwe. Ordiya Dara hezaran kuştî dan, bi şermsarî şikiya û bi perîşanî reviya ! Ev ordiya Kurd bi feremandariya Mardonyosê ûrim navê bilind û serfiraz ê Mad hildigirt. Ordiya Mad heya vê demê bi kişwergîrî û bajargîriya xwe di şer û êrîşan da bi dilîrî, qehremanî, mêranî û canbêzariya xwe cihanê giştî tirsandibû û lerizandibû. Gîtî tev li mêrxasî û cengaweriya Kurd mat û lal û dilda mabû. Yewnaniyan jî digot qey li hembera xwe van Madên ku bi qêrîna xwe ya birûskasa û mifriqjen ku şêran dilerizandin dê bibînin, û bi rastî jî dilhej bûn û ponijî bûn.



Institut kurde de Paris

Belê, Darayê Mezin Padîşahê Mad bû, Padîşahê Kurdan bû. Lê, ordiya Darayê Mezin ne ordiya Mad bû. Ordiya Key Kubbadê Kurd û Key Kûriş ne ev ordî bû ! Ordiya Dara ji 72 gelan û hawişan dahevdayî û ordiyeke geremolan bû ! Serfermandar jî Mardonyos bû ! !

Pey vê encama dilkuj û şermsariyê, Dara weherand (qerar stend) ku ew bixwe biçe geştecenga Yewnanê. Darayê Mezin sê salan bi karê cengê koşiya, lê temenê Dara qîm ne kir. Ew di sala 487 B.Z. da temenpayan bû. Di rojên dawîn yên Dara da, Misr ser hildabû.

Key Serxes, kurê Darayê Mezin, di sala 487 B.Z. da li Textê Mad rûnişt. Karûkoşên pêşîn ên Key Serxes çûna şerê Misriyan bû. Di rojên dawîn ên Dara da Misr serê xwe rakiribû. Ji bo şerdekirina wê, geştecengek ber bi Misrê çêkir. Di demeke hindik da Misrî şerde kirin û vegeriya Babilê.

Me berê nivîsandibû ku Dara, piştî şerê dilkuj ê Maratonê, weherandibû ku ew dê bixwe biçe şerê Yewnanistan. Ji bo vê yekê, sê sal bû karê xwe yê şer dikir.

Belê, Darayê Mezin di karê leşkerî da tu kêmanî ne hiştibû. Bi hezaran hezar leşker civandibûn, hespên siwaran bê heval bûn, enbarên çekên nûjen û bijare bi devê dagirtî bûn, xwarin, dirav, her tişt pir bû û pir bû. Lê, di ordiya Darayê Mezin da, di vê ordiya hezaran hezaran da, ku bi vî rengî pêk hatibû û karûbarikirî bû, gelek muxabin ! yek tişt jê kêm bû : rewanê cengawerî ya Key Kubbad.

Di ordiya Key Dara û Key Serxes da, navûdengê ordiya Mad ku qehremanî, pehlewanî û canbêzariya wê li felekan belav bûbû, jê tu şop û nîşan ne mabû. Ordiya Kurd a karûbarkirî, bi rewanê bilind ê bexşîşên Key Kubbadan, Key Aksaran û Key Xusrewan, li meydanê tu nebû.

Ordiya Mezin ku Darayê Mezin di sê salan da bi xebateke germî û kel berbihev anîbû bi çendiya

Institut kurde de Paris



INSTITUT KURDE de PARIS • BIBLIOTHÈQUE

(kemiyet) xwe ji ordiya Maraton pirtir bû. Lê, bi çewayiya (keyfiyet) xwe gellek kêmtirê wê bû û jê bedter bû. Ev ordî ji heftê û du gelan civandî bû û ji têxên (kom) enzanan pêve ne tiştek bû.

Ev Ordiya Mezin, ku Darayê Mezin bingeha wê danîbû û paşê ji Key Serxes ra mîrate mabû, ji Misrî, Habeşî, Lîdî, Ermenî, Yewnanî, Finîkî ... û ji gelên din civandî bû. Key Serxes ji bavê xwe, ji Darayê Mezin, mîratxurê ordiyeke di vî rengî da bûbû. Gava Key Serxes siwar bû, da pêşiya ordiya xwe ya giran û mezin, piraniya leşkeran, girêdanên rextûbendên siwaran, çelengan û lewendan, bi hezaran hezar cengawerên bi çek û cilên nûjend û gûrîpaş ew serxweş dikir, ji gewz û şadiyên xwe Key Serxes hişwenda bûbû !!

Key Serxes wer bawer bûbû ku bi vê ordiya dêwasa, ne bitenê Yewnanistanê, lê cihanê gişî dê vekirîne! Key Serxes, di 480 B.Z. da, li pêşiya ordiya xwe, bi firazbazî riya Yewnanistanê girt. Pira ku li Dardanêl (Çanaqale) danîbû, jê bi rewşeke şahane derbas bû, kete Tirakyayê. Keştîcengên Key Serxes - pirtirên keştiyan û deryavanan finîkî bûn - paşê ji Deryayê Ege derbasî Deryayê Yewnanistanê bûn.

Serleşkerê Key Serxes cardin zavayê wan ê ûrim, Madonyosê binavûdeng, bû. Ev ordiya şeşelanî ya Key Serxes ji Derbendê Termopîl dê derbas bibûya û Yewnanistan gişî dê bida ber xwe !!

## ŞERÊ CIGESÛZ Ê TERMOPÎL

Lêonîdas, padîşahê Isparta, li Derbendê Termopîl bi sêsed cengawerên canbêzar li benda leşkerên hezaranhezar ên Key Serxes bû.

Di 480 B.Z. da, qehremanê qehremanan Lêonîdas, Padîşahê Isparta, bi sê sed kurên xwe yên dilawer, bi sehgura sibê ra êrîş bir, xwe avêt ser ordiya milyonan a Serxes. Lêonîdas, Padîşahê dilpola, welatparêzê zorbazû, û sê sed cengawerên dilîr û yekta û şêrêşêran xwe kir goriyên welatê xwe yê şîrîn û firazbaz !



Institut kurde de Paris

## ŞERÊ SELAMÎN

Yewnaniyan paytextê xwe Atîna vala kiribû, kişiyabûn girava Selamînê. Mardonyos bi ordiya xwe kete Atînayê, bajar vekirand û wêran kir, şewitand, ji belengazên ku ketin destên wî bilêc (qetlîam) kirin.

Kewteyê (Filo) - koma keştîcengan - biçûçik ê Yewnaniyan xwe pêk anîbû ku girava Selamînê biparêze. Kewteyê Key Serxes ku ji neyarê xwe deh caran pirtir bû, dirêjî avtenga Selamînê kir. Li avtenga Selamînê cengeke mezin a deryayî çêbû. Li ber çavê Key Serxes kewteyê Medan bi awakî perîşanî şikiya. Key Serxes ordiya xwe stend, ji geliyê Dardanêl derbas bû, reviya Babîlê !

Mardonyos bi sê sed hezar leşkerê xwe va li Yewnanistanê ma. Zivistana xwe li Trakyayê derbas kir. Yewnaniyan jî seraserê zivistanê bi xebtûkoşên cengê derbas kir. Buharê, Mardonyos dirêjî Yewnanistanê kir. Li Pilatê şerek kiribû. Di meydana şer da Mardonyos hat kuştin. Ordiya Mad bê serî ma, perîşan bû, şkest û reviya. Ên berşûrmayî li keştiyan siwar bûn, xwe reha kir. Li ser riya vegera xwe, li hemberî girava Sîsamê, li pozê Miraqê, ji nû da bi Yewnaniyan ra ketine şer. Ordiya Key Serxes a bê ser û bin cardin şkest û belabela bû. Keştiyên wan bicarek hatin şewitandin. B.Z. 479.

Pey van şkestinên bi rûreşî, Key Serxes di seraya xwe da, bê fedî û bê mejî, xwe da xwarin û vexwarin û gevzendegî. Fermandarê ordiya bendewar (xas) a Key Serxes, Artabanos, jar da Key Serxes û ew jardadayî kir û kuşt. B.Z. 465.

Artabanos, Dara, kurê Key Serxes, bi kuştina bavê wî buhtan kir. Paşê mirarkeriya Artabanos derket meydanê. Artabanos jî, zarokên wî jî giş hatin mirandin.

## ŞEHRIYARIYA ERDIŞÎRÊ YEKIM

Key Erdişîrê yekim, kurê Key Serxes, di 465 B.Z.

Institut kurde de Paris

da, gava li Textê Mad rûnişt, hêj zarok bû. Paşê ku mezin bû, xebt û karên kişwerê xwe girt destê xwe, ji bo avakirina hundirê welatê xwe koşiya, ne bi Yewnanistanê, ne jî bi hemsiyên xwe yên din ra şer kir. Rojên xwe bi aştî û şadimanî derbas kir.

Berî mirina wî, şerên Yewnaniyan ên hundirî - şerên Peleponîs - dest pê kiribû. Bi dîtina hevdukuştin û perçekirina neyarê xwe dilhênik bû.

Key Erdişîrê yekim di 424 B.Z. da temenpayan bû.

## ŞEHRIYARIYA KEY DARAYÊ DUYIM

Key Drayê duyim di 424 B.Z. da du birayên xwe kuştin û li ser textê padîşahiya Mad rûnişt. Ji bo xweşgerandina welêt pir koşiya, lê bi tu awayî kamwer ne bû.

Lîdya û Misr fermanşikenî kir. Çend mîrên Mad jî ser rakir. Di 20 salên şehriyariya xwe da tu demên xweşbextî ne dîtin. Di 404 B.Z. da temenê xwe payan kir.

## ŞEHRIYARIYA ERDIŞÎRÊ DUYIM

Key Erdişîrê duyim, kurê Key Darayê duyim, di 404 B.Z. da li Textê Mad rûnişt. Birayê wî Key Xusrew fermanşikenî kir, neyartiya birayê xwe kir, ji Yewnaniyan 13.000 leşker anîn.

Di navbera her du biran da şerine dijwar û xwînrêj çê bûn. Key Xusrew di meydana şeran da hat kuştin û ordiya wî şkest, ji hev belav bû.

Erdişîrê duyim, pey kuştina birayê xwe, bi Yewnaniyan ra sê meh şer kir. Paşê, Erdişîr generalên Yewnanî xandin (dawet kirin) saraya xwe, ew kirin mêvanên xwe. Hezaran muxabin ! Erdişîr di saraya xwe da bi bêbextî mêvanên xwe tevde kuştin (18).

## ŞEHRIYARIYA ERDIŞÎRÊ SÊYIM

Key Erdişîrê sêyim di 358 B.Z. da li text rûnişt. Padîşahiyek xwînxwar, bêdad bû. Ezbeta xwe, jin û



Institut kurde de Paris

mêr, bê dilovanî û mîhrîbanî bilêc kir. Key Erdişîr fermanşikeniya Finîkya û Misr vemirand, parastekê Misriyan (Boxêapîs) bi destê xwe kuşt, bajarê Seyda yê Finîkiyan şewitand, kesên wê bilêc kirin, ên ku ji ber şûr reha bûn kire dîl, di bajaran da firotin.

Key Erdişîr, dawiya dawî, gihîşte mafê xwe ! Bi destê Fermandarê xwe Bogoasê Misrî jardadayî bû. Bogoas bi evçend jî qîma xwe ne anî, zaroyên Key Erdişîr giş kuştin.

Şehriyariya Key Erdişîr di 338 B.Z. da gihîşt dawiya xwe.

## ŞEHRIYARIYA KEY DARAYÊ SÊYIM
## KEY DARAYÊ MADÎ

Key Darayê sêyim, pey Key Erdişîrê sêyim, li Babilê, di sala 338 B.Z. da, li textê Mad rûnişt. Ji Darayê sêyim ra Darayê Madî jî dibêjin.

Fermandarê bendewar ê sarayê, Bogoasê Misrî, li çara wendakirina Key Darayê sêyim jî digeriya. Lê, Dara ji vî bêbextî ra fesal ne da, zûtir rahiştê û ew fermandarê bêbext û çepel wenda kir.

Key Darayê sêyim ji ezbeta Key Kubbadê Kurd e, neviyê şahbanû Hûmay e, neviyê qehremanan e. Loma, di dîrokan da ji vî Padîşahî ra Darayê Madî dibêjin.

Belê, Key Darayê bedbext neviyê Key Kubbadê Kurd e. Lê çi sûd ! Textê ku li ser rûnişt ne textê nahej û tebût ê Key Kubbad e !!

Padîşahên Anzanî yên ji ezbeta Texîxî-Kûtî - Amerdî-Xenî pey Kûrişê Mezin û Kurê wî Key Kawûs li ser Textê Mad rûniştin. Tevger û xuyên Kurd ên sade, lê bilind, paqij û xurt berdan, xwe ji bîr kir ku ji reha Padîşahên Anzanan in, peyhatiyên Kûtî-Amerdiyan in. Hezaran muxabin ! Van Padîşahên peyhatî yên Key Xusrewan, pertewfiraziya sarayên xwe, xurtbûn, jêhatîbûn û tîravêjbûna pêştirên xwe girtin.



Institut kurde de Paris

Tuwangerî û darayiya (dewlemendî) gel di sarayan da feşartin, hebûna gel giş dane gewzegerî û xweşşademaniyan. Tuwangerî, darayî û bazarvaniya welêt wenda kirin.

Padîşahên ku di pey Kawûs ra hatin navê Mad ku neyar dilerizandin ne dianîn bîra xwe. Van padîşahana pirtirên gewremerd û serleşkerên xwe ji biyaniyan dibijartin : Yewnanî, Ermenî, Misrî, Finîkî, Lîdî ... Gewremerdên Kurd û serleşkerên Kurd ji sarayên xwe, ji ordiyên xwe dûr xistibûn û ji bîr kiribû ku Key Xusrew û kurê wî Key Kawûs, ev her du şahînşahên ku navê Mad bi serfirazî li xwe girtibû, bi xebtûkoş û canbêzariyên gewremerd û serleşker û cengawerên kurd ji pîrozbexiyekê gihîştibûn pîrozbextiyeke din !

Lê, di ordiyên padîşahên mayîn ku pey Key Kawûs hatibûn da fermandar û cengawerên fêris û şerevan ên kurd kêm kêm xuya dibûn. Mezinên Kurdan ên xeydan û purxun kişiyabûn koşe û tenhayê, bi kuldarî û dilbirînî li van tevger û gertevan temaşa dikirin.

Padîşahên ku pey Key Kawûs, kurê Key Xusrewê Mezin, li Textê Mad rûniştin bawer kiribû ku Key Kubbadê Kurd, Key Aksarê bajargîr, Key Xusrewê Mezin û gelê Kurd ê cengawer imparatoriyeke firazbaz û navê cihangîriya giran bi xebtûkoşan, bi dildariya Kurdistan, bi jîr û mejî û hunermendî, bi rêtina xwîna sor wek çem û leyiyan anîbûn meydanê.

Darayê Mezin û peyhatiyên wî dê çawa karibin welatê giranbiha û serfiraz bi leşker û fermandarên biyaniyan û bi dirav û zêran kirrî ji dijminan biparêzin ? Key Darayê yekim hêj di destpêka ferweraniya xwe da ji Mîrên Mad ku ji bo mafên xwe di nuxûna wî da rabûbûn tirsiya û pir dilhejî kir. Loma, saraya xwe û ordiya xwe bi biyaniyan û Parisiyan tije kir. Darayê Mezin ku ji Tacûtextê xwe pêva tiştek ne dianî bîra xwe ev awayê çewt û kirêt serrast kir û ji vê yekê jî şermsarî û rûreşî anî ji bo gelê Kurd, ji bo navê cengawerên Kurd. Lê,



Institut kurde de Paris

hezaran efsûs û muxabin ! Padîşahên paşhatî yên Darayê Mezin jî ev awayê çewt û kirêt ji hevûdu hevand (taqlîd kir) û çûn. Loma, Artabanosên Yewnanî, Bogoasên Misrî, biyaniyan û bêbextan bilindayî, mezinayî û girancahiyên sarayan xistibûn, gerdişên pak û mêrane yên kevnare serûbin kiribûn.

Saraya Keyaniyan êdî ne ew saraya girancah û pertewpaş a kevnare bû. Ev saraya pertewdar a gewre bûbû meydaneke çepel û dilbixwîn : bêbextî, mirandin, kuştin, jehirandin.

Darayê sêyim – Darayê Madî – bû şehriyarê xweher-mendeke rengparisî, padîşahê biyaniyan ! Ferweranê xwehermendeke kosmopolît !! Ev şahînşahî bi navê şahînşahiyeke Mad bû. padîşahiya Kurdan bû ! Lê, bi rastî, di vê şahînşahiyê da tu rewş û heykel û pêjn û xuyên Mad û Kurdên kevnare tu nebû !!

Darayê Mezin berî du sed salan rewan û peykera vê şahînşahiyê wergerandibûn, serûbin kiribûn, niştimanê Kûtî û Kurtiyan radestî (teslîm) Biyaniyan – ên wek Mardonyosan – kiribû ! Loma, hezaran hezar leşkerên wî û yên kurê wî li ber çend Yewnaniyan şikiyan ! Rûreşiya revê li Maraton, li Salamîn, li Mîkal ... anîn ser ruyê ordiya Mad !!

Ji van gertevên tarî û bednav, ku di dirêjiya du sed salan da dîroka Kurdistanê bi şermî û bedbextî tijî kir, bi van kirêtiyan şeş padîşahên Anzanî ferweranî kir. Lê, pir muxabin ! Her şeş padîşah jî riya pirkujare û metirs û çewt û xwar berneda ! Çavkorî û nezaniyên xwe, serhişkiyên xwe bernedan ! Di du sed salan da, ordiya Keyaniyan, ên Anzanî, di destê biyaniyan da, li ser rêzanên kevnare û dûrbîn ên Keyaniyan venegeriyan ! Ordî di destê bêbext û nezanan da ma !!

Gava ku Darayê Sêyim tacê Kurdistanê danî serê xwe, hezaran muxabin, ordiya ku ji Erdişîrê sêyim mirate girtibû, mîna ordiya Darayê Mezin, ordiyeke genî, pejmûrde û ji biyaniyan dagirtîbû. Belê, Darayê sêyim, Darayê bedbext gava ku tacê Keyaniyan danî serê xwe bûbû Mîratxurê ordiyeke ewha !!



INSTITUT KURDE de PARIS

Darayê sêyim Padîşahekî dilrast bû, dilpaqij bû, xebatker bû, û kujarişê ku ji roava, ano ji Yewnanistanê, bihata didît û jê haydar bû. Ji bo vê yekê jî, ji dilûcan rahişt xebtûkoşeke germ û hêja. Di kargerînî, bajarvanî, leşkerî da bihterîşeke zor pêşve dibir : satrabdar û bendekarên (memûr) ku ji xwarina xûgî û tazîkirina gel pêva tiştek ne dikir avêtin, guherandin, rêderketî û xwedî sûcan rind şerde kirin. Çandinvanî û bazirganî xistin bin parazmendiya xwe, pejilandina (israf) sarayê jî rawestand. Paşê, rahişt bihterîşa ordiya xwe. Key Darayê sêyim, gava bi van karûkoşên bergiran kariwer (meşgûl) dibû, hergav di hiş û bala wî da ev qisseya bergiran hebû : vegerandin û vejandina xurtiya kevnare ya ordiya Mad !!

Du sed sal berî padîşhiya Key Darayê Mezin, Darayê yekim ruyeke (usûl-awa) pir çewt û çepel serrast kiribû ! Ordiya xwe ji gelên rengareng, ji heftê û du gelan, bi zora dirav û zêran anîbû meydanê, û ev ordiya heftê û du reng kiribû parazvanê imparatoriya Kurdistanê. Dawiya vê çewt û çepeliyê çawa bû me dît û me xwend. Her du kopên (darbe) dijwar : Maraton û Salamîn, ji bo Kurdan çi şermsarî ! çi rûreşî bûn !! Parazvanên welatekî kurên wî bixwe ne. Kurên biyaniyan di meydana ceng û mêraniyê da ji bo welatê kesan xwîna xwe narijînin. Paraztina welêt ji biyaniyan hêvî kir. Nîgaş (xeyal) siya daran e. Darayê sêyim dixwest wek bapîrên xwe, Anri-Daprizan, Kandijan, Key Kubbadan, Minwaşan, Sardonişan, Key Firîbrezan, Key Aksaran, Key Xusrewan, Key Kawûsan, Key Ferhedan ... ordiyekê bîne meydanê : xurt, girancah, berzavêj, bi bendûbest, bedenbaz û şerevan. Darayê sêyim qenc bawer kiribû ku bi ordiyeke di vî babetî da ew karibû rizgariya welêt bike, welatê giranbiha ji neyaran biparêze. Key Darayê sêyim kujarişa ku ji roava, ano ji Yewnanistanê, tê dîtibû û bîr dibir ku ev metirs ji bo Kurdan malmîratbûn e, gijokiyeke dijwar e, lê Dara ji vê metirsê ra tu berbend û

Institut kurde de Paris

çare peyda ne dikir. Maraton û Salamîn hergav di bîra wî da bûn : ev şermsarî, rûreşî karibû bicare (tekrar) bibe. Dara, ji bo ne carandina gijokiyeke ewha, li çarekê digeriya û çare jî peyda kiribû : vejandina ordiya Mad !! Lê, vejandina ordiya Mad ne hêsan bû. Diva bû berî hertiştî biyaniyan ji ordiyê derîne û ciyê wan bi kurên welêt dagire, ano, bi Kurdan. Di imparatoriya Mad da du pejikên (unsur) bergiran hebûn, Kurd û Paris. Di imparatoriya Kurdistanê da jimara Paris pir hindik bû, bi zorî 10%ê gel Paris bûn. 90%ên mayîn Kurd bûn. Dara vêrasta hanê ji herkesî çêtir zanibû. Loma, Dara dixwest ku, mîna dema bavpîrê xwe, Kurdên cengawer bibin mejî, movikên piştê û bingeha ordiya wî. Muxabin ! Pirtirên Kurdan ji dema Darayê Mezin, ano ji du sed sal ve, ji karûkoşên xwehermendê destên xwe kişandibûn. Darayê Madî ne karibû Kurdên xeydan û purxun aş bike û bîne ser karê xwehermendê. Êdî ji vê xwehermendê ra baweriya Kurd ne mabû, pirên wan kişiyabûn çiyayên xwe. Dawiya dawîn, Darayê sêyim digel xebtûkoş û dilpaqijiya xwe ne karîbû têra ordiya xwe Fermandar û cengawerên Kurd peyda bike. Ji aliyê din jî, ji berê da jimarên Parisan di ordiyê da pir hindik bûn. Parisî hawuşekî kêm bûn. Li bakurê rohilata kenarê Deryayê Paris, Şîraz û Pasargatê cî girtibû. Ji xwe Parisiyan ne merivine cengawer bûn. Şer û pevçûn ne bi dilê wan bû û hij jê ne dikir. Parisiyan cotê xwe dikir û pezê xwe diçêrand. Di van demên dawîn da, carna xweşbesteyên (şiir) dilrevîn û xweşaheng digotin.

## ŞERÊN DARA BI ISKENDERÊ MEZIN Ê YEWNANÎ RA

Darayê sêyim digel xebtûkoşa xwe ya bi canûdil kadroyên ordiya xwe bi qîma dilê xwe ji kurên welêt nikaribû dagire û serrast bike. Leşkerên ordiya Darayê sêyim jî, mîna pêşhatiyên wî, ji heftê û du gelan berhevbûyî ma. Ordiya Darayê sêyim jî,

Institut kurde de Paris

mîna ordiyên pêşhatiyên wî, bê bendûbest, bê bedenbaz, bê zaneweri bû, gilorek merivên tevlihev bû ! Lekên Darayê sêyim ên rêzandî û bedenbaz û zanewer pir hindik bûn.

Eger paşimtê (reqîb) Dara çend salên din jî hilmvereyî bikira û ji Dara ra weşan (firsat) bida, dibe ku Dara têra xwe lekên rêzane û bedenbaz serrast bikirana. Lê, pir muxabin ! Paşimtê Dara jê ra vê weşanê ne da. Berî ku Dara têra xwe lekên sazdar, tebût û karûbarkirî ber bi hev bîne, paşimtê wî ji Dardanêl derbas bû, dirêjî imparatoriya Kurdistanê, kişwerê Darayê sêyim, kir. Evê ku dirêjî Dara kir Qralê Yewnanî Iskenderê Mezin bû (20).

Lê, ordiya biçûk a Iskender mêr, canbêzar, çekbaz û hunerwer bû. Leşkerên Iskender ji zarotiya xwe da her celeb libatgerî (jîmnastîk), bedenbazî dikirin û zanewerî, şerevanî hîn dibûn. Leşkerên Iskender şûrhingêv, mertêlgêr û tîravêjine zor bûn. Di her awayên şerhînî (manavra), şerevanî, şebxûniyê da pispor bûn ! Leşkerên Iskender di cihanê da yekta bûn.

Ji vê aşkaftinê xweş xuya dibe ku dawiya kopandina her du ordî dê çi bibe !! Di navbera her du ordiyan da - di sê demên cihê da - sê şerên mezin çê bûn: yek di sala 334 B.Z. da, nêzîkî Deryayê Ege, di rexê çemê Nîfos da. Ê duyim di sala 333 B.Z. da, li Kilîkyayê, li deşta Edenê, nêzîkî Ipos-Tersûs. Ê sêyim di sala 331 B.Z. da, li Kurdistanê, li deşta Hewlêrê - Erbîl -.

Ordiya Darayê bedbext li her sê cengmeydanan bi perîşanî şkest. Di cenga Iposê da, diya Dara, jina wî, du keç û kurekî wî ketin destê Yewnaniyan. Iskender ji kesên Dara ra nermdilî û mihrivanî nîşan dan.

Pey şerê Ipos, Iskender ne ket pey ordiya Dara, bi standina bajarên kenarên Deryayê Sipî kariwer bû. Paşê, berê xwe da Misrê. Misr seraser girt, avakirina bajarê Iskenderiye ferman kir. Iskenderê Mezin

evçend kişwer û bajaran di du salan da vekirandin. Wî li Misrê ordiya xwe mestir kir, xurttir kir, karûbarê xwe tekûz kir û vegeriya ser Dara.

Darayê sêyim li deşta Hewlêrê li benda Iskender bû. Ordiya Dara îcar jî li ber kopandina ordiya Iskender ling ne da ber xwe. Ordiya Darayê bedbext şkest, perîşan bû, ji hev belav bû. Du leşkerên Hemedanî yên bêbext Dara kuşt.

Iskenderê Mezin ji Hindistanê heya Deryayê Reş û Deryayê Sipî Kurdistan û Parisistan vekirandin. Paşê, hin ciyên Hindistanê jî girtin. Lê, leşkerên wî ne xwest pêşvetir biçin. Iskender ji neçarî vegeriya Babîlê. Iskenderê Mezin, Iskenderê cihangîr, gava ji Babîlê bi planên vekirandina gişî cihanê kariwer bû, nexweş ket, di nav şeş rojan da temenpayan bû. B.Z. 323.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## PEY MIRINA ISKENDERÊ MEZIN XWEHERMENDA SELEKOS LI KURDISTANÊ

Kişwerên ku Iskenderê Mezin vekirandibûn pir fireh bûn : ji Yewnanistan heya Hindistan, ji Deryaçê Aralê heya Beyabana Mezin a Afrîqayê dirêj dibûn. Pey mirina Iskender, ev kişwerê fireh di navbera generalên Iskender da bi sî û çar ciyan parvebû. Jixwe, berî rakirina termê Iskender, generalên wî rahiştibû hev û di nav wan da berberî dest pê kiribû. Paşê, pey van xerpişînan, şerine dijwar û cengine xwînrêj çê bûn. Li nav generalên pirxwaz û çavbirçî yên Iskender ên binavûdeng ev bûn : Pêtolêmêos-Batlanyos, Pêrtikas, Lêonidas, Antigonos, Lêonatos, Aleksandros, Kiyoyas, Lizimakos, Nêarkos, Sêlêkos, Omoyis. Navê van generalan "Diyaduk" bû, ano paşhatiyên Iskender.

Generalên pirxwaz ên Iskender bîst sal ne westiyan, bîhn ne da xwe, xerpişîn û şer kirin. Kişwer talan kirin, wêran kirin, şewitandin, bajar hilweşandin, herifandin. Di gellek ciyan da, mezin û biçûk ne gotin, bilêc kirin. Carna kesên bajarekî giş, jin û mêr, keç û kur, dîl kirin, di bajaran da firotin.

Ev keşmekêş û xwînrêjî bîst sal ajot. Pirên wan generalên pirxwaz û bêdad an di şeran da, an bi destên leşkerên xwe, hatin kuştin. Dawiya dawîn, sê general ev kişwerê fireh di nav xwe da par kir: Antigonos bû Qralê Yewnanistanê û Makêdonya, Pêtolêmêos-Batlanyos Misr ji xwe ra bir, Sêlêkos dest da ser kişwerên ku Iskender li Asya vekirandibûn û xwehermendeke nû serrast kir. Navê vê xwehermendê bû Selefke. Di sala 312 B.Z. da Sêlêkos bû Qralê Selefke. Ev kişwerê gewre û

Institut kurde de Paris

buhuştasa ku Sêlêkos dest da ser welatê giranbuha û pirfiraz ê Kûtiyan û Kurtiyan bû (21).

Sêlêkos li Babîlê rûnenişt. Li ser çemê Diclê bajarekî nû ava kir, navê wî kir bajarê Selefke û ji xwe ra kire paytext. Bajarê Selefke di demeke hindik da bû bajarekî mezin û xemilandî. Babîl, paytextê Sûmîr û Akad û Kildan, paytextê Hamorabî yê Nebexe, paytextê Anrî-Dapriz ê Kurd, ê Kandij, padişahê Kasiyan, paytextê Kardûnya, ano Kurdan; Babîl, bajarê Merdûxê pirfiraz û fisûnkar, xwedan û parazgehê Sûmîr û Akad û Kilde; Babîl, bajarê gewre û rewşen; Babîl, bajarê bazirganan, tuwangeran, roj bi roj kêm bû, vemirî, hêdî hêdî hilweşiya û herifî ... !!

Sêlêkos kişwerê xwe yê fireh û ji gelên rengareng dagirtî nikaribû dûr û dirêj di destê xwe da bigre. Pirên Kurdan di demeke hindik da ji bindestiya Sêlêkos derketin. Ferweraniyeke Mad a biserxwe çê bû. Çend mîriyên din jî serrast bûn. Bitenê hin bajar û deştên Kurdistanê di destê Sêlêkos da man.

Di sala 280 B.Z. da, gava ku kurê Sêlêkos, Antokyos, bû qral, li ser çemê Oront (Asî) bajarekî nû ava kir û navê wî kire bajarê Antokyos (Antakya), paşê ferweraniya xwe ji Selefke rakir, anî Antakya. Antakya bû paytextê xwehermenda Selefiye. Ji bo vê yekê, aliyê rohilatê kişwerê xwe di demeke hindik da wenda kir.

Di destê ferweraniya Selefkiye da bitenê Anadol û Sûrya man. Ji sînorê Hindistanê heya Deryayê Reş cardin vegeriya ji xwediyê xwe ra, ano ji Kurdan ra. Kurdistan ji nû da gihîşt serxwebûn û azadiya xwe : Kurd du xwehermend çê kirin :

1- Xwehermenda Mad, di Kurdistana navîn da.

2- Aşek, neviyê Key Kubbadê Kurd, jî xwehermenda Aşkaniyan li Kurdistana rohilat serrast kir.

**Xwehermenda Selefkiye li Antakya 250 sal ferweranî kir.**

Institut kurde de Paris

## WENDABÛNA ŞEHRIYARIYA SELEFKE LI KURDISTANÊ

## XWEHERMENDÊN KURDAN

Me nivîsandibû ku kişwerên fireh û bêpayan ku Iskenderê Mezin li Asya vekirandibûn bûbûn para generalê wî Sêlêkos. Ev erdê hanê ji ber çend xwehermendan ma bû, gelên bê jimar tê da dijîn, zimanên rengareng dipeyivîn, ol û gerdişên wan jî ji hev cihê bûn.

Gelo li vî erdî Sêlêkos dê kariba dûr û dirêj ferweranî bike ? Ev ne tiştekî hêsanî bû. Evçend zordestî ji her merivî dûr bû. Vê qisseyê, Antokyos, kurê Sêlêkos, baş bîr biribû. Loma, Antokyos paytextê xwe ji bajarê Selefke rakir, bir Antakyayê (li Sûrya, li ser çemê Asî). Aliyê rohilatê kişwerê Antokyos, ano Kurdistan, bi vî awayî ji paytextê nû, ano ji Antakyê, bi hezaran kîlometre dûr ma. Kurd jî bi hêsanî keysa xwe li Antokyos anî û rabûn ser xwe, li hev civiyan, dirêjî ordiya Antokyos kir, leşkerê Antokyos şikand û du xwehermendên mezin ên Kurdan serrast kirin. Yek ji wan xwehermendan navê xwe xwehermenda Mad danîbû, 255 B.Z. Xwehermenda din jî li rohilatê Kurdistanê serrast bûbû. Navê wê jî bû xwehermenda Aşkaniyan.

Antokyos nema dikaribû ev kişwerê fireh dûrûdirêj di destê xwe da bigirta. Jixwe di hengama Iskender da jî Kurdistan seraser ne hatibû vekirandin. Ciyên dûr ên derbasok ên leşkerî serxwebûnên xwe ji dest bernedabûn, li pir ciyan Mîriyên serazad serrast bûbûn.

Institut Kurde de Paris

## XWEHERMENDA MAD LI KURDISTANA NAVÎN

Di Kurdistana navîn da, di sala 255 B.Z. da, li nixûna ferweraniya selefke rabûn, fermanşikênî kir, bi Selefkiyên Yewnanî ra şer kir, ordiya wan şikand û xwehermendeke mezin a kurd serrast kir. Navê vê xwehermendê kir Xwehermenda Mad.

Ev xwehermend ji destpêka xwe heya du sed sal çi kir ? Çi hat serê wê ? Çi wergerek hatin serê wê? Ev 200 sal çawa derbas kirin ? Çend padîşahên wê hatin ? Navên wan çi bûn ? ... em nizanin.

Em di nivîswarên dîrokan da rastî zanegiyê ne hatin. Lê, çend serhatiyên wan ên dawiyê, ano ji bingehdanîna xwehermenda wan 200 sal bi şûnda, ket destê me : Mirata Iber, Saîd Paşa, rûpel 316-318: Venûn, kurê Ferhadê çarim, Padîşahê Xwehermenda Aşkaniyan, di sala 35 B.Z. da li ser textê Aşkaniyan rûniştibû, lê padîşahekî bedxuy û kargerînekî çewt-çepel bû. Kesên welat tevde di nuxûna wî da bûn. Rojekê, bi hev ra fermanşikenî kir, xwest Venûn ji Text daxînin, di şûna wî da padîşahê Mad Erduwanê sêyim li textê Aşkaniyan bidin rûniştandin. Padîşahê Mad, Erduwanê sêyim, bi ordiya xwe ajot ser Venûn. Ordiyên her du padîşahan ketin meydana şer. Şer dirêj kir, cengawerên her du aliyan jî ji yek xwîn û ji yek malbatê bûn. Lê, çi sûd ! Îro roja mêraniyê bû, roja mêrxasî û pehlewaniyê bû ! Bira ji birayê xwe ra rûmet ne dikir ! Gome û zinar rastî hev hatibûn ! Guştîriya şêr û pilingan bû. Siwar miqlacî û hunerbaziyên xwe, peya şûrhigêvî û mertalgêrînên xwe nîşan didan ! Çingîna kalmisriyan, xuşîna şûrikên riman, qêrînên box û beranan erd û ezman dihejandin ! Ev roj çi roj bû ! Roja kurê bavan, roja canbêzaran û canfeşanan bû ! Kuştin û mirin di bîra kesî da ne bû ! Ev hezaran qehreman û pehlewan ji yek dê û ji yek bav bûn, kurên Kûtî û Kurtiyan bûn. Ji bo çi hevûdu dikuştin? Ji bo çi xwîna hev dirijand ? Dilxwaza wan çi bû? Armanca wan çi bû ? Ev hezaran qehreman û pehlewan ji bo yek dilxwaz û armanc, ji bo yek

tişt bi erzanî û bi herweyî xwîna xwe dirijand, can û rewanên xwe didan ! Vî tiştî herkes ji xwe ra dixwest ! Her yek dixwest keç û bûk jê ra bilîrînin, lê jê ra bitenê !!!

Çerxa felekê, bîşkê bext bi Venûn ra ne keniya ! Evçend kuştî û nalîn û ax û wax beyhûde çê bûn, leşkerê Venûn şkest, du tac û du text ji Erduwan ra man !!

Erduwanê sêyim bajarê Medayin stend. Medayin di wan hengaman da paytextê xwehermenda Aşkaniyan bû. Lê wê gavê, Medayin bajarekî biçûk bû û pir ne ava bû. Erduwanê sêyim ji bo avakirin û xemilandina medayin pir xebtûkoş kir, pir guh dayê. Paytextê xwe fireh kir û xemiland. Lê, her du kurên Erduwanê sêyim, Wardan û Baqûr, di hengama padîşahiyên xwe da ji bavê xwe bêtir xebtûkoş kir, bajarê Medayin bi sazkarî û canfeşaniyên salan kir paytextekî ronak û zîwer, mezin û çeleng.

Erduwanê sêyim û padîşahên peyhatiyên wî her du xwehermendên Mad û Aşkanî gihandin hev û yekandin. Ev xwehermenda yekandî li Medayinê ferweranî kir.

Di hengama van Padîşahan da, sînorên Kurdistanê ji Hindistan digihîştin heya Deryayê Reş û Sipî.

## XWEHERMENDA AŞKANIYAN

Kurd di sala 2055 B.Z. da, ji bindestiya xwehermenda Selefke rizgar bûn. Di Kurdistana navîn da bi serxwebûnî xwehermendeke Kurd anî meydanê. Navê vê xwehermendê kir Xwehermenda Mad. Bi danîna vî navî rewanê pak û Key Kubbadê Kurd kir şad û xurrem.

Sî sal bi şûnda, ano di sala 225 B.Z. da, li aliyê rohilatê Kurdistanê, li sînorên Hindistanê xwehermendeke din a Kurd serrast kir. Navê vê xwehermendê kir Xwehermenda Aşkaniyan.

Xwehermenda Aşkaniyan di sala 225 B.Z. da hat serrast kirin. Qehremanek ji ezbeta Key Darayê



Institut kurde de Paris

Madî, Aşek = Arşek, ji aliyê bakurê Belxê ala serxwebûnê rakir û kete pêşiya Kurdan, dirêjî ordiya Selefkiyan kir û ew şikand, bajarê Damexan xist bin destê xwe, ji xwe ra kire paytext. Bi vî awayî bingeha xwehermenda Aşkaniyan danî.

Di destpêkê da paytextê xwehermenda Aşkaniyan bajarê Damexan bû. Paşê Medayin kir paytextê xwe. Ferweraniya Aşkaniyan 451 sal di kişwerê Key Aksarê Bajargîr ê Nînwa da ajot. Sînorên kişwerê xwehermenda Aşkaniyan, wek hengama Key Aksar, heya Deryayê Reş dirêj dibû. Kesên vî kişwerê fireh 90% Kurd bûn. Şahînşahê wan Kurd bû, zimanê gişkî Kurdî bû. Imparatoriya Aşkaniyan imparatoriya Kurdan bû.

Kesên vê imparatoriya fireh û firazbaz giş yek nejad bûn, giş ji nejadê Endo-Awrupayî bûn : Kurd, Paris, Sexdî ... Ev hawiş tevde pismamên hev û yeknejad bûn. Lê çawa ku me berê gotibû, piraniya mezin 90% Kurd bûn, şerker û cengawerên wan bitenê ji Kurdan bûn.

Belê, evên ku bi Sûmîr, Elam, Kildan, Asor, Hitît û Misr ra şer kir, xwîna xwe rijand û di meydanên ceng û şeran da canfeşanî û canbêzarî kir kurên Kurdan bûn. Parisiyan, di van çend hezar salan da, yek dilop ji xwîna xwe ya şîrîn ne rijand ! Rojekê bi tu kesî ra ceng û pevçûnek ne kir ! Li dora Deryayê Paris û Şîraz û Pasargat cotê xwe kir, pezê xwe çêrand. Ev meriv cotkar û şivan bûn, ew (Aştîperwer) bûn ! Bac didan, ji şer û cengan dûr diman ! Dixwar, vedixwar, gewzûşadî dikir (22).

Key Darayê Mezin sûcekî mezin kir, Parisî û biyanî anîn, li ser karê xwehermend û ordiya xwe danîn. Paşê jî ji heftê û du milletan ordiya xwe tijî kir û bi şermsariya Maraton meyweyê sûcê xwe çinî. Peyhatiyên Darayê Mezin jî şopa Dara berneda. Loma rûreşî û malmîratiya mezin a Erbîlê çê bû ! Imparatoriya ku Key Kubbadê Kurd ber bi hev anîbû, Iskenderê Mezin di sala 331 B.Z. da da ber lingê xwe. Paşê jî, di sala 312 da, generalê Iskender,



Institut kurde de Paris

Sêlêkos, destê xwe danî ser welatê pirfiraz û giranbiha yê kurd.

Lê pir ne ajot, Kurdên canfeşan û canbêzar wek şêran qûriyan, dirêjî Selefkiyan kirin. Hêj ji bingehdanîna xwehermenda Selefke 57 sal derbas ne bûbûn.

Di Kurdistana navîn da, di sala 255 B.Z. da, Kurd fermanweriyeke Mad vejand. 30 sal bi şûnda, di sala 225 B.Z. da, neviyê Key Kubbadê Kurd, Aşek, ala serxwebûnî bilind kir û xwehermenda Selefke ji Kurdistanê avêt, di şûna wê da xwehermenda Aşkaniyan a Kurd anî meydanê.

Awrûpayî, bê mafî û çewtî, ji xwehermenda Aşkaniyan ra xwehermenda "Part" dibêjin. Ecem, Ereb û Tirk jî "Fursî Qedîm" nav lê dikin û jê pak dibin.

Bingehdarê xwehermenda Aşkaniyan Aşek e. Aşek neviyê Key Kubbadê Kurd e. Ano, Aşek bi xwe Kurd e. Leşkerên Aşek jî giş Kurd bûn. Ji bo azadiya Kurdistana xwe ya şîrîn û rengîn xwîna xwe rijand, Imparatoriya Kurdistan ji destên peyhatiyên Iskender derxist. Di van şeran da, yek dilop xwîna Ecem û Paris ne rijiya. Ecem û Paris li Şîraz û Pasargadê bi gewzûşadî dema xwe derbas dikir, serê xwe ji xaniyê xwe dernedixist.

Ev kisse eşkere ye, wek rojê xuya ye : xwehermenda Aşkaniyan xwehermendeke Kurdan e, ne xwehermenda Ecem e, ne jî xwehermenda Parisan e. "Ancienne Perse", "Fursî Qedîm", gotinên vala ne, pirsên saxte ne, xweşbestên (şair) nîgaşperest (xeyalperest) ên wekî Firdewsî ji ber xwe derxistine. Şehrevaniya Ancienne Perse û Fursî Qedîm jî pirsên nezanan in. Carê xwehermendeke Faris çê ne bûye. Şehrevaniya wê ya kevnare ji ku çê bû ?

Şehrevaniya kevnare, şehrevaniya Kurd a kevnare ye, şehrevaniya Kasiyan e. Wan Kasiyên ku di sala 1765 B.Z. da Kildan vekirandin, di Babîl da 700 sal fermanferma bûn. Avayiya Babîl, xemla Babîl, şehrevaniya Babîl duta û çarta kirin. Şehrevaniyên kevnare yên Lolobûm, Hûrî, Mîtanî, Nehrî, Mad,

Institut kurde de Paris

Mannaî ... bû. Ev şehrevanî şehrevaniyên van xwehermendên kevnare yên Kurdan bûn.

Padîşahên Asor, endazvan (muhendis), pîşewer (senetkar), hunerwerên Kûtî, Kasî, Lolo, bi dirav û zêran dilxweş dikirin, dibirin Nînwayê û bi van zana û hunerweran Nînwa dixemiland. Bi saya van Kurdan Nînwa ronaktir, rewşentir û dilrevîntir dibû.

Padîşahên Asor bîrnave (xatira), stûn û beryadên (abîde) ku daçikandin, pir caran li ser van keviran pesna zîwerî, mêrxasî û hunermendiya Kurdan nivîsandine.

Rojhilatzan û arkêologên awrûpayî li Kurtdistanê, bi ger, bi xepir û kolan, li ser Kurdên Kevnare pir kevnerêç derxistine. Ev kevnerêçên Kûtî û Kurtiyan in, ano yên Sûbarî, Hûrî, Mîtanî, Lolo, Kasî, Madî, Mannaî, Kûtî-Amerdiyan in. Ano, giş ên Kurdan in. Yek kevnerêçeke Parisê Kevnare derneketiye meydanê. Gelo çima ? Çima ku Farisên kevnare "Fursî Qedîm" carê di cihanê da tu nebûn.

Di dawiya nivîswara me da, hûn dê pirsigoyekê (meqale) bixwînin. Em dê, di vê pirsigoyê da qisseya Fursê Qedîm û Kurdistana Kevnare rind û pejilandî, rastiyê derînin meydanê.

Ji Padîşahên Aşkaniyan, di 450 sal da, 37 Padîşah li Textê Kurdistanê rûniştin. Navên van Padîşahan ev in : Arşek, Tîrdadê yekim, Erduwanê yekim, Feryapantosê yekim, Mihirdadê yekim, Ferhadê duyim, Erduwanê duyim, Mihirdadê duyim, Menûçehr, Senaradîç, Ferhadê sêyim, Mihirdadê sêyim, Hûrdê yekim, Ferhadê çarim, Ferhadê pêncim, Hûrdê duyim, Venûnê yekim, Erduwanê sêyim, Tîrdadê duyim, Sînay, Wardan, Xudrey, Mihirdadê çarim, Pelasê yekim, Venûnê duyim, Pelasê duyim, Erduwanê çarim, Bakurrê yekim, Xusrew, Akisdar, Pelasê sêyim, Bakurrê duyim, Pelasê pêncim, Pelasê şeşim, Erduwanê pêncim.

Ji van 37 Padîşahan, bitenê ji tevgerên sê Padîşahên hêja û mêrxas em dê xwendevanên xwe agah bikin.

Institut kurde de Paris

Padîşahên jêhatî, camêr, xebatker, dûrbîn û mêrxas ev her sê Padîşah in :

1- Mihirdadê yekim, padîşahê sêyim.

2- Ferhadê duyim, kurê Mihirdadê yekim.

3- Hûrdê yekim, padîşahê panzdeyim.

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

ŞEHRIYARIYA MIHIRDADÊ YEKIM

Padîşahê Aşkaniyan, Mihirdadê yekim, di sala 157 B.Z. da bû Padîşahê Aşkaniyan. Mihirdadê yekim padîşahê sêyim ê Aşkaniyan e û ev padîşah pir rahiştmen (muteşebbis), xebatker, karaşîna û dûrbîn bû. Kirdariya (icraat) wî ya pêşîn ev bû : di wan deman da, li Baxterî, Hemedan, Babîl û Mêzopotamyayê, mîrên serkeş hebûn. Ev mîrên serkeş yek bi yek bindest kirin û yekîtiya Aşkanî bi cî anî. Paşê, bi dadkerî û mihrivanî rahişte avakirina welêt, pêşvebirin û gumrehkirina kişwerê xwe. Di gel van karûkoşan, ji bo paraztina sînorên welêt, rahişt çare û karûxebtan : Selefkiyên roava yên Anadolê ku paytextê wan Antakya bû - herçend ku Kurdistan ji destê wan çûbû - hêj kişwerekî mezin di destê xwe da digirt û ferweriyeke zor diajot.

Ev qralên Antakya, ev qralên Yewnanî, peyhatiyên Sêlêkos, kopê mejîrêj ê dijwar ji destên Kurdan xwaribûn, hêj êşa xwe ji bîr ne kiribû. Ji canûdil dixwest heyfa kevn a bav û kalan vegerînin. Ji bo vê yekê, ji salan ve, karûkoşeke zor dikir. Ordiyeke bê jimar û xurt berbihev anîbû. Li roja keys û fesalê digeriyan.

Mihirdadê yekim, padîşahê Kurdan, ji van xebtûkoşan, ji van karûbestên Selefkiyan haydar bû. Mihirdadê cuwan û canfeda rîsipiyên germûsar dîtin, fermandarên kevnare yên şerûcengan derbaskirî, emekdarên karaşîna û xudanbext, şîretkerên zana û nebexe dabûn çarnikarên xwe.

Vê encumena şîretkeran, ercumend (fadil) û nebexeyan, serleşker û fermandarên bijare, bi rojan û

Institut kurde de Paris

mehan bernaveke (program) durust û tebût berbihev anî. Bi vê bernaveyê dest bi xebtûkoşeke zor giran kir. Armanca wan paraztina sînorên welêt bû, paraztina bilindayî û serfiraziya imparatoriya Kurdistan bû. Bi van xebtûkoşên meh û salan, şev û rojan, ordiyeke xurt, cuwan, bedenbaz, hunerwer û bi bendûdest anî meydanê. Vê ordiya Kûtî û Kurtiyan çav dibilbisand û dil dikutand ! Peyayên vê ordiyê tîravêj, kemendirêj, şûrhingêv, mertalgêr û rimbazine bê hawe bûn. Siwarên vê Ordiyê miqlac, çerxzîz, gurzkop, şûrkêş û rimlîzên yekta bûn. Dawiya dawîn, roja kurên bavan, roja pehlewanan û canbêzaran hat. 147 B.Z.

Qralê Selefkiyan, Dîmîtriyos, ji paytextê xwe, ji Antakya ordiyeke giran û bêjimar, ordiyeke sed hezaran, ordiyeke şepxûnan dîtî, têr çekkirî, rapêçayî dabû dû xwe, êrîş bire Kurdistanê.

Mihirdad ji Pêşdarên Ordiya xwe, ji tevgera neyar her dem û gav agahdar bû. Ciyên stratêjîk girtibûn, bi agahî û hişyarî ordiya Dîmîtriyos dipa.

Pir ne ajot, du Ordî dirêjî hev kir. Her du alî jî cengawer û hunermend bûn. Pir ji hev kuştin, gelek xwîn rijand. Lê, paşê kemendavêjên Mihirdad padîşahê Selefkiyan dîl girt. Ordiya Dîmîtriyos şkest û perîşan bû. Mihirdad bi gewz û şadî vegeriya Meydanê, Dîmîtriyos bi xwe ra anî, ew dilxweş kir û jê ra mihrivanî nîşan da.

Li sînorên Hindistanê serkeşî û tevhevî çê bûbû. Mihirdad berê xwe da Hindistanê, bi Hindiyan ra çend ceng çê kirin, hergav leşkerên hindî şkestin. Mihirdad ket hundirê Hindistanê. Bi vî awayî sînorê xwe fireh kir û vegeriya Medayinê.

Mihirdad, pey van kamweriyan, şahînşahiya xwe li çar kenarên xwe bang kir. Mihirdadê Şahînşah 14 sal imparatoriya Kurdistanê kir, hengama xwe bi firazbazî, kamwerî, bedxwarî û mêrxasî derbas kir. Di 138 B.Z da temenê xwe payan kir.

Institut kurde de Paris

## PADÎŞAHIYA FERHADÊ DUYIM

Padîşahê Aşkaniyan, Ferhadê duyim, kurê Mihirdadê yekim, Padîşahekî bijare yê Aşkaniyan bû.

Ferhadê duyim di sala 139 B.Z. da li ser text rûnişt. Padîşahê heftim ê Aşkaniyan bû. Ev Padîşah jî wek bavê xwe xebatkar, canfeşan û dadker bû. Ji bo avayiya welêt û gumrehî û geşiya gel pir koşiya. Ferhad jî, mîna bavê xwe, baş bîr biribû : serxwebûnî û bextiyariya welêt berî her tiştî ordiyeke xurt dixwaze. Loma, ordiya ku ji bavê xwe mîrate girtibû li ba wî pir giranbuha bû. Ev ordî perçak ji canûcîgerê wî bû. Ordiya Ferhad hergav amade, li benda neyaran bû.

Ferhadê duyim ji zû da agah bû : Antokyosê heftim, qralê Selefke, li vegerandina tolan digere. Dîlbûna bavê xwe, pelişandina ordiya Selefke ji bîr ne kiriye. Loma, Antokyos xebtûkoşên giran dike, ordiyeke mezin dike bîne meydanê.

Antokyosê heftim pir dereng ne ma, bi ordiyeke mezin, xurt û rind karûbarkirî dirêjî Aşkaniyan kir.

Çend cengên no, dijwar û xwînrêj di navbera Kurdan û Selefkiyan da çê bûn : di cenga pêşîn da, ji cuwanî û kêmpisporiya Ferhad, Selefkiyan zor da Kurdan. Lê, Ferhad ji vê şkestinê bê umîd û purxun ne bû. Ordiya xwe xurtir, bedenbaztir û karûbartir kir.

Pir derbas ne bû, şer ji nû da xweş bû. Di cenga duyim û sêyim da Selefkiyan pir kuştî dan, meydana cengê berda, bi şûnda kişiyan. Di cenga çarim da, ordiya Selefke bicarekê ji hev ket, şkest û perîşan bû. Qral Antokyos di meydana cengê da hate kuştin.

Ferhadê duyim ê mêrxas û dilpola 12 sal padîşahî kir. Di sala 127 B.Z. da, di nav ordiya wî da serkeşî û tevheviyek çê bû. Di hengama vekuştina tevheviyê da hat kuştin.

Institut kurde de Paris

## PADÎŞAHIYA HÛRDÊ YEKIM

Hûrdê yekim di sala 55 B.Z. da li ser Text **rûnişt.** Hêj nû bûbû Padîşah, Ordiya Romanî şep (keys) ne dayê, ji nişkava dirêj kirê (23).

Roma di bin fermandariya Krêzos, Serhengê dengîn, bi ordiyeke giran hatibû ser Aşkaniyan. Hûrd hîç dudilî ne kir, ket pêşiya ordiya xwe, ber bi Krêzos lezand. Krêzos berê xwe dabû Mêzopotamyayê, ber bi rohilat dişûşikî.

Hûrd Sûrnay kiribû serleşkerê ordiya xwe. Sûrnay serleşkerekî zor zana û hunermend bû. Hêj di destpêka şer da, bi mêrxasî û zorbaziyên leşkerên xwe û bi hunerweriya xwe ordiya fêris a Roma şkand. Krêzos ji bivênevî (neçarî) ordiya xwe paşpaşkî kişand. Krêzos jî, wek Sûrnay, di danişmendiya leşkerî da hunerwerekî zor bû. Krêzos bi zanayî û hunermendî ordiya xwe ji pelişandin û wendabûnê rizgar kir. Bi rêzanî û bendûbestî ber bi roava ordiya xwe paş ve bir. Bi saya manewra û taktîkan, di navbera her du ordiyan da - Kurd û Roma - minizîş (temas) ne ma. Lê, Sûrnay ne dixwest bi hêsanî nêçîra xwe ji destê xwe berde. Bi firebînî, bi ewleyî û tebûtî ket pey neyarê xwe.

Paş du heftan, li deşta Hewranê, cardin her du ordî ketin pêsîra hev, ji nû da cengên dijwar pê kirin. Her du alî jî bi mêranî û hunerbazî dirêjî hev dikir. Dawiyê, bext bi Kurdan ra keniya, li meydana cengê serleşkerê Roma Krêzos hat kuştin. Kurd ordiya Roma bi dijwarî kopand, ji hev jend û herifand! Pey vê kamweriyê, Hûrdê yekim heldorên Antakya bi kişwerê xwe va girêda û vegeriya Medayinê. Paşê, dema xwe bi avadaniya welatê xwe derbas kir. Di sala 37 B.Z. da temenpayan bû.

## ROJÊN DAWÎ YÊN XWEHERMENDA AŞKANIYAN

Me bi awakî kurtebirî çîroka xwehermenda Aşkaniyan **xwend. Ev xwehermend, çawa ku pir rojên pertewdarî û mezinayî dîtin, ewha jî yek caran tengî, tevhevî jî**

derbas kirin. Nemaza, gava di sala 220 B.Z. da dubendî ket navbera xanedana padîşahî. Pelasê sêyim di nixûna birayê xwe Erduwanê pêncim da rabû, Tac û Text ji birayê xwe bi darê zorê stand. Lê, her du bira bi hêsanî ji hev ne geriyan. Gel bû du tîş : tîşekê hevaltiya Pelas dikir, tîşa din jî bû hevalê Erduwan. Ji bo lihevanîna her du biran tu çare peyda ne bû. Ceng û pevçûn bi salan dirêj kir. Ji bo vê yekê, xwehermenda Aşkaniyan qels ket, perîşan bû.

Erdişîrê Babekî keys xist destê xwe, di nixûna her du biran da rabû, bi wan ra ceng kir, leşkerên her du biran jî şkandin. Erdişîrê Babekî Tac û Text kire destê xwe. Bi vî awayî bingeha xwehermenda Sasaniyan danî û dawiya xwehermenda Aşkaniyan di 226 B.Z. da anî.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## XWEHERMNDA KU AŞEK BINGEHA WÊ DANÎ XWEHERMENDA PART AN A AŞKANIYAN E ?

Aşek, ji bo ku ji Teberistanê di nixûna Selefkiyan da rabû, dîroknivîsên awrupayî navê xwehermenda nû ku Aşek bingeha wê danîbû kir Part, çima ku bi gotina Awrupayiyan Teberistan welatê Partan e.

Generalê Iskender ê mezin, Sêlêkos, pey Iskender, di 312 B.Z. da, dest danîbû ser welatê Key Kubbadê Kurd. Xwehermenda Selefke li Kurdistanê 87 salan ferweranî kir. Aşek, neviyê Key Kubbadê Kurd, di sala 225 B.Z. da, ala serxwebûnê bilind kir, Kurd giş - Kûtî û Kurtî - xwe da dora Aşek, bi leşkerên Selefke ra ceng kirin, Selefkî ji ber Kurdan reviyan. Kurd imperatoriya Kurdistanê vejand. Kurd ji destê Selefkiyan rizgar bûn û navê xwehermenda nû ji bo pîroziya Aşek kir Xwehermenda Aşkaniyan.

Hin dîroknivîsên awropayî xwehermenda Aşkaniyan kirine xwehermenda Part. Eşkere xuya ye, ev guhartina nav ne rast e : carekê bingeha xwehermenda nû Aşek daniye. Divê navê vê xwehermenda nû bi navê bingehdarê wê bê gotin. Paşê jî, bitenê Part li dora Aşek ne civiyabûn, Kurdistan giş, Kûtî û Kurtî, bûbûn leşkerê Aşek û ketibûn bin ala wî, neyar ji welatê xwe qewirandibûn. Yeka din jî, Partan ne bitenê li Teberistanê cî girtibû. Part li her aliyên Kurdistanê rûdiniştin :

Padişahê Asor, Salmanazarê duyim, di sala 759 B.Z. da, gava li Kurdistanê şer dikir rastî Mad û Part hatiye. Di van hengaman da Mad, Part, Mannaî, Kimrî ... li dora Urmiyê rûdiniştin. Arkêlogan di van salan da kevnerêç ji bin erdê derxistin. Ev kevnerêç nehrevanî dikin ku Part birekî Kurd in.

Di nivîswarên dîrokan da pir nav li Partan danîbûn.

Institut kurde de Paris

Parth, Partûwa, Partûwah, Parsûwas, Partek ... Ev nav giş hevnav in, giş yek pirs in. Ev nav giş ji pirsa Partas tîş bûne. Mad heft ezbet bûn. Navê yek ji van ezbetan "Partas" bû. Partên dora Urmiyê her gav alîkariya Mannaıyan dikir : di sala 825 B.Z. da, padişahê Mannaiyan, Mînwas, bi padişahê Asor, Salmanazarê duyim şer dikir. Salmanazar şkest. Di vî şerî da, Araratî, Mannaî, Part, Sît, Kemrî, Amerdî ... giş di bin fermandariya Mînwas, Padişahê Mannaiyan, da şerê Asor kir û Asor şikand. Ji van nivîsandinan eşkere dibe ku Part birekî Mad in, ano Kurd in, Kurtî ne. Di wan hengaman da, ji Urmiyê heya Teberistanê belav bûbûn.

Bi guhartina navê Aşkaniyan bi navê Part, ev xwehermend ji kurdbûnê dernakeve. Xwehermenda Part jî ya Kurdan e, xwehermenda Aşkaniyan jî ya Kurdan e.

Lê, Aşek bitenê bi alîkariya Partan ev xwehermend serrast ne kir. Kurd giş - Kûtî û Kurtî - li dora Aşek bûn yek û xwehermenda Selefke wenda kir, imperatoriya Kurdistan vejand (24).

## PADIŞAHIYA ARŞAKIYAN (25)

Aşek, di sala 225 B.Z. da, xwehermenda Selefke şikand û wenda kir. Xwehermenda Aşkaniyan serrast kir. Di van hengaman da Armînya satrapeke Selefkiye bû, paşê jî bû satrapa xwehermenda Aşkaniyan.

Padişahê Aşkaniyan, Mihirdadê yekim, di sala 157 B.Z. da bû Padişah, pismamê xwe Agirşak kire satrapdarê Armînya. Agirşak ku ji ezbeta Aşkaniyan bû, bajarê Erdîşê kire semîveka xwe. Pey mirina, kurê wî Arşek li şûna bavê xwe bû satrapdarê Armînya û li Erdîşê rûnişt.

Arşek di sala 132 B.Z. da bi xwehermenda Pont ra şer kir û leşkerê Pont şikiya. Kişwerê Pont kire bin destê xwe û tevî satrapa Armînya kire ferweraniyeke nû û navê xwe lê danî. Ev ferweranî bû ferweraniya Arşakiyan.

Bingehdarê vê ferwaraniya nû, Arşek, neviyê Akirşak bû. Ew jî wek pismanê xwe Mihirdad, neviyê Key Kubbadê Kurd, bû. Ano kurê Kurdan bû. Wuha ye. Ferweraniya Arşakiyan ferweraniyeke Kurd e.

## PADIŞAHIYA ERDEŞÎS

Arşek gava di sala 114 B.Z. da temen payan bû, kurê wî Erdeşîs ket ciyê bavê xwe û bû padişahê Arşakiyan. Erdeşîs padişahekî mêr û cengawer bû, bi senca (nisbet) mêraniya xwe jî, pirxwaz bû û ji heftê û du gelan ordiyekê berbihev anîbû. Ev Erdeşîs zû ji bîr kir ku ew ji ezbeta Aşkaniyan e û neviyê Key Kubbadê Kurd e. Ew rabû di nixûna Aşkaniyan da serkêşî kir, fermanşikenî kir, dirêjî xwehermenda Aşkaniyan kir, bi Aşkaniyan ra şer kir û ordiya wan şikand. Amed (Diyarbekir), Nisêbîn, Serê Kanî, Ruha ji Aşkaniyan standin. Bajarê Niseybînê ji xwe ra kire Paytext.

Çendaki bi şûnda, vê ordiya ku Erdeşîs ji heftê û du gelan, ji serserî û pêxwasan dabû hev û ku evçend ew kamwer kiribû, ku evçend bajar û kişwer jê ra vekirandibûn, di nixûna wî da serkêşî kir û padişahê xwe Erdeşîs kuşt.

## PADIŞAHIYA DIKRANÊ MEZIN

Dikranê Mezin, pey kuştina bavê xwe Erdeşîs, di sala 89 B.Z. da li Textê Arşakiyan rûnişt.

Dikran bi zavayê xwe, padişahê Pont, ra yekdestî danî. Ji vê yekdestiyê ordiyeke xurt berbihev anî, di çend şeran da kamwer bûn. Paşê dirêjî Selefke kir, paytextê wan, bajarê Antakya, vekirand.

Dikranê Mezin, pey vê kamweriyê, bi Ordiyeke Roma şerekî dijwar kir û ordiya Roma şikand.

Dikranê Mezin ku Padişahekî pir payexwaz û bêdad bû, pey van kamweriyan, payexwaziya xwe pir kir û israfa seraya xwe bêtir kir. Di ordiya Dikran da tu bend û best tu nebû. Jixwe Dîkran ordiya xwe ji



Institut kurde de Paris

hevsiyên xwe gişan, ji heftê û du gelan dabû hev. Di van deman da, ji bo ordiya Dikran wuha digotin: "Ordiyeke xurt, lê ordiyeke bê ser û bin".

Payxwaziya Dikran ewçend pêş da çûbû ku bi firazbazî û mezinayî û zordariya Romayê fêris tinazê xwe dikir. Carekê Konsulê Roma, Sokkullas, bi yazdeh hezar leşkerên xwe dirêjî ordiya Dikran a bi 150 hezar leşker kir û ordiya fêris a Dikran şikand û ji hev jend !!

Di sala 71 B.Z. da, li dora Amed ordiya Roma du caran ordiya Dikran şikand. Ordiya Roma Amed talan kir û şewitand. 10 sal pey vê şkestinê, ano di sala 61 B.Z. da, Dikranê Mezin bi Pompeyûs, fermandarê Roma, ra şerekî giran û pir bi xwîn kir û bi perîşaniyeke dijwar şkest.

Pey vê şkestinê, ferweraniya Arşakiyan pir kêm ket. Roj bi roj qelstir bû. Dawiya dawîn, ferweraniya Arşakiyan wenda bû.

Bitenê ferweraniya Arşakiyan wenda ne bû. Çawa ku em dê paşê bixwînin, Roma, Ereb, Mongol, Tatar û Tirkmen imperatoriya serfiraz a Kurdistanê da ber xwe, leyand, wenda kir. Kurdistan seraser wêran kir, herifand.

Di van hengaman da, çawa ku li hundirê kişwrê Aşkaniyan tevheviyên mezin hebûn, di navbera xanedana padişahî da jî paşimtî (reqabet), dexsî, dilnexwazî û geremolî hebûn. Roma ji vê qelsiya Aşkaniyan keys xist destê xwe, kenarê Deryayê Reş û bakurê Mêzopotamya leyand. Lê Roma bi hergavî ev kişwer di destên xwe de ne digirtin. Li van deran Aşkanî û Romanî du sed sal lîzê "satranc" dilîst. Gava di sala 226 B.Z. da Sasaniyan Kurdistan kir destê xwe û xwehermendiya Sasaniyan serrast kir, îcar ev kozîbazî di navbera Sasaniyan û Roma da dest pê kir û 400 sal dirêj kir. Paşê, bi leyandina Islam û Ereban, Sasan jî, Roma jî ciyên xwe ji Ereban ra berdan. Pey Ereban, leyiyên Mongol, Tatar, Tirk û Tirkmen li pey hev hatin.

## ŞEHRIYARIYA SASANIYAN

Bingeha Şehriyariya Sasaniyan Erdişîrê Babekî di sala 226 B.Z. da danî. Erdişîrê Babekî jî, wek Aşek, ji ezbeta Key Kubbadê Kurd e, ano Erdişîr jî, wek Aşek, Kurd e (26) û piraniya gelê wî jî, 90%, Kurd e..

Wuha ye, xwehermenda Sasaniyan jî, mîna xwehermenda Aşkaniyan, xwehermenda Kurdan e, ne ya Faris û Eceman e.

Şehriyariya Sasaniyan 422 sal bi kamwerî û firazbazî Ferweranî kir. Ji xanedana Sasaniyan 28 padîşah şehriyarî kirine. Erdişîrê Babekî, Şapûrê yekim, Hurmuzê yekim, Behramê yekim, Behramê duyim, Behramê sêyim, Tersî, Hurmuzê duyim. Şapûrê duyim, Erdişîrê duyim, Şapûrê sêyim, Behramê çarim, Yezdîgurdê yekim, Behramê pêncim "Behramê Gurr", Yezdîgurdê duyim, Hurmuzê Şeşim, Fîrûz, Pela Kubbad, Nûşîrewan, Hurmuzê çarim, Xusrewuperwîz, Sîrûye, Erdişîrê sêyim, Pûranduxt, Azramî duxt, Ferrûxzad, Zerdîgurdê sêyim.

Ji van 28 Padişahan, em dê bitenê şehriyariyên çar padişahên Bergiran binivîsînin. Çar padişahên gewretir û hêjatir ev in : Erdişîrê Babekî, Şapûrê yekim, Şapûrê duyim, Nûşîrwanê dadker (adil).

### ŞEHRIYARIYA ERDIŞÎRÊ BABEKÎ

Me li jor jî derbend (qeyd) kiribû, di 226 P.Z. da Erdişêrê Babekî ezbeta Sasaniyan serrast kir. Erdişîrê Babekî jî berî her karî li hundirê welat asayîş (emniyet) tekûz û tebût kir : di hengama şehriyariya Erduwan da, hin sergerde û tevhevker peyda bûbûn. Wî ew ji meydanê hilanîn. Paşê ji imperatorê




Nexşeya Imperatoriya Sasanî. Splendeur des Sassanides, Muzeya Qralî, Bruksel.

Institut kurde de Paris

Roma, Iskender Sêwer, xwest ku çi erdê Keyaniyan ku di gevera Asyayê da ne û îro ketine bin destê Roma divê ku Roma van ciyan giş vegerîne ji Sasaniyan ra. Û pir ne ajot, Erdişîr dirêjî Romayiyan kir. Imperator Iskender Sêwer bixwe fermandariya leşkerê xwe girt ser xwe û bi ordiyeke pir xurt li Sasaniyan wergeşt (muqabele) kir. Ordiya Sasan şkest û Mêzopotamya seraser ket destê Roma : 233 P.Z.

Erdişîr ji vê şkestinê gelek êşiya û pir li ber xwe ket, sond xwar ku tola xwe ji Roma bistîne. Erdişîr ji bo sazandina ordiyeke xurt û mezin dest bi xebtûkoşê dijwar kir. Heft sal, bê rawestan, ji bo pêkanîna ordiya xwe ji dil û can kariwer bû.

Lê çerxa felekê bişkê ! Erdişîrê Babekî ne giha miradê xwe, di sala 240 P. Z. da temen payan bû.

## ŞEHRIYARIYA ŞAPÛRÊ YEKIM

Şapûrê yekim, pey mirina bavê xwe di sala 240 P.Z. da, li ser Textê Sasaniyan rûnişt. Şapûr berî her tiştî karûbarên kişwerî, dadkerî û diravwerî çêtirandin (islah) û tekûz kirin. Paşê, ket pêşiya Ordiya xwe ku bavê wî bi xebteke germ û bê aram, di heft salan da, anîbû meydanê. Dilxwaz û armanca Şapûr ev bû : tola bavê xwe vegerîne, ordiya Roma bişkîne. Mêzopotamya û deverên ku di destê Roma da ne ji wan bistîne, welatê xwe paqij bike û tola kevnare ya bav û kalan ê Keyaniyan bistîne. Şapûr bi dilxwazeke germ û tin, bi awakî nosûr, dirêjî ordiya Roma kir.

Imperatorê Roma Gordiyan û serleşkerê wî Fîlîp bi ordiyeke pir mezin û gellek xurt li Şapûr wergeşt. Di gellek meydan-cengan da, Şapûr ordiya Roma şkand. Lê, Gordiyan bê aram ji Roma leşkerên taze anîn û umîda xwe ji karkirina cengê ne dibirî. Lê di demeke nazik a cengê da Serleşkerê Roma, Fîlîp, ji mezinê xwe ra nankorî kir, bi bedbextî Imperator Gordiyan kuşt, xwe imperator bang da û

Institut kurde de Paris



Ji hunera Sasaniyan : Padîşah Şapûr II.
Splendeur des Sassanides, Muzeya Qralî ya Brukselê.

bi dijwarî şer kir. Çi fayde ! Şapûr û ordiya Sasan, ev cengawerên Kurdan, ev çêjikên qehreman û şêran ne yên şkestinê bûn. Dawiya dawîn, leşkerên Fîlîp li ber êrîşên Kurdan xwe ranegirt, şkest, bela bela bû û Fîlîp reviya Romayê.

Şehriyarê Sasan, Şapûr, Mêzopotamya, Ibîrya, Armînya û Kapadokya, giş ji Roma bi şûnda standin. Û Şapûr bi evçend jî qîma xwe ne anî, Antakya û Hums ji Roma stand : 244 P.Z.

Şehriyarê Kurdan Şapûr bi pêdarî û xurtî ku xurê (layiq) Keyanan e, di kişwergiriya xwe da tim pêşve çû û demand (dewam) : Kilîkya (Adana) û pir ciyên Sûriya vesendin.

Pey van kamweriyên gewre û hêja yên Şapûrê fêris, di sala 260 P. Z. da, Valaryan, imperatorê Roma, xwest ku radara (manî) kişwergîriya Şapûr bibe. Loma, bi leşkerekî pir giran derbasî Asyayê bû. Şapûr ji dilxwaza Valaryan pir zû agah bûbû. Tavil, bê wendakirina bîstekê, Şapûr ordiya xwe ya amade hilanî û pêrgiya Valaryan bû. Her du neyar li deşta Ruhayê gihîştin hev. Meydancengeke pir xwînrêj û dijwar çê bû ! Ordiya Şapûr ordiya Valaryan şikand, ji hev jend, perîşan kir û Şapûr neyarê xwe Valaryan dîl girt.

Şehriyarê Kurdan Şapûr, pey vê pîrozbextiya gewre, 11 salên din jî jîndariyeke pir mezin û bextiyar derbas kir. Di sala 271 P. Z. da temen payan bû.

## ŞEHRIYARIYA ŞAPÛRÊ DUYIM

Şehriyarê Sasaniyan, Şapûrê duyim, kurê Hurmuzê duyim e. Di sala 310 P.Z. da, gava bavê wî temen payan bû, hêj ew ne hatibû cihanê. Piştî çend mehan, dema ku ji diya xwe bû, giregirên Sasanî vî şahzadeyê nazenîn bi navê Şapûrê duyim şehriyarê Sasaniyan bang kir.

Di zarotiya Şapûrê duyim da, rîsipiyên Sasanî kargerîniya imperatoriya Sasan kir. Di hengama



Institut Kurde de Paris
INSTITUT KURDE DE PARIS · BIBLIOTHÈQUE

zarotiya Şapûrê duyim da, Iraq, Mêzopotamya Ibîrya, Armînya, Kapadokya ... hemî aliyên roavayê imperatoriya Sasaniyan giş di nav tevheviyê da bûn. Ji alîkî imperatoriya Roma, ji alîkî din jî hawişên reng bi reng ev welatê bedbext wêran kiribû.

Şapûrê duyim, dema ku bû xort û celewa imperatoriya kurd kire destê xwe, di demeke hindik da sergerde û tevhevkerên ziyankar şerde û zîbade (terbiye) kirin û ji meydanê rakirin. Ordiya xwe rind karûbar kir, mestir kir. Leşkerên wî giş di bedenbazî û miqlaciyê da hunerwer bûn. Şapûr û serleşker û fermandarên wî baş baweriya xwe anîbûn ku ev ordî hempeyker, hemnîgara ordiya Keyaniyan e. Ordiya ceng û şeran e, ordiya doz û tolan e.

Şapûrê duyim, Şapûrê lawîn, dê îcar Roman ji axa Kurdistanê bike der û Roman ji niştimanê Kurdan biqewirîne. Êdî roja hejmardanê hatibû. Şapûr êdî bi Roman ra hejmardaniyê dê bikira.

Şapûr cara pêşîn bi Roman ra di hêşiyên Çiyayê Şengalê da şer kir. Di êrîşa pêşîn da ordiya Roma pêdarî ne kir, ji ber Kurdan reviya. Şapûr heya Nisêbînê da pey Ordiya Roma, Nisêbîn dorpêç kir. Di hengama dorpêçê da, Imperatorê Romayê, Kostantînê duyim, bixwe bi ordiyeke giran derbasî derya bû û hat gaziya Nisêbînê. Kostantîn bi Şapûr ra çend şerên mezin çê kirin, ji van şeran tu derjê (netîce) ne ket destê wî, paşpaşkî vegeriya Romayê. Lê pey Kostantîn, imperatorekî din, Imperatorê nû Yolyanos, bi ordiyeke hîn mestir derbasî Asyayê bû. Bi Tudmur û bi Erebên dora wê ra yekdestî danî û xwe hîn xurtir kir. Di şerên destpêkê da, ordiya Şapûr heya Mûsilê xwe bi şûnda kişand. Lê, Şapûr ev paşpaşkî bi hozanî û konetî çêkirin. Şapûr bi pevçûn û xerpişkên cî cî û biçûk bi neyarê xwe ra çîtlîskî dikir û bi vî awayî dem û gav kar dikirin. Şapûr ji van şepan (*) behremend dibû û li ciyên dûr ên pêşanî yên cengê leşkerine taze berbihev dianîn û amadeyê şer dikirin.

Institut kurde de Paris


Institut kurde de Paris

Ol û hunera Sasaniyan : nimêjgeheke zerdeştî ku tê de agir dihat dadan. Splendeur des Sassanides, Muzeya Qralî, Bruksel
Di dîroka hendesê de, ev cara pêşîn bû ku avahî çarkoşe û li ser wê qubbeke gilover dihat çêkirin. Piştî Sasaniyan, Filleyên Yûnanî (Bîzans) dêrên xwe û Erebên Misilman mizgeftên xwe bi vî stîlî ava kirin.

Gava ku Şapûr ev leşkerên xwe yên nû û taze tekûz û tebût kirin, ew anîn meydana cengê. Yolyanos gijotiya (wexamet) paşhatiya xwe rind nas kir, aşîtî xwest. Her du şehriyar, Şapûr û Yolyanos, li hev hatin. Nisêbîn ma ji Sasaniyan ra, Diyarbekir bû ya Roma. Lê pir ne ajot, şer ji nû da dest pê kir. Şapûr direjî Diyarbekir kir, vekirand, şewitand û talan kir.

Di van demand da, imparatoriya Roma bû du tîş : imparatoriya Roma ya Roava û imparatoriya Rohilat. Imparatoriya Rohilat li ber devê geliyê Bosforê (Istanbul Boğazı) bajarek ava kir, navê wî kir Konstantinopl (Istanbûl) û ew bû paytextê vê imparatoriya nû. Paşîkê, vê imparatoriyê navê xwe kire imparatoriya Bîzans û ji imparatorên wê ra jî digotin Qeyserê Rom "ûrum".

Şehriyarê Sasan, Şapûrê duyim, gava Diyarbekir vekirand, li Istanbûlê Qeyserê Rûm rûniştibû. Û îcar dora êrîş û şerê Qeyserê Rûm bû. Qeyserê Bîzans, Qeyserê Istanbûlê, bi sed hezaran leşker ve, bi ordiyeke giran ve derbasî derya bû û riya Amed da ber xwe, ber bi Kurdistanê hat. Pêşdarên Kurdan ji mêj ve ji van tevger û gertevan haydar bûbûn û şehriyarê xwe agah kiribû.

Şapûr tavil têgihîşt ku nêrû (quwwet)ên Qeyserê ûrim ji yên wî gellek caran pirtir in, bi wan ra pêsîr bi pêsîr şer nabe. Divê bi konevaniya leşkerî, bi hostatiya stratêjî û taktîkan şer bike. Jixwe berî çend salan Şapûr leşkerên sedhezaran ên imparator Yolyanos bi hunerweriya leşkerî, bi pisporiya stratêjî şikandibû, perîşan kiribû û Nisêbîn û Diyarbekir jê standibûn.

Îcar dora Qeyserê ûrim e : Şapûr piraniya nêruyên xwe, bingeha ordiya xwe ber bi jêr şand. Sed hezar leşkerê Şapûr hêdî hêdî ber bi jêr bûn, bê lez û bê west riya Medayinê girt. Şapûr bi çend hezar siwarên miqlac û çerxîbaz, gurz li ser milan, şûr li nav piştan, li pêşberê sed hezaran leşker û pehlewanên Qeyser ên ûrim rawestiya.

Institut Kurde de Paris

Şapûr, neviyê Zal û Rustem, çêjikê Key Kubbadê Kurd, Key Aksar, Kûrişê Mezin û Key Behmen bi çend hezar siwarên xwe yên bijare, bi gurz û şûran, bi rim û tîran û bi kemendan karûbarkirî, her roj berî rohilat, berî sipîtala sibê, wek baz û êloyan direjî refên kevok û kewan dikir, êrîş dibir ser siwar û peyayên Qeyserê ûrim. Van sedhezaran leşkerên ûrim ji hev tîşûtîş dikir. Ji ûriman pir kuşt, pir jî birîndar kir. Ji Kurdan jî yekayek kuştî çê dibûn, yek birîndar jî dibûn. Ma ev ne şer û ceng e ? Di şer û cengan da, kî guh li kuştî û birîndaran dide ?

Ev çend hezar siwarên bijare û padîşahê wan Şapûrê qehreman û çend fermandarên gernas ên yegane di nav xwe da dor kir, şer û ceng sar ne dikir, her roj ji sibê heya êvarê dikuşt û şer dikir. 50 roj bi vî awayî pevçûn û xîrpişkên xwe sar ne kirin. 50 roj ji sipîtayiya sibê heya tarîtiya êvarê, bi gurz û riman, bi şûr û tîran û bi kemendan, diajotin ser cengawerên Qeyserê ûrim, bîn ne dida wan, ew diwestandin, diêşandin, birîn dikirin û dikuştin.

Rojekê, serê sibê pir zû, hêj ku tarîtiya şevê ne çûbû, Kurdên ingirî, wek gurên dev bi xwîn ên meha Sibatê, şebxwîn bir ser neyarê xwe : carna li dora neyarên xwe zîz dibûn, carna wek pîj û xenceran di nîvê germîçanka wan da diçikiyan, ev leşkerên sed hezaran tîştişî dikirin, ji hev dijendin, tu bîn û asûdegî ne didan wan.

Her sibe, Şapûr û çend hezar bijareyên wî bi rohilat ra, bi tîrêjên tava sibê ra, berên xwe didan rojê û ji Xudan û Yezdan û Hurmuz ra spas dikir.

Şapûr, ku hergav di pêşiya siwarên xwe da, gurzên şahane di destan da, wek piling û şêran diqûriya û direjî neyaran dikir, dikopand û dikuşt, ji siwarên xwe ra şop, rê û rêçan vekirin. Hêj birîn ne bûbû, geware (durusten) bû. Ji siwarên wî yên bijare jî kuştî û birîndar kêm bûn ! Spas ji Hurmuz ra !!

Ev cenga Şapûran e, ev cenga mêran û şêran e. Bi vî rengî, bi vî babetî 50 roj ajot.

Di van 50 rojan da, Şapûr û bijarên wî ji alîkî ceng û pevçûn dikirin, ji alîkî jî ber bi Medayin dişemitîn: deşta Diyarbekir ji zû da berdabûn, Nisêbîn û Mûsil bi şûnda hiştibûn, nêzîkî Medayin dibûn. Sê rojên karwanî jê dûr bûn.

Xwejber 50 rojên ku ordiya Şapûr jê cuda bûbû, berê xwe dabû Medayinê, padîşahê xwe, fermandarê xwe yê gewre bê peyam ne dihişt. Padîşah her roj ji bûniş û gerteva ordiya xwe agahdar bû. Her roj nûçe û peyman didan û distendin. Şapûr her roj bi birîde (poste)yan ferman û rêwerz (talimat)ên xwe ji ordiya xwe ra dişandin. Ordî jî bi xwezişa (mûcib) fermana Şapûr di nêzîkayiya Medayin da deverên stratêjîk digirtin û livger (hareket)a taktîkî ya xwe jî bi dilxwazî berbihev dianî.

Şapûr, gava sê rojên karwanî nêzîkî Medayin bû, bi xwezişa buxuşjimar û taktîka xwe êdî diva bû ku lîza xwe ya dawîn bilîze : wê sibê, wek her rojan, bi sipîtayiya rojê ra, Şapûr dîsa da pêşiya siwarên xwe yên bijare û êrîş bire Ûriman. Siwarên Qeyserê ûrim wê rojê ji her rojan bêtir şer dikir û tu şop û rê ne didan Şapûr. Şapûr ev tişt kire behane û berê siwarên xwe serbijêr kir û ber bi Medayin reviya. Ûrim got qey Şapûr şikiya, tirsiya û bi rastî reviya. Qeyserê Bîzansê bi hezaran siwarên xwe va da dû van revokan.

Şapûr reva xwe sar ne kir. Bi yek bînê ajot Medayinê. Şapûr û siwarên wî yên bijare ji Ûriman pir dûr ketibûn. Qeyserê Ûriman bi hezaran siwarên xwe va ketibû pey Şapûr.

Ji wî tirê ew dê Şapûr û siwarên wî yên bijare bi hêsanî dîl bigre. Lê, Şapûr û siwarên wî yên bijare wek baz û başbaşikan difiriyan, wek xezalan bi çindikan baz didan û wan zû, pir zû, xwe gihand Medayinê.

Ordiya Şapûr ciyên stratêjîk girtibûn, bendewarên



Institut kurde de Paris

neyarên xwe, bi werzanî û gerwerziyan (manewra) kariwer bûn.

Şapûr û siwarên wî yên bijare gava ku gihîştin Medayinê, ew û hespên wan bê tab û tûvan bûn. Riya sê rojên karwanî, bê xwarin û bê razan di bîhnekê da hatibûn. Hezaran kes baz dan, hatin pêşiya van mêrxasan û pehlewanan. Tavil zîn ji hespan kirin, bi naz û niwaziş û mizdan li dora hespan geriyan, xweydana wan pak û paqij kir, li pêşiya wan ka û ceh û nefel tijî kirin. Şehriyarê gewre, qehremanê yekta û siwarên wî yên bijare û gurz, kop û şûrhingêv rext û çek û kinc ji xwe kirin, bi ava germ şa bûn û bi destê nazenîn û nermîn ew şuştin, miz dan û niwazîxandin, kincine nû û paqij li wan kirin, ew bi goşt û xwarin û nan û çeşniyan têr kirin û giş xistin nav nivînên germ û nerm, di xewa şêrîn ve kirin.

Qeyser û hezaran siwar û sed hezaran leşkerên wî dabûn ser pişta şehriyarên Kurdan û siwarên wî yên bijare. Lê Qeyserê ûrim siwarên Kurdan zû ji ber çavan wenda kirin. hespên vana wek hespên ji bê bûn, mîna refê çivîkan zûka ji ber çavan wenda bûn. Qeyserê ûrim bi zor di roja çaran da li pêş Medayinê xuyanî kir. Deşt û Newal û Mesîl bi leşkerên Qeyser tijî bûbûn. Lê roşîmana (hal) Qeyser û leşkerên wî ne tu roşîman bû : ji riya dirêj êşiya bûn, westiya bûn, kêmxew bûn, nîvtêr û' nîvbirsî bûn.

Şapûrê stratêj, Şapûrê qehreman û miqlac û pehlewan bi siwarên xwe yên bijare û dilîr û mêrxas, bi fermandarê yekta û bêheval têr razabûn, têr xwaribûn, west û êşa 50 rojî ji bîr kiribûn, bûbûn ter û taze, xurt û zîwer û çeleng.

Du roj bû, Şapûr bi serleşker û fermandarên xwe va li pêşanîceng, li nav leşker digeriya, bi xebtûkoşên cengê kariwer dibû.

Me berê dîtibû, Şapûrê duyim pir caran ordiyên imparatorên Roma çawa şikandibûn û çawa ji hev

Institut kurde de Paris



Ji hunera Sasaniyan : firaqek ji zîv : di nîvê wî de tawûsek û li dora wî jinên muzîsyen.
Splendeur des Sassanides, Muzeya Qralî, Bruksel.

Institut kurde de Paris

jendibûn. Şapûr îcar jî ev bobelat anîn serê Qeyserê ûrim : ordiya Qeyserê Bîzans a ku gihîştibû dora Medayinê pir bê tab û derbeder û perîşan bû. Şapûr jixwe ji bo vî tiştî 50 roj koşiyabû. Şapûr pir qenc ponijîbû, gellek qenc buxûşa xwe kiribû. Şapûrê pehlewan 50 roj xwe û can û rewanê xwe û çend hezar siwarên xwe ji bo vê demê heba kirin. Şapûr bi gutlek siwarên bijare 50 roj şerê sed hezaran leşker kiribû. Dawiya dawîn plan û xapên Şapûr meywedar bûn. Şapûr gihîşt dilxwaza xwe, neyarê xwe xist tora xwe.

Şapûr ji Qeyser ra bîn û dem û şep ne dan. Bi leşkerê xwe yê ter û taze û jînde êrîşeke dijwar bire ser sedhezaran leşkerên Qeyser. Êrîşên han ji êrîşên şêran, şepalan, pilingan û boxan dijwartir bûn. Ev şerê xwînrêj pir dirêj ne kir. Leşkerê Qeyser bi hezaran kuştî û birîndar û dîl dan û ji hev belabû. Qeyser reviya, bi zor xwe gihande Istanbûlê.

## ŞEHRIYARIYA NÛŞÎRWANÊ (ADIL)

Nûşîrwan, şehriyarê Sasaniyan, padîşahê bîstim ê Sasaniyan e. Nûşîrwan hêjatir û pirfiraztirê padîşahên Sasaniyan e.

Nûşîrwan di sala 531 P.Z. da li ser textê Kurdistanê rûnişt. Ji mirina wî heya îro, ano heya sala 1972, 1372 sal derbas bûne. Gel vê yekê, dadkeriya wî û comerdiya wî destanê her zimanî ye.

Nûşîrwan çiçend bi dadkerî û comerdî û enzanperweriya xwe bi navûdeng e, ewçend jî bi kişwer û bajargeriya xwe jî bi navûdeng e.

Nûşîrwan bi ûriman, bi Tirkan, bi Hindiyan û bi hemsiyên xwe yên din ra pir şer kiriye. Pîrozbext û kamwer bûye û bi vêrastî şayesteyê bernavê "Mezin" bûye.

Nûşîrwan Şam, Ambar, Qafqasya vekirandine, sînorên xwe ji Hindistan, Tirkistan heya kenarê Deryayê Sipî fireh kirine.

Institut kurde de Paris

Di sala 562 P.Z. da, Qeyserê Istanbûlê Yustiyanos ordiyeke giran hilanî, ji derya derbas bû û êrîşî ordiya Nûşîrwan kir. Lê, di destpêka şer da ordiya Qeyser şikiya, ji binî da wenda bû. Qeyserê ûrim neçar bû ji bo pêncî sal, 30.000 zêr di salê da, bac bide Nûşîrwan. Nûşîrwanê Adil di sala 579 P.Z. da ronakrewan bû.

Gewremerd "wezîr"ê Nûşîrwan, Buzurcumhûr, bilindkesek bû. Hozan, hoşîmend û pir karsaz û karaşîna bû. Dema xwe bi Nûşîrwan ra derbas kir û di van kamweriyên navdar da xudan pare, homan jê xweş be.

Di hengama Nûşîrwanê Mezin û dadmend "Adil" û gewremerd "wezîr"ê wî Buzurcumhûr da, Kurdistan bi şehrevanî, bi nêrûmendiya xwe navûdeng dabû, mezinatiya Imparatoriya Kurdistan di wan deman da digihîşt felekan.

Sasaniyan ji rojên bertir sînorên xwe li aliyê rohilat û li aliyê bakur gihandibûn sînorên hengama Keyaniyan. Ev sînor bi gellek kamwerî di destên xwe da digirtin. Lê, li aliyê roava xwehermendeke nû ya Roma peyda bûbû. Di van deman da xurtirê xwehermendên cihanê Roma bû. Sasaniyan û Roma her gav di şer û ceng û xerpişandinê da bûn. Ev her du xwehermendên mezin Jorjiya, Armînya, Pont, Kapadokya, Lîdya, Mêzopotamya nikaribûn di navbera xwe da par bikin.

Carna ordiyên Sasaniyan xurttir derdiketin û Roma heya Deryayê Reş diajot û ev kişwer giş jê digirtin, dikirin bin destê xwe. Carna jî berovaj Roma xurttir derdiket, ev kişwer distandin.

Gel vê yekê, xwehermenda Sasaniyan di pir deman da ji çiyayên Qefqasan heya Yemen, Anadol, Sûriya, Filistîn û Misr vekirandibûn. Di vê Imparatoriya Mezin da şahînşahî dikir. Gava Islam derket meydanê, dawiya van şer û keşmekeşan hat. Kurd û Roma ji hev geriyan. Meydan ma ji Islamê ra !! Emperyalîzma **Ereban ev welat giş kirin bin lingên xwe.**

Di hengama Yezdîgurdê şeşim da, di 652 P.Z. da, Xelîfeyê duyim ê Islamê, Omer Ibn Xettab, di bin fermandariya Se'd Ibn Ebî Weqqas da, ordiyek şand ser Sasaniyan. Vê ordiya Ereban dirêjî Sasaniyan kir. Li navbera Sasaniyan û Ereban du şerên dijwar çê bûn : Qadisiye û Nehawend. Ordiya Yezdîgurdê bedbext di her du şeran da jî şkest û perîşan bû.

Ereb Imparatoriya Kurdistanê giş leyand û da ber xwe. Welatê giranbiha û şêrîn û hirazbaz ê Kûtî û Kurtî û Perîsan ket bin destê Ereban !

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## KURDISTAN DI HENGAMA LEYANDINA EREBAN DA

Omer Ibn Xettab, Xelîfeyê duyim ê Islamê, di sala 15 ya Koçbariya Pêxember da, ano di sala 637 P.Z. da, di bin fermandariya Se'd Ebî Weqqas da, ordiyek şand ser xwehermenda Sasaniyan. Di navbera Sasaniyan û Ereban da du şerên giran çê bûn : şerê Qadisiye û şerê Nihawend. Di van her du şeran da jî leşkerên Sasaniyan şkestin û perîşan bûn !

Xwehermenda Sasaniyan, pey van her du şeran, bicarek wenda bû. Padîşahê Sasaniyan Yezdîgurd hat kuştin. Pey perîşaniya ordiya Yezdîgurd, ji Parisan tukes îcar jî xwe ne da pêş û bi Ereban ra şer ne kir. Carek din jî di nuxûna Ereban da mêrên Ecem dest hilanî, dilopek ji xwîna xwe ne rijand, tavil bû, Islam (27) û "eger xahî selamet der kenar est", ano "eger tu rehayî (rehetî) dixwazî, li kenarê rûnê", got û li quncikê rûniştin.

Lê Kurd, ku movika pişta xwehermenda Sasaniyan bûn û ji 90%ê gelê Sasanê bûn, sî sal bi Ereban ra şerine dijwar kirin. Belê, gava Paris û Ecem li mala xwe rûniştibûn û bi tizbî û nimêjan kariwer bûn, Kurdan sî sal bihn ne da xwe, koşiyan, xerpişîn, ceng kir, wek çeman xwîna xwe rêt.

Bi rastî, şerê Kurdan bi Ereban ra pir dirêj kir. Li pêş Ereban sê sed sal pêdarî kir. Di hengama Ebbasiyan da jî Kurd du sed sal cî, cî şer kir.

### ŞERÊN ŞEHREZOR Û PAWE

Pey şkestina ordiya Yezdîgurd, di imparatoriya Sasaniyan da cengine yeman, li Şehrezor û Pawe, çê bûn. Xelîfeyê duyim, Omer Ibn Xettab, di sala

Institut Kurde de Paris

18 ya Koçbariya Pêxember da, ano di 640 P.Z. da, ji nûva du ordî şandin ser Kurdan - Ecem û Paris islam bûbûn, li mala xwe rûniştibûn - loma ev her du ordiyên Ereban ji bo Kurdan şandin. Ordiya yekim a Ereban di bin fermandariya Imam Hesen, Hazîqe î Yemanî Qasêm Ibn Ebbas, Ebd Ibn Muttelib bû. Ordiya duyim a Ereban bi fermandariya Abdullah Ibn Omer, Ebû Ubeyd El Ansarî bû.

Ordiya yekim dê biçûya ser Kermanşah, Hemedan, Rê, Mazenderan. Ordiya duyim jî dê biçûya ser Şehrezor û Pawe.

Ev her du ordiyên Ereban, gava gihîştin Kurdistanê, cengawerên Kurdan ên pêkhatî li hemberê xwe dîtin.

Çend cengên giran û xwînrêj çê bûn. Di destpêkê da Kurdan berra Ereban dan, fermandarê wan, Ebû Ubeyd, li meydana şer hat kuştin.

Lê, Kurd paşê li her alî şikiyan û perîşan bûn. Gava ku Ereban bicarek serdestî li Kurdan kir, rahişt bextreşî û bêdadî, bobelatine mezin anîn serê Kurdan. Zerdeştîbûna Kurdan ji Ereban ra bû behaneke baş. Hertiştê Kurdan - can, dast (mal), namûs - ji Ereban ra fêhil (helal) û herwe bûbû. Pîr û ciwan bilêc kirin, bajar, bajarok û gund şewitandin. Welatê Kurdan seraser wêran kir, dastê Kurdan giş - jîndar û ne jîndar - talan kir : jin, keç û zaro tevde wek kerî û garanan dan ber xwe û birin. Wan tiştên dilxiras, kirêt û çepel li Şehrezor û li Pawe ji her alî dijwartir kirin (27).

Fermandarê Ereban, Abdullah Ibn Omer, li ser xwestin û fermana Xelîfe Omer Ibn Xettab, li dora Pawe avadaniyên fireh çê kirin. Hezaran keç û bûkên nazenîn û dawpaqij û xudan namûs li van avadaniyan tije kirin. Paşê, li bin serdarî û çavnêriya Meaz Ibn Cebel, Erebên bedewî dianîn teniştên van keç û bûkên Kurdan û dixistin paşilên nazenînan, **keçperî û keçxezalan !!**

**Ev dezgehên rûreşî yên Omer Ibn Xettab, ev çepeli-**

Institut kurde de Paris

yên bê şermî, bi salan ajot. Ji vê genîtiya dilşewat, bi hezaran zaroyên "bêjî" çê bûn ! Ji van bedbextan êl û ezbet hatin meydanê. Îro, êl û ezbetên van bedbextan li Pawe û li heldorên Pawe cî girtine û jîndariyê dikin û ji "dureh" û "bêjî"bûna xwe şermsar in. Îro jî ji bo dadkeriya xurû ya Omer Ibn Xettabê paqij û pakrewan û pakpeykeriya wî ra nehrevanên candar in !!

Ev cenawurî û xwînxwarî û gengemarî û çepeliyên pûrtgij û mejîderwerger (hercûmerc) bi daxwaz û fermanên Omer Ibn Xettab çê dibûn. Wî ji Medînê ferman û bernave dişandin ! Belê, kirdekarê evçend dujûnî û kirêtî Omer Ibn Xettab bixwe bû ! Ev Omer Ibn Xettabê navdayî bi dadkerî, rastgerî, dilovanî û mihrivanî !!

Omer Ibn Xettab evçend cenawurî, xwînrêjî û genîwerî ji bo firaziya Yezdanê pak û dilovan, ji bo mezinayiya Xuda, Xudayê tean, kir ! Mirarkerên (canî) wek Hulakû bixwe mêrkujî û xwînrêjî dikirin, lê dest ne diavêt dawpaqijan, xudan namûs ên ferîşteran. Xelîfeyê duyim, Omer Ibn Xettab, ji herkesî çêtir li sûda (mana) Qur'anê agah bû. Wî zanibû Islam ola Ereban e. Loma ji bo belavkirina wê ne dikoşiya. Omer xwîn dirijand, mêrxas bilêc dikirin, ezbet vedimirandin, emperyalîzma Ereban serrast dikir !!

Deverên ku hêzên Ereban ne dikaribûn xwe bigihînine, ne tê da bin, her cî, ciyên din ên Kurdistanê ku hespên wan lê dibeziyan, tu cenawurî û kirêtî bi şûnda ne hişt. Bêdadkerî, xwînrêjî û genîweriyên Ereban bi sedsalan direj kirin. Nemaza ji bo belavkirina ola Islamê, ji zimanê Ereban pêve tu zimanekî din ne hişt. Ji hezaran salan di vî kişwerî da, di Kurdistana mezin da, di Kurdistana hengama Iskenderê Makdonî da, ji Hindistan ta Sûriya, kurdî zimanê gişkî bû (28). Lê Parisî, Efganî, Masajêt ... jî hebûn. Axaftina van zimanan giş nadar kir. Kî ji zimanê Ereban pêva bi zimanekî din bipeyiviya, bi cawbir (meqes) zimanê wî bedbextî, bê dilovanî, diçirpand.

Institut kurde de Paris

Nivîswarên dîrokên kevnare, nemaza nivîswarên kevnare yên Ereban, ev cenawurî û çepelî dûr û dirêj nivîsandine.

Pir muxabin ! Îro welatên misilman, mîna Pakistan, Efganistan, Îran, Tirkiye, Erebistan ..., giş bûne peşinxwanên Ereban. Di nivîswarên xwe da, di rojnave û kovar û pelikên xwe da, ev vêrastên dîrokî û ev serhatiyên dilxepêr û dilsûz pir bi kul nanivîsînin ! Nivîsandina van maf û vêrastan nadar dikin ! Ji bo vê ye ku ji 1400 sal virde bobelat û sosretên dilgijok ên mejîhej ku hatine serê Kurdê belengaz tukes jê agah ne bûye. Tukes nizane ji bo bilindiya navê Xwedê, ji bo ola Muhammed, ji bo ola Islamê çi rûreşî, çi şermsarî, çi cenawurî anîne serê Kurdê perkende.

Em dikarin wuha bêjin : hin gernasên dîrokzan û dîroknivîs hene ku ji van rastiyên ku me bi kurtebirî nivîsandin, ji wan ne haydar in, ne dîtine û ne xwendine !!!

Xweşber (tebiî), fermeriyên Ecem, Ereb û Tirk, ev her sê Imparatoriyên xwînmijên Kurdan, ji bo feşirandin (xeniqandin) û wendakirina Kurdan ling kutane û wehirandine (israr kirine). Rastiya dîrokê bê perwa vedişêrin û, wek di hengama destpêka Islamê da jî, di nixûna Kurdan da her celeb stemkerî rewa dibînin û, ji bo veşartina van stemkeriyên cangudaz ji ber çavên cihanê, çi ji destê wan bê dirix nakin.

## KURDISTAN DI HENGAMA EMEWÎ Û EBBASIYAN DA

### MÊRXASIYA "EBA MUSLIM"Ê XORESANÎ

Pey Omer Ibn Xettab, di sala 646 P.Z. da, Osman Ibn Effan bû Xelîfeyê Islamê. Di xebtûkarê xwe da, çewtî çêkir. Kesên Medînê ew kuşt.

Pey Osman Ibn Effan, ji bo bijartina xelîfekî nû, di navbera Ereban da pevçûn û tevheviyên dijwar çê bûn. Dawiya dawîn, Meawiye Ibn Ebî Sufyan bi xap

Institut kurde de Paris

û fûtan berra paşimtê xwe, Elî Ibn Ebî Talib, da û bû xelîfeyê çarim ê islaman, li Şamê, di 661 da, gihîşt payeya Xelîfetiyê.

Ezbeta Meawiye paşê navê xwe kir Xilafeta "Emewiye". Emewiyan 89 sal xelîfetî kir. Di sala 759 da dawiya wan hat.

Çawa ku di hengama xelîfe Omer da ji Kurd û Paris û biyaniyan giş ra stemkerî û bêdadî dikir, xelîfeyên Emewiyan jî tu kêmanî ne xist, tu mirdarî û çepelî ji Kurdan ra dirix ne kirin.

Emperyalîzma Emewiyan 89 sal bi dijwarî û bi noyîtî dirêj kir. Emewiyan, çawa ku ji Kurd û Paris ra zebûnkerî û şikencdariyên nedîtî û celeb celeb kirin, wusan jî ji kur û neviyên Elî Ibn Ebî Talib ra jî dikir. Loma, ev her du berên hemderd û hemneyar gihîştin hev û bûn yekdest. Digel givaj û şikenceyên bê awa yên Emewiyan, Kurd û Paris û ezbeta Elî di nixûna wan da xebtûkoşek zor dikir.

Ezbeta Elî Basra û Kûfe ji xwe ra kiribûn sernîvek. Lê heldorên Basra û Kûfa olrêya (mezheb) şîîtî û elewîtiyê rast kiribû. Kurdan û Parisan jî ji vê berberîtiya Ereban fesal xist destên xwe û Partiyên konevanî sazandin (tesîs kirin) û dilreşiya gişkî li Emewiyan gurr kir, agirê kînê geş kir ...

Roja ronayiyê, roja Eba Muslimê Xoresanî. Xelîfeyên Emewiyan zor dabûn bêdadiyên xwe, cenawurî û mirdarkeriya xwe. Roj bi roj zorkeriyên xwe notir dikirin. Jixwe. bilêcvaniya xwe carê sar ne kiribû. Lê, ji nişkava, bextruyê xwe ji Emewiyan zîvirand û çerxa felekê ji bo wan çep geriya !

Xweşmêrek, mêrxasek derket meydanê ! Eba Muslimê Xoresanî, Kurdê niştimanparêz ê yekta ! Pehlewanê çargurçik xuya bû !

Eba Muslimê Xoresanî ji Kurdên Xoresanê ye (30). Di sala 749 P.Z. da, li bajarê Merû ala rizgariyê rakir. Armanca wî azadiya gel bû. Dixwest ku renckêşan ji bêdadiyên Xelîfeyên Emewiyan reha bike !



Institut kurde de Paris

Gelê Kurd giş, bi Parisan, bi Erebên şiî û Elewiyan, li bin ala Eba Muslimê Xoresanî civiyan. Ji Xoresan heya Mûsil, Kurd bicarek hevaltiya wî kir.

Eba Muslimê Xoresanî ordiyeke gewre saz kir : berbihev, rapêçayî, bi bend û best serrast kir û direjî Emewiyan kir, leşkerên Emewiyan şikand, ji Xoresan heya Mûsil kir bin destê xwe. Paşê, Eba Muslimê Xoresanî bi Xelîfê Emewiyan ê dawîn, Xelîfe Merwan, ra cengeke mezin li dora Mûsilê kir, ordiya xelîfê jî ji hev jend û belabela kir. Merwan reviya Filistînê. Elî Ibn Ebdullah bi ordiyekê kete pey Merwan û li Filistînê Merwan kuşt, ordiya wî ji hev xist. Di van şeran da, yên ku pir alîkariya Eba Muslimê Xoresanî kiribû, yek jê Elî Ibn Ebdullah, apê Xelîfeyê nû, bû.

Merwan, Xelîfeyê Emewiyan, hat kuştin. Ordiya wî bela bû. Îcar dor hat bijartina xelîfekî nû : ji neviyên hezretî Elî, Ebû Ebbas Ibn Ebdullah kir Xelîfeyê Islamê. Navê xanedana wî kir Ebbasî û xelîfetiya Ebû Ebbas li çarmedoran bang kir.

Pey van gertevên bergiran û kujdil, Xelîfeyê nû ji bo kuştina Emewiyan futû da. Li Şam, Filistîn, Sûriya, Iraq û Kurdistan bi hezaran Emewî kuştin ! Ter û hişk bi hev ra şewitîn : tola Elî, Hesen û Huseyn vegerand.

Di sala 750 P.Z. da, bi mêrxasî û camêriya Eba Muslimê Xoresanî şehriyariya Emewiyan hat herifandin. Li ciyê xwehermenda Emewiyan xwehermenda Ebbasiyan hat danîn.

Germîçanka Ebbasiyan bû Iraq. Bexdad ji xwe ra kir paytext. Di hengama Ebbasiyan da, hişkbaweriya (teassub) Ereban dest bi sistbûnê kir. Kurd û Paris û hawişên din hinek azadî dît û bihna wan fireh bû. Êdî bi axaftina kurdî û parisî zimaê kesî ne diçirpand. Gel vê yekê, hişkbaweriya Islamê bicarek ji meydanê ranebûbû. Ev marê heft serî yê hişkbaweriyê di xew da bû. Carna ji nû da hişyar dibû û dora xwe jardadayî dikir. Nemaza di Kurdistana



Institut kurde de Paris

navîn da, li Suleymaniye û Erbîlê, cardin xelîfeyên Bexdê pir xwîna Kurd rijand. Li van doran hinek Zerdeştî mabûn. Erebên xwînxwar ev bê gunehan tevde kuştin.

Digel van gertevên cenawurî û çepelî, Kurd, Kurdên islamkirî, pir caran digihîştin payeyên bilind û dibûn destûrmend (sahibî imtiyaz) di seraya Xelîfê da. Di ordiyên wî da gelek gewremerd, fermandar, serek û serkanên Kurd hebûn. Ji van payeyên bilind pêva, di erdê fireh ê Kurdistanê da, bê jimar mîrî çêbûn. Ev mîriyên Kurdan bûn xudan kel û burc û baruyan. Paşê, Kurd padîşahî, şahî û şahînşahî jî anîn meydanê.

## PADÎŞAHIYA MÎRÊN KURDAN DI HENGAMA EBBASIYAN DA

Padîşahiyên ku di hengama Ebbasiyan û pey wan da serrast bûbûn, bi rêzên demên sazimaniyên wan, em dê yek bi yek ji we ra binivîsînin :

Di hengama Ebbasiyan da, heft Padîşahên Kurdan hatin. Em dê berê du dîrokçeyên van heft padîşahan binivîsînin; paşê jî, em dê mîriyên Kurdan pêş we bikin.

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

## DÎROKÊN HEFT PADÎŞAHIYÊN KURDAN DI HENGAMA EBBASIYAN DA

1- Padîşahiya Lorê Mezin di sala 922 P.Z. da bingeha xwe danî. Ereb di sala 652 da Kurdistan leyandibû. Pey leyandina Ereban 170 sal derbas bûbû ku cara pêşîn Kurdên Lorê Mezin serxwebûna xwe ji Ereban bi zora darê xwe stand.

Ev xanedan, ano xanedana Fedlewî, 500 sal bi serxwebûniyeke tumî padîşahî kir. Ji vê xanedanê 35 padîşah hatin.

2- Padîşahiya Axşadiyan :

Padîşahiya Axşadiyan di 993 P.Z. da li Şamê serrast

bû. Li Sûriya û li Misrê 40 sal padîşahî kir. Ji vê xanedanê 4 padîşah rabûn.

3- Padîşahiya Dîlemiyan-Peweye :

Elî Imad El Dewle ji Kurdên Dîlem e. Li Bexdê, di sala 940 da, bingeha padîşahiya Peweye-Dîlemiyan danî.

Ji bo padîşahiya xanedana Peweye, dîrokzanê osmanî, Sedrî Azam Haqqî Paşa, di nivîswara xwe da, "Ibrahim Hakki Tarihi", derpêç 7, rûpel 6, 22, 24 da dinivîsîne : "Di hengama Xelîfe Mustafî Bîllah, di 334-338 Hicrî da, Meaz El Dewle Ibn Ebû Şuca' yê Peweye leşker kişand ser Bexdê, şer kir û Bexda bi zora şûrê xwe vekirand û gihîşte payeya Emîr El Umera. Payeya Emîr El Umera sedsalek li ba xanedana Peweye, ano li ba padîşahiyeke serxwebûnê, ma".

Meaz El Dewle bi standina Bexdê hertiştî kir ê xwehermendê : leşkerî, kişwerî, kenzedarî û her tişt gihîşte destê Meaz El Dewle; ji bo xelîfetan tu çare û fer (taqet) ne ma. Xelîfe bes xutbe dixwend û li mizgeftê dida pêşiyê, di ayinan da dibû mezinê olê. Bi vî awayî xanedana Peweye li Îran û li Iraqê heya hatina Selçûkiyan padîşahî kir.

4- Pdîşahiya Hesnewiyan :

Ereban pey Islamê Kurdistan leyandibû. Hesnewî kurê Huseyn ku yek ji mezinên Şehrezorê bû di sala 981 da ala azadî û serxwebûnê bilind kir. Xelîfeyê Bexdê ordî şandin ser Hesnewiyan, lê Hesnewî her çar ordiyên Xelîfê Bexdê şikandin û ji hev jendin.

Hesnewiyan bingeha padîşahiya xwe di sala 981 P.Z. da li kişwerên Demar û Şehrezorê danî. 141 sal di vî kişwerî da bi kamwerî û bi dadkerî padîşahî kir. Paşê Tatar hatin, li şopa xwe tu avayî ne hişt, talan û wêran kir. Padîşahiya Hesnewiyan wenda kir. Ji Hesnewiyan 11 padîşah rabûne.

5- Padîşahiya Merwaniyan :

Ehmed kurê Merwan (Nasir El Dewle) di sala 1009 P.Z. da li Amed (Diyarbekir) Padîşahiya Merwaniyan serrast kir. Vî Padîşahî 52 sal bi serxwebûnî padîşahî kir. 80 sal temendirêj bû. Di seraya xwe da hergav 366 nazenîn xwedî kirin. Her 366 dîlber jî xweşdeng û sazende bûn.

Ji vê xadenadê 5 padîşah rabûn : Ehmedê Merwan, Nasirê Ehmed, Seîdê Nasir, Mensûrê Nasir. Padîşahiya Merwaniyan 91 sal ajot.

6- Padîşahiya Eyyûbiyan :

Şahê şahan, Selaheddînê Eyyûbî, qehremanê şerên Xaçparêzan, di sala 1177 P.Z. da bingeha şahînşahiya Eyyûbî ya Kurd danî. Kurdistan, Ermînya, Sûriya, Misr û Yemen di bin destê Eyyûbiyan da bû. Şahînşahiya Eyyûbiyan 305 sal ajot.

150 sal berî şahînşahiya Selaheddîn fileyên Awrûpa Quds vekirandibû, Filistîn seraser standibû, padîşahiyeke mesîhî di nîvê Islamê da serrast kiribû. Heya ber deriyê Şamê dirêj dikir, dora Heleb û Hums keleşî û nejdivanî dikirin. Dilxwaza Qralê Qudsê û siwarên wî eşkere bû : Sûriya û Msr bistînin û di nîvê Islamê da imparatoriyeke mesîhî serrast bikin.

Lê Salaheddînê qehreman, Selaheddînê kurd hat ! Nigaşa (xeyal) qralê Qudsê ne çû serî ! Selaheddînê kurd ê pehlewan bi salan şerê heft padîşahên Awrûpa kir, ordiyên her heftan jî şikandin !! Selaheddîn bû "Pîrozbext" û serfiraz !

Pey nivîsandina van çend rêzan ji dîroka Selaheddîn ku engîza (sebeb) firazweriya (ihtişam) Islamê, nemaza ya gelê kurd e, em dikin hinek zanînên dîrokî yên pejilandî (mufassal) jî binivîsînin.

Ji bo ku em vê dilxwaza xwe bi awakî qenc û durust bibin serî, me gellek nivîswarên (kitab) dîrokê yên ku di gihaja (heqqê) Selaheddîn da

Institut kurde de Paris



Selaheddînê Eyyûbî

Institut kurde de Paris

hatine nivîsandin xwendin : bi kurdî, tirkî, farisî, erebî, fransizî û ingilîzî.

Me ji nav van çend nivîswaran a dîrokzanê fransiz, Albert Champdor, pêşirand (tercîh kir).

Mîrza Albert CHAMPDOR li ser cengên Selaheddîn û Xaçparêzan û li ser xuy û wafirên (exlaq) berguzîn (mumtaz) ên Selaheddîn û di gihaja jîn û tevgerên wî yên vîjetî (xusûsî) da û li ser nêrûmendiyên (menaqib) gûrîbaş û bilind ên wî zanînên pir pejilandî nivîsîne. Bi xwendina nivîswara Mîrza Albert Champdor baş eşkere dibe ku ew fillekî olparêz e û katolîkekî hişkbawer e. Gel vê yekê, Mîrza Albert hîç dudilî (tereddud) ne xistiye nivîswara xwe ya 350 rûpelî, bi nêrûmendiyên berguzîn û bi wafirên bilind ên Selaheddîn tije kiriye.

Tiştekî din ê hêja jî heye : Mîrza Albert Champdor ji bo nivîswara xwe navekî bercuste (mustesna) lê kiriye : navê nivîswara xwe kiriye "Saladin, le plus pur héros de l'Islam", ano "Selaheddîn, xurûtirê (safîtir) qehremanên Islamê". Yekî din jî : di derpêça nivîswarê da, bi tîpên girs ev peveka (cumle) ha nivîsandiye : "Saladin, après Mahomed, la plus haute figure de l'Islam".

"Saladin", nivîswara Albert Champdor, rûpel 32 :

"Hengamekî (dewr) tije bi şan û firazwerî (şeref) dest pê dike. Ji îro pêda navê Melik Nasir guherî, bû "Selaheddînê Mezin". Selaheddîn di şepên (firset) bi fesal û bi endiz (munasib) da xurtî û zoraweriyeke mezin kire dest, û ji cihanê ra aşkart ku ew kare gellek kisse (mesail) û gertevên pir zor û bergiran bibe serî; û ew xwehermendkesekî (şexsiyeta dewlet) yekta ye û bi nejadekî derberz (fewqelade) hatiye aferandin".

"Heya wê rojê Selaheddîn ji rêgeha cengaweriyê ra tu berxwarî nîşan ne dabû, heya ewçend ku di geştecenga Misrê da, ji bo ku hevaltiya mamê xwe Şêrkuh bike, mamê wî bênev (mecbûr) bûbû ku ji Selaheddîn ra zordarî û şûrgivajî nîşan bide. Ji bo

Institut Kurde de Paris

Selaheddîn çêtir û xweştir ew bû ku di aram (sukûnet) û aştiyê da bi kisseyên zanişolî (ilmê dînî) û bi zanişmendiyê kariwer (meşxûl) bibe û neçe şeran, di meydana ceng û pehlewaniyê da çerxbazî neke. Lê, paşê xuya bû ku ew di kargerîniya werzişan (umûr) da serdarekî derberz e û gêndişwe-rekî (şexsiyet) bercuste (mustesna) ye".

"Selaheddîn bi baldarî û pêdarî (sebat) xwe girêda xebtûkoşên pir bergiran (muhim). Wî armanc û riya xwe bi awakî xuyadar û aşkaftî didît : olriya (mezheb) sunnî di Misrê da bi cî bike, herkesî bi pitik û pitik li rêdarê (qanûn) serfirû bike, bê wendakirina yek duyik (saniye) Xaçparêzan bişkênîne, xurtiya gêndîşa xwe û ya ezbeta xwe sazdar bike, ji bo avayiya welêt konevaniyeke kişwerî (mulkî) serrast bike".

"Li bin penaha Selaheddîn misilmanî dê bigihîje gûrîpaşiyeke (geşbûn) nûjen".

Rûpel 42, 43 :

"Qralê Bîzansê ji Qralê Qudsê ra 220 perçe keştîceng (gemiyên herbê) dan. Qralê Qudsê bi van keştiyan tavil dest bi xebatê kir. Bajarê Dimyatê ku kilîta pehnava Nîl e, dorpêç kir (muhasere). Dorpêça Dimyatê pênc roj ajot. Lê, Xaçparêzan tu havil ne kir. Selaheddîn ji bo Dimyatê çêtirên leşkerê xwe , lekên Kurdan, bi cî kiribûn. Dorpêçkiriyên Dimyatê bitenê bi herwandina (aqîm) xebatên Firingan qîma xwe ne anî, bi şev û roj ji Firingan ra bîn ne dida, ew diwestandin, keviravêjên (mencenîq) dêwasa ku ji Yewnanistanê anîbûn şewitandin".

"Xaçparêzan ku dilîrî (cesaret) û mêraniya xwe wunda kiribûn bêjgotina (muzakere) aştiyê xwest. Li dawiya bêjgotê ziyancengeke (tezmînatê herbiye) giran da, Misr vala kir û çûn".

"Selaheddîn ji van serhatiyan bi serfirazî û bilindî derket".

"Ew rewana parastina Dimyatê bû. Neyarên wî yên hundirî dixwest ji par ra li wî xin. Lê Selaheddîn

Institut kurde de Paris

bi carekê Misr ji destê wan reha (xelas) kir".

Rûpel 46 :

"Selaheddîn gava sî û pênc salî bû, li ser textê şehriyariyê rûnişt û malbata Eyyûbiyan anî meydanê. Êdî xwîneke nû, xwîna Kurd li Islamê ferweranî (hukum) dikir.

Selaheddîn bi tevbûna dîrokê dê biaşkirîne ku ew hêja û şayeste (layiq) ye û di temaşagehê da dê roleke mezin bilîze.

Ferweriyên (hukûmet) Latînî yên Rojhilatê di pêş xwe da dê konevanekî hunerwer (mahîr) û ronak bibînin. Ji vir pêda, di hemberî xwe da ferweranên rojhilatê naçîz û nehêja û ji sûdişa dîrokê ra ku bi bedid (wedî'e) di destê wan da ê ne agah ew dê ne bibin".

Rûpel 48 :

"Pey tevheviyên ku bi kêketin û qelsiya xanedana Fatimiyan li Qahirê çê bûn û pey birçîtî û tîbûnê, pey wergerkên (inqilab) ku serheng (qumandan) û gerceng (zabit) li pey hev disazandin, pey zorbatî û stemkariyên hergav, pey tevdanên noker û nazenînan li hundirê serayê, Selaheddîn hat.

Selaheddîn bi dilxwaziya xwe ya qenc, di demeke hindik da, tiştên ku bi tevgerên çepel û çewt û xwar ên xelîfeyên Fatimiyan hatibûn meydanê nûvandin û çêtirandin, pojnên çelq û tund ên gel nermijandin û neşimandin (tehwîn), bawermendî da dara û tuwangeran, bazirganî haland (teşwîq) û xurt kir, medrese û xwendegehên nû vekirin, ji bo ewlemendî, aştî, asûdegî û asayişa paytext pir baldarî kir, ji bo vê yekê hindikek dudilî (tereddud) ne kir, tu endiz (tedbîr) û çare şûnda ne hiştin.

Misr bi sîdariya Selaheddîn, Mîrê xwe yê nû, gihîşte jîneke candar û teze û bextiyariyeke bê pîvan û meywedar.

Ev kamweriyên (muweffeqiyet) han di pêçpelxaneyên (defterxane) Misrê da bi navbilindî nivîsandî ne".

Institut kurde de Paris

Rûpel 11 :

Bi vî awayî Misr li bin fermandariya bingehdar (muessis) a Eyyûbiyan a ronak hengameke dirêj û pir gûrîpaş vejiya : li kişwerê Misrê seraser aştî û asayiş cî girt, zanişmend bûn xudan rûmet û çare, û meydana koşişiyê peyda kir. Pîşewerî (senet) û spehpîşe (fennîcemîl) bi azadeiyeke vêrast (heqîqî) bişkivîn û lezûbez pêşve çûn. Xebtûkoşa bazirganî ji nû da dest pê kir, sermiyan û bermeyweyên (mehsûlat) biyaniyan bi firawanî (pir) hatin Misrê.

Di hengama xelîfeyê Fatimî El Edîdê bêkêr û ne hêja da, ji ruyên keşmekeşên civatî û ji vajferwerî (anarşî), ji tunebûn û birçîtî, ji bêdadî û stemkarî (zulm), Misr ku hebûna wê hatibû kujarişê (tehlike) demeke firawanî û gumrehî û şadimanî ajot".

Rûpel 77 :

"Selaheddîn ji bo pezirandina şehriyariya Şamê tu lezandin nîşan ne dida. Wî ne dixwest ku dilxwaza wî ya wergerandina kurê Nûreddîn (parastvanê wî yê kevn) di nav kesan da dengîn bibe. Wî diçêtirand (tercih dikir) ku pezirandina şehriyariya Şamê jê bê niyaz û hêvî kirin. Bi ravajişên (israr) germûsûr (pir xurt) ên hevalbendên xwe yên Şamê ber bi Sûriya bi rê ket.

Selaheddîn bi heft sed siwarên Kurd Qahirê berda. Ji bo ku dej (kele) û barû (birc) û singerên (şato) dora Sinayê bazresîne (teftîş), berê xwe da tengava (mîna, xelîc) Aqebê.

Bê serêşanî ji navberên giloreyên (post) Firingan û ji pehnava Aqaba derbas bû û di sala 1174 da, roja Sêşembê, di 27 Çiriya Paşîn da ji navberên kesên ku hêj wê gavê jê ra bi çavê qehremaniyê dinihêrt, bi çepik û lîlişan derbas bû, kete Şamê".

Rûpel 81 :

"Dema ku Selaheddîn bi Kurdên xwe va li pêş Helebê xuya bû, bajar di nav avayî, gumrehî û firewaniyê da bû. Wêranezarê ku Tirk di nav pêncî salan da têx kiribûn, ji meydanê rabûbû".

Institut kurde de Paris

Rûpel 92 :

"Selaheddîn payîzê vegeriya Misrê, di nepeydeya xwe da birayê xwe Tûranşah li Sûriya danî şûna xwe.

Selaheddîn avayîsazê gewre, kar û xebtên ku berê çend salan li Qahirê dest pê kiribûn rahişte payankirina (intac) wan.

Tuwandarî û xurtiya (quwet û qudret) Eyyûbî, ku bingehdarê wî yê pêşîn Selaheddîn e, di dîroka Islamê da hengameke nû vekir : darayî û hebûna xwe ya berdest danî peykandinê (mewqî û tetbîq) û di meydana ceng û leşkeriyê da gihîşte kamwerî û pîrozbextî, Xaçparêz şkandin û "Erdê pirfiraz" (muqeddes) ji destê Xaşparêzan rizgar kir.

Di spehpîşeyê da, di avayîsaziyê (mîmarî) da, peyker (saql) û nigarên (neqş) nûjen û pirxeml nûvandin (îcad kir). Ji bo wundakirina rêola (mezheb) şîîtiyê, mîna dej û baruyan, xwendegeh û xaneqah serrast kirin. Van avadaniyên han, ku di konevaniyê da roline mezin dilîst, ewçend navûdeng da ku Prensên Qahirê di navberên xwe da, ji bo lêkirina van avadaniyan, ji hev ra paşimtî dikir. Bi vî awayî bajarê Qahirê bi avadaniyên gewre û xweşhevisandî xemilî.

Selaheddîn bi sernavê xwe dirav da kopandin (derb). Li ser diravan vîneya (sûret, resim) Sultan nigarkirî (menqûş) bû, Sultan li ser Text, bi çarmêrgî xuya dibû.

Selaheddîn, gava sî û neh salî bû, li Qahirê gihîşte şan û payeyên pirî hevraz û bilind. Gava, cara pêşîn, Selaheddîn hate Qahirê, tukes ew nas ne dikir".

Rûpel 93 :

"Rûpen, Qralê Ermenistana Piçûk, çend deverên Padîşahê Konyayê vesandibûn (zabt). Kiliç Arslan, Padîşahê Konyê, ji bo qewirandina van leyandkeran (mustewlî), ji welatê xwe alîkariya Selaheddîn niyaz kiribû. Selaheddîn ku di konevaniyê da huner-

Institut kurde de Paris

wer e, şandina ordiyeke bitenê ser jimara xwe, li ser qralê Ermeniyan çêtirand. Ev qralê Ermeniyan bi alîkarîkirina Xaçparêzên Awrûpayiyan xudan sûc bû.

Selaheddîn kişwerê Rûpen leyand û pelixand, paytextê wî dorpêç kir û bi êrîşê vekirand (feth), talan kir û bazarîşa (muşarete) xwe ya aştiyê bi zorê da pezirandin. Rûpen erdê ku stendibû - bivê nevê - vegerand û bi ser da ziyancengî sencand (te'yîd).

Padîşahê Qonya ji Selaheddîn ra pir spas kirin û ji Selaheddîn gellek niyaz kir ku ji bo bergaftina (hellî mesaîl) neliheviyên di navbera Ferweranên (hukumdar) Islam ên biçûk ên van doran da bibe Ferwerde (hekem).

Ji vir pêda, ji bo ku aştiya hergaye û gişkî paydar bibe, parastvaniya bilind a Selaheddîn ji aliyê gişî Ferweranan hat pezirandin. Bi vî awayî, li Anadolê çi kisseyên ku ji bo yekîtiya Islamê karibin ziyandar bibin bi "Ferweriya Yeganetî" ya Selaheddîn bên encamdan.

Qenc xuya bû ku êdî Selaheddîn dê xwe bispêre van mîrên Islamê û Heleb, Şam û Qahirê; û ji vir bi şûnda bi hunerwerî û agahî konevaniyeke pir mezin bilîze.

Selaheddîn di sala 1180 da, li kenarê Ferêt, nêzîkî Crablusê, bi hin ferweran û mîran ra peymaneya (mu'ahede) dostanî girêda. Ev peymane ji aliyê van mîrên jêrîn hat navişandin (imza) : Padîşahê Konyayê, Kılıç Arslan; Ferweranên Şengal, Erbelan, Mêrdîn û Diyarbekir; Fermandarê Sipahên Mezin û Qralê Ermenistana Biçûk Rûpen III ku Kurd ew vê paşiyê şikandibû.

Ji bo şan û firazweriya vê aştiya gişkî, êl û hawişên Mêzopotamya beran û kavir ser jê kirin û nan danîn û govend û dîlan gerandin, cêjn û şadmaniyeke zor kirin.

Selaheddîn, pey ku lekên xwe perwendin (izn da), vegeriya Misrê. Weşbestan, ji bo xelat û comerdiya

vî siwarê herasawer ê Xudê, destan dinivîsandin, pesn û aferîn dixwendin".

Rûpel 131 :

"Selaheddîn ferweranê Mûsilê, Izeddîn, li bajarê Mûsilê dorpêç kiribû. Selaheddîn, di dema dorpêçê da, nexweş ket. Bijîşên wî jê ra şîret kir ku biçe Herranê (Urfa), çima ku Herran bi rindî û paqijiya xwe binavûdeng e.

Selaheddîn di nivîna bîmareyê da bê tabûtûwan razabû. Ferweranê Mûsilê Izeddîn encumenek şand Herranê, ji bo ku bi Selaheddîn ra "bêjgoya aştî" bikin.

Selaheddîn guh ne da bîmariya xwe. Zordestî li bîmariya xwe kir, encumenê Izeddîn pezirand dîwana xwe. Li şîpanderê mirinê li aştiyê qîma xwe anî. Lê bi Izeddîn aştiyeke wusan çêkir ku goya Izeddîn, mîna dîlekî bi zincîran girêdayî, di bin destê wî da girtî ye. Ji Izeddîn paytextê Kurdistan û Mêzopotamyê stend. Di vî kişwerî da Ferweraniya Eyyûbiyan pê da nas kirin. Rojên Înê "Xutbe" bi navê Selaheddîn dê bihata xwendin".

Rûpel 146, 147 :

"Gewretira Kamweriya Islamê li hemberî Xaçparêzan, Hattîn :

Xelîfe, cînişte (wekîl) Peyxember, di nixûna Xaçparêzan da koşişceng (cihad) bang dabû. Loma, li Sûriyayê şadmaniyeke zor çê dibû. Tûde giş di gewz û şadiyê da pûyan bûbû. Erebên koçer ji her alî dikişiyan ber bi Filistînê. Weşbestên (*) Ereban war bi war, kon bi kon digeriyan, ev gertev û peyxamên bergiran li çar nikarên Erebistanê belav dikirin.

Selaheddîn leşkerên xwe yên rêzanwer (nizamî) li bin fermandariya birayê xwe Melik Efdel, li bakurê Hewranê, di nehê Adarê da, di sala 1187 da civand. Melik Efdel ji birayê xwe ferman girtibû ku ji bo geştecengeke (sefer) dirêj xwariş (erzaq) û çekan bide hev. Ev amandişên (hazirî) ku li Şamê çê bûn

li Qudsê deng da. Qralê Qudsê, Guy de Lusignan, dest pê kir bi şorindên (we'iz) homanwer (mubarek) û bi qayîşkêşê xwe, Comte de Tripoli, li hev hat. Bi piraniya dengê gel, leşkerên xwe li Galîlê civandin. Li deşta Sofarê 2.000 siwar û 18.000 peya gihandine hev.

Di vê geştecenga Firingan ku bi lezûbez hat çê kirin da tiştek heye ku divê em di bîra xwe da bihêlin : li bajarên Filistînê û keleyên wan ji jin û zarûk pêva tukes ne ma bû. Belê, Qralê Qudsê kare biangişîne (iddi'a) ku wî li Sofarê bergirantira ordiyên Xaçparêzan daye hev. Lê, eger Kurdê kişwergîr (fatih) kamwer bibe û Qralê Qudsê bişkîne, paşê li ser riya Selaheddîn kî dê şer bike? Qralê Qudsê giş gertevên ku karibûn bên pêşiya wan ne dîtibûn. Servehata (muqedderat) filleyên gûrîpaş û gumrehên Rohilatê di yek meydancengê da lîztin tu caran rêt (efû) nabe".

Rûpel 148 :

"Selaheddîn berî ku rahêle fermandariya sipahê xwe, bi hin paşimtên xwe va dostanî girêdabû : bi Qralê Antakya, Bohêmon, ra, bi riya konevanî li hev hatibû, dostanî girêdabû. Bi vî awayî, sînorê bakurê Sûriyê xistibû bin ewlemendiyê. Loma, Selaheddîn karibû, bitenê, bi gertevên Filistînê karwer bibe.

Selaheddîn di sala 1187 da, di meha Gulanê da, li rohilatê Teberiyê, li dora kaniyên Astara şergeha xwe danî. Li vir, li benda "leşkerên alîkar" (ihtiyat), ên ku ji Mêzopotamya û ji Misrê dê bihatana, bû. Ev leşkerên alîkar li bin fermandariyên Mîrên bijare yên rohilatê bûn. Gava ev leşker hatin û li ser hev civiyan, Selaheddîn ew bazres (teftîş) kirin. Ev bazrese çiçend firazbaz (muhteşem) û gûrîpaş (geş) bû ! Çav dibilbisandin, dil xur û şadan dikirin!

Dîrokzan El Imad vê alayişa leşkerî (resmi geçit) bi vî awayî dinivîsîne : "Deşt û çiya bi piraniya

Institut kurde de Paris

siwarên Yezdan hatibûn niximandin. Şergeha me bi kîlometran dirêj dibû. Şêst hezar leşker di şevekê da li bin ba û bager, bazres bûn".

Rûpel 149 :

"Selaheddîn şeva 26/27ê Hezîranê li Xifînê derbas kir. Paşê, ji bo pênc rojan, şergeha xwe rakir û bir, li deşta Teberiyê danî. Li 30ê Hezîranê, roja Sêşembê, ji bo ku li Teberiyê, bajarê şanfiraz, karibe xweş temaşa bike, li ser girekî bilind bi cî bû.

Selaheddîn, di yek deme (saet) da, Teberiyê vekirand. Leşkerên wî bajar talan kir û şewitand. Gava gûriya agir bajêr da ber xwe, Selaheddîn êrîşên beyhûde li kelê dikirin. Jina ferweranê bajêr, Raymond de Tripoli, qedxena (mudafaa) kelê dikir, radestkirina (teslîm) kelê ne pezirand û dizîka merivek şand ba Qralê Qudsê û jê lezûbez gazî xwest.

Xaçparêzan li ser kaniyên Sofarê 20.000 leşker civandibûn. Qral, gava peyxama şewatê şûnawerê Teberiye bihîst, encumeneke bergeştmendan (muşawir) civand.

Bêjgoya (muzakere) wê encumenê pir dirêj û pir bi hengeme bûbû. Paşê, dengên encumenê bûn du cî, nemaza Raymond de Chatillon û Gérard de Ridefort dixwest tavil dirêjî serê misilmanên ku agir berdane Teberiyê bikin. Lê, Raymond de Tripoli pir hoşwer (maqûl) diponijî û got : "Divê di kelakela germa havînê da em dora kaniyên avê bernedin, xwe navêjin beyabanên bejavê, xwe ji tînan nekujin !".

Qral ku kêmmeram (irade) bû, ne karîbû wehrişekê (qerar) bide. Paşê, qral wehrişa xwe da ku li ber avê bisekine. Lê, nîvê şevê serekên ordiyê hatin çarderê Qral û ew qîmand (iqna' kir) ku serê sibê zû dirêjî islaman bikin. Ev serek bûn engîza (sebeb) wendabûna ordiya Xaçparêzan bi destê Selaheddîn".



Institut kurde de Paris

Rûpel 152 :

"Çend deme (saet) bi şûnda, bi rohilat ra ordiya Fillan serê kaniyên Sofarê berda, bi rê ketin û berê xwe da mirinê.

Selaheddîn bi dorpêçkirina kela Teberiye fillan dizorandin ku kanî û çêrên Sofarê berdin û ber bi wî bên; û ji alîkî din jî riya gola Teberiyê ji wan digirt û ew dikişandin erdekî hişk û bê dilopek av. Di yekê Temûzê da, du ordî hatin hemberê hev. Selaheddîn gava dît ku qralê Xaçparêzan, ji bo cengê, tê ciyê ku wî bijartiye, ji dilşabûna xwe wuha qêr kir : "Xudê wan dispêre destê min". Sibetirê, kopişa (musademe) pêşîn li Lîbya çê bû, ji serekaniyên Sofarê neh mîl dûrtir. Her du alî jî ji hev ra dilovanî ne dikir.

Behaeddîn ji bo vî şerî wuha dinivîsîne : "Di dîrokên jîlên pêşiyên me da, cengên wek vê rojê tu caran ne hatine dîtin".

Şev hat, herkes çek bi dest, di şergeha xwe da kire sibe. Bûnişa (hal) fillan dibû bûnişeke dijwar û dilkuj, meriv û hesp dest pê kiribû li berketina tîbûnê.

Rojeke germ û bi tîn û kizroke bû. Heyişa avê dikira biqede. Sibetirê bi rohilatê umîdeke fillan mabû : ji navbera misilmanan buhurek vekin û benda dijwar a misilmanan bişkînin. Lê, di vê dojeya sîlik û tavê da, leşkerên Selaheddîn ku li ber rexê avê gewza xwe dikir, şep (firset) ne dane wan. Vê rojê seraser fille di nav ewrên axpîngan da û li pey hev êrîş birin misilmanan.

Behaeddîn ewha dinivîsîne : "Xudê dilê gawuran bi tirs û herasê tije dikir".

Ordiya Firingan ji çar alî ketibû nav çenberê. Ev çenber bê dilovanî, ji berêva teng dibû. Selaheddîn hêj gişî sipahê xwe ne avêtibû meydanê, êrîşa mezin hiştibû ta ku neyarê wî ji tînan bicarekê bêtab bikeve.

Institut kurde de Paris

Tîravêjên Selaheddîn carna germiçanka neyarê xwe, carna hêlekên neyarên xwe, didan ber tîran. Tîravêjên hunerwer ên Selaheddîn ziyankariyên hovnak (mexîf) çê dikirin. Firing xurtî û mêraniya xwe wenda kirin. Lekekî Firingan xwest ku bireve, giş hatin hûr kirin. "Berşûrmayiyên" ordiya gûrîpaş a Firingan bi awakî pejmurde hilkişiyan serê girê Hittînê. Qralê Qudsê xwest ku li leşkerê xwe bendûbest bide. Lê beyhûde !

Guzîdetirên leşkerên wî bawermendiyên xwe wenda kirin, bîr ne dibir ku di vî girî da - ku ew hildikişin - dê bêne dorpêç kirin û giş ji tînan, ji birçûnan û ji german dê bimirin.

Filleyên bedbext dest pê kiribû îşkenceyên tîbûnê bikişînin, ev tîbûna ku mejiyê meriv çelq dike û ber çavê meriv reş dike.

Îşev ji fillan hindik kes xew kir, çima ku Selaheddîn heya sipîtayiya sibê ew di tirs û herasê da hiştin.

Paşiya paşîn, roja çarê Temuzê, sala 1187 ku ji gişî filletiyê ra rojeke reş û şîndar bû hilat.

Sultan, ji bo ku dirêjî fillan bike, li benda ba bû, bayê kizrok ku ji aliyê Teberiyê tê. Gava ku ba rabû, giya û istiriyên ku ruyê erdê girtibû, agir berdanê û şewitandin. Şewat zûka girê Hattînê girt. Imadeddînê dîrokzan ewha dinivîsîne : "Fille, ku sê xudanên wan hene gihîştin sê agiran : ê ezmên, ê erd û ê birînê".

30.000 leşkerên Firingan li girê Hettînê wenda bûn. Selaheddîn çardera (çadir) xwe di nîvê meydana cengê da kutta. Mezinên dîl ên cengê jê ra Qralê Qudsê Guy de Lusignan, de Giblet, du Boutron, de Maraclée, Ofroi de Toron, de Montfferat, Guillaume III û Renaud de Chatillon anîn.

Selaheddîn ev sendin çardera xwe. Li serê çardera wî alek daçikandî bû. Li ser alê bu sîmên zêrîn ev nivîsandin dihat xuya kirin : Selaheddîn, şahînşahê

Institut kurde de Paris

şahînşahan, kişwergîrê kişwergîran, wek her kesî beniyê Xudê ye û li benda mirinê ye.

Selaheddîn qralê bedbext bi firazbazî pezirand, li aliyê xwe yê rastê da rûniştandin, ew niwazt (tesellî), dilê wî xweş kir, pê ra dest bi peyvê kir, jê ra ava tezî, berfa çiyayê Hemrînê, gulav û xweşav peşvekirin. Qral çend qurt vexwarin, paşê piyale dirêjî Renaud de Chatillon kir. Tavil Selaheddîn ji wergeşk ra wuha got : "Ji Qral ra bibêje, ji vî mêrikî ra ew av dide, ez nadim". Selaheddîn vegeriya, berê xwe da Renaud de Chatillon û bi dengekî tûj û hişk lê qêriya : "Te pir caran sond xwar û paşê te peymanşkenî kir; te gotina xwe da, lê tu li ser gotina xwe ne ma. Ji çavnetêrî û ji diravparêziya xwe te pir caran di nîvê aştiyê da peymannav çirandin, sond û gotinan ji bîr kirin". Selaheddîn, pey van pirsan, li ruyê Renaud de Chatillon awirne tûj da û qêr kir : "Xudê, ku ji stemkeran dadê belengazan distîne, tu xistî nav lepê min, Prensê nebekar ! Di nav aştiyê da, bêdadî, stemkerî û zorbatiyên ku te li islaman dikirin bîne bîra xwe ! Çêr û dijûnên ku te li Peyxemberê me dikirin bîne bîra xwe ! Xudê nefrînan li te bike ! Paşiyên gişan, tiştne kirêt ku ji bo Meke û Medîne te xistibûn mejikê xwe bîne bîra xwe ! Ji bo evçend mirarkerî û gendgemariya te, divê sezayê te ez bi destê xwe bidim û sonda xwe bînim cî ! Ev rast e! Ev dadkerî ye ! Min sond xwaribû, ez bi destê xwe te bikujim !".

Selaheddîn şûrê xwe kişand û kopek daweşand li Renaud de Chatillon û milê wî ji laşê wî cuda kir, anî xwarê. Çend efserên (zabit) ku li dîwanê amade bûn li bin lingê Qral - ku ji tirsan dilerizî - Renaud de Chatillonê birîndar kuşt û cendekê wî avêt dervayê çarderê. Selaheddîn di cî da berê xwe da qralê ku ji serê xwe ditirsiya û jê ra got : "Qralek qralekî nakuje. Ev meriv ji endazeyê nebekarî û bêbextî, ji zû da bider kiribû. Loma min bi vî awayî sezayê wî da".



Institut Kurde de Paris

Rûpel 175 - 180 : Vekirandina Quds :

"Di sala 583 Hicrî da û di 16ê hîva Recebê da, ano di sala 1187 Mîladî, 20ê Eylûnê da, li pey meydancenga xwînrêj a Hettînê, Selaheddîn li pêşberê bajarê Qudsê xuya bû û tavil bajêr dorpêç kir. Ev gertev ji bo Islamê bû hengameke ne ya jibîrkirinê. Baliyan d'Ibellin, qedxendarê (mudafî) Qudsê bû. Selaheddîn ji fillan ra radestkirina (teslîm) bajêr û bêjgoya (muzakere) serbê (muqedderat) a tûde pêşirand (teklîf) û bazarişne (şert) sivik û hoşwer (maqûl) li pêş wan kirin û ji wan ra got : "min ji bo bilindayiya navê Xudê evçend bajar vekirandin. Lê min bacên giran li wan bar ne kirin. Min tu stemkarî li wan ne kir, ji bo Qudsê ez dê çêtir û nermtir bibim. Ez dê qîma xwe bi 30.000 zêr bînim û filleyên ku li hundirê bajêr in di çûna xwe û di mana xwe da dê serbest bin".

Baron û keşeyên Qudsê dil ne dikir li hev bên. Wan dixwest Kurd bixapînin, zexelî lê bikin û çend dem û rojan behredar (muteneffî) bibin.

Ew pir umîdwar bûn ku di nêzîkan da leşkerên dilîr ên Awrupayî bi zinarvejan (menceniq) û bi "bombard"an, bi keştiyên Cinevîzan li kenarên deryayê Lubnanê dê xuyanî bibin. Wan pêşirandişên (teklîf) Selaheddîn ji xwe ra bêrûmetî difamand û digot : "Bajarê ku Xudanê me tê da miriye, çawa radestê Selaheddîn bikin ? Em vê cîgeha pirfiraz û yezdanî çawan bifiroşin ?".

Selaheddîn enirî û ji wan ra got : "Hûn dê nefrînan li serhişkiya xwe bikin û, pir najo, hûn dê xwe bavêjin bextê min. Ez dê di çend rojan da bikevim hundirê Qudsê. Lê, wê gavê, ez dê çi bêjim ji hevalên xwe yên pîrozbext ra ? Ev hevalên min ên bajargîr dê bînin bîra xwe ku di sala 492 ya hicrî da we çi anîbû serê islaman. Ez dê çawa karibim nehêlim ku hevalên min heyfa xwe ji filleyên Qudsê venegerînin ? Baş bînin bîra xwe ! We li hundirê Mescid El Aqsa da 70.000 islam ser jê

kirin; û cardin bînin bîra xwe ku di sala 398 da Xelîfeyê Misrê yê Fatimî hilweşandina tirba Îsa ferm kir û di hundirê wê da çi hûrmûr hebû da talan kirin. Û cardin tiştên kirêt û çepel ku dîtin û bihîstina wan dilan pir diêşîne, ku we anî serê Islamê, bînin bîra xwe !".

Filleyên Qudsê bazarên sivik ên Selaheddîn ne pezirandin û vegeriyan ciyên xwe. Selaheddîn ji nû da bi awakî xurtir û zortir rahişte dorpêça Qudsê. Bi keviravêjan cî cî bedenê Qudsê herifand. Roja dehê ya dorpêçê Baliyan d'Ibellin korpoşman xwe avêt torûbextê Selaheddîn.

Selaheddîn ku xweşxuy, xweşwafir bû duruştî û tundî jê pir dûr bûn. Ji bo ku Qudsê ji bobelat û wêrankeriya cengê rizgar bike xwîna beyhûde ne dirijand, jin û zarûk û bêguneh li ber lingan ne dipelaxtin, bi fermanadarê Qudsê, Baliyan d'Ibellin II li hev hat. Bazarên lihevhatinê ev bûn : filleyên Qudsê ji bo kirîna azadiya xwe, mêr deh dînar, jin pênc dînar û zaro jî du dînaran dê bidin, 20.000 bêçîz (feqîr) jî tiştekî sivik, 30.000 "êku", dê bidin.

Di sala 1187 da, li duduyê Çiriya Pêşîn, gava li Bexdê Xelîfe Nûriddîn, Imparatorê Rohilatê Issac l'Ange, Imparatorê Roavayê Frederic Barberousse, Qralê Fransa Philippe d'Auguste, Qralê Ingilîz Henri II şehriyarî dikir, Selaheddîn berê nimêja nîvro kela Qudsê vekirand.

Şadimaniya islaman pir mezin bû : dawer (qazî), mafdad (hakim), weşbest (şair), derwerş û naçîzan ji bo pîroziya şehriyarê gewre û navdar ji çar aliyên cihanê baz dida, dihatin.

Rûpel 182 :

Li Qudsê, ji darayî û dastûsamanên (serwet) ku ketin destê islamê û radestê Selaheddîn : zêr, zîv, gewher, pûrên (eşya) giranbuha, tu par ji vê gewerzê

Institut Kurde de Paris

(serwet) ji xwe ra ne bir. Gişî vê dastûsamanê di navbera kesên ku li Qudsê pê ra hevaltî kiribû : leşker, serleşker, dawer ... li wan par ve kir. Di gellek şepan da, ji belengaztirên fillan ra nermayî û neşmînî nîşan da, ji sivikkirina bûnişên wan ên nuh ra li çare digeriya. Bîmarên ku di bîmargehan da dihatin derman kirin û xwedî kirin, ferman da ku ew di nexweşxanan da bên hiştin. Dêra "Saint-Sépulcre" ji Ûriman û ji filleyên Sûriyê ra hişt. Bi fermana wî û ya birayê wî Adil, 1.500 filleyên bêçiz ji dana bac reha bûn.

Gava ku fille Quds dihişt û diçûn, ji bo ku li wan tu stemkerî çênebe, Selaheddîn li her alî ji birleşkeran ra pasvan bi cî kiribûn. Bi vî awayî, dixwest radar (manî) bike ku tukes li tola kevn negerre û tu filleyî neêşîne. Selaheddîn merivên xwe dizorandin, dixwest ku pey kamwerî (muweffeqiyet) û serdestî, li neyarên dîl dilovanî û nermayî nîşan bidin. Selaheddîn di cengê da bilindrewanî ferman dikir.

Evçend endazên (tedbîr) dûrendişî stendin ku fille bi ewlemendî û bê serêşanî ji Qudsê

derkevin. Paşê, ji deriyê Dawûd pêva deriyên din ên Qudsê dan girtin. Karwana nuxûnbextan (mexlûb) ji ber Selaheddîn derbas bû. Di pêşiya gişan da Patrick Heraclius xuya bû. Pey wî kesên din hatin.

Patrick hin hûrûpûrên giranbiha yên dêrê bi xwe ra dibirin. Dîrokzan El Imad Sultan hişyar kir û got : "Ev hûrûpûrên giranbiha bi peymannave divê gihajên pîrozbextan bibin". Selaheddîn ev ponja Imad guwaht, lê ji birinên van hûrûpûran ra destûr da û got : "Olparaztîşên vêrast ên xudannasan paqijtir in ji zêrên li nav firaqên pirfiraz (muqeddes)". Pey van keşîşan, Satrapdarê bajêr, prens û giregirên Firing û Sûrî derbas bûn. Jinên Xaçparêzan xwe avêt dest û piyên Sultan û bi gazî û girînan jê niyaz dikir: "Me hertiştên xwe wenda kirin : xanî, qafûqûr, hûrûpûr û welatê xwe. Ji vir pêda em dê derdê biyaniyan, serserî, sergerd û bedbextan bişûşikin.

Institut kurde de Paris

Lê, tu karî şê û şikenc û derdên me yên evçend dijwar û giran sivik bikî. Mêr û kur û birayên me ku li ba te dîl in, girtî ne, van belengazan azad bike, bike seregerdora xwe, bide me; birînên me yên kûr derman bike, bedbextiya me hinek sivik bike". Selaheddîn ev dîlên ku van jinan jê hêvî û niyaz dikirin azad kirin û dan wan. Selaheddîn ji wan ra hîn bêtir jî kir : ji wan ra xwarinî (erzaq) da, perû û xelat li wan kirin, dilovanî û mihrivanî kirin.

Selaheddîn, pey vekirandina Quds, daket kenarê Deryayê Sipî. Ji aliyê nîvro dest pê kir û ber bi bakur hevraz bû, kel û bajêrên kenarên Deryayê hemûçkan vekirandin. Hin ji van kel û bajaran ku xwe diqedixand bi êrîşê ew standin. Hin ji wan jî dawiya serhatişên xwe bîr bir, şer ne kir, zûbizû pes kir û xwe bi erzanî reha kir".

Selaheddîn di pirên van şeran da, şûrê tazî li destan, li pêşiya leşkerê xwe êrîş dibirin neyaran, bedenan û keleyan. Ji wan kelan yek a bergirantir, kela "Bûrziya" bû. Em vekirandina vê kelê ji dîrokzanê Fransiz, Albert Champdor, distînin û li jêr dinivîsînin:

Rûpel 196-197 :

"Li her cî, gava ku siwarên musulmanan xuya dibûn, bajarên fillan mîna meyweyên gihîştî ji xwe ber diketin. Li bakurê rohilata Apamê, li kela Bûrziya, karê germtir çê bû. Bi nivîsandina Behaeddîn, ji bo ku ev kela ha carê nayê vekirandin, xwejber (tebîet) û pîşewerî (senet) yekaheng liviyane. Girên bilind û di tengalên hev da, çal û cuhên xweşberî çê kiribûn; hîn rasttir, fîsên heftê gaz kûr serrast kiribûn. Di nîveka van giran da, zinarekî girs û fêriz hebû; Kela Bûrziya li serê vî zinarî ava bûbû. Ev kel dora Apamê diparazt.

"**Selaheddîn nêzîkî kelê bû. Hûr lê temaşa kir û rind ew bazresand (teftîş). Di gel nexwestina**

Institut Kurde de Paris

fermandarên wî, bi êrîşgirtina kelê wehrîşa (qerar) xwe da. Prensên wî, bê perwa, ji vê pojna ha ra kustahiyeke mezin digot. Lê, karên giran şan û serfiraziyên giran tînin.

Sultan vegeriya ba ordiya xwe, keviravêj sazandin, pirên ji textan û pêpaskan (derence) dan çê kirin. Bi rojan kelê da kopandin, paşê ferman kir ku ji bo êrîşê hertişt amade bibe. Bi awayê taktîka xwe, birleşkerên xwe kire sê par. Ev her sê par li pey hev dê êrîş bikirana : mîrê Şingalê li birleşkerê yekim, Sultan li birleşkerê duyim, kurê Sultan jî li birleşkerê sêyim fermandarî dikir.

Gava nîşaneya êrîşê da mîrê Şingalê, ji pirên darîn derbas bû, li hilkişîna kelê pêdar bû û çend deme (saet) xebitî, nikaribû pêpask bi cî bike û şûnda vegeriya. Selaheddîn ket şûna wî, şûrê xwe kişand, "Allahû Ekber" got û qêr kir, ket pêşiya leşkerê xwe. Ordî giş ev qêrîna Selaheddîn, qêrîna cenga Islamê, bi dengekî bilind qoriya, bi êrîşeke wusan ku li cihanê tukes nikare xwe li ber bigre - di bin barana tîran da, şûrê tazî li destekî, li destê din jî mertaleke sivik - dirêjî kelê kir û berî herkesî hilkişiya ser dîwarê bedenê û xwe avêt meydana kelê. Bo demeke hindik, fille dora Selaheddîn girt, jîna wî kete kujarişê (tehlike); lê bi hunerbaziyên leşkerên xwe zûka ji fillan reha bû. Neyarên dorpêçkirî dildayên nêrûmendiya Selaheddîn bûn û jê ditirsiyan, xwe avêt dest û lingên wî û jê bext xwest. Selaheddîn ji dorpêçkiriyan ra bext da û ew niwaztin (lutf) û fermandarên wan bi hin siwaran şandin Antakyê".

Rûpel 257 - 285 :

"Êdî dorpêça Ekka ji bo herkesî bêdawî dirêj dikir û diçû. Kêmaniya xwarinî, nemaza di vê germê da, nexweşiyên leyok û hovnak û bi xwarinên kirêt û

gemmar, ordiyên fillan diherifîn û homanweriya (manewiyat) wan ro bi ro qelstir dibû. Serhengan, ji bo demandina pêjnişa şerevanî ya leşkerên xwe, nikaribûn yekcaran şebxûn û xerpişan bikin, çima ku di van xerpişan da leşkerên Xaçparêzan ne dianî bîra xwe ku di riya olê da bimrin û herin buhuştê. Wan ji peydakirina xwarinî û talankirina neyarên xwe bazdida. Prensên Firingan baş fehm kir ku ev bûnişa han heya demsala baranê nikare dirêj bike. Loma wehirandin ku çi dibe bira bibe, divê ber bi Heyfa derbasokek peyda bikin û xwarinî bi dest xînin, leşkerên xwe ji birsîtiyê reha bikin.

Fireng, gava bihîst ku Selaheddîn nexweş e û di nav ciyan da dinale, gewzxweş bûn û ev şep di destê xwe bernedan. Sala 1190, 13 Çiriya Paşîn, bi sipîtayiya rojê ra, ordiya Xaçparêzan bi rê ket. Leşkerên Firingan xwe da tenişta hev, wek dîwarekî yekperçe xwe avêt pêş; û wek baran tîr û zobîn (rim) barandin. Di germîçanka ordiya fillan da girdîleyek (erebe) ala Xaçparêzan hildigirt. Fille bi dirêjayiya çemê Bêlûsê diçûn.

Selaheddîn nikaribû siwa bibe. Ferman kir, bi çardarê ew bir ser girê Xarûbê. Selaheddîn ji vî girî tevgera neyar nehêrdarî (kontrol) dikir û li leşkerê xwe rêdarî dikir ...

Cenga hanê bi harî û dijwarî sê rojan dirêj kir. Lê, Xaçparêzan nikaribû ji navberên rêzên neyarên xwe derbas bibin.

Selaheddîn pir qels ketibû. Xwe li ser piyan nikaribû bigre. Çima ku ne di nav leşkerê xwe da bû û hevaltiya kujarij a wan ne dikir, ji kulê dilan digiriya. Kurên xwe yên ku lê nehêrtî dikir û li dora wî kar dikir şandin meydana cengê, ji wan ra digot : "Divê hûn bibin nimûne ji leşkerê Islamê ra. Çawa ku ez ne nexweş bûma, min dê xwe bikira nimûne". Paşê ev pirs li ser gotinên xwe efzunandin : "Divê **kurên min hergav bînin bîra xwe, kujaretirên ciyan ciyê wan e".**

Institut kurde de Paris

Di vî şerê pir xûnrêj da, ji her du aliyan yek jî kamwer ne bû. Lê, Firing ku bivê nevê vegeriyan Ekkayê, şikestin, wuha ye, bû para wan.

Ji mezinên Firingan gelek dîl ketibûn destê Selaheddîn. Rojekê, Selaheddîn yekî pîr û bêtab di navbera wan da dît û jê pirsî : "Tu ji kîjan welatî yî ? Kal lê vegerand : "Welatê min pir dûr e, ji bo ku tu bigihêjî wî divê ku tu bi mehan rê biçî. Selaheddîn cardin ji kalo pirsî : "Tu ji wî welatê evçend dûr û tu evçend pîr î, çawa û çima hatî û çima bi min ra şer dikî ?". Kal ji Selaheddîn ra vegerand : "Ez ne hatim bi te ra şer bikim. Ez hatim Qudsa Homanwer dorger bikim". Selaheddîn wuha lê vegerand : "Wusa ye here ! Dorgera xwe bike ! Min tu azad kirî. Here temenê xwe yê mayîn di nav zaroyên xwe da derbas bike ! Û ji bo nehrevaniya dilpaqij a min van diyariyan ji wan ra bibe !". Selaheddîn ferman kir, ji kal ra hespek da, diyarî dan wî û ew bir şergeha Xaçparêzan.

Selaheddîn ji dîlên din ra hindiktir niwazîş ne kir. Li aliyê tenişta çardera xwe, ji wan ra çarderek da vekirin, wekî ku jê ra bi mêvanî hatine rûmet kir û ji wan ra xweşdarî û ciwanmerdî nîşan da. Çend roj bi şûn da ew şandin Şamê.

Rojekê, leşkerekî Selaheddîn zarokekî sê mehî ji himêza diya wî girt û revand. Dayika bedbext û pepûk bi girînan çû ba Qralê Ingilîz, derdê xwe giliyê wî kir û peydakirina zarokê xwe xwest. Qralê Ingilîz jê ra weha got : "Ev kisse ji mefera min dere. Here, derdê xwe ji Sultanê Islamê, Selaheddînê Kurd, ra gilî bike ! Ew merivekî dilovan e. Bivê nevê, ew dê çarekê ji derdê te ra bibîne". Dayika derdinak havilek peyda kir û xwe gihand dîwana Selaheddînê Kurd, giliyê xwe jê ra kir. Sultanê dilovan ê dadker di nav ordiya xwe ya fêris - ordiya sedhezaran - da, berî ku roj here ava, zarokê gunekok peyda kir, da destê diya wî û bi diyarî û xelatan ew şand şergeha Xaçparêzan".

Institut kurde de Paris

Rûpel 274 - 275 :

"Conrard de Mont Ferrat xeyidî, dorpêça Ekkayê hişt û çû Tîr. Evçend engîzên ku nuxûndariyên (ihtilaf) prensan demandin ne bes bû, Qralê Ingilîz, Richard Coeur de Lion, û yê Fransiz, Philippe August, her du jî di rojekê da nexweş ketin. Her du jî bi yek dengî yekûdu bi jarandinê xist bin buhtanan. Van çîvanokan dilê Selaheddîn hênik dikir. Selaheddîn camêrî û bilindrewaniya xwe bi awakî enzanperwerî eşkere kirin.

Lê, filleyên Ekkayê hînî tiştine bilindfiraz ên weha ne bûbûn. Filleyên dora Ekkayê ji rik û kînan pêve tu karekî din ne dizanibû. Li vira pir behreyên nixûndar hebûn. Wan berkeşiya hev dikir û di nixûnên hev da gellek dek û pîk digerandin.

Selaheddîn, gava ku bihîst ev her du qralên Xaçparêzan di nav nivînan da ji ber tayê (malarya) dinalin û dilerizin, ji wan ra mirîşk, berf, gulav û xoşavên tezî (sar) şandin. Roj bi roj, ji bûnişên tendurustî yên herdu ferweran agahdarî dixwest".

Rûpel 334 :

"Selaheddîn gava bawermend bû ku keştiya Ingilîz a dawiyê berê xwe da roava û ji ber çavan wenda bû, birrleşkerên Şingal û Mûsilê perwandin.

Ji kurê xwe Melik Zahir ra - ku amadeyê çûna Helebê bû - wuha şîret kir : "Ez te dispêrim mezinatî û tuwandariya Xwedê. Ez te dispêrim wî Xudanî ku serekaniya giş qenciyê ye. Ji fermana Xwedê ra serfirû bike, çima ku riya aştî û rehayê ev e. Rind baldar bibe ! Bira xwîna beyhûde nerije, çima ku xwîna rijiyayî tucar bi şûnda venagere ! Bixebite ! Dilên merivên xwe bi dest xîne. Bi hişdarî, sûd û qenciyên hawişê Islamê biparêze. Çima ku te ev ustubar (wezîfe) ji min û ji Xwedê stendiye, bitenê ji bo gihandina misilmanên rastîn

bi jîneke bextiyar. Cardin, ji bo ku tu karê xwe rind bigerînî, divê tu dilên prens û gewremerdên xwe kar bikî. Min mezinatiya Xwedê bi karkirina dilên merivên xwe bi dest xist. Di tu demî û di tu warî da, di nuxûna tukesî da ponjên bedxwedî meke".

Rûpel 336 :

"Paşiya paşîn, pey xuyanekirina çar salan, Selaheddîn di sala 1192 da, di 14yê Çiriya Paşîn da, di navbera şadiya kelakelên tûde da vegeriya Şamê.

Bajar bi tevayî di şadmaniyê da bû. Cejn bi hefteyan li pey hev dirêj kir. Ev şadmaniyên ku ji bo "Qehremanê Islamê yê paqijtir" çê dibûn, Şamî giş bi carekê xwe tevê kir. Pey Muhammed, tu meriv ne gihîştiye evçend şan û rûmet û payeyên bilind. Selaheddîn, gewretir û bilindnavtirê pîrozbexttir ê Islamê bû. Selaheddîn bi karkirina şerê Hettînê deriyê Qudsê vekir û perdeke reş di navbera Roava û Rohilat da girt. Ji wendakirina Qudsê, li gundên biçûçik ên Firingan jî digiriyan û li van deran ji Selaheddîn ra nefrîn dikirin ...

Lê, li van doran (Şam, Sûriya, Misr), Selaheddîn di jîndariya xwe da û ji bo nejadên mand (istiqbal) bû şûrê Islamê. Ew bûbû minişa (timsal) nebexetiya (deha) Islamê. Ew bûbû rewş û nîşneyê Islamê.

Wanên ku dianî bîra xwe ku di mandê da serê xwe rakin navê Selaheddîn bi tenê ew dilerizandin.

Ji bo aşandina (selam) Selaheddîn, ji her alî, ji quncikên tenha yên Satrapan, mîr, serek, zanişmend, dawer ... dişûrikîn, dihatin Şamê. Weşbestan (şair) di weşbeste û dasistanên xwe yên derberz da ji siwarê Xwedê Selaheddîn ra distira û dilorand ...

Li bin azimanê Erebistanê yê ronak û gûrîpaş, li ser riyên Deryayê Kaspînê, yan li derbasokên hundir ên avsûnkirî yên Asyayê û li her ciyan : li bin

konên bedewiyan, li kaşaneyên Isfehanê, li holên Berberan, li cîgehên (kamp) Mongolan; belê li her ciyan : li şîpanderên Tîbet, li çiya û zozanên Hebeşistanê yên bilintir, weşbestên ku dîrokên qehremanan distirên ji Cihanê ra serhatiyên "Qehremanê Islamê yê paqij" didan bihîstin".

Rûpel 337 :

"Hêj di destpêka sala 588 a koçbarî (Hicrî) da, ano di 1193 P.Z. da, tendurustiya (sihhat) Selaheddîn pejrokî (perîşan) bû. Xizmetçî derî li Şamiyên ku lezûbez dihatin pirsiyariya Selaheddîn digirt. Bijîşkên (doktor) Selaheddîn bi birrayî (qet'î) ne dihişt ew derkeve derva. Lê Selaheddîn di sala 1193 da, di destpêka meha Sibatê da, çû pêşiya Heciyên ku ji Mekkê vedigeriyan. Li geliyê sar ê Bereda serma girt, li ser hesp teviziyên tayê ew pir diêşand. Selaheddîn bi zor xwe li ser zînê hesp digirt. Bi awakî perîşan gihîşte Şamê û îcar bi rastî kete nav nivînan. Nexweşiya wî - tayê tîfo - zor lê da. Di 21 Sibat, roja yekşembê, serê sibê da Behaeddîn bi du kurên Sultan ve - Fadil û Melik Fadil - hat ji bo pirsiyariya Sultan. Lê, ew di bûnişeke bê tab da bû. Selaheddîn gava kete "koma", Şam seraser şîn girêda, çarsû (bazar) giş hatin girtin.

Gava ku Melik Fadil nêzîkbûna dawiya bavê xwe - di bin nalîn û qêrînên aliyê malê da - fehm kir, Satrapê Şamê, gişî mîran, atabegên kurd ên ku li Şamê amade bûn bang kire Kelê. Li pêş Melik Fadil giş civatê sond da, gerdorî (qesema sedaqetê) kir.

Sonda ku Qazî nivîsandibû, xurbêja (metn) wê ev bû : "Ez, ji nuha da sond dixwum, jîndariya Selaheddîn ez dê jê ra gerdor û serfirû bimînim, hergav ez dê ferweraniya wê biqedixînim (mudafaa) û piştedariya wê bikim, jîna xwe, darayiya xwe, şûrê xwe û merivên xwe ji bo pîşekariya wî amade bikim. Pey

wî ra, ez dê vê bawermendiyê ji bo kurê wî Melik Efdel û peyhatiyên wî ra bikim. Bira Yezdan ji min ra nehrevan bibe; ez xebata xwe, hebûna xwe, jîna xwe, şûrê xwe, merivên xwe, bitenê ji bo parastina ferweraniya wî deynim. Ez sond dixwum ku xebtûkoşa min dê wek peymana min bibe, çima ku ji gotinên min ra Yezdan nehrevan e. Eger ez van sondan ji bîr bikim, bira jinên min berdayî bibin, beniyên min serazad bibin û ez xwas herim dorgera (tewaf) Kabê".

Rûpel 339 :

"Paqijtirê Qehremanên Islamê" pir naçiz mir. Giş darayiya ku hişt çil û heft dînar û zêrekî (Tîr) bû.

Diravê ku bo şuştina wî divabû, bi bedih (deyn) hat peyda kirin. Qerqer û karûbarên wî qaziyê Şamê Fadil berpêş kirin. Lê, Sultan Selaheddîn di jîndariya xwe da, ji bo tuwangerbûnê du şep – şepek di mirina xelîfeyê fatimî El Adîd û şepek din jî di mirina Atabeg Nûreddîn – ketin destê wî. Kenzine Xelîfeyê Misrê ji leşker û serleşker û merivên bin destê xwe ra par kirin. Ji hebûna Nûreddîn ku wek gir û çiya bû tiştekî biçûçik ji bo xwe ne girt û ev darayiya fêris radestî kurên Nûreddîn kir".

Rûpel 340 :

"Şîn bû gişkî, çima ku pey mirina çar Xelîfeyên Awist (meşrû) Islam kopeke evçend dijwar ne xwaribû. Ji bo şadiya rewanê wî li Mekkê û li Medînê hêviş (dua) xwendin. Bi rêzimana Islamê, ev ayinên firazbaz bitenê ji bo Xelîfeyan çê dikirin. Cendekê wî leşkerê olperwer paş nîvro bir baxçeya seraya havîngehê. Paş çend salan, jê ra di nêzîkayiya Mizgefta Mezin, di tenişta xwendegeha Azîzîye da tirbeke nû hat çê kirin. Ev tirb bû cîgeha wî ya herdemî".

7- Xoristan û Sîsistan :

Pey êrîşên Cengîzxan çend sal bi şûnda, li Xoristan û Sîsistanê padîşahiyeke Kurd serrast bû. Ev padîşahî di xuyakirinê da di bin siya Cengîz da bû; lê bi rastî padîşahiyek serbixwe bû. Ev padîşahî 130 sal ferweranî kir. Paşê Tîmûrleng hat û ev padîşahiya Kurd wenda kir.

Di hengama vê padîşahiyê da, zanistî û xwendevanî pir pêş da çûbûn. Padîşah Maziddînê Muhammed di alîkarî û halandana zana û xwendevanan da gellek nav û deng bû. Zanayê nebexe û bi nav Saîduddînê Tevtenamî di bin parastina vî padîşahî da bû (29).

## MÎRIYÊN KURDAN DI HENGAMA ABBASIYAN DA

Werzişcuyê (mucahid) Mezin ê Kurdan, Eba Muslimê Xoresanî, di sala 750 P.Z. da Xelîfetiya Emewiyan wenda kir, di şûna wê da Xelîfetiya Abbasiyan danî. Bi vî awayî Kurd ji wendakirinê reha kirin. Pey vê wergerka sosretbexş, li çar aliyên Kurdistanê bê jimar Mîrî serrast bûn.

Bi rastî, van mîriyan û her heft padîşahiyên Kurdan ku me nuha navên wan nivîsandin ronakî û mezinatî û yekîtiya Kurdan a berê venegerandin. Bi çewtî û gunehkariyên Azdiyakê gewzeger û Darayê yekim ê payexwaz û çavnetêr Imperatoriya Kurdistan a fêris firazbaziya xwe wenda kiribû. Wergerka Eba Muslimê Xoresanî bilindayî û xurtiya Kurdistan a kevnare bi cî ne anîn.

Lê gava ev mîriyên bê jimar serrast bûn, li her aliyê Kurdistanê hezaran kel, burc, barû û şato ava kirin. Bi sîdariya van kel û baruyan, Kurdan xwe ji Mongol û Tirk û Tataran parast. Leyandinên van barbaran hinek erzantir derbas kirin.

Belê, di sedsala 13im da, leyandinên Mongol, Tatar û Tirkan dest pê kir. Ev leyandina van barbaran

Institut kurde de Paris

300 sal bê aram dirêj kir. Ji Hindistanê heya Anadolê, bi sedan kişwerên ava û gumreh wêran bûn, milyon û milyonan enzan bi destê van cenawuran hatin kuştin !!!

Kurdan xwe spart kel û şatoyên xwe, xwe parast. Penahên wan birc û barû bûn. Çiçend ku ji wan hat, xwe bi erzanî ji van barbarên cenawur û talanker reha kir. Kel û barû û şatoyên bê jimar, mîrên mêrxas û dilpola, cengawerên çekbaz û canbêzar gelê Kurd ji wendabûnê rizgar kir.

Kurdan hebûna xwe ji van kel û şatoyan ra, ji van mîran ra, cengawerên Kurd ên çekbaz û cengbazan ra bedihkar in. Lê paşê bobelatên din çê bûn ! Ji sedsalan ve, Ereban, Eceman û Tirkan Kurd dorpêç kirine. Dilxwaza wan ev e ku Kurdan parî parî bikin, di nav xwe da bipişifînin û wenda bikin û Kurdistanê daqurtînin. Ji bo gihîştina vê armancê, di destên wan da çekine bê awa hene. Lê, xurttirên çekên wan Islam e. Ji kevn da ola Islamê ji xwe ra kirine destik, bi durûtî û planan û dek û dolavan xwestine Kurdan tune bikin ! Kurdistan, niştimanê Kurdan, bikin dastê (mal) xwe. Kurdan bi werzişên mêrane li ber xwe da, mêrxasî û qehremaniyên mezin kirin. Pir muxabin ! Dilîrî û canfeşaniyên ku Kurdan ji bo maf û azadiya xwe kirin, di dîrokan da, di tu nivîswaran da ne hatine nivîsandin; di cihanê da ne hatine bihîstin û dîtin. Nemaza, di vê sedsala paşiyê da, ji bo parastina hebûna xwe canfeşaniya ku Kurdan kirin cihanê giş dilda û mat kir. Kurdan bi şilfa xenceran êrîşî topan û mîtralyo-

Institut kurde de Paris

zan dikirin ! Kurdan bi van behadiriyan neyar mat û devekirî hiştibûn.

Evçend camêrî û mêrxasî ! Evçend pesnxan û dasitan ! Heya îro mana Kurd û hebûna Kurd ji ruyên van birc û baruyan, ji van mîriyên bê jimar in. Ev tişt bi sîdariya Eba Muslimê Xoresanî yê nebexe hatiye meydanê ! Rehakarê Kurd, ev pehlewanê yekta ye.

Belê, hezaran muxabin ! Ev mîrên bê jimar ên Kurd nikaribûn dev ji xudbîniya xwe berdin, giş gotinên xwe bikin yek, ji bo rizgariya Kurdistan yekîtiyekê çêkin, ji nav xwe Padîşahekî bibijêrin, Padîşahiya Gewre ya Kurdistan vegerînin, Şahînşahiya kevnare ya Kurdistan vejînin.

Belê, ev camêrî ji van mîran çênebû; vê mezinayiyê, vê dilgermiyê nikaribûn nîşan bidin.

Lê ev mîrî, digel sûc û gunehên xwe yên pir mezin, di paydarbûna Kurdan da bûne faktorekî bergiran, bûne engîza hebûna Kurd. Loma, em jî ji bo vê qenciya wan navên mîriyên ku me karibû bida hev li jêr dinivîsînin.

Di nivîsandina van navan da, me ji rohilat dest pê kiriye û ji berê va em hatine ber bi roava :
1- Erdelan (Kelhor) : a) Pilingan. b) Derteng. c)Tahîdest. 2- Siyahmensîr. 3- Cengî. 4- Zengene. 5- Pazûkî. 6- Somay. 7- Sehran (Soran). 8- Mahmûdî. 9- Mukrî. 10- Baban. 11- Biradost. 12- Behdînan. 13- Hekkarî (Sîno). 14- Mikis. 15- Bedlîs. 16- Mûş. 17- Sipayerd. 18- Sasûn (Herzo). 19- Botan : a) Azîzan. b) Gurgîl. c) Fenik (30). 20- Hesenkêf.

Institut kurde de Paris

21- Sêrwan : a) Kufra. b) Kefrî. c) Iron. 22- Xerzan. 23- Farqîn. 24- Zirkî : a) Derdin. b) Gurdîkan. c) Hatax (Licê). d) Tercil. 25- Batman. 26- Qulp. 27- Cebaqçûr. 28- Gênc. 29- Mirdasî : a) Egil. b) Palo. c) Çêrmûk. 30- Siwêrek. 31- Çemîşgezek : a) Mencîkurd. b) Pêrtek. c) Sekman. 32- Koçhîsar. 33- Dûrik. 34- Egîn. 35- Rişwan. 36- Entab. 37- Kilîs. 38- Mendêlan : a) Mêrdîn. b) Qesrîk. 39- Sorikan.

Ev navên mîriyên Kurdan ku me li jor nivîsandin pirên wan me ji Şerefnameya ronakrewan Şeref Xanê Bedlîsî standine. Hinek ji wan jî me ji nivîswarên din dane hev. Ji van mîriyan pêve, îro li Kurdistanê gellek mîriyên din jî hene ku navên wan ne hatine nivîsandin û ne ketine nivîswarên dîrokan. Lê, mîriyên ku me navên wan li jor nivîsandin, îro bi navên xwe yên kevnare li Kurdistanê paydar in.

Ji van mîriyan pêve, birekî din heye ku di sedsala 13im û 14 da, bi leyandina Mongol û Tirk û Tataran, bicarekê wenda bûne. Hinek mîriyên din jî bi şerên hundirî nabedîd bûne.

Pey van berjendişan (îzahat), divê ku em hin zanegî û zanişmendiyên dîrokî yên çewt û çelwer (mubalaxa) ku di gihaja Mîrê Azîzan, Mîr Bedirxan, da hatine nivîsandin û feşandin durust bikin û rastiyê bibêjin:

Di van salan da, di gihaja Mîr Bedirxan da bi rojnave, kovar û nivîswaran pir tiştne bê bingeh û bê serûbin hatin nivîsandin. Ev nivîstekên han giş ji serapa, çîrok, efsane û nîgaşên (xeyal) bê sûd pêve n tiştek in. Ev rîzeyên (neşriyat) nîgaşwer bicarek ji vêrastê dûr in. Di van nivîstişan da ji sedî yek rast tu neye.

Bi nivîsandinên van rojnave, kovar û nivîswaran, Mîr Bedirxan, mîna Carê Mosqofan, Petroyê Mezin ê bi nav û deng, xebatkar, rahijmend (muşteşebbis), dûrbîn, dûrendîş û pêşvexwaz bû. Mîr Bedirxan di gola Wanê da geşteceng sobandiye (sebih), ji bo



Institut kurde de Paris
INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE

hînbûna zanişên zanişmendî, hunerwerî û pîşeweriyên (sen'et) modêrn xwendemend şandine Awrupayê, li Cizîrê karxaneyên top û tivingan sazandine, barûdxane serrast kiriye. Ji van rahijmendiyên bergiran pêva tiştên din ên hêjatir û gewretir - leşkerî, konevanî, şehrevanî - jî çê kirine û kamwer bûye : ji Urmiye ta Siwêrekê, ji Mûsilê ta Mûşê yekdestiyeke gelî û leşkerî pêk aniye. Di vî erdê fireh da, bi ordiyên Osmaniyan ra şerne dijwar kirine ...

Lê di dawiya van meydancengan da felek bi pîrozbextî bi Bedirxan ne keniyaye ! Ordiya Mîr şikiyaye, Mîr xwe avêtiye kela Erux, heşt meh di kelê da bi Osmaniyan ra şerne bê hawe kirine.

Me zanişweriyên jorîn bi kurtebirî nivîsandin. Ev zanişweriyên han di gîhaja Mîr Bedirxan da, bi awakî pejirandî, bi hengam û timare (tarîx û erqam) li Awrûpa, Misr û Sûriya, di rojnave, kovar û nivîswaran da hatine nivîsandin.

Lê, di gel xeptûkoşên me yên bi germî, em di tu nivîswara dîrokê da rastî zanişweriyên wusa ne hatin. Dîrokzanên rohilat û roava yek jî ji van angaşt (iddia) û nivîzişan ne gûwahtiye (tasdiq). Ji van dîrokzanan yek jî di nivîswara xwe da ji bo mezinatî û hozanweriya Mîr Bedirxan yek pirs ne nivîsiye. Nemaza dîrokzan giş di gola Wanê da ji sobandina keştecenga Mîr Bedirxan ra keniyane. Nivîswarên dîrokan bi yek demî, ji aliyê Mîr Bedirxan, şandina xwendemandan li Awrûpayê, sazkirina fabrîqayên top û tivingan, çêkirina karxaneyên barûdê li Cezîrê, yekdestiya gelî û leşkerî di erdê fireh û fêris ê di navbera Urmiye û Siwêrekê da, Mûsil û Mûşê da, jî napezirînin. Van engişan giş ji rastiyê pir dûr dibînin, dibêjin û dinivîsînin. Ev engişên han derjêyên (netîce) bişkavtinên nêrûnîgaşên (texeyyul) rapirî (mufrit, zêde) ne, yaxut bermeyweyên bêhişbêjiya (heyecan) mejikî ne ...

Bi zanişên nivîswarên dîrokê, Şoreşa Mîr Bedirxan heft, heşt roj dirêk kiriye. Paşê, Mîr Bedirxan xwe

Institut kurde de Paris

avêtiye penaha kela Erûxê, di vê kelê da sê roj pêdarî kiriye û li dawiyê radestî (teslîm) Tirkan bûye. Tirkan ew bi malî biriye Istanbûlê.

Mîr Bedirxan li pêş Padîşahê Osmaniyan, Sultan Mecîd, çarîna jêrîn a Omerê Xeyyam xwendiye :

Nakerde guneh der cîhan kîşt bugo !

An keskî guneh ne kerd çûn zîst bugo !

Men bed kunen tu bed mukafat dihî,

Pes ferqî meyanî men û tu çîst bugo !

Gava ku Mîr Bedirxan wegeha (itîraf) sûcê xwe kir, Sultan Mecîd ew bexşand (efû) û payeyê paşatî dayê.

Mîrê Kurdan bû Paşayê Tirkan. Pey mirina Bedirxan Paşa, goya çend zarokên wî çûne Kurdistanê û li Çiyayê Madenê bi Tirkan ra dûr û dirêj şer kirine. Ev qisseya hanê ji nîgaş û efsane û çîrok e. Li Misrê, neviyê Bedirxan Paşa dema ku li kenarê Nîlê gerûgeşt dikir, hate cûş û xurûşê û şerê Madenê wek romanekê, wek çîrokekê nivîsî.

## ÇEND GOTIN JI BO EBA MUSLIMÊ XORESANÎ YÊ REWANPAK

Nuha ku me dawiya Dîroka Abbasiyan ne aniye, divê em çend gotinan ji bo Eba Muslimê Xoresanî binivîsînin :

Kurdên ku Omer Ibn Xettab, Xelîfeyê duyim ê Islamê, kopandibûn û mirandibûn - berê ku sedsalek û nîv derbas bibe - bi nebexeyî, bi dilgermî û mêrxasiya Eba Muslimê Xoresanî ji nû da derketin meydanê.

Belê, ê ku Kurd vejandin Eba Muslimê Xoresanî ye. Mezintirê Kurdan ku ji bo payedariya Kurdan li cihanê xebtûkoş kiriye Eba Muslimê Xoresanî ye. Bi halandana vê bawerbûna han, li ser wergerka ku

Institut Kurde de Paris

Eba Muslimê Xoresanî afirandiye, em dê çend pirsên din jî bêjin : Wergerka ku Eba Muslimê Xoresanî afirand gertevek pir mezin e. Ev wergerka pirfiraz ji Kurdan ra can da, Kurd vejandin, Kurd ji tunebûnê, ji malmîratbûnê reha kirin.

Wendakirin û ji ruyê cihanê bicarek maltina Imparatoriya Emewî ya bi destê Eba Muslimê Xoresanî wek herifandina Nînwa û wendakirina Xwehermenda Asor bi destê Key Kubbadê Kurd û Neviyê wî Key Aksar bergiran e.

Ev wergerka gewre li Endelus, Afrîqa Roava, Misr, Yemen, Hicaz, Sûriya û Filistînê ji aliyê civatî û konevanî guhartineke bingehî û tevheviyeke dijwar çê kirin. Ev wergerka fêris Kurdistan vejand, geş kir, zînde û ava kir.

Pey vê wergerkê, li Kurdistana fireh mîriyên bê jimar hatin meydanê. Li çar aliyên Kurdistanê kel û burc û şato hatin ava kirin û, bi sîdariya van burc û baruyan, Kurdan bi erzanî xwe ji leyandina Tirk û Tataran reha kir.

Ev burc û baruyên rehadar îro jî ji Belxê heya Deryayê Reş, ji Araratan heya Sûriya û Filistînê, di van kişwerên fireh da şopeyên wan hene û îro jî xuya ne.

Ev kel û şatoyên bê jimar ku li devgeliyên teng û çepokaşan, li kotên bilind, li çiyayên sîdar û serkişiyayî, li ser zinaran, li pozê herfaz û tûj yên birrekan ava bûbûn. Di roja tengasiyê da, ji Kurdan ra bûn parazgeh û penah. Di sîdariya van kelên bilind, tebût û tekûz da, di sedsalên 13yim û 14yim da, gava ji Tirkistanê Mongol û Tirk û Tataran, mîna leyiya bobelatan, dirêjî Kurdistanê kir, Kurdan hinek erzantir xwe ji destê wan reha kir.

Cardin Kurd ji se sal bêtir devgirtî û destgirêdayî mabûn. Bi sîdariya wergerka ku bi bîrewerî, karmendî û camêriya Eba Muslimê Xoresanî serrast kiribû, Kurd bûn xwediyên şepa dest û zimangirêdanê :

weşbestên Kurdan dest bi nivîsandina weşbeste, destan û mersiyeyan kir. Dengbêj stran nuhurandin, kur û keçên nazenîn bi dîlan û govendan şayî, dilgeşî û gewzewerî li çar aliyên xwe feşandin. Çerbaziya siwaran, tîravêjî, mertalgêrî û behadiriyên xortan ji nûva bi çapikî û çalakî candar bûn. Kurdistan hêdî hêdî ax û birînên dilan, şîn û girînên huduran dest bi jibîrkirinê kir. Ji berê va vedigeriya kamraniya berê, xurremî, şadmanî û bextiyariya xwe ya kevnare.

Emperyalîzma Ereban bi tumî 110 sal Kurd ji mafên xwe yên enzanî, niştimanî û gelîtî bêpar kiribûn. Emperyalîzma Ereban bi rik û kîn û zorê Kurd dikirin Ereb ! Armanc û dilxwaza wan wendakirina Kurdan bû !

Lê, Eba Muslimê Xoresanî vê bêdadiya duruşt (xesîn) û şikolek a Ereban ne hişt here serî. Wî, bi yek kopandina yeman, ev şep ne da Emewiyan ! Eba Muslimê Xoresanî di meydana şer û cengan da "Emperyalîzm"a Ereban pelaxt ! Di bin lingên xwe da pelçiqand ! Eba Muslimê Xoresanî ev fer û taba wêranker û xudkam bicarek ji binî wenda kir!

Hezaran şabaş, Eba Muslimê Xoresanî ! Gelê kurd û niştimanê kurd ji bin zorbatiya Ereban rizgar kirin.

Institut kurde de Paris

## BÊBEXTIYA EREBAN Û ABBASIYÊN ÇILVERK

Eba Muslimê Xoresanî şehriyariya Emewiyan nabedîd kir, ji gelê Kurd ra wêtê (deyn) xwe bi cî anî. Kurd di bin barê emperyalîzma Ereban da çûbû ber mirinê; Eba Muslimê Xoresanî ew vejand, zînde û candar kir. Lê, bi Kurdan ra hemgaveyên (eynî zeman) wan : Elewî, Haşimî û Abbasî jî ji mirinê, ji zindanê, ji malmîratiyê reha kirin. Xweşber, ezbeta Hezretî Elî giş divabû spasdara Eba Muslimê Xoresanî bibe. Wî ev Ezbet ji bin zerzemînan deranî, li hevrazên bilind danî, ji zindanan reha kir,

li ser postê xelîfetiyê, li ser Textê şehriyariyê rûniştand.

Lê, Xelîfeyê duyim ê Abbasiyan, Ebû Cafer Muhammed El Mansûr, nankor û bêbext derket ! Qenciya Eba Muslim zû ji bîr kir ! Spasdariya xwe ji vî camêrê mêrxas ra bi awakî bêbext û telaqreş, bi kuştina wî, vegerand ! Belê, Xelîfe Muhammed El Mansûr bê tirs û şerm ev fêris, ev nebexe di hundirê Seraya xwe da kuşt, cendekê wî yê pirfiraz parî parî kir û avêt çemê Diclê ! ! Ev bêbextê Ereban, Xelîfe El Mansûr, gava bi bêbavî Eba Muslimê Xoresanî di Seraya xwe da kuşt, Weşbestê wî, Hebeşî Ebû Duleyme, şerm ne kir, ruyê xwe yê reş cara duduyan jî reş kir û bi Kurdbûna Eba Muslim jî yariya xwe kir û di hengama kuştina wî da weşbesteyên jêrîn gotin :

أبا مجرم ما غير الله نعمه    على عبده حتى يغمر ها العبد
أفي دولة المنصور حاولت غدره    ألا إن أهل الغدر آبارك الكرد
أبا مجرم خوفتني القتل فانتخى
عليك بما خوفتني الاسد الورد

WERGERKA VÊ WEŞBESTÊ BI KURDÎ :

Bavê mirarker, Xwedê firawana (*) xwe li ser hulûlkê (*) xwe naguhere,

ta ku ew kes ji riya qenciyê danegere.

Ma tu di bin siya Xwehermenda Mansûr da dikî bêbextî bikî ?

Lê rast e. Kesên bêbext bavpîrên te yên Kurd in.

Bavê mirarker ! Te ez tirsandim û te zirt li min kir.

**Lê, tola min şêrê mezin ji te hil kir.**

## MANSUR, XELÎFEYÊ DUYIM Ê ABBASIYAN RIYA XWÎN Û BEDBEXTIYÊ VEKIR

Xelîfeyê duyim ê Abbasiyan, Ebû Cafer Muhammed El Mansûr, di destpêka şehriyariya Abbasiyan da xwîna mêrxasekî bêguneh rijand, bi bêbavî qencxwazekî Abbasiyan kuşt, nankoriyeke mezin kir û bi awayê han riyeke çewt û çepel nîşanê xanedana Abbasiyan da. Ev riya çewt û çepel li xanedana Abbasiyan ne hat. Ev riya xwînrijandin û bêdadkerî û bextreşiyê bû engîza wendabûna xanedana Abbasiyan. Abbasî bi xwîn û telaqreşî xopan bûn, malmîrat bûn :

Harûnê Reşîd ku ji bijareyên Xelîfeyan bû destê xwe, wicdanê xwe bi xwîna bêgunehan lekedar kir! Gewremerdê xwe Caferê Bermekî da kuştin. Bermekî ku hem gewremerd û hem hevalê wî bû, ji hogirê rewanê wî bû û bi salan ji bo pêşveçûna xwehermenda Abbasiyan ra ji canûdil karûkoşên zor kiribûn. Harûnê Reşîd evçend xebat û emekdarî ji bîr kir û bê mihirdadî û bê dilovanî ji kuştina Caferê bedbext û bêguneh ra ferman da. Serê Cafer hat firandin, ji ezbeta wî pir bêgunehên din jî hatin kuştin.

Kurê Harûnê Reşîd, Xelîfe Memûn, Textê şehriyariya xwe li ser cendekê birayê xwe, Emîn, vegirt !!

Gotina dawîn : di 528 salan da, ji Abbasiyan 37 Xelîfe hatin. Ji van 37 Xelîfeyan, bi tenê 9 Xelîfe di nivînên xwe da, bi hêsanî mirin. Ji 28 Xelîfeyên mayîn, 3 Xelîfeyên bedbext çavên wan hat deranîn, kor bûn !!

Ev her sê Xelîfeyên bedbext, di kuçan da, li Bexdê, ji bo kerîkî nan pars kir, bi salan naliyan û mirin. 25 Xelîfeyên mayîn, her yek bi awakî hat kuştin ! Hin ji wan bi dek û planên birayên xwe hatin mirandin, hin ji wan bi destên gewremerdên nankor hatin jehrandin, çend ji wan bi bêdadiya Emîrul-Umera di zindanan da ji tîna, ji birsîna temenê xwe gihand dawiyê !



INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHEQUE

Ev e dawiya dilkuj a Xelîfeyên Bedbext ! Dawiyeke reş û kirêt ! Islam pesn û sitayişên van Xelîfeyan gihandine perê ezmanan, ji bo van Xelîfeyên gendûgemar, genîwer, pespaye û xwînxwar çi efsane û çîrok ber bi hev anîne ! Ji bo wan çi dastina û pesnave û çi bêjelaw (xezel) stirane ! Rastiyê ji gelê nezan veşartine. Rûreşiyên Xelîfeyan eşkere ne kirine ! Ev Xelîfeyên bedbext û kêmbext ku di Serayan da keys û fesal dixist destên xwe, bi gewz û şadî li teniştên gulperiyan, bi xwarin û vexwarin, bi mey û meygeran, bi çerez û mêzeyan, bi lîz û gewendan, bi saz û stran û hayhuyan serxweş dibûn !

Eva ! Vêrastên nivîswarên dîrokan ! Eva ! Ruyên vêrastên Xelîfeyên xudan şan û cî û payeyan ! ...

Em dîroka Kurd û Kurdistanê dinivîsînin. Em dîroka Islamê, dîroka xanedana Emewiyan û Abbasiyan nanivîsînin. Lê, ji bo Xelîfeyên pêşîn - Xelîfeyên Raşidîn -, yên Emewiyan û Abbasiyan û Xilafeta Osmaniyan ku vê paşiyê, di sedsala 16im da, bi zora şûr ji Ereban gihaştibû Tirkan û 450 sal "Meqami Xilafeti Ulyai Osmaniye" li Istanbûlê paydar bûbû, divê em çend pirsan bibêjin :

Xelîfeyên Islamê ku me berê ji bo wan nivîsandibû li Asya, Afrîqa û Awrûpa, ji bo bilindayiya navê Xwedê, ji bo pêşvebirina Islamê pir kişwer û der û ber vekirandin, welat û bajar talan kirin û şewitandin, meriv kuştin, bilêc kirin, xanûman wêran kirin û vemirandin û ji destdirêjiya namûsa dawpaqijan xwe ne parast. Keç û bûkên perîpeyker wek keriyên tarişan ajotin bajaran, di çarçiyan da firotin.

Te digot qey şeştarî û bêdadiya Ereban ne bes bû. Tirkên Selçûqî, Tirkên Kayhanî jî xwe tevî guruhên talankeran kir. Ji bo riya Xwedê, ji bo ola Peyxember, kujtin, bilêc kirin, şewitandin, talan kirin, dîl girtin, kurên bavan di zindanan da rizandin ... Ev xwînxwarî bi sedsalan dirêj kir ! Nemaza li Balkanan,

Institut kurde de Paris

li Bulgaran, li Sirban, li Yewnanan ... xwînrêjî û cenawuriyên ku Tirkan çêkirin !!!

Roj roja Ereb û Tirkan bû ! Ji alîkî mal û talan, ji aliyê din jî keç û bûkên dilber ! ... Paşê jî li Seray û baxçeyên buhuştê, horî û periyên bê jimar ! ...

Di van hengamên cangizok û dilherêf da, kopa dijwar li Kurdan xistin : Xelîfeyê duyim ê Islamê, Omer Ibn El Xettab, cenawurî û xwînxwariya dijwar li Kurdan kir. Rûreşî û sermsariyên gijok bi serê Kurdan anîn. Xelîfeyên Emewiyan jî şopa Omer ajot. Xelîfeyên Abbasiyan yekfesal xistin destên xwe û Kurd kuştin û êşandin. Lê, Xelîfeyên Osmaniyan 400 sal tiştê nemayî anî serê Kurdan : kuştin, talankirin, namûsa wan lekedar û paymalkirin, debistan û medreseyên Kurdan hilweşandin, Kurd nezan hiştin. Wan Kurdistanê kir wêranezar.

Ecem jî ji Emperyalîzma Ereban pir êşiyan. Lê kopa dijwar li serê Kurdan ketibû. Ereb kopek ewçend bi bêbavî û dijwarî daweşandibû ku îro 1400 sal e ku Kurd ji hejandina wê pak ne bûne !

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## STANDINA BEXDA Û WENDABÛNA ABBASIYAN BI DESTÊ HULAKÛ

## PADÎŞAHIYA ISMAÎLÊ SAFAWÎ Û SERHATIYA KURDAN

Di sala 1529 P.Z. da, li Îranê, Şeyx Ismaîlê Sawafî - ji Ezbeta Hazretî Elî, neviyê Mûsa Kazim, kurê Şêx Sefaeddînê Erdebîlî - bû Şahê Kurdan.

Ji bo ku em bizanin bingeha padîşahiya Safawiyan li bin werêç (tesîr) gertevên bi çi rengî hate danîn, divê em ji standina Bexdê bidestê Hulakû, ji wendabûna Xelîfetiya Abbasiyan û leyandina Mongol, Tatar û Tirkan hinek agah bibin :

Me berê nivîsandibû, xwehermenda Kurdî ya Peweye = Dîlemiyan di sala 942 P.Z. da li Bexdê bingeha xwe danîbû. Xanedana Dîlemiyan li Bexdê û li tuma Iraq, Kurdistan û Parisistanê 127 sal padîşahî kir. Paşê, ji Tirkistanê Tirkên Selçûq hatin. Mezinê wan, Turxul Beg, di sala 1070 P.Z. da dirêjî Bexdê kir, ordiya Dîlemiyan şikand, Turxul Beg bû Emîrî Umera, ano wek Dîlemiyan bû padîşahê Iraq û Bexdê. Padîşahiya Selçûqiyan 208 sal ajot.

Mîna hengama padîşahiya Dîlemiyan, di dema padîşahiya Selçûqiyan da jî, Xelîfeyên xwediyên tu karmendiyê ne bûn. Xelîfeyan bes roja Înê li mizgeftê xutbe dixwend û têkilî tu karê din ne dibûn. Xelîfeyên bê nêrûmendî, bê karmendî û bê xebtûkoş li Serayan û Kaşaneyan bi çeng û saz û aheng, bi meyên reng bireng, bi bejnên selwan û hîvrûqan, bi gulav û misk û emberan, bi xwarin û vexwarinên

Institut kurde de Paris

meyxweş gewz û şadî dikirin. Bi kamranî û şadmanî xweşdem dibûn û bi van hawana bedbextî, belengazî û rebeniya xwe ji bîr dikirin !

Dawiya dawîn, di sala 1258 P.Z. da, Xanê Tataran - Neviyê Cengîz Xan - Hulakû Xan dirêjî Bexdê kir, bi ordiya Xelîfê ra şer kir, ew şikand, Xelîfeyê pepûk kuşt û kete Bexdê. Bexdê talan kir, bilêc kir, 800.000 bê dilovanî kuştin, ji şûr derbas kirin. Hulakû bi vî awayî "rêkor"a merivkujî û xwînxwariyê şikand !

Hulakû Xan, pey vê kamweriyê, di welatê Kurd û Farisan da - ji Hindistanê heya Deryayê Reş - bi navê "Ilhaniyan" xwehermendeke Tataran serrast kir.

Hulakû pir jîn ne kir, heft sal bi şûnda mir. Xwehermenda Ilhaniyan pey Hulakû paydar ne bû, vemirî, di nav çend salan da wenda bû.

200 sal bû ku kişwerê Îran - welatê Kurd û Paris - di nav geremolî û tevheviyê da bû. Weke ku kevanjenek bijene, Imparatoriya Kurdistan hatibû jendin, ji hev bela bela bûbû : asayiş û ewleyî ne ma bûn, tukes asûde û bextxweş ne bû.

Tatar, Tirkmen û Tirk li Îranê - Imparatoriya Kurd û Faris -, Anadol û Sûriya çerx dibûn, çaraliyên xwe bilêc dikirin, wêran û kambax dikirin !

Ev koçerên Tatar û Tirkman û Tirk bi milyonan bûn, bê rêzan, bê bendûbest bûn. Gelek caran di navbera wan da jî şer û pevçûn hebûn. Xan û begên wan tim di nav xwe da qayişkêşî û pêşimtî dikirin. Xebtûkoşên van Xan û Began hergav talan û kuştin bûn.

Van gurûhên koçer - Tatar û Tirkmen û Tirk - ji du sedsalan bêtir Îran talan kir, xopan kir. Gava ku tu avayî li wan deran he hişt, êdî tu tiştên talankirinê li van doran ne man, berê xwe da roavayê.

Institut kurde de Paris

Tatar li Gurcistan, Qafqasya û Qirim belav bûn. Tirkmen û Tirk jî kişiyan Anadol û Sûriyê. Li van deveran "Atabegîtî" û "Begîtî" serrast kirin. Paşê, ji van atabegan du xwehermendên mezin çê bûn : Selçûqî di sala 1078 B.Z. da li Qonyayê xwehermenda Selçûqî ya Rûm saz kir. Tirkên Kayhanî jî ji qelsketina xwehermenda Selçûqiyan keys xist dest xwe, bûn mîratxurên Selçûqiyan û di sala 1300 P.Z. da bingeha Imparatoriya Osmaniyan danî. Di sala 1453 P.Z. da, Istanbûl bû paytextê Osmaniyan.

Di şerê mezin ê 1914 da, Imparatoriya Osmaniyan wenda bû. Di ciyê wê da, tûdevaniya (cumhûriyet) biçûk a Tirkiyê çê bû.

Institut kurde de Paris

## XWEHERMENDA SAFAWIYAN

Di dawiya sedsala 14im da, li Kurdistanê zordestiya Tatar û Tirkan dest bi sivikbûnê kiribû. Tatar û Tirk, ev gurûhên talankeran, pey talankirin û wêrankirina kişwerê Kurd û Paris, ji xwe ra - ji bo talankirinê - li deverne din geriyan. Tataran berê xwe da aliyê Deryayê Reş. Pirên Selçûqiyan jî ber bi aliyê Anadol û Sûriyê koçbar bûn.

Di van hengaman da, ano pey dûrketina Tatar û Tirkan ji Kurdistanê, kurê Şêx Sefaeddînê Erdebîlî, Şêx Ismaîlê Safawî, li aliyê Geylanê şêxê rêol, ano Şêxê Terîqet, bû. Şêx Ismaîlê Safawî paşê bû Şah. Şahîtî çêtirî Şêxîtiyê dît û murîdên xwe, ano cengawerên Kurdan, li dora xwe civandin û dirêjî Gurcistanê - Gurcî Îsaparêz bûn -, Satrapdarê Sêrwanê kuşt û satrapa Sêrwan ji Gurciyan stand. Paşê, di sala 1.500 P.Z. da, dirêjî Akkoyunluyan kir, bi wan ra şer kir, padîşahê wan Elwend Mîrza kuşt.

Paş salekê, di 1501 da, dirêjî bajarê Tebrîzê kir, Tebrîz ji Tirkmenan stand û kir paytextê xwe û serxwebûniya xwe bang kir. Şah Ismaîlê cuwan û jêhatî di demeke hindik da Xoresan, Hemedan, Bexda, Diyarbekir û Meraş vekirandin. Pey van

kamweriyên mezin, bû xwediyê xwehermendeke fireh.

Xoresan û Hemedan û heldorên wan hêj rind û rind ji Tirkên Selçûqî paqij ne bûbûn. Şah Ismaîl bi camêriya xwe van ciyên buhadar ên Kurdistanê ji destê Tirk û Tirkmenan reha kir. Şah Ismaîl bi van kamwerî û xebtûkoşan niştimanparêziyeke mezin, xebateke hêja çêkir, di rizgarkirina welatê Kurd û Paris da şabaş û aferîna gelê Îranê giş kar kir û firazdariya xwe nîşan da.

Şah Ismaîl bi xebtûkoş û canfeşanî ceng û şerên din jî kirin, Tirkmen û Tirk ji Kurdistanê deranîn, Kurd û Paris ji bin destê neyaran reha kirin. Wî ji welatê Kurd û Paris ra xebateke hêja û mezin kir, bi van xebtên giranbuha firazdariya xwe eşkerand.

Muxabin û pir muxabin ! Şah Ismaîl paşê du gunehkariyên çewt û bervaj kirin : 1- Şîîtiyê kire Ola Fermwer (resmî) a Kurdistanê. 2- Mîriyên Sînedej û Kirmanşahê bi zora şûr ji Mîrên Kurdan standin û kirin bin kargerîniya xwe.

Ev her du karmendiyên (icraat) Şah Ismaîl Kurd sil kirin û ji xwehermenda Safawî sar kirin; êdî baweriya wan ji Safawiyan ra nema.

Di van sedsalan da, sedsalên olbûnê, li her gertevî bi dûrbîna olê dihat nihêrîn. Piraniya Kurd sunnî bûn, şîîtî ne dixwest û ne dipezirand (qebûl ne dikir). Gava Şah Ismaîl şîîtî kire ola fermwer, Kurd pir tengjîn û dilşikestî bûn û ji Şah Ismaîl dûr ketin. Jixwe mîrên kurd, bi standina Sînedej û Kirmanşah û heldorên wan, li Safawiyan bi çavekî bedgûman û bi dudilî û rengwerî dinêrt. Şah Ismaîl bi pirxwaziya xwe û bi desthişkiya xwe ronak ne dît û kûr bîr ne bir. Loma, her du sûc û gunehên wî ji Kurdistanê ra renc û derdên giran anîn : nêzîkî 50 mîriyên Kurdistanê serxwebûna xwe wenda kir, bi milyonan Kurdên azad bûn dîlên destê Tirkan.

Institut kurde de Paris

## YEKÎTIYA KURD Û TIRK

## SERHATIYÊN DILKUJ ÊN KURDAN LI BIN DESTÊN TIRKAN

Berî ku Şah Ismaîl li rohilatê padîşahiyekê bi cî bîne, Tirkan du sed sal bertir li Anadolê xwehermenda Osmaniyan serrast kiribû. Di hengama Şah Ismaîl da, padîşahê Osmaniyan Sultan Selîm bû. Sultan Selîm bavê xwe ji text anîbû xwarê û, li ciyê bavê xwe, li ser text rûniştibû, xwe kiribû Padîşahê Osmaniyan. Ji bo ku ciyê xwe tebût û xurttir bike, 12 birayên xwe kuştibûn ...

Ji van gertevan pir baş xuya dibe ku Sultan Selîm padîşahekî çavnebar û gellek pirxwaz û xwînxwar bû ! Sultan Selîm bicarek xistibû serê xwe ku bibe cihangîr û cihanê tevde bixwe.

Sultan Selîm, ji Roava bêtir, çavên xwe berdabûn Rohilat. Kişwerên vekirandinê li rohilat bêtir hebûn û firehtir bûn !

Li Rohilat, li hemberî Sultan Selîm xwehermendeke xurt hebû. Ev xwehermenda nû û cuwan xwehermenda Safawiyan bû. Şah Ismaîl di van salan da ji destê Akkoyunluyan Diyarbekir, Mêrdîn û Maraş standibûn û xwe gihandibû sînorên Osmaniyan. Sultan Selîm ji van tevgerên Şah Ismaîl pir ingirîbû û veherandibû (qerar stendibû) ku li Ismaîl kopeke dijwar daweşîne û Îran - Kurdistan û Parisistan - gişî jê bistîne. Hêj wêdatir jî, here bibe Iskenderê Mezin, Hindistanê jî vekirîne !

Di vê demê da, di navbera Şah Ismaîl û mîrên

Institut kurde de Paris

Kurdan da nexweşî û tevhevî dest pê kiribû. Mewlana Melle Idrîsê Bedlîsî şîretvanê xurû (xas) ê Sultan Selîm bû. Ew Kurd bû, zana û jîr bû, li ba Kurdan xudan cî û xudan nav bû. Sultan Selîm ev keys û wesana (firset) mezin ji dest berneda, xebtûkoşên zor kirin, Kurdên sunnî ji Şah Ismaîl cuda kirin. Mîr Şerefeddînê Bedlîsî 15 sal bi şûnda, di 1529 P.Z. da, ji Şah Tehmaseb ûdê (nav) Xanîtiyê stend. Bi halandana Melle Idrîs, ji Sultan Selîm ra çend merivên xwe yên şareza û reşbelek şandin. Mîr Şerefeddîn di reşbeleka xwe da tevgera Şah Ismaîl û leyandin û pêşveçûna şîîtiyê dûr û dirêj dida zanîn û ji Sultan Selîm alîkarî dixwest.

Ev qisseya bergiran di Dîwana Sultan Selîm da bi candilî hate peyivandin û, li dawiyê, Sultan Selîm çend Paşayên xwe, tevî Mewlana Idrîsê Bedlîsî, şandin ba Mîr Şerafeddîn.

Şandina encumena ha li Bedlîsê bû destpêka geştecenga şerê Osmaniyan û Safawiyan.

Çendakî bi şûnda, di sala 1514 P.Z. da, Sultan Selîm ji Istanbûlê ordiya xwe rakir, derbasî derya bû, berê xwe da Rohilat. Ji Qeyserî û Sêwazê derbas bû, hat Amasyê. Amasya ji xwe ra kire sernîvek, ano ji ordiya xwe ra kire şergeh.

Mîr Şerafeddîn gellek dorevan (muhafiz) û şerevanên xwe hilanîn, bi Melle Idrîs ra hat Amasyê. Mîr Şeref û Melle Idrîsê Bedlîsî, her du jî, şîretvanên Sultan Selîm bûn.

Sultan Selîm li Amasyayê, bi her du şîretvanên Kurd û bi gewremerd û paşayên xwe, ji bo vê geştecenga bergiran a Safawiyan bi rojan û şevan bêjgoyî (muzakere) kirin, rêzane û çare giş dan pêşberên xwe, xerşe (xerîte) û plan serrast kirin, bi her awayî xwe pêk anî û amadeyên ceng û şer bûn. Bi rêberî û pêşdariya Kurdan, padîşah, ordî, şîretvan û gewremerd ji bo şerê Çildêranê bi rê ketin.

## ŞERÊ ÇILDÊRAN (31)

Mîr Şerefeddîn, Mewlana Idrîsê Bedlîsî, Cengawerên mîriyên Rojkan û hezaran siwarên Kurd ji êlên din ên Kurdan ji ordiya Sultan Selîm ra rêberî û pêşdarî kir.

Padîşahên Asoran, padîşahên zorker û nêrûmend, bi sedsalan bi Kurdan ra şer kir, wek leyiyan xwîn rijand, lê nikaribû ji van geliyên kûr û teng, ji van kaş û hevrazên tund û şîp derbas bibin. Du hezar sal deriyên Kurdistanê ji padîşahên cihangîr ên Asoran ra hiş û biring girtî man. Paşê, Asor bi destê Kurdan wenda bûn. Asor ne gihîştin vê armancê, bê mirad mirin, ev kul û birîn di zikê wan da ma. Lê, ev derên Kurdistanê ku du hezar sal ji padîşahên Asoran ra girtî mabûn, ev çiyayên bilind û dijwar ku Ksênofonê Yewnanî nalandibû, derdnag û perîşan kiribû, ji Sultan Selîm ra bi xahiş û dilxweşî, şayî û şadmanî vebûn. Sultan Selîm bi ordiya xwe va, barxwane û giraniya xwe va ji van derbendan, ji van geliyên kûr, ji van çiyayên tundûşîp bê serêşanî, bê tengahî derbas bû!

Padîşah û giregirên dora wî, paşa û leşkerên wî, hesp û olaq û topkêşên wî, evçend bê jimar enzan û çarpê bûbûn mêvanên Kurdistanê. Kurdistan, bi camêrî û comerdî, mêvandariya xwe bi cî anî. Bi xwarin û vexwarinên mêzxweş û çeşnîşîrîn xanên şahînşahî rast kirin. Di derbasokan da, herkes, mezin û biçûk, bi çepikan û lîlandinan pêşçûyiya mêvanên xwe dikir.

Geştecenga ha dirêj kir, hevraz û nişîvên Kurdistanê, çiyayên şîn û bilind ên serkişandî li ezmanan sergihandî ne diqediyan. Çendakî bi şûnda, ew gihîştin bajarê Beyazîdê, û paşê berê xwe da rohilatê bakurr û riya xwe ajot. Çend roj bi şûnda, serê sibakê zû, li pêşiya wan, li palên hemberên wan şergeha Şah Ismaîl xuya bû. Ev der deştika Çildêran bû.

Institut kurde de Paris

Sîbetirê, bi rohilat ra şer dest pê kir : her du alî jî, di destpêkê da, bi siwariyan dirêjî hev kir. Şerevanên her du ciyan bi mêranî cengine zor kirin. Di miqlacî û mêrxasî û hunerweriyê da tu kêmanî ne dihişt.

Di dawiyê da, Şah Ismaîlê Safawî di meydana şer da birîndar bû. Merivên wî bi zor ew revand. Ordiya wî şkest, ji hev belav bû. Şergeha Şah Ismaîl, tevî jina wî "Taclı Hanim", bicarekê ket destê Osmaniyan (32).

Sultan Selîm 13 roj bi şûnda, bê teqereq, bê şer û pevçûn kete Tebrîzê, paytextê Şah Ismaîlê Safawî. Sultan Selîm çend roj li Tebrîzê ma, paşê vegeriya Amasyayê.

## CIVANA SULTAN SELÎM Û MÎRÊN KURDAN LI AMASYAYÊ

Sultan Selîm, pey vegera xwe ji Tebrîzê, li Amasya bi reşbelekan mîrên Kurdan xwandin (dawet kirin). Bi halan û zirtên Mewlana Melle Idrîsê Bedlîsî, 28 Mîrên Kurdan hatin Amasyayê. Di dîwana Sultan Selîm da, bi rojan civiyan, hûrik hûrik peyv û gotin hilanîn û danîn û teqilandin. Li dawiyê, 28 mîrên Kurdan bi zimanbaziya Mewlana Melle Idrîsê Bedlîsî û xweşgotin û şêrînpeyvên Sultan Selîm bawermend bûn, û di navbera xwe û Sultan Selîmê Osmanî da yekdestî danî û ji Şah Ismaîlê olşîî dûr reviyan.

Padîşahê Osmaniyan, Yavuz Sultan Selîm, û 28 mîrên Kurdan li Amasyayê, di sala 1514 P.Z. da, yekdestînaveyek şeqil (mohr) kir.

Ev yekdestînave ji sê Bendan pêk hatibû :

1- Mîrên Kurdan di erdê xwe yê bav û bavpîrên xwe da, bi serxwebûniya tumî, gerdiş (adet) û rêzanên kevnare yên xwe dê biparêzin. Mîrîtiya wan. wek rêzanên kevn ên berê, dê ji bav û dê bigihîje kurr.

Institut kurde de Paris

2- Mîrên Kurdan, parazvanên sînorên Kurdistanê ne. Eger xwehermenda Osmanî bi xwehermendeke biyanî ra şer bike, Mîrên Kurd siwarên xwe yên çekkirî û karûbarkirî dê bişînin alîkariya padîşah. Leşkerên Kurd di bin Fermandarên xwe yên Kurd dê şer bikin. Eger xwehermendeke biyanî dirêjî Kurdistanê bike, xwehermenda Osmanî, bi ordiya xwe, dê bê alîkariya Kurdistanê bike.

3- Mîrên Kurdan her sal, bi navê diyarî, hinek dirav dê bidin kenza Osmaniyan.

## SERHATIYÊN KURDISTANÊ PEY YEKDESTIYA AMASYA

Sultan Selîm, bê west û bê xwînrijandin, bi xebt û jêhatdariya Melle Idrîs, bû xwediyê Kurdistana rengîn.

Sultan Selîm ji vê kamweriya hêja û bêbuha pir gezdar û dilxweş bû. Mîrên Kurdan jî ji yekdestiya xwe û padîşahê Tirk û Sunnî gelek dilşa bûn.

Hezaran muxabin ! Van mîrên bedbext nizanibû paşê dê çi bê serê peyhatiyên wan ! Melle Idrîs û 28 mîrên Kurd bi destên xwe çi malmîratî anîn serê gelê Kurd ! Van mîrên bedbext bêbavî, bêbextî û nankoriya Tirk nizanibûn ! Wan ne dizanîn ku rojek wê bê, padîşahên Tirkan û Sedirazamên wan û Talat Paşan, Enwer Paşan, Mustafa Kemalan, Ismetan, Celal Bayaran ... dê çi bînin serê Kurdan!

Van mîrên nezan û çavnetêr, Melle Idrîsê şeqlevan nizanibûn ku Tirk 400 sal bi bilêckirin û kuştin û zindan û talan û agir ... dê Kurdistana nazenîn wêran bikin.

Şah Ismaîlê Safawî ji bêfehmiya xwe û bi hişkbawariya xwe ya olî, ano "Şîitî", perçake mezin û bergiran û hêja ya Kurdistanê wenda kir.

Yavuz Sultan Selîm, bê serêşandin, bê şer û xwînrêtin bû xwediyê Kurdistana fêris.



Institut kurde de Paris

Paşê, Sultan Selîm Kurdên cengawer li sînorên rohilat kire parazvan û bi bawermendî, ewletî û asûdegî dest bi vekirandina Misrê kir.

Bi derjê (netîce) vekirandina Misrê, "Parazgeh"ên Islamê, Mekke û Medîne, ketin destê Sultan Selîm. Sultan Selîm gihîşt payeya bilind a xilafetiyê û pertaw û tavdariya xwehermenda Osmanî gihande felekan. Di gihîştina Osmaniyan vê serfirazî û mezinayiyê da, Kurdan rolên bê awa lîstine û alîkariyên hêja kirine.

Kurdan, di hengama Yavuz Sultan Selîm û kurê wî Qanûnî Sultan Suleyman da, di meydancengan da : vekirandina Misrê, girtina Belgradê, şerê Muhaç ê xwînî, cenga Bûdîn, dorpêça Viyana ... xebtûkoşine dijwar kirine. Kurdan, di van şeran da, bi mêranî, hunerbazî û cengaweriya xwe navûdeng birine. Mîrên Kurd, Cengawerên Kurd, ji bo Ol û Xwehermend, ji bo Padîşah û Xelîfetan, bi dilekî paqij, bi merdî û mêrxasî, wek çeman xwîna xwe rijand. Kurdan di dîroka Osmaniyan da roline hêja lîstin. Kurdan mêrine kêrhatî dane xwehermenda Osmanî: sergewremerd, gewremerd, zana, weşbest û fermandar ... Kurdan bi milyonan kurên xwe di riya Padîşah û Xelîfeyan da kirine gorî !

Kurdan 450 sal bi Tirkan ra evçend canfeşanî kiriye, ji bo wan evçend koşiyane, xebitîne. Lê, li hemberê evçend xebtûkoş çi gihîştiye destên wan ? Malmîratî û zebûnî !!

## WENDAKIRINA MÎRIYÊN KURDAN BI DESTÊ TIRKAN

Mîrên Kurdan, gava ku di sala 1514 P.Z. da li Amasyayê bi Yavuz Sultan Selîm ra yekdestî danî, wer bawermend bûn ku mafên ferweraniya xwe, serxwebûna xwe, avrû û ewlemendiya xwe xistin bin girewê.

Institut kurde de Paris

Efsûs ! Ev bawermendiyên wan giş pûç derketin ! Kurd bûn goriyên şapînozî û xap û bêbextiyên Tirkan.

Hêj ji yekdestiya Amasyayê nîv sedsal derbas ne bûbû ku Padîşahên Tirkan ji ber xwe hezar behane çê kirin û Mîriyên Kurdan ên serbixwe yekayek wenda kirin.

Kurdê serazad ji hezaran salan ve, di hengama Sûmîr, Akad, Hittît, Kildan û Asoran da, her dem ji bo serxwebûn û azadiya xwe can da, xwîn rêt. Kurdan îcar jî ji Padîşahên Osmaniyan ra bi hêsanî serfirû ne kir. Kurdan, li pêş ordiyên Padîşahên Osmaniyan mafên xwe yên awist (meşrû) bi mêranî û canfeşanî qedxen (mudafaa) kirin. Nemaza di van 50-60 salên dawîn da, ordiyên padîşahên Osmaniyan, ên "Jön Türk"an û yên "Atatürk"an bi çekên "Modern" ên her reng û her celeb karûbarkirî bûn : top û tivingên lezagir, hawun û bombavêj û mîtralyoz, tank û balafir ... Tirkan, bi van çekên dijwar, bi van çekên agirrêj û mirinrêj dirêjî Kurdan dikir. Kurdan, bê tirs û lerz pêsîra xwe dida ber gulleyên topan û berikên tivingan; pir caran bi tena şilfên xenceran li Tirkan vedigeriyan, wek pilingên ingirî êrîş dibirine wan ! Kurdan şerine bê umîd dikirin! Xwe dida kuştin, xwîna xwe dirijand, ji bo Kurdistanê xwe dikir gorî !

Li Kurdistanê 400 sal şer û ceng û şebxwîn sar ne bû ! Kurdan, ji bo serazadiya xwe, ji bo serxwebûna niştimanê xwe yê pirfiraz, ji bo rizgariya Kurdistana şêrîn ji destê Tirkên nankor û bêbext, bê tirs û endûh, xwe diavêt ber mirinê, niştimanê xwe yê giranbuha gav bi gav, bihust bihust qedxen kir. Kurdistan seraser bi xwîna rewanpakan hat sitirandin !

## DÎLKETINA KURDISTAN

Divê em vê yekê, divê em vê rastiyê bizanibin : Kurd ji çekên Padîşahên Osmaniyan, Jön Tirkan û

Institut kurde de Paris



INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Atatürkan bêtir bi zexelî (*), bi nîrengî (desîse) û komployên wan şikiyan !

Tirkan, li Kurdistanê, ji Şêx û Melleyên afsûnker, bawervaj, çavnetêr û nezan hevalbend ji xwe ra ber bi hev anîbûn (33).

Pir caran, van Şêx û Melleyan, van kurtîlxuran, Mishefa Pêxember digirt destên xwe, dikir mertal, xwe digihand kel, çeper û baruyên Kurdan; ev burc û baruyên ku carê ne ketibûn destên tu xwehermend û neyaran. Van Şêx û Melleyên nizmpaye û bêbext ev sargeh û burc û şatoyan bi Mishef û sond û selawatan ji destên cengawerên Kurd derdixistin û didan destên Tirkan, ev Tirkên neyarên malbat û bingeha Kurd !

Van Şêx û Melleyên bawervaj û nezan û bedbunyad, bi ayetan, bi hedîsan, bi tifuyên şêx-islam û miftiyan Kurd dixapandin, Kurd didan bawer kirin ku kesê ku di nixûna Xelîfeyê Islamê da şer bike dibe bêbawer û bêol û rasterast diçe dojehê. Van Şêx û Mellan, bi van fend û fûtan, bi van firîb û zexeliyan çekên ku Kurdan pê maf û serxwebûn û namûsa xwe qedxen dikirin bi givaja Mishef û ayet û hedîs û tifû jê digirtin, radestî (teslîm) Tirkan dikirin !!

## YENI ÇERI Û AKINCI

Tirk, hîn rasttir, Mongol, Selçûq, Kayhan, Tatar û Tirkmen, gava hatin Kurdistana bindestê Abbasiyan, pûtparêz bûn. Wê gavê - di sedsala 11im û 14im P.Z. da - hêj ne ketibûn Ola Islamê. Paşê bûn musulman. Ji rêzanên bingehî yên Islamê, yek jî "Cihad" û "Xezû", ano "kuştin" û "talan" e ! Ev bîrok (madde) pir bi endaz (muwafiq)ê Tirkan bû, bi tumî bi keys û fesala wan bû. Em dikarin bêjin ku Tirk ji bo van her du pirsan, ano "Cihad" û "Xezû", hîn çêtir, em bêjin ji bo "kuştin" û "talan" Musulman bûn ! Ev Ol ji bo Tirk û Tatar û Tirkmenên talanker û xwînxwar pir bi kêr hatibû. Ev Ol

Institut kurde de Paris

bicarek di endazê xuy û peykerên van barbaran da bû !

Tirk, gava bûn musulman, xwestibûn ku ji vê olê ra behremendiyeke zor bikin. Tirkên Osmanî, ji bo ku bigihîjin armanca xwe, du sazmanên (teşkîlat) şigevtwer (ecêb) anîn meydanê. Lê, li cihanê, li tu ciyan, li ba tu xwehermendan, wek vê sazmanê tutiştê sosret û şigeft û barbar ne hatiye dîtin : Yeni Çeri Ocağı ! Akinci guruhu !!

## YENI ÇERI

Leşkerên Yeni Çeri bi sedhezaran bûn. Tirkên Osmanî ji berhevkirina Yeni Çeriyan ra "Devşirme usulu" digot, ano "Rêzana berhevkirina kurên Fillan".

Ji bo berhevkirina kurên Fillan, her sal bi hezaran leşkerên tirk êrîş dikir bajar û gundên Ulah, Bulgar, Sirb, Yewnan ... – ev kişwerên han di van deman da dîlên bindest ên irkan bûn – û cuwanên 14-15 salî bi zor û bi stemkerî didan hev, ji himêz û pêsîrên dê û bavan cuda dikirin û mîna keriyên tarişan didan ber xwe û diajotin, dibirin Istanbûlê. Paşê, ev ciwanên bedbext li leşkergehan dadikirtin. Berî her tiştî, bi lezûbez, hosteyên mîzokbir (sunnetçî) dihatin, kirîvanî datanîn, kurên fillan "pak" dikirin. Piştre, ev reben û pepûk radestên mellan û suxtan dikirin û Ola Islamê di guhên wan da dixwend !

Ev cuwanên bedbext bi stemkerî û bêdadî û zorbazî ji himêz û pêsîrên dê û bavan, ji ol û bawerî, dêr û welatên wan cuda dikirin; êdî heya mirinê, mal û ezbet û jin û jinkirin nabînin ! Ev xortên bedbext, ji vir pê da, bihna xweş û germ a paxilên dê û bavan napêjinînin, tu dengên şêrîn û nuwazişker nakeve ber guhên wan ! Ji bo van bedbextan, ji ezmanan nefrîn bariya ! Ji dê û bavan, ji naz û nazeniyan bêpar man ! Pir dûr ketin ji îro bi şûn da, bextiyarî û kamranî ji wan ra ne ma ! Ev



Institut kurde de Paris

bedbext êdî bûn Yeni Çeri û çûn ! Ev êdî ne enzan in ! Ev êdî enzanîtî, dilovanî, mihrivanî nizanin ! Ev êdî leşkerê Tirk in ! Ev ji vir pêda kuştin, talankirin, şewitandin û wêrankirinê zanin. Ev pasivanên Ola pirfiraz û pirpîroz a Islamê ne ! Ev pasivanên Xelîfe û Padîşah in. Ew dê "Cihad" û "Xezû" bikin, "Xenîmet"an dê bidin hev ! Welatan tarac (talan) bikin. Ew dê kişwer û bajaran vehirînin, welatan bistînin, talan bikin, keç û bûk û xortan dê dikin dîl, di bajaran da bifroşin ! Ew dê hêj pêşdatir herin; evçend xwînxwarî, gend û gemarî, genîwerî ne bes e ! Ew dê birîndaran, dîl û girtiyan serjêkin, bi dar vekin, singan bi wan da bikutin, mêran di sîtilan da bikelînin, zarok û keç û kurran di kadînan da tije bikin, gaz lêkin û agir berdinê. Ew dê çêliyên bê guneh bişewitînin ! Ev êdî bûn cenawur, bûn yeni çeri, bûn eskerên Tirk !!

## GURUHÊ AKINCIYAN

Akıncı pêşdarên ordiya Osmaniyan bûn. Akıncı bi tu rêzan û rêdaran ne girêdayî bûn. Ev sazman ji yê Yeni Çeriyan hovnaktir û barbartir bû. Ev çend hezar siwar bûn, ji serserî û mirarker û hovên derûberan û ji kurtîlxuran hatibûn hevdan.

Gava ordiya Padîşah diçû cengê, van serseriyên cenawur û gûncenawur pêşdariya ordiya Osmaniyan dikir.

Ev bedxuyên merivxur, gava ku diketin erdên neyaran, ji her mirdarî û çepeliyê ra destûrdayî bûn, ji tu gunehkarî, ji tu gendgemarî û genîwerî berpirsiyar ne dibûn. Ji bo wan, her bedkerî û mirarkerî û tevgerên kirêt fêhil (helal) bû ! Gava Akıncı, wek gurên har û devbixwîn, bi zûrîn û qêrînan diketin bajar û gundan, herkes hebûnên xwe dihiştin, bi tirs û heras, bi girîn û nalîn bazdida û direviya, canê xwe yê şêrîn reha dikir.

Institut kurde de Paris

Bedbextên ku nikaribûn birevin diketin destên van xwînxwar û cenawurên ku sorseteyên giran, bi awayên dijwar, dianîn serê van belengaz û rebenan û ew işkence dikirin : kal û pîr û ciwan ne digot; kî biketa destên wan serjêdikir, bi satoran perçe dikir, dikişand çarmixan û sing dikir, agir berdida û dişewitand ...

Nemaza, van Akıncıyên bê şerm û bê wijdan di destdirêjayiya namûsa jin û keçan da tu bêbavî bi şûnda ne hişt. Van Akıncıyên bedbunyad û genîrewan, bê êşa wijdanî, zarokên heft, heşt salî jî lekedar û berbat dikirin ...

Dawiya dawîn, pey evçend xwînrêtin, rûreşî û stemkarî, talan û yaxmadest pê kir : Akıncı berî hertiştî Tirk e, ano talanker e ! Rewan û bunyadê Tirk talankerî ye ! Tirk, berî hezar sal, gava Tirkistan berda û koçbar bûn, berê xwe da roava, armanca wan talankerî bû. Tirk, ji bo tarac û talanê, ciyê xwe "Tirkistan" hişt, ber bi roava hat û bû bobelata serê Kurd û Kurdistan û hezar gel û hawişên din ! Kurdistan û hezar kişwerên din wêran kirin.

Belê, Akıncı berê hertiştî Tirk e ! Berê dikuje, namûsa dawpaqijan lekedar dike û paşê jî dora talanê tê : Akıncı ji hûrûmûrên giranbuha, ji gewher û zêr û zûvan çiçend ku karibe hilgire diavêt pişta xwe û agir berdida xanûmanan û diçû. Li paş xwe merin, agir, şîn, girîn dihişt, panî dida hespê xwe û diqeştiya û diteqizî !!

Padîşahên Tirk ku hem Padîşahî dikir, hem jî Xilafetî diajot û li ruyê erdê cînişê Xwedê bûn, li ser postê Pêxember rûniştibûn, şalika Pêxember li xwe werkiribû, neyartiya Kurdê islam dikir û xwîna wî vedixwar !

Ev Padîşahên Tirk ên bedbunyad, ku ji wan ra Emîrulmuminîn dihat gotin, ji bo tarackirina mafê Kurdê stemkêş, ji bo bicarek ji ruyê erd rakirin û wendakirina yekdest û destbirayên xwe yên doyîn,

Institut kurde de Paris

vî Kurdê camêr, mêrxas û musulman ji tu kirêtî û çepelî, ji tu çewtgerî û fend û fûtên xwe şûnda ne dida !

Ev Padîşahên zorba, xwînxwar, bêbext; û paşhatiyên wan ên kirêttir û xwînxwartir - Talat, Enwer, Mustafa Kemal, Ismet, Celal Bayar ... - ji bo ku Kurd li cihanê nabedîd bikin, ji bo ku ji nav û dengê Kurd tu nîşan nehêlin, ji top û tiving û tangên xwe pêva, bi ayet û hedîs û fituyan jî neyartiya Kurdan kir, tiştê ku ji wan hat ne hêvişand (teqsîr ne kir) !

Nuha, ji bo piştekdan (teyîd)a engişên xwe, nivîsandina zanayê Rûsî yê bêalî, Alexandre Jaba, em dê li jêr rast bi rast binivîsînin, em dê dawîna vê qissê bînin :

"Berî ku Kurd xwe bigihînin Tirkan, li Kurdistanê pir debistan hebûn. Wan, li vir, ji zaniş ra pir berxwarî (qabiliyet) nîşan dida. Li Kurdistanê, li her bajar, bajarok û gund 1, 2, 3, carna jî bêtir debistan hebûn. Debistan di bin parastina ferweriyê da bûn. Li Kurdistanê zaniş û pîşewerî (senet) pir buhadar bû : li Cizîr, Amedî, Soran, Sêêrt, Bedlîs, Diyarbekir (Amed) û gelek ciyên din xwendegehên payebilind hebûn. Ji bo standina giwahnave (şehadetname) divabû xwendevan ji 12 zanewerî azmayiş (imtihan) bibin.

Gava Kurd ketin bin destên Tirkan, debistan kêm bûn, xwendegeh û xwendevan gelek kêm man. Dibe ku hebûn û tunebûna wan êdî xuya ne dibû".

## PADÎŞAHIYA SAFAWIYAN PEY ŞERÊ ÇILDÊRAN

Şah Ismaîlê Safawî, pey şkestin û perîşaniya şerê Çildêran, deh salên din padîşahî kir. Di sala 1524 P.Z. da temenpayan bû.

Institut kurde de Paris

## PADÎŞAHIYA TEHMASEBÊ YEKIM

Pey mirina Şah Ismaîl, kurê wî Şah Tehmasebê yekim bû Padîşah.

Şerên ku bi Padîşahê Osmaniyan, Sultan Suleymanê Qanûnî, kurê Yavuz Sultan Selîm, ra kirin, di gişan da şkest : Bexda û Wan wenda kirin.

Şah Tehmaseb bedsezayê (ceza) bavê xwe kişand. Pir ne ajot, temenpayan bû.

## PADÎŞAHIYA ABBASÊ YEKIM

Şah Abbasê yekim Padîşahê çarim ê Safawiyan e. Şah Abbas, di hengama Padîşahiya xwe da, çend kamwerî bi dest xistin : li aliyê Kurdistana roava û li aliyê Qefqasê sînorên xwe fireh kirin. Tirkên Özbekistan ji aliyê Xoresanê hin cî standibûn; ev cî ji Özbekan vegerandin. Ji bo geş û gumhurî û avayiya kişwerê xwe xebtûkoş kir. Şah Abbasê yekim jêhatîtir û hêjatirê Şahên Safawiyan e.

## PADÎŞAHIYÊN ŞEŞ ŞAHÊN BÊKÊR

Di hengama şeş şahên ku pey Şah Abbasê yekim ra hatin tu huner ji wan çê ne bû. Demên her şeşan jî vemirokî û çilmisokî derbas bûn.

Paşê Padîşahiya Safawiyan ket destê Nadir, Nadirê Tirk : di 1732 P.Z. da, di hengama Tehmasebê duyim da, sergerdekî Tirk peyda bû, navê wî Nadir bû, ji ala Havşar bû û kurê şivanekî bû.

Nadir 6.000 meriv gihandin dora xwe, dirêjî Xoresanê kir û bajar stand, li wan doran bû ferweran.

Di vê hengamê da, Afganistan dirêjî Safawiyan kiribû û pir ciyên wan xistibûn bin destên xwe. Tehmasebê duyim ji Nadirê sergerde gazî xwest. Nadir hat hawara Tehmaseb û bi Afganiyan ra şer kir û ew şikandin, da dû wan û Afganistan seraser vekirand.



Institut kurde de Paris

Nadir, pey vê kamweriyê, ûdê Tehmaseb Kulu Han stend û bû gewremerd û şîretmendê Şah.

Lê, gava Nadir (Tehmaseb Kulu Han) ji Afganistanê vegeriya, Tehmasebê duyim ji Text anî xwarê, ciyê wî da Abbasê duyim ê heşt salî û evê dawîn kire şah. Abbasê duyim di 1735 da temenpayan bû.

## PADÎŞAHIYA NADIR ŞAH

Nadir Şah di sala 1735 da li ser Text rûnişt, ordiyeke mezin berbihev anî û Afganistan û Belûcistan vekirandin. Di sala 1799 P.Z. da, dirêjî Hindistanê kir, ordiya Gurganyan (neviyê Timurlenk) şikand û bajarê Delhî vekirand, talan kir, tiştine zor giranbuha standin û vegeriya Îranê. Pertew û nêrûmendiya kevnare ya Îranê vegerandin.

Lê, Nadir Şah ji fêhma xweşgerînî pir dûr bû, stemker û bêdad bû. Loma, kargerîniyeke hêja ne bir serî, ji bedgerîniya (sûî idare) xwe Kurd ji xwe xeyidandin. Kurdan şoreş rakir. Nadir Şah leşkerên giran bi ser Kurdan da şandin. Lê, hêj ne gihîştibû meydana şer, temenpayan bû. 1747 P.Z.

Nadir Şah bîst sal Padîşahî kir. Ji ezbeta Nadir Şah çar Padîşahên din hatin. Lê, ji van Padîşahan yek jî ji zebûniya welêt ra tu çare ne dît. Gelê bedbext û perkende ji tevheviyê pak ne bû, jîneke asûde ne dît !

Paşê Kerîm Xanê Zendî rabû, di 1760 P.Z. da Tac û Text ji Nadiriyan standin.

## PADÎŞAHIYA KERÎM XANÊ ZENDÎ

Kerîm Xan Kurd bû. Ji êla Zend bû. Di 1760 P.Z. da Padîşahî ji destên Nadiriyan derxist, bû Padîşahê Îranê. Bîst sal bi kamwerî Padîşahî kir.

Kerîm Xanê Zendî zanişmend, pîşewer û hunermend parastin. Ji pêşveçûna çadvanî û bazirganiyê ra pir

guh dida. Bajarê Şîrazê kiribû paytextê xwe, ew pir xemiland û fireh kir, di dadmendî û gumrehgeşiyê da hişt. Di 1780 P.Z. da ji vê cihanê koçbar bû.

Di pey Kerîm Xan ra, Zekî Xan, Sadiq Xan û Elî Murad Xan padîşahî kir. Lê, pir muxabin ! Her sê Xan jî wek bavpîrên xwe jêjatî û kêrhatî derneketin, qelsî kir, pejmurde bûn, padîşahî ji destê xwe revand. Padîşahî di 1796 P.Z. da gihîşte Kacaran.

## PADÎŞAHIYA KACARAN

Qacar Tirk bûn. Êleke mezin a Tirkan bû. Di sedsalên 12im û 13im da, gava Tataran Tirkistan leyand, Kacar ji ber Tataran reviyan, hatin roavayê Asya. Ji Xoresan ta hundirê Sûrya belav bûn. Gava di 1518 P.Z. da Şah Ismaîl bingeha xwehermenda Safawiyan danî, endişîbû (fikirî) ku êla Kacar di ceng û leşkeriyê da jê ra bi kêr bên. Loma, ji Kacarên Tirk bi jimareke pir anîbû dora Tehranê û dabû rûniştandin. Di sala 1796 P.Z. da, serekê van Kacaran, Aqa Muhammed, serdestî li Ezbeta Zendiyan kir û li ser Textê Îranê rûnişt. Ano, Kacarên koçer bûn xudan Tac û Textê Kurdistanê !

## PADÎŞAHIYA XANEDANA PEHLEWÎ

Di sala 1925 P.Z. da, yek ji efserên ordiya Kacaran, ku navê wî Riza Xan bû û ji êla Mezindiran a Kurdî bû, wergerkeke leşkerî çêkir û dawiya Xanedana Kacaran anî.

Riza Xan xanedaneke nû, xanedana Pehlewî sazimand kir. Navê Ecemistan jî kire Îran û şahîtiya xwe bang kir.

Riza Xanê Pehlewî bi avêtina Kacaran tenê qîma xwe ne anî. Di hengama Kacaran da, Ecemistan ne xwehermendeke sezawar a van sedsalan bû. Ecemistan kişwerekî gelek şûndamayî bû, di nav nezanî û çewtbaweriyê da pûyan bûbû. Riza Xanê Pehlewî ji



Institut kurde de Paris

bo pêşveçûna Îranê û "modernîzekirina" Îranê pir xebitî. Ji aliyê leşkerî, zanişmendî, şehrevaniyê pir wergerkên hêja bire serî. Lê, Riza Xanê Pehlewî kêmaniyeke pir mezin, sûcekî pir giran, gunehekî bê senc û pîvan kir ! Bêdadî, stemkerî û dijwariyên pir hofnak di nixûna Kurdan da çêkirin : wî ew kuştin, talan kirin, dûrandin, perîşan kirin ...

Em vê kisseyê naxwazin ducarînin, kula kûr û noyên dilê xwe nû bikin. Lê, em hêvîdar in, niyazkar û bendewar in ku kurrê Riza Xanê Pehlewî, Şahînşahê Îraniyan ê îro baş bîr bibe û sûda (mana) pirsa Îranê rind fehm bike : Îran Kurd û Paris e. 90% Kurd + 10% Paris = 1 Îran e. Padîşahiya Paris + Padîşahiya Kurd = Şahînşahiya Îran e.

## KURDISTAN Û MÎRÊN KURDAN DI BIN DESTÊ ŞAHÊ SAFAWIYAN DA

Çawa ku me di kisseya Xwehermenda Safawiyan da nivîsandibû, Şah Ismaîl bi dilîrî û xebtûkoşên "mirîd"ên xwe yên Kurd li Tebrîzê li Textê Şahiyê rûnişt. Lê, gava Şah Ismaîl bi xwîna Kurdan bû xudan kişwerekî fireh û ji Tebrîzê heya Meraşê xist bin destê xwe, êdî xwe ji bîr kir ku di Kurdistanê da Şahê Kurdistan e. Paşhatiyên wî jî bicarek ne anî bîra xwe ku tacê Kurdistanê danîne serê xwe, li ser textê Kurdistanê rûniştine û dest bi terraneyên (nexme) Paris û Ecem kirin.

Çi gelê kurd, çi jî mîrên kurd guh da vê guhartinê. Kurdan Paris ji xwe cuda ne digirtin, Paris ji xwe dijimartin. Ma bi hezaran sal welatê Paris ê biçûçik ne perçeke Kurdistana gewre bû ? Bi hezaran sal, ji Asor û Kildan û ji neyaran kê Paris diparastin? Jixwe ev dem ne dema gelîtiyê bû. Loma, di hengama Şah Ismaîl da, Kurdan li terraneyên Paris û Eceman tu giranbuhayî ne dabû. Lê, li dawiyê, kisse guherî, bû awakî din û derket meydanê. Şah Ismaîl dest bi dexisandina Mîrên Kurdan kir, xwest

Institut kurde de Paris

ku Kurd û mîrên wan ji meydanê rake. Loma, kisseya şîîtî û sunnîtiyê geş kir, şîîtî kire ola xwehermendî û bi vî awayî Kurd û Paris ji hev cuda kirin. Ji cudabûna her du birran xwehermenda Safawiyan qels ket. Ji vê qelsiyê Şah Ismaîl jî têra xwe renc kişand. Kurdistana roava, ji Tebrîz heya Meraşê, wenda kir. Bi ser vê jî jina xwe Taclı Hanim li ser kir, da destê Tirkan, destê neyaran. Endîşeya wî ya bi salan ku sazmendiya imparatoriyeke mezin bû ne çû serî, pelişî, bû leylaneke derewîn û vemirî.

Ji aliyê din jî, Şah Ismaîl û paşhatiyên wî, ano Nadirî û Kacar, li gel perîşaniyên xwe, li gel şkestina xwe li ber Osmaniyan, ji kirêtî û nebekariya xwe şûnda ne diman. Wan Kurd û Mîrên Kurdan ne dievînandin. Li gel vê yekê, çepelî û stemkeriyên Safawiyan û Şahên din wek stemkeriyên Osmaniyan ne bûn. Li Kurdistana rohilat danişmendî û avadanî hindê Kurdistana roava nizm ne ketibû.

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Institut kurde de Paris

## DI SEDSALÊN 19im Û 20im DA, KURDISTANA ROAVA

## HENGAMÊN SULTAN HAMÎD, JÖN TÜRKAN Û MUSTAFA KEMAL

Padîşahên Osmaniyan û Sadr Azemên wan, Paşayên van Padîşahan û peyhatiyên wan : Telat, Enwer, Cemal, Mustafa Kemal, Ismet, Celal Bayar ... bi topan, bi tivingan, bi tang û balafiran û bi fen û fûtan, bi bêbextiyên rengareng Kurdistana roava ya rengîn di 400 salan da seraser kir wêranezar û Kurdên bahadir kirin dîlên bin destê xwe.

Padîşahên peymanşiken ên Osmaniyan, ku bi Mîrên bijare yên Kurdan ra bi Peyman û şeqil û naviş û bazaran û bi ferman û sondan yekdestî danîbû, bi bêbextî ev mîr ji meydanê rakirin.

Belê, Padîşahên xudan Tac û Text, Sadr Azam û Paşayên bi paye û nav, bê şerm û bê fedî, namûs û rûmetên xwe firotin ! Peyman û sond şikandin !

Mîrên Kurdan ku bi "peymannave"ya Amasya yekbend û yekdestên Padîşahên Osmaniyan bûn, bi vî awayî, ano bi bêbextî û bi bêdadî ji meydanê hatin rakirin! Bi milyonan Kurd bê xwedî, bê serî, bê mezin man.

Ji vir pêda, Paşa û Walî û Qadî ... û bendekarên (memûr) zorba û bêdad, ku ji Istanbûlê - vê paşiyê ji Ankara jî - dihatin şandin Kurd, Kurdên bedbext, bicarek di bin fermanên wan da mabûn.

Paşa û bendekarên zorba bitenê bi du ustubarên (wazîfe) bergiran kariwer dibûn : berhevkirina

Institut kurde de Paris

leşker û ya dirav ! Di vê navê da, bendekarên çavnetêr bi kisseke din a bergirantir kariwer dibûn: dagirtina bêrîka xwe !

Asayişa Kurdistan, tendurustiya gelê kurd, çandevanî, bazirganî, pîşewerî, nemaza zanişwerî ne dihatin bîra tukesî.

Jixwe, di van sedsalên dawîn da, imparatoriya Osmaniyan xurtî û gûrîpaşiya xwe wenda kiribûn : Cezayir, Tûnis û Misr ji destê Osmaniyan derketibûn. Romanya, Macar, Qaradax, Yewnanistan, Bulgaristan giş bûbûn Padîşahiyên xudan serxwebûn. Di 1879 P.Z. da, ordiyên Ûrisan ji rohilat, ji Qafqasan, derbas bûbûn û Erdehan, Qars û Ezerom girtibûn. Ji aliyê roava jî Rûmelî bicarek leyandibû, çend kîlometre hatibûn nêzîkî Istanbûlê. Lê, Ingilîz zû hatin gaziya Tirkan. Ingilîzan dil ne kir ku Ûris Istanbûlê û geliyên Dardanêlan (Çanakale û Bosfor) bistînin.

Ûrisan bivê nevê ji vekirandina Istanbûlê berda, ji erdê Osmaniyan gelek cî ji wan ra vegerandin.

Me li jor gotibû ku Imparatoriya Osmaniyan mezinatî û xurtiya xwe wenda kiribûn. Belê, Imparatoriya Osmaniyan di wan hengaman da ji tabûtuwan û pertewa xwe bêpar û cuda mabû. Ev xwehermenda fêris, wek reşê şevê, navekî mezin û warekî wenda mabû.

Xwehermenda Osmaniyan, bi saya qayîşkêşiya xwehermendên gewre pêdar dima. Roja ku ev qayîşkêşî ji meydanê rabe, ev xwehermend û ev gel dê biherife û ji meydanê wenda bibe.

## SULTAN HAMÎD

Sultan Hamîd di sala 1903 P.Z. da bi Yewnanistana biçûçik ra şer kir, ew şikand û navê "Gazî" bir. Lê, ev ûda firazbaz ji Sultanê fêris ra tu pertew û helahela pir ne kir.

Institut kurde de Paris

Sultan Hamîd bi van Gewremerd û Paşayên ku ji birayê wî Sultan Azîz ra çewtejotî (sûîqasd) kiribûn baweriya xwe ne dianî. Sultan Hamîd li dora xwe, ji peyayên çê û jêhatî bêtir, hulûlkên (bende) durû û bawervaj dabûn hev.

Sultan Hamîd, ji bo ewlemendiya canê xwe, li geliyê Istanbûlê, li kenarê deryayê, li raserê "Boğaz içi", li rastê Yıldızê, bi navê "Yıldız" sarayeke bi navûdeng ava kiribû û dora saraya xwe bi bendeke xurt çember kiribû û pêçabû. Sultan Hamîd, Padîşahê pir pertew û tacdarê fêris ji hundirê vê saraya bi bedenan çemberkirî "kişwerê tabidar û gewre" yê Osmaniyan didêra û kokûsaz dikir !

Li derva, li ba Awrupayiyan, tu paye û bergiraniya xwehermenda Osmanî ne mabû. Hundirê kişwerê osmanî jî di tevheviyê da bû. Jendumendiyeke (hercumerc, tevlihevî) dijwar fermanferma bû. Li Kurdistanê, Mîrên "ji ber şûr mayî", serek û giregir, nemaza axayên êlên giran ji bendekarên Padîşah ra serfurû ne dikir. Dêrsim her dem û gav ser radikir. Li Sasûn, Hekarî, Şemdînan û li gelek ciyên din ên Kurdistanê çiksmendiya ferweraniyê nema bû.

Li welatê Arnawûdan, li Yemen, Ibn Suûd, Çiyayê Durziyan tu caran geşteceng kêm ne dibûn.

Di vê sedsala ku tê da Awrupayî di riya zanişmendî û hunerweriyê da bi gavên dêwane pêşde diçûn, Imparatoriya Osmanî jî di nezanîna reş û tarîtiyê da wenda bûbû : zanişwerî, bazirganî, çandevanî û pîşevanî di nimûna (şekil) sedsalên kevnare da bûn.

Kes nezane çawa bûbû. Li Istanbûlê çend debistan avakiribûn. Di bajarên din da, nemaza li Kurdistanê, zanişwerî bicarek hîç bû. Çawa ku zanişwerî li Kurdistanê hîç bû, li ba Arnawûd û Ereban jî hîç bû. Anadol û Rûmelî ji van deran hinek çêtir bûn. Sultan Hamîd û giregirên serayê sûd û behreyên xwe di hiştina gel di nezaniyeke kûr û tarî da dîtibûn.

Institut kurde de Paris

Çar pisporên Sultan Hamîd, çar gewremerdên bergiran ên seraya Yıldız hebûn : Fehîm Paşa, ji bajarê Bursa; Çerkez Muhammed Paşa (nexwenda); Muhammed Izzet Paşa (Izzet Holo), ji Şamê; Şêx Ebûl Huda (Ufurukçu Ebûl Huda), ji bajarê Helebê.

Fehîm Paşa di pêşiya gişan da bû. Serekê sazmendiya "Jurnalci"yan bû, agahdarê razên (esrar) bergiran ên Sultan Hamîd û şîretmendê wî yê rûmetwer bû. Çerkez kaba sakal, Muhammed Paşa, nexwenda bû, lê peyakî girs û çeleng û kêrhatî bû. Karkerê bindest ê Fehîm Paşa bû. Ustubarê bergiran ê Muhammed Paşa bi cîanîna asayiş û ewletiya paytext bû. Zindan û girtîgeh û dûrangeh di bin fermandariya Muhammed Paşa da bûn. Kaba Sakal Muhammed Paşa destê rast ê Fehîm Paşa bû, berpêşgehê (merci') jurnalciyan bû.

Eger em ji hengama Sultan Hamîd ra hengama Jurnalciyan bibêjin, em tu neweyiyê nabêjin. Her roj, bi riya Fehîm Paşa, hezaran jurnal digihîştin destê Kaba Sakal û wî jî bi werbêja wicdanî werbêj dikir, qenc û neqenc ji hev dikirin û dibijartin : bedbextên aliyê neqenc sezayê xwe didît ! Her roj, bi sedan xanûmanê bêgunehan wenda dibûn. Sultan Hamîd û giregirên sarayê ji bo asûdeya xwe ev çare dîtibûn.

Fehîm Paşa bîrewer û jêhatî bû. Lê, behreya xwe ji behreya gel pêştir digirt. Fehîm Paşa ji Sultan Hamîd ra şeqlevanî dikir û bi milyonan berhev dikirin.

Izzet Paşa Holo bawermentirê peyayên Sultan Hamîd bû. Bicarek Sultan Hamîd pê baweriya xwe anîbû û xwe lê spartibû. Muxabin ! Izzet Paşa meriveki bi fend û fût bû, di zexeliyê da pir dijwar bû. Loma, bi fend û fûtan, bi lîzbazî û zexeliyan di navbera gewremerd û paşan da roleke yeman dilîst û bêrîka xwe dadigirt.

Em werin ser Şêx Ebulhudayê Ufurukçu (pufînok). Sultan Hamîd pir ponjnevaj (wehham) bû. Çiçend

Institut kurde de Paris

ponjnevaj bû, ewçend jî bawervaj bû, olparêzekî çavkor bû. Ebulhudayê zexel bûnişrewanê (haletî rûhiye) Sultan Hamîd baş nas kiribû. Sultan Hamîd dixiste dabê, dafê, jê paye û zêr dibirin.

Sultan Hamîd bawer dikir ku Ebulhuda Yezdanpaye (welî) ye, li tiştine veşare agah e ! Loma, Sultan Hamîd kisseya xwe ya bergiran bi şîret û şîretmendiya Hezretî Ebulhuda çê dikir.

Sultan Hamîd imparatoriya xwe ya gewre ku ji Yemenê ta Qafqasan, ji Basrayê ta Deryayê Adriyatîk pehn û frereh kiribû, bi vê mejikê (zihniyet) digerand. Lê, çawa ev imparatorî hilnediweşiya ? Çima ku Padîşahên Osmaniyan ji alîkî din jî Xelîfeyên Islamê bûn, li nik muslumanan pir xudan rûmet bûn, Textegehên (meqam) wan bilind û pirfiraz bûn. Eger Sultan Hamîd xwe li vî ciyê bilind û pirfiraz nesiparta, du rojan li ser Textê Osmaniyan ne dima, ne mabû !

Di hengama Sultan Hamîd da, ji her pitike (noqta) bûnişa xwehermenda gewre ya Osmaniyan perîşan û berbad bû : diravkodên (kasa) wan vala bûn, rê û şeqam pirr hindik bûn, pirên derbasokan pejmurde bûn, zivistanê rêwîtî heman, heman rawest dibûn. Xweşber, ji kêmaniya riyan bazirganiyeke pêşvebirî û gumreh tunebû : çandevanî ji binî ne mabû. Sazmendiya jandarma pir kêm bû. Jandarma mehaneya (maaş) xwe tekûz ne distend, loma barê ustuyê bêçîz (feqîr) û zebûnan dibûn !

Em werin ordiya Osmaniyan : di hengama Sultan Hamîd da, ordiyeke mordern, bi karûbar, şipîl û bi werziş tu nebû. Kadroyê ordiyê pir kêm bû, serekcengên wan ku berdestên Almanan rabûbûn pir hindik bûn. Di ordiya Osmaniyan da, di hengama Sultan Hamîd da, hêj "binbaşi û kolağası"yên nexwenda hebûn. Ordî gerwerzî (manawra) çi ye nizanibû, werziş û perweriş û bendûbesta wê ne baş bû. Sazmenda tendurustî û barxane di bûnişeke perîşaniyê da bû.



Institut kurde de Paris

Gelo di pitika tendurustiyê da bûnişa Osmaniyan çawa bû ? Berbadê berbadan bû ! Li bajaran bixwe jimarên bijîjkan pir kêm bûn. Derman û nexweşxane kêm peyda dibûn. Di gundan da bijîjk çi ye kes nizanibû, gundî gerdenxwarê şêx û melan bûn. Şêx û mela ev belengaz bi nivişt û avsûn û pivkirinê bimar (tedawî) dikirin.

Lê berbattirê giştikan bûnişa zanişwerî bû : jimarên dibistanan li bajaran bixwe gelek hindik bûn. Medreseyên kevnare cîgehên suxte yên nezan bûn. 90% ji gel ne xwenda bûn û 10% mayîn jî xwenda bûn, lê pirtirên van xwendayan jî bawervaj bûn.

Di hengama Sultan Hamîd da, têkilbûna xwehermendên biyaniyan hebû. Bi texlîtan behreyên xwehermendên mezin di erdên Osmaniyan da hebûn. Loma, wan jî li hundirê kişwerê Osmaniyan rengareng serêşanî û entrîka çêdikirin û ji vê yekê di welatê Osmaniyan da tucar tevhevî û serkeşî kêm ne dibûn, tukes jîneke asûde derbas ne dikir. Di sedsalên 19im û 20im da tevgera xwehermenda Osmanî ewha bû. Belê, rastî ev e. Di van sedsalan da Imparatoriya Osmanî evçend pejmurde, evçend bê tabûtuwan bû !

Gelo çima Imparatoriyek evçend perîşan, perkende û qels ne diherifî û ne diçû ? Bi mejîka me, ji bo nemirina vî nexweşê li ber xirexirê du engîz hebûn: yek jê hundurî, ya din jî derveyî bû.

Engîza hundirî bi yekdemî Xelîfebûna Padîşahê Osmaniyan bû. Engîza derveyî jî qayîşkêşiya Xwehermendên Awrupayiyan bû. Rastirê wî behreya Ûris û Îngilîz bû.

Em van her du engîzan hinekî kûr bikin :

1- Engîza hundirî :

Ji destpêka Islamiyetê, textgeh û Meqamê Xelîfetiyê li ba Islaman bi konevanî û olî ciyekî pirfiraz û bergiran bû. Berê Ereban ji Xelîfe ra "Emîr El-Mumi-

nîn" digot. Paşê Osmaniyan "Halifeyi Ruhi Zemin" digot.

Osmaniyan bi ser mezinayî û firazbaziya Xelîfeyên xwe ra xudayî û razberî (manewî), xurtî û pertav jî dikir. Osmaniyan di xelîfeyên xwe, raserên nîgerandina enzan, da hebûneke pertewdarî, bahadirî û zorawerî didît. Di nivîswaran da, di devê kesan da, li ser xelîfeyan hezar û yek çîrok, çîrçîrok, efesane û gotinên bêteşe hene : her Xelîfe xudanê çîkmendî (nufûz) û pertava 7 yezdanpaye (welî) ye ! Xelîfe li ruyê Deryayê digere, sola wî şil nabe ! Xelîfe şêran û dêwan digrin ! Xelîfe bi pifkirinê 40 "gawur" dikujin ! ...

Textgehê Xelîfetiya pirfiraz zaf bilind bû, pirfiraz û berguzîde (mubarek) bû ! Xelîfeyên mihrivan ji her kêmanî dûr bûn, ji her gunehî pak bûn, pir paqij û yekta bûn !

Xelîfe parêzmendên Islamê yên li ser ruyê zemîn bûn ! Bav û Xudanên gel bûn ! Xelîfe ji her du çavên gel mihrivantir bûn ! Gel hemî bende û hulûlk û goriyên naçîz ên Xelîfeyên xwe bûn ! ...

Şoreşên serxwebûnê yên Kurdan, serkeşiyên Yemeniyan, rabûna Arnawûdan ... ji çi engîzî, lezûbez û bi hêsanî dihatin vemirandin ? Çima ku mêrê musluman zû bi zû bi leşkerê Xelîfe ra şer ne dikir. Cengkirin di nuxûna Xelîfan da gunehkariyeke mezin bû ! kufurbazî bû !

Çawa dibe ! Mîrên Kurdan maf û serxwebûnê dixwazin ? Ma imamên Yemenê ji Xwedê natirsin, pey azadî û mafê xwe digerin ? Begên Arnawûdan çi dikin ? Çima hildikişin çiyê, li rizgariya xwe digerin ? Tevgerên wusa ne bi cî ne, bêolî ne ! Ciyê kirdaran doje ye ! Çareya yegane ya rizgariyê serfirûbûna Xelîfe ye.

Li her goşeyên Imparatoriya Osmaniyan zanayên Olê, şêx û mela û şorindgo (waiz) giş bi yek dev û yek deng, ji sedsalan ve, ji gelê osmanî ra –

Institut kurde de Paris

Ereb, Kurd, Tirk, Çerkez, Laz, Arnawûd, Boşnak, Pomak ... - ev rewan û mejîkên serfirû û tekapê (secde) kirin, ji Xelîfeyan ra şev û roj xwend û pif kir.

Gelên nezan û dilpaqij bi sedsalan ev deng û gotin û peyv godarî dikirin. Ev pesn û aferînxaniyên Xelîfeyan di mejî û hestiyên gelê nezan da bi cî bû û tê da çikiya !

Osmaniyên Musulman giş - Ereb jî tevî wan - wuha bawer dikir : qelsiya Xwehermenda Osmanî qelsiya Islamê ye. Islam bi hebûna Padîşah û Xelîfeyên Osmaniyan paydar e. Ev bawerî û ev ewlemendî qenc ketibû ser û mejiyê vî gelê olparêz û bawerhişk. Loma, Musulmanên Osmaniyan ji her renc û êşê ra : birçîbûn, tazîbûn, kêmasî û belengazî qîma xwe anî bûn. Wan sond xwaribû û peyman kiribû ku ta mirinê ew dê li ber xwe bidin û ji bin fermana Xelîfe dernakevin !

Ev bawermendiya Musulmanên Osmaniyan, Sultan Hamîd û Sultanên din, ta Mustafa Kemal û Ismet û Celal Bayar ... û yên din jî heya îro paydar hiştiye.

Belê, engîza nehilweşîn û neherifîna Xwehermendên Osmaniyan ên Tirkan ev bawermendiya tebût e.

Ev e ku di sedsalên 19im û 20im ên Islamiyetiyê da xwehermenda Osmaniyan, û vê paşiyê jî Cumhûriyeta Tirkan, ji hilweşînê reha kir. Hemş (hetta) firazbazî û pertewdariya Yawuz Sultan Selîm û çend Padîşahên peyhatiyên wî jî sîdariyê bihevgihîştina Xilafetî û Padîşahî bû.

Belê, Ola Islamê ji Xwehermenda Osmaniyan ra, paşê jî ji Tirkan ra, qenckariyên mezin kirin. Lê, Kurd û gelên din ên Musulman jî ji Osmaniyan û Tirkan ra kirin bende û hulûlk.

Nemaza serek û şêx û melleyên nezan ên behreger (menfeetperest) ên Kurd bi salan li nalandina Kurdan, li bin bindestî û girtîtiyên Tirkan, guh ne

Institut Kurde de Paris

da. Gava di nav 400 salan da Kurd ji behadirên kurên xwe bi milyonan xort, ji bo maf û serxwebûna xwe, kirin gorî, gelek ji Mîrên Kurd bûn hevalbendên Xelîfe û Tirkan !

Mustafa Kemal bixwe jî di 1919 da, di şerê Yewnaniyan da, li Erzeromê ji bo xapandina Kurdan teylesana şêxan da serê xwe û cubbeya muftiyan jî li xwe pêça û bû hevalê şêx û melan û muftiyan; bi ayetan, bi hedîsan Kurd xapandin. Kurdan alîkariya Mustafa Kemal kir, Yewnanî şikandin û şer kar kir. Mustafa Kemal bû "Gazi Paşa", bû Atatürk, bû Serekê Cumhur ! Lê Mustafa Kemal bêbext derket, tu maf û azadî ne da Kurdan, sond û peymana xwe ji bîr kir.

Kurdan di 1925 P.Z. da şoreş rakir. Ji Şêx Seîd, Şêx Şerîf, Şêx Şemseddîn û çend hevalên wan pêva, bi hezaran şêx û melle bûn hevalên Mustafa Kemal û alîkariya birayên xwe yên xwînê ne kir, bi rovajî alîkariya Mustafa Kemalê xwînvexwarê Kurdan kir !

Van nezanan, bêbext û behregeran (menfeetperest), van şêx û melan, axa û began, li kuştina birayên xwe - bi rengareng êş û işkence - temaşa kir.

Evçend mirarkerî ji bo rûmet û evîna şaşik, cubbe, teylesan, ayet û hedîsan, û ji bo Xelîfeyan çê bû !

2- Engîza derveyî :

Di sedsala 19im û di nîvê sedsala 20im da, Ûris û Îngilîz ji bo Istanbûlê û her du geliyên wê (Bosfor û Dardanêl) qayîşkêşî dikir. Istanbûl û her du geliyên wê ji van her du xwehermendên mezin ra pir diva bû. Bosfor û Dardanêl ji aliyên Ceng û Bazirganî, ji aliyên konevaniya Balkan û Rohilata Navîn, ji her du xwehermendan ra ciyên pir bergiran bûn. Loma, her du xwehermendên emperyalîst ji bo Istanbûl û her du geliyên wê li hev ne dikir. Wek çareya yegane, **Padîşahên Osmaniyan li van ciyan** pasivan dihiştin !



Institut kurde de Paris

Qayîşkêşiya her du emperyalîstan dibû engîza payedariya xwehermenda Osmaniyan. Di sala 1873 P.Z. da Ûris di nixûna Osmaniyan da bangşer (Îlanî Herb) kir. Di demeke hindik da, ji rohilat gihîşt Erzeromê; ji aliyê roava Rûmelî giş leyand û bi çend kîlometre nêzîkê Istanbûlê hat. Lê, Geştecengên Ingilîzan ji Dardanêl derbas bûn, li pêşberê Ayastafanosê lenger avêtin. Ûrisan bivê nevê paş ustuyên xwe xurandin. Istanbûla rengîn careke din ji Tirkan ra hişt û çûn.

Di 1914 P.Z. da, di şerê yekemîn ê cihanî da, gava Alman û yekdestê wî yê Osmanî li ber Ingilîz û hevalên wî şikiyan, Amerîka, Ingilîz, Fransiz û hevalên wan di 1918 P.Z. da ketin Istanbûlê û gelek ciyên Anadolê jî leyandin. Çar sal Istanbûl di bin destê wan da ma. Çar sal fermandarê Istanbûlê serleşkerekî (Haut commissaire) Ingilîz bû.

Lê, mana Ingilîzan li Istanbûlê tucar bi qîma Ûrisan ne dihat. Ûris alîkariya Mustafa Kemal kir. Alîkariya han ev kisseyê bicarek guhart. Ingilîz û hevalên wî paş çar salan - sala 1922 - Istanbûl vala kir û korûpoşman Istanbûl hişt û çûn !

Hazretê Mustafa Kemal Paşa bi saya Ûrisan Istanbûl û Anadol ji nû da xistin bin destê xwe û hat li seraya "Dolma Bahçe" pal da !

Xwehermenda Osmanî ku di sala 1918 da bicarek hilweşiyabû bi xweşxwaziya (lutuf) Ûrisên Bolşevîk navê xwe guhart, bû "Cumhûriyeta Tirkiye" û ji mirinê reha bû.

**Ji nû da Mustafa Kemal û Cumhûriyeta wî li serê Kurdan bûn bobelateke mezin.**

Institut kurde de Paris

## ARMENYA LI ASYAYA BIÇÛK

Ermenî ku 2500 sal hevsiyên Kurdan in, em dixwazin ji wan hinek zanegî bidin û di van 2500 salan da têkiliyên her du gelên hevsî çawa bûn hindikek karûwer bibin (34).

Nejadê Ermeniyan jî wek Kurdan Endo-Awrupayî ye. Ermenî deh hezar sal berî zayîna Îsa, di koçbariya giştî da - wek "Arî"yên din - ji Iskandinavya bi koçbarî ber bi nîvro koç kirine.

Lê, Ermenî, berê, di vê koçbariyê da, wek Kurdan ne li Qefqasan û Araratan bûn. Ermenî ji aliyê Romanyayê derbas bûn û berê xwe da Yewnanistanê û li Trakyayê bi cî bûn (35).

Ermenî ji ber Sîtan baz da, xwe li Kurdan (li Araratan) girt. Kurdan ev Ermeniyên penahvêj (multecî) bi dilovanî pezirandin, ji van penahvêjan ra dilxweşî kir, dostanî û biratî nîşan dan.

Di van hengaman da navê Padîşahiya Kurdan a Araratan Xaltî bû. Ev padîşahiya Xaltiyan Padîşahiyeke xurt bû, ji aliyê roava digihîşt Torosan. Paytextê Xaltiyan Tospa (Wan) bû.

Kurdên Xaltî ji Ermeniyên Penahvêj ra mêvanperweriyeke mezin kir. Ermenî ji van qencî û mihrivaniyên Kurdan pir dilşa bûn. Dostaniyeke hêja di navbera Kurd û Ermeniyan da çê bû. Ev dostanî û niwazişên Kurdan ewçend çû ku Ermenî Xudayê Xaltiyan ku navê wî "HAY" bû ji xwe ra kir "Parastek" (mabûd). Hay, ano Zaniş, Hiş, Bîrewerî. Û Ermeniyan navê xwe jî kir "HAYÎK".

Ji van berjendinan (îzah) tê fehm kirin ku Ermenî piştxwaz (mahmî) bûn û Kurd jî piştedar (hamî) bûn. Ermeniyên piştxwaz ola piştedarên xwe pezirand û navê xwe jî kir HAYÎK.

Baş xuya dibe ku Ermenî bi zora şûrê xwe ne hatibûn Araratan û bi şer û ceng û bi xurtî jî li Araratan bi cî ne bûbûn. Bi berevaj, ev Ermenî ji ber stemên Sîtan reviyabûn, revokeyên belengaz bûn.

Ji aşkartina (isbat) van engeştan (iddia), em nivîsandinên jêrîn pêş we dikin.

Di nivîswarên dîrokan da nivîsandine ku ber bi sedsala 6im B.Z., Ermeniyan ber bi Araratan koç kir. Cardin van nivîswarên dîrokan nivîsand ku Padîşahê Kurdan, Key Aksarê Kişwergîr, di sala 625 B.Z. da li Text rûniştibû û di 623 B.Z. da Nînwa, Paytextê Asoran, dorpêç kiribû. Di hengama dorpêçkirinê da, Sît ji bakurr hatin, Kurdistan, Gurcistann, Armenya, Pont û Kapadokya dan ber xwe.

Key Aksar li ber metirsa Sîtan dev ji dorpêça Nînwa berda. Ji bo derxistina Sîtan ji Kurdistana bakurr bi salan bi Sîtan ra koşiya. Di sala 615 da Sît ji Kurdistanê qewirandin, paşê ket pey Sîtan, ew ji Armenya, Kapadokya û Pont deranîn. Ev her sê kişwer veserê (îlawe) Kurdistanê kirin. Bi vî awayî sînorên Kurdistanê gihandin Çemê Halis (Qızıl Irmak). Key Aksar di sala 612 B.Z. da Nînwa vekirand. Xwehermenda Asor ji ruyê cihanê rakir. Ev vêrastên dîrokê di nivîswaran da nivîsandîne.

Ordiya Key Aksar di 615 B.Z. da Armenya, Pont û Kapadokya heya Deryayê Reş vekirandin û ev her sê kişwer jî bi ser Kurdistanê va veser kirin. Ev bûniş heya hatina Iskenderê Mezin 300 sal ajot. Wuha ye, Ermenî 300 sal berbendên (tebaa) Kurdan bûn.



Institut kurde de Paris

Gava ev vêrastên dîrokê li meydanê bin, gelo meriv dikare bibêje ku Ermenî di 600 sal B.Z. da dirêjî Araratan kir û Xaltî şikandin, Ararat ji destê Kurdan stendin ? Gelo engaştinên (iddia) ewha dikevin serê kê ? Ma dîrok hiş û hoşmêja (mantiq) tiştine ewha dipezirîne ?

Kurdên ku 2000 sal bê aram cengên Asoran kirin, 2000 sal sîngên xwe li ber ordiya Asorê zorba kirin mertal û dawiya dawîn Nînwa vekirand û Asor kirin tunne, ma ev Kurdên bahadir li ber çar Ermenî şikiyan ?

Di van hengaman da - 600 B.Z. - Ermenî ji Trakya hêj nû hatibûn, di niştimanê xwe yê nû da - dora Rewanê "Wan" - hêj nû bi cî bûbûn, dema ku rastî hengemeyê Sîtan perîşan bûn, ji hev ketin.

Paşê, Key Aksar, Padîşahê Kurdan, hat gaziyê, Sît ji Kurdistana bakurr, ji Armenya, ji Pont û ji Kapadokya qewirandin, ev kişwer ji Sîtan paqij kirin; her sê padîşahî jî, ferweriya Ermeniyan jî ne man, ordiya Ermeniyan jî ne ma !

Rastî ev e : hinek Ermenî, ji bo rehakirina canê xwe yê şêrîn, ji ber Sîtan reviyabûn, xwe avêtibûn bextê Kurdan. Kurdan ev penahxwaz pezirandibûn, paşê van Ermeniyên penahvêj Xudayê Kurdan ku navê wî HAY bû ji xwe ra kir parastek û navê xwe jî kir HAYÎK.

Eger em van nivîsandinên han kurtebir bikin, Ermeniyan di sala 600 B.Z. da ji Trakya hatin Asyaya Biçûk. Di vê navê da, Key Aksar Nînwa vekirand, Sît ji Asyaya Biçûk qewirandin, Armenya, Pont û Kapadokya bi welatê xwe va girê da. Ta wendabûna Şahînşahiya Kurdistanê bi destê Iskenderê Mezin, Ermenî 300 sal bûn berbendên Xwehermenda Keyaniyan, ano berbendên Şahînşahiya Kurdan.

## LI DORA ARARATAN
## ROŞMANA (WAZIYET) KURD Û ERMEN

Em dê roşmana Kurd û Ermeniyan li dora Araratan, ji hengama Koçbariya gişkî ta vesendina Kurdistanê bi destê Iskenderê Mezin, ano ta sala 331 B.Z., ji nû va berçav bikin :

Kurd 10.000 sal B.Z. ji Iskandinavya koçbar kirine, berê xwe dane nîvro, li Qefqasan û li Araratan bi cî bûne. Û 6.000 sal B.Z., dibe ku hîn bêtir, gihîştine van doran. Kurdên ku di van deman da hatin Araratan du ezbet bûn : Kûtî û Kurtî. Kurtî ji Kûtiyan cuda bûn, çûn ber bi Deryayê Kaspînê. Kurtiyan, li Asyaya roava, ji rohilata Araratan ta bajarê Belxê vesend. Ji aliyê nîvro jî gihîştin Deryayê Umanê.

Kûtî jî Araratan, Zagrosan û kenarên Çemê Diclê girtin. Paşê, bi sedsalan bela bûn, pehn bûn, erdê xwe fereh kir : Antîtorosan, Torosan û paşê Sûrya jî vesend, gihîşt sînorên Firewnan.

Di van hengaman da, di van hengamên pêşveçûna Kurdan da - 6000-4000 sal B.Z. - pehnavên (wadî) Dicle û Firat di destê sê hawişan da bûn : Sûmîr, Akad û Elam. Kurdên Kûtî bi van her sê hawişan ra bi sedsalan û hezarsalan şer kir. Dawiya dawîn her sê hawiş jî şikandin û wenda kirin û Kurd di her sê kişweran da Fermanferma bûn.

Di hengama çêbûna van gertevan da, li ser ruyê cihanê navên Kildan, Asor, Paris û Ecem hêj ne dihatin bihîstin. Eger navê Ermen dihat bihîstin, ne li Araratan û li serekaniyên Dicle û Firat dihat bihîstin, belkî li rohilatê Makêdonya, li Trakyayê dihat bihîstin.

Belê, Ermeniyan di dawiya sedsala 7im B.Z. da Trakya berda, derbasî Asyaya Biçûk bûn û di sala 600 B.Z. da li dora Rewanê rûniştin. Wuha ye; li van doran dengên Ermeniyan ji dengên Kurdan 5.500 sal bi şûnda, ano 55 sedsal bi şûnda, hat bihîstin.

## ERMENÎ BÛN BERBENDÊN KURDAN

Ermeniyan di dawiya sedsala 7im da ji Awrûpa koç kir, hatin Asyayê, li dora Rewanê bi cî bûn. Di van salan bixwe da, Key Aksar, Padîşahê Kurdan, Nînwa vekirand, Sît ji Asyayê qewirandin, Armenya, Pont û Kapadokya vesendin. Ev her sê Padîşahî jî bûn sê Satrapên Kurdistanê û gelên her sê Satrapan jî bûn berbendên Kurdistanê. Ermenî ji 615 B.Z. ta 331 B.Z. bûn berbendên Kurdan. Paşê, di sala 331 B.Z. da, Iskenderê Mezin hat, Kurdistan seraser - ji Deryayê Sipî ta bajarê Belxê û sînorê Hindistanê - leyand û vekirand. Iskender zû mir (356-323). Di dewsa wî da generalê wî Sêlêkos di 312 B.Z. da bû Padîşahê Kurdistanê. Armenya bû Satrapeke Selefkiyan. Ermenî 109 sal bûn berbendên Selefkiyan. Padîşahiya Sêlêkos pir ne ajot. Di sala 125 B.Z. da, Key Kubbadê Kurd "Arşek" rabû, padîşahiya Aşkaniyan a Kurd serrast kir, Padîşahiya Sêlêkos wenda kir. Armenya ji nû da bû Satrapeke Kurdistanê. Ermenî îcar jî 480 sal bindestên Aşkaniyan man. Paşê, di sala 26 P.Z. da, Erdişîrê Babekî yê Kurd Padîşahiya Aşkaniyan wergerand û Padîşahiya Sasaniyan sazdar kir. Îcar jî Armenya bû Satrapeke Sasaniyan.

Lê, Roma li dawiya hengama Aşkaniyan dest bi vekirandina Asya kiribû. Ji bo vê yekê, Gurcistan, Armenya, Pont û Kurdistana roava di navbera Roma û Aşkaniyan da - vê paşiyê Sasaniyan da - meydana şer û koşandinê bû. Ev kişwerên bedbext bûn bazîçe û goriyên van emperyalîstan û 600 sal aşîtî û aram ne dîtin.

Gava di sedsala 7im P.Z. da vekirandina Islamê dest pê kir, Kurd jî, Ermenî jî, Paris jî bûn dîlên bindest ên emperyalîzma Ereban. Di 1278 P.Z. da, neviyê Cengîz Xan, Hulaku, Bexda vekirand, Xelîfe kuşt, tûdeyê Bexdê ji şûr derbas kir, 800.000 enzan bilêc kirin. Ji vê demê bi şûnda, leyandina Tatar, Tirk û Tirkmenan dest pê kir ...

Ev nivîsandina me eşkere nîşan dide ku Ermenî

tucar ferwerê Kurdistanê û çiyayên Kurdistanê, çiyayên Araratan, ên Erzerom, Erzincan, Dêrsim û zozanên wan û çiyayên din ne bûne (36) ...

## KURD Û ERMENÎ DI HENGAMA FEŞARTINA (INTIŞAR) ISLAMÊ DA EMPERYALÎSTÊN TIRK Û EREBÊN ÎRO

Islamîtî di destpêka feşartina xwe da ji Ermeniyan ra - çima ku Mesîhî bûn - firawaniyeke mezin bû; ji Kurdan ra jî ji qotik û jan dijwartir mîratkeriyek bû.

Di destpêka Islametiyê da, Ereb ji Mesîhiyan ra Xudan Nivîswar got û Mesîhî jî di aşîtî û asayişê da jîn. Loma, Ermeniyan ji Musulmanan tu ziyan ne dît.

Kurd Zerdeştî bûn. Nivîswara wan "Awîsta" bû. Erban Awîsta wek Incîl nivîswara Asmanî ne pezirand. Ji bo vê yekê, Ereban ji Kurdan ra Gawur got û ji wan ra bi awakî dijwar û şermsarî stemkarî kir. Xweşber, Kurd jî bi Ereban ra şerine dijwar kirin. Di destpêkê da, Ereb şikiyan û serfermandarên wan hatin kuştin. Ereb reviyan, lê paşê cardin vegeriyan. Îcar Kurd şikiyan û bi şkestineke dijwar ji hev belav bûn. Ereban wicdan bicarek ji bîr kir, bajar, gund, deşt û çiya talan kirin, wêran kirin, agir berda wan. Deverên ku ordiyên Ereban karibûn bikevinê tu avayî ne hişt. Bi salan ev bêdadiyên Ereban dirêj kirin : bilêckirin, şewitandin, talankirin, namûsa pakdawan jî lekedar û paymalkirin (37).

Weke ku me li jor gotibû, Islamîtî di destpêkê da Kurd nabedîd kirin û şewitandin. Lê Ermenî ne êşandin. Ermenî gihîştin aşîtî û asûdegiyê : welatê wan ji ordiyên Sasaniyan û Roma ra 600 sal bûbû meydana ceng û pevçûnê. Êdî tu şer û ceng ne mabû, dawiya pevçûn û lihevxistinê hat. Li ba Ereban, Ermenî Xudan Nivîswar bûn, loma tu

Institut kurde de Paris

kuştin û talan ne dîtin, gihîştin jîneke asûde û ewlemend : zimanê wan, ola wan, hencarên (adet) wan bi rehayî ji wan ra man. Lê Kurd Zerdeştî bûn. Loma Ereban ji wan ra aşîtî mefer ne da. Kurd ji bo parastin û qedxenkirina zimanê xwe, ola xwe, gerdişa xwe, namûs û hebûna xwe tu çareke din ne dît û rahişt gurz, şûr û xenceran !

Kurdan bi Ereban ra bi rojan, bi mehan û bi salan ceng û şer kir; pir kuşt û pir xwe da kuştin, wek çem û leyiyan xwîna sor lîzikandin. Lê, dawiya Ereban ne hat û ew xwediyên du çekan bûn ! Wan bi destekî şûr digirt û bi yê din jî Quran. Ereban ne bi mêrxasî, lê bi firîb û dekan zora Kurdan bir! Û Kurdê pehlewan, Kurdê cihangîr şikiya. Kurd ne ji şivik û darikan bûn ! Kurd ji pola û mifriq bûn ! Kurd wek şivikan du ta ne bûn, wek pola şikiyan !

Kurdên ku bi dilîrî û xurtî pêdarî kir tev de hatin kuştin. Kurdan kurên xwe yên berjiste wenda kirin. Kurdên kêrnehatî yên şûndamayî musulmanî pezirand û canê xwe yê şêrîn reha kir. Lê, namûs û rûmeta xwe reha ne kirin. Kurdên ku Musulmanî jî peziran-dibû cardin ji stemkerî û bêrûmetiyê reha ne bûbûn. Cara yekim axaftina kurdî ji binî nadar (memnû) bû. Kurdên musulmanbûyî jî eger zimanê xwe biaxiftana bê mihribanî, bê dudilî zimanên wan bi cawbirran (*) diçirpandin.

Ev bêdadkeriya Ereban 110 sal dirêj kir.

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHEQUE

## DI ZANIŞ Û ZANIŞWERIYÊ DA ENGÎZA BERTERIYA (FAIQIYET) ERMENIYAN JI KURDAN

Padîşahê Osmaniyan. Sultan Muhammedê kişwergîr, gava Istanbûl vekirand, ji Ermeniyan ra (û ji Ûriman û hawişên din ên ne musulman ra jî) bi fermanên gewre servedarî (imtiyaz) dan. Bi maf û toreyên (selahiyyet) van fermanan, Patrîkxaneyên Ermeniyan wek bi nîvserxwebûnî li Istanbûlê sazmaniya ferweri-yekê danî. Bi vî awayî, Ermeniyan du Dîwan (Heyet)

rast kirin : rewanî (rûhanî) û peykerî (cismanî). Bi bijartina tûde, komel û encumenên wan çê bûn, Ermenî bûn xudan diravkod (kasa) û kodikên alîkariyê.

Ev sazmendiyên han ne bitenê li Istanbûlê, li her aliyê kişwerê Osmaniyan, li her bajarî sazmendiyên ewha serrast kiribûn. Ev baxşîşên Padîşahên Osmaniyan ji Ermeniyan ra bûn firawaniyeke Yezdanî.

Jixwe, Gutenbergê Alman di sala 1436 da çapsazî ji nû da anîbû meydanê. Di van deman da enzanîtî di nav nezanîtiyeke reş û tarî da wenda bûbû û jimarên merivên xwenda pir kêm bûn. Xweşber, Ermenî jî di vê bûnişê da bûn. Paş 200 salan, gava çapsazî ji Awrupayê xwe gihande Istanbûlê, Ermeniyên rahijmend (muteşebbis) berî hawişan giş rahişt wê kisseyê. Ermeniyên xebatkar û karaşîna di demeke hindik da çapsaziya Istanbûlê xist bin dest xwe. Ermenî, ji vê engîzê, ji alîkî bûn xudan saman (serwet), ji aliyê din jî xwe gihand xwendevaniyeke zor.

Ermenî, bi bexşandina servedariyên Sultan Muhammed û bi xebata çapsaziyê, di demeke hindik da xwendevaniya xwe pir pêşve bir.

Dîwana peykerî (meclisê cismanî) ya Patrîkxaneya Ermeniyan ji bo pêşvebirina xwendevaniyê pir koşiya. Her sal jimarên debistanan pirtir dibûn. Di van 40-50 salan da, jimarên Ermeniyan gihîştin bişkavtineke mezin. Zimanekî wîjeyî (edebî) yê ermenî çê bû, derket meydanê. Paşê, li Istanbûlê, jimarên rojnave û kovaran ji berê va pir bûn. Nivîswarên zanişmendî, romanên wîjeyî bi firawanî çap dibûn û bela dibûn. Xweşber, nivîswarên debistanî pelika yekim a bernaveya xebatê bû. Di kişwerê Osmaniyan da, sal bi sal jimarên debistanan bêtir dibûn. Ermenî, ku li riya zanişmendî û hunerweriyê evçend pêşve çûn, xweşber li jîna kardestî (pratîk) jî kamweriyên mezin birin serî, di bazirganî û pîşewerî (senet) da ciyên bilind girtin.

Lê, gava Ermenî di vê pêşveçûn û tuwangerî û gumrehiyê da dijiyan, gelo Kurdên bedbext di çi bûnişê da bûn ?

Kurdistan bi leyandina Ereban kete çi bûnişê, me bertir nivîsiye. Di destpêka leyandina Ereban da pir ciyên Kurdistanê bûn wêranezar. Nîvê gelê Kurdistanê xwe kire goriyê niştimanê xwe, azadî û ola xwe ! Kêrnehatiyên din bûn musulman û canê xwe reha kir. Lê Kurdistan bi zor 150 sal, û di hin ciyan da 300 sal, bi şûnda gihîşt aşîtî û aramê.

Bi sazmendiya Xelîfetiya Abbasiyan li Bexdê, Kurd gihîştin aram û asûdegî. Nemaza birrên tovrindan û şerkerên şerevanan bûn xudan payeyên bilind û bercuste. Kurd gihîştin her payeyên bilind : Mîr, Mîrê Mîran, Xan, Padîşah û Şah û Şahînşah. Lê, piraniya gelê kurd di bûnişa xwe da hatin hiştin - hêj rasttir di bûnişa xwe da ne hatin hiştin -. Belkî tûdeyê Kurd di devê guran da hat hiştin. Vî tûdeyê belengaz spartin bindestê şêx û melan, melleyên tarînezan û behreger. Kurdê belengaz li bin destê van şêx û melleyên cihanneditî, nezan û behreger ev tiştên han kar kirin : nezanî, hişkbaweriya vala, olparêziya çavkor, ji Xelîfeyan û Padîşahan ra serfirûbûn, ji bo nav û rûmeta Xelîfeyan û Padîşahan ceng û pevçûn û di meydana şerran da karkirina "Rutbeyî Şehadet" !!

Ev bûnişên Kurdan ku me jimartin, heya îro ne guherîne ! Nemaza bêparbûna Kurdan ji xwendin û zanişmendî û huneriyê !

Li Îran, Tirkiye, Iraq û Sûriyê yek debistana Kurdan tune. Di van kişweran da xwendin û nivîsandina kurdî - yekcaran jî peyva kurdî - sûcekî mezin e ! mirarkerî ye !

Pir muxabin, di van demên nêzîk da, Ingilîz li Iraqê û Fransiz li Sûriyê bi salan ferweranî kir : lê zanişweriya Kurdan yek pê pêşve ne çû û tevnegeriya. Nemaza li Sûriyê bi hezaran debistanên vîjeyên her

hawişî hene : Ereb, Suryanî, Asorî, Kildanî, Ermenî û Cuhû. Lê Kurd ji vî mafî, ji vê firavaniyê bêpar in ! Kurd bibe xwediyê debistan ? Kurd zimanê xwe bixwîne ? Ev tiştê han gunehkariyeke mezin e! Divê Kurd nexwîne, Kurd nexwenda û nezan bimîne!

Kurdên belengaz ên Sûriyê, ji bo dermankirina derdê xwe yê giran û bê derman, encumen çê kirin, giregirên xwe dan pêşiya xwe û pir caran diçûn Bêrûdê, giliyên xwe pêş "Haut Commissariat" dikirin. Lê "Haut Commissaire"ê fransiz Kurdên ustûxwar bi peyv û gotinan dixapandin ! Pir muxabin, Ferwerana Fransiz ustubara (wezîfe) xwe ya konevanî, şehrevanî û zanewerî bi cî ne dianî. Ferweranê gewre yê Fransiz 25 sal Kurdên reben xapandin û ne hişt ku Kurd bibe xwediyê yek debistana "Yekimî".

Hezar û sê sed sal e ku ev bûnişa girînxwîn a Kurdan dirêj dike û diçe ! Xelîfeyên Musulman berî 1300 sal çi kir ji Kurdan ra, çawa Kurd bê ziman û bê xwendin hiştin, Şah û Padîşah û Serektûdeyên wan jî û "Haut Commissaire"ên Ingilîz û Fransiz jî wek wan kir, Kurd nezan û nexwenda hiştin. Û îro jî şopa berê dajon; îro jî ji vê şopa neenzanî û stemkerî venegeriyane !

Kurd di navbera sê xwehermendên musulman da hatine parkirin : Tirk, Ecem û Ereb. Ev her sê xwehermendên musulman - goya pariyeke pir hêsan e - dixwazin Kurdan daqurtînin.

Ev her sê xwehermendên musulman, ji bo ku bigihîjin dilxwaza xwe ya xam, ji sedsalan ve ji rengareng zuştkerî, mirarkerî û nebekariyên xwe venagerin. Ev her sê xwehermend - Tirk, Ecem, Ereb -, weke ku bi hevre şîretkerî kirine û yekgotin bûne, li ser sistemekê, bernavekê, mezintirê bêdadkerî ji bo Kurdan çê dikin. Belê, hovnaktirê bêdadkerî ji bilêc û talan û şewat û zindan û dûrandin dijwartir û wêrankertir rencek heye, bi vê renca yeman Kurdan **dikujin** !

Institut kurde de Paris

Ev her sê xwehermendên musulman gelo bi çi rencî Kurdan dikujin ? Gelo ev rencê rencan çi ye? Çi teba ye ? Ji bilêc, ji agir, ji talan xurtir çi renc ji van renctir, çi bobelat heye ? Kurd nezan hiştin! Ji Kurdan ra mafê xwendinê ne dan !

Ev konevaniya mirarkerî di hengama xelîfeyê duyim ê musulman Omer Ibn Xettab da dest pê kir. Hêj wê gavê Kurd zimanê xwe bipeyiviyana, bi cawbiran zimanên wan bedbextan diçirpandin ! Her sê xwehermendên tirk, ecem û ereb îroj jî şopa Omer dajon. Di nezanhiştina Kurdan, girtin û hilweşandina debistanan û di çirandina alfebeyan da çi ji wan dihat dirîx ne dikir û nakin !

Ji bo mirdarî û bêbaviyên din ên sivik, bilêckirin, darvekirin, şewitandin, bidestavêtina dawpaqijan ... di her keysanînê da tu kêmanî nahêlin, hergav diaşkirînin ku şopajoyên Omer Ibn Xettab in !

Kurd ji 60-70 sal vir da çiçend ku zimanê wan karibû bigere û qelemên wan karibûn binivîsînin, ustuyên xwe yên stemdîtî xwar kirin, bûnişa xwe ya dilxiraş û purxun ji cihana şehremendiyê ra gilî kir. Lê, hezaran muxabin ! Gazî û nalînên wan ên cangudaz, nalînên wan ên dilşewat kêm kes guhdarî kir. Nemaza cîgehên konevanî hîç giranberî (ehemmiyet) ne da : ne "Komela Hawişan" a Genev, ne jî "Komela Gelan" a New York ji perîşanî û stemkêşiya Kurdan ra êşiya !

Li vir ponjek heye. Divê meriv bi giranberî biendîşe, gelo di vî gelî da - gelê Kurd - ev ferûtaba (quwwet û qudret) veşirî çi ye ? ! Ev ferûtab û ev jîndarî ku evçend ji berberiyên hovnak ra pêdarî kir û hê jî dike çi ye ? Ev xurtî û zorawerî çi tişt e ? ! Kurd ev sirişt û bunyad çawa peyda kiriye ?

## GERDIŞA (WEZIYET) KURD Û ERMENIYAN BI KURTEBIRÎ

Em gerdişa Kurd û Ermeniyan di bin ferweriya van



Institut kurde de Paris

emperyalistan da çawa bû bi kurtebirî binivîsînin. Ev her du hawîşên hemsî yek jê gihîşt zanişmendî û bîreweriyê, ê din jî di nav nezanî û di hişkbaweriyê da hat hiştin !

Eger em pirsa bilêc û kuştin û talan û koçandinê bikin, her du hawiş jî para xwe bi firehî stend !

Me gava gerdişên Kurd û Ermeniyan diendizandin, em hinek çeperê bûn, me nikaribû xwe bigirin û em rabûn, me derdên kevn û nû yên Kurdan rêtin û jimartin.

Bi rastî di nivîsandina van rêzan da dilxwaza me ya vêrast ne derdrêtin bû. Dilxwaza me ku em bidin zanîn ev e : gelo Ermenî ji çi engîzî di riya zanişmendî û bîreweriyê da pêş ve çûn û Kurd çima berovaj xurû û di nezanişa tarî û reş da man ?

Dilxwaza me ya din jî ev bû : em bidin zanîn ku çawa Ermenî ji nezaniya Kurdan gend (istifade) dikin û çawa bi bêbextî û stemkerî kopên dijwar li Kurdan dixin ! Belê, Ermenî di zanişmendî û bîreweriyê da pir pêşveçûn, Kurd jî pir paş ve man. Ev rastiya han li meydanê ye, nayê veşartin. Lê, tukes Ermeniyan li tu ciyan ji xwendinê radar (manî) ne kiriye. Lê, Kurd ji vê firawaniyê hergav û li her cî ji binî bêpar mane ! Çawa ku Kurd vê rastiyê dizanin, Ermenî jî di van kissan da li berteriya xwe pir baş agah in. Bi vî awayî, Ermeniyan, ku meydan vala dît, di propagandayên xwe da bi bêwicdanî di nixûna Kurdan da pir tiştên ne rast û kirêt û çepel nivîsandin û hê jî dinivîsînin. Tu caran ji bêbextî û çewt û xwariyên xwe şûnda namînin. Ji bo şerandina (inkar) mafê Kurdistanê, çi ji destê wan bê dirix nakin. Nemaza nivîswarên ku di debistanan da ji zarokên xwe ra didin xwendin çi jahr in ! çi non in !

Di van demên paşiyê da, dîrokvan û coxrafîşînasên Ermeniyan dîroka Kurdistan û herşeya (xarite) Kurdistanê herdem biçûk dikin. Eger ev baron bi vî

Institut kurde de Paris

awayî bajon, di demeke nêzîk da herşeya Kurdistanê ji ruyê cihanê bicarek ew dê rakin. Xweşber, ji van kamweriyên xwe yên mezin, ji Ecem, Ereb û Tirkan, aferînan û nîşanên zêrîn dê bistînin !

Çêtir ev e ku em kisseya çewtgerandina dîrok û coxrafya Kurdistanê kurt bibirin û çend nimûne nîşan bidin û dawiya vê kisseyê bibînin :

1- Nivîswarên Ermeniyan Nehriyên Sûbarî kirine Ermenî ! Ev engiş ji binî da ne rast e : Nehrî birrekî Sûbarî yê Kurd in. Sûbarî 6.000 sal B.Z. li Araratan bi cî bûbûn. Sûbariyan di hengamên dîgeran (muhtelif) da li dora Araratan û berbijêr 5 padîşahî serrast kirin : Hûrî, Mîtanî, Nehrî, Alarodî, Xaltî.

Nehriyan di 1.500 B.Z. da Padîşahiya xwe sazandibû. Ermenî gava ji Tirkiyê koçûbar kir hatin dora Rewanê. Nehrî 1000 sal bû ku xwediyên Padîşahiyeke xurt bûn û paytextê wan bajarê Tospa = Wan bû, li Araratan 1000 sal bû ku padîşahî dikir. Nehriyan ta Torosan û Deryayê Sipî ferweranî dikir. Bi mêranî û dilîriya xwe nav dabûn. Di dîrokan da heye : Padîşahê zorba "Salmanazarê duyim" ê Asoran li çar aliyê xwe fermanferma bûbû, lê bi Nehriyan ra melsokî (mudara) dikir. Di sala 612 B.Z. da, padîşahê Kurdan Key Aksar paytextê Asoran vekirand, Imparatoriya fêris a Kurdistan serrast kir, xwehermenda Nehriyan jî bû libatekî imparatoriya Kurdan. Îro jî li dora Hekkarî hene, wek ên bavpîrên xwe, mêrxas in û Kurd in.

Ji van nivîsandinên jorîn xuya dibe : Sûbarî bavpîrên Nehriyan in û Sûbarî B.Z. 6000 sal li Araratan bi cî bûbûn. Nehriyan B.Z. 1500 sal li Tospa = Wan padîşahî dikir. Di 1278 B.Z. da Tîklat Palazarê duyim bû Padîşahê Asor û bi Nehriyan ra melsokî (mudara) dikir, ano Nehrî di 1278 da padîşahiyeke xurt bû, li Araratan û li Wanê padîşahî dikir. Ermenî di wan hengaman da li Yewnanistanê, li Trakya, bûn û 1000 sal bi şûnda ji Trakya koçbar



Institut kurde de Paris

kir, hatin Asyayê, li dora Rewanê bi cî bûn. Weke rojê eşkere ye, dîrokzanên Ermeniyan ji nîgaşa (xeyal) xwe deranîne û Nehriyên Kurd kirine Ermenî!

2- Di nivîswarên dîrokên Ermeniyan da nivîsandî ye ku bajarê kevnare yê Amed (Diyarbekir) Dikranê mezin ava kiriye. Ev nîgaş jî çewt e : bajarê Amed ji zayîna Îsa 4-5 hezar sal bertir ava bû û bajarekî binavûdeng bû. Avakerê Amed kî ye û çigavê ava bûye ? Tukes nizane. Tê gotin ku padîşahê Akadan, Sargon, padîşahê yekim, ava kiriye. Pir dibe ku Hûriyan, an Medan ava kiribin û ev her du gel Kurd in.

Ji dîroknivîsên Ermeniyan pê va, tu dîroknivîs - ne Ewropayî, ne jî Asyayî - ji bo Amed "Dikranagêr" ne gotiye. Dikran Padîşah ji avakirina Amed 4-5 hezar sal bi şûnda ji diya xwe bûye ! Ji nivîswara me benda Arşakyan bi baldarî bixwînin. Ji bo Dikran Padîşah zanişweriya zûlandî (mufassal) û rast hûn dê bixwînin.

300 - 400 sal B.Z., dîrokzanê yewnanî, general Ksênofon, ji Kurdistan û Ermenistan derbas bûye. Li ser vê geştecenga xwe nivîswareke dîrokî nivîsiye. Navê vê nivîswarê "Vegera deh hezaran" e û tê da li ser tuwandarî û dilîriya Kurdan û dasendên (munasebet) wan bi Ermeniyan ra zanişwerî heye. Xwendina vê nivîswarê pir behre û hêja ye.

Eger em bixwazin hemî çewt û xwariyên ku dîrokzanên Ermeniyan bi çelweriyên bê endaze nivîsîne û di nixûnên Kurdan da peyvine bê teşe belav kirine durust bikin, divê em nivîswareke fêris û bi sedan rûpel binivîsînin.

Ji bo îro em navên vê kisseyê evçend direj bikin. Em dê nuha bi vî çendikî qîma xwe bînin. Lê bitenê, em ji endişmendan û profesor û dîrokzanên Ermeniyan ra - çêtirê wî ji gelê ermenî ra - berê xwe didin û van rêzên jêrîn pêşkêş dikin : Me di destpêka nivîswara xwe da nivîsîbû ku arkêologên

Institut kurde de Paris

amerikan, Ingilîz û fransiz, ji 1924 vir da, li Îranê û li kişwerên kevn ên Osmaniyan, bi endazeke fereh custuger (teharri) kirin û îro jî ji kolana xwe bi şûnda ne mane. Di van kişweran da – Îran, Iraq, Sûriya, Filistîn, Yemen, Trakya – 45 sal e ku koş û xebateke zor dikin. Lê, jêderên (netîce) koş û xebtên evçend giran beyhûde ne çûn, berxudar bûn, gihîştin armanca xwe : kevnerêç (asarên kevn) û nîşane û şope peyda kirin.

Ev nîşane û şopeyên ku di nav 45 salan da van arkêologan deranîn meydanê pir çewtî û xwariyên nivîswarên dîrokên kevn eşkere kirin û aşkartin.

Nivîswarên kevn ên dîrokan, ji bo nivîsandina gertevên sedsalên kevnare, xwe dispartin bawervajî û çîrçîrokan û gûmanên beyhûde. Loma, nivîswarên dîrokên berî 45 salan hatine nivîsandin pir çewt û xwar in.

Bi ponj û endîşa me, eger ji bo demeke hindik bibe jî, divê em nivîswarên kevn bidin alîkî û nivîswarên nû yên Ewrupayî, Amerîkanî û Rohilatzanan bixwînin.

Manivîsên (eser) van zanişmendan bixwînin ! Wan bi zanebûnên xwe yên kevn ku hûn ji bawerişên kevnare hîn bûbûn berhevînin (muqabele bikin) ! Zanibûna xwe ya kevn durust bikin ! Ji çewlerî, hişkbawerî, şovênî û kîndarî xwe bidin alîkî ! Bi xwînsarî li rastiyê bigerin !

Kurd û Ermenî du gelên hevsî (cîran) ne. Her du gel jî gelên bedbexttirên cihanê ne. Di vê sedsala 20'an da gelên Afrîqa bûn xudanên serxwebûnê, lê ev her du gel hêj ji dîlbûnê rizgar ne bûne ! Xwejber, tûdevaniya (cumhûriyet) Rewanê ku teva Hevbenda Sovyetan e divê em jê der bikin.

Bi me, Kurd û Ermenî ku hevnejad, heverd û hevsî ne, divê dev ji ifrat û hişkbaweriyê berdin, destê xwe bi hevdin, bikoşin û ji destê emperyalîstan xwe rizgar bikin.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## DASENDA (MUNASEBET) KURD Û FARIS

Ji bo me bedih (deyn) bû ku em li dawiya nivîswara xwe di gihaja dasenda Kurd û Faris da çend pirsan binivîsînin û ponja xwe di vê kisseya bergiran da bi awakî berjendî (wazih) diyar bikin.

Kesbilindên ku nivîswara min, ano nivîswara dîroka ku min "Dîroka Kurdistan a kurtebir" nav lê kiriye, bixwînin, dê bi hêsanî fehm bikin ku giş kisseyên ku di vê nivîswarê da hatine nivîsandin û giş bendên ku di van kissan da hatine gotin, heya bi givirkî hatine peyivîn, xwe spartine nîşane û aşkarişan. Min di vinîswara xwe da yek pirs ji ber xwe ne nivîsandiye.

Pey tumandina (ikmal) vê nivîswara ku bi spartina maf û vêrastan min nivîsiye, eşkere xuya bû ku pismamên Kurdan, Ecem evçend vekirandin û vesandin û canfeşandin û xwînrijandinên Kurdan kirine malê xwe ! Evçend kamwerî û pîrozbextiyên firazwer û giranber ku bi xwîna Kurdan, bi koş û xebt û werzişên kurên Kurdan hatine meydanê, Ecem ji xwe ra kiriye bermêv û xistiye dîrokan û nivîswaran !

Bi hengave (eynî zeman), dîrokzanên rohilat û roava jî ji sedsalan ve bê peygerdin (tahqîq) û bê hûrandin (tetqîq) ev firazbextî û kamwerî û şehrevaniyên evçend gewre û gurîpaş ku bi xwînfeşandina Kurdê qehreman hatiye meydanê li ser navê Ecem nivîsîne û kirine nivîswarên xwe, û evçend bêdadî û stemkerî ji Kurdan ra rewa dîtine.

Hemj, navek jî çapînoz kirine : "Ancienne Perse", "Fursî qedîm", "Eski Faris" gotine !

Çawa ku "pirsa pêşiyan" dibêje : "Meriv ji kîjan pitikê vegere kare" û "jimardeka xwar ji Bexdê vedigere", min jî got ez dê bikoşim, biwerizim û bixebitim, maf û vêrastê biderînim, şapînoz û virên Eceman derînim meydanê, rastiyê biaşkirînim, bangdim gişî cihanê. Di nivîswara xwe da, min di gelek ciyan da nivîsandibû ku Kurdan bi xebtûkoşên dijwar, bi leyandinên xwîna xwe ya sor a wek çem û rûbaran evçend kamwerî û pîrozbextî û cihangîriyên pirfiraz û ronak xistin destê xwe. Kurmamê Kurd, kurmamê pepûk û belengaz ê Ecem bê xebtûkoş evçend mezinayî kiriye dastê (mal) xwe û bê şerm û fedî nivîsiye nivîswaran; lê ev destdirêjayî û bernixûniyên Farisan bazareke ne sivik û hêsanî ye. Ev kisse canwej û bergiran e. Loma min nivîsandina vê bendê hanê, benda "Dasenda Kurd û Faris" pêtiviyeke (teslîh) bergiran dît.

## 1- BICÎBÛNA KURDAN LI ARARATAN

Kurdan, Berê Zayîna Îsa bi hezaran salan - 10.000, belkî jî hîn bêtir - di hengama koçbariya gişkî da, wek hemû pismamên xwe yên endoawrûpayî, Iskandinavya berda, serejêr bûn, hatin Araratan. Kurdan, pey ku van ciyan ji xwe ra kirin niştiman, warê xwe fireh kir, ber bi roava, nîvro û rohilat belav bûn. Kurdên ku li Araratan man, bajarê Tospa, ano Wan, ava kir û ji xwe ra kir paytext. Kurdên ku berê xwe da rohilat, dora Deryayê Kaspînê, ano Kasiyan, girt û gihîştin sînorên Hindistanê, bajarê Belx ava kir û ev bajar bû Paytextê wan.

Kurdên ku ber bi roava çûbûn, ji Çiyayên Qefqasan heya çiyayên Torosan girt, Sûriye û Filistîn jî giş vesandin. Evên ku berê xwe dabûn nîvro, Zagrosan, dora Urmiyê girt û serejêr bûn û pehnavên Dicle û Ferêt stendin, gihîştin kenarê Deryayê Faris. Lê, di wan deman da hêj Faris li meydanê tu nebû.

Institut kurde de Paris

## 2- LI MÊZOPOTAMYA XWEHERMENDÊN KÛTIYAN Û LOLOYAN Û DASENDA KURD Û FARIS

4000 sal B.Z., dema ku Kurdan deverên nîvroyê Araratan leyandin, li pehnavên Dicle û Ferêt rastî sê xwehermendên pirr şehrevan (medenî) hatin : Sûmîr, Akad û Elam.

Kurd, di demeke hindik da, bûn xudanên van her sê kişweran. Di van hengaman da, hêj li ruyê cihanê Faris, Ecem, Kildan û Asor tune bûn. Dengê van her sê hawuşan hêj tukes ne bihîstibû (38).

Di 1700 B.Z. da, Kûtî û Loloyan bi Sûmîr, Akad û Elaman ra şer kir û ew şikandin, di kişwerên wan da xwehermendên Kûtiyûm û Lolobûm serrast kirin. Xwehermendên ku Kurdan – Kûtî û Lolo – vekirandibûn ji yên Sûmîr û Akadên ku pêşveçûyîtirên cihanê bûn, di zaniş û agahî û şehrevaniyê da, di demeke hindik da ji wan buhurtin.

Paşê, nêzîkî du hezar sal bi şûnda, di rexên Ferêt da Kildanî û yên Diclê da Asor xuya bûn. Di kenarên Deryayê Faris da jî Faris peyda bûn. Ano, bavpîrê Farisan, Kiyûmers, di van hengaman da zaye. Bi bawermendiya Farisan, Kiyûmers bavpîrê hemû enzanan bû ! Dîrokên cihanê giş – xweşber dîrokzanên Eceman rader (mustesna – ji vê angaştinê dikenin û baş bawer in ku tiştên han çewtbawerî û efsane ne ! Ne Kiyûmers heye, ne jî bavpîrên wî !

Û paşê, bi angaştên Eceman, Kiyûmers Padîşahê pêşîn ê Farisan e û malbata padîşahan serrast kiriye. Ez durust û nedurustiya bawermendiyên Eceman di gihaja Kiyûmers û padîşahiyan da bersenc (munaqeşe) nakim. Ji bo vê yekê tu vêt (luzûm) nabînim. Lê, di gihaja Pişdadiyan da pirseke bergiran heye. Ji 2371 salnave – 400 sal B.Z. – di nivîswarên dîrokan da, ên destnivîs û yên çapkirî, ne hatiye nivîsandin. Û ez di vê sosirê da mame ku tukes, tu dîrokzan – ên rohilat û yên roava – bernihêra (diqqet) vê pirsa evçend nerxber ne bûye ! Efsûs û

Institut kurde de Paris

pir efsûs ku bi hezaran dîrokzan van pirsên evçend eşkere di nivîswaran da dîtine, xwendine, lê fehm ne kirine, yaxut guh ne dane ! Evçend pirs gelo çi ne ?

400 sal B.Z. ano 2371 sal berê hingî, Hêrêdot, pîrê dîrokzanan, geştevan (seyyah) û zanayê yewnanî yê binavûdeng di hemî cihanê da, geştevanî dikir û li çaraliyên gîtî (dunya) digeriya. Wî çi bidîta, çi bibihîsta, dinivîsand û bi nivîswarên dîrokan van gertevên kişweran û gelan belav dikir. Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 180, çend pirsên ku Hêrêdot berî 2371 salan li ser Farisan û Farisistan gotiye dinivîsîne : "Farisan di niştimanê xwe da, ano li dora tengava Faris da, bi cotkarî û şivanî kariwer bûn. Carna bi serxwebûnî jîne, lê pir caran berbendên (tabî) Pişdadiyan bûn. Yaxut, ji xwehermenda Mad ra, Kildan û Asor ra bac dida, û tucaran ji axa xwe derneketine derva".

2371 sal berî hingî, Hêrêdot, dîrokzanê yewnanî, çûbû welatê Farisan, tiştên ku li van doran dîtibûn û bihîstibûn giş nivîsandibûn. Gotinên jorîn ji nivîswarên Hêrêdotê bêalî û dîrokzanên din hatine girtin û derkenar bûne. Loma, ev pirsên han li ba dîrokzanan gelek buhadar in û herkes bawer e ku ev pirs rast in.

Ev gotinên Hêrêdot "Faris pir caran berbendên Pişdadiyan bûn" rind diaşkirînin ku Faris ne Pişdadî bûn, berbendên Pişdadiyan bûn.

Min, gava di nivîswarên dîrokan da van pirsên Hêrêdot xwendin, tavil zexelî, lîzbazî û çerpdestî (meharet) fehm kir. Min dest bi pêşekirina (tetqîq) van xap û dekan kirin. Min bicarek tûma rastiyê fehm kir : Farisên ku ne bi serê xwe bûn, ano serxwebûniya wan tune bû, destbendên Pişdadiyan bûn. Wan bac dida xwehermendên Mad, Kildan û Asoran. Gava hêj nû dest bi nivîsandina dîroka xwe kir, rahişt fend û fûtan, bend û virran ! xwe ji sextekarî û xapînokî bi şûnda ne da ! û bi çerp-

destî û bi destlîzî destbendiya xwe çirand, li ciyê şehriyarê xwe rûniştin û xwe kir Padîşahî ! Farisên bendeyên Pişdadiyan ji bendebûna xwe şerm kirine û bendetiya xwe ne gotine !

Rastî ev e. Xwehermenda Pişdadî bi xurtî û camêrî û şerevanî padîşahê Kûtiyan, Anrî- Daprîz, bûbû. Di 3700 B.Z. da, bi şikandinên Sûmîr û Akad, van padîşahên Kurdan xwehermenda Kûtiyûm sazandibûn. Pişdadî Gûtiyûm bixwe ne.

Pirsa Pişdadiyan pirseke weşbestan (şair) e. Pirsa rastîn, pirsa dîrokî "Gûtiyûm" e. Ev vêrast li ba dîrokzan û rohilatzan û arkêologan pezirandî ne. Eva rastî : Pişdadî Kurd e, ne Faris e : di sedsalên 38 B.Z. da "Dasenda Kurd û Faris" !

Institut Kurde de Paris

## 3- VEKIRANDINA BABÎL BI DESTÊ KASIYAN

### IMPERATORIYA MÎTAN Û PADÎŞAHIYÊN DIN ÊN KEYANIYAN

### Û DI VAN DEMAN DA "DASENDA KURD Û FARIS"

Pey Lolobûm û Kûtiyûm, Kasiyan ku birrekî Kûtî bûn di sala 1965 B.Z. da Babîl vekirand, li Babîlê 700 sal ferweranî kir û bi navê Kardûnya imperatoriyek serrast kir.

Şanên Kasiyan ne bitenê mêranî û cengawerî bûn. Kasî çiçend şerker û bajargîr bûn, ewçend jî şehrevan û enzanperwer bûn. Gava Kurdan Babîl vekirand, fermanwerî kir destên xwe, Babîl ji berê xemilandîtir û mezintir kir. Kasiyan hesp anîn Babîlê - gerdûnşerên Babîliyan ker girêdidan -, ji Babîliyan ra lixwekirina paçên hevisandî kir. Babîlî ustupêçên rengîn û bi gulvadûn ji Kurdan hîn bûn (di nivîswara me da li şehrevaniyên Kasiyan rohilatzanên awrupayî pir tişt nivîsîne, bi camêriya xwe bixwînin).

Di vê hengamê bixwe da, Mîtanî ku cardin birrekî Kûtî bûn Imperatoriyek serrast kir. Imperatoriya

Mîtaniyan ji hundirên Asor ta sînorên Misrê dirêj dibû. Mîtaniyan bi sedsalan bi Hitît û Misriyan ra ceng kir. Şerên Mîtanî û Misriyan tu jêder (netîce) ne da, loma herdu alî jî qîma xwe li aşîtiyê anî. Bakurrê Sûriyê ma ji Kurdan ra, Nîvroyê Sûriyê bû yê Misriyan. Mîtanî û Misriyan bi hev ra "parazî û êrîşî" peymannave girêda. Sê Fîrewnên Misrî bi prensesên Kurdan ra jinmêrî danî. Prensesa Kurdan a sêyim banûşaha binavûdeng "Nefertîtî" ye. Firewnê Misrê ji vê Banûşaha Kurd ra "ehram"ek ava kir. Navê wê li mala bavê wê "Tadu-Hepa" bû. Paşê, gava bû banûşaha Misrê, Firewn navê wê kir Nefertîtî.

Ji van nivîsandinên min pir baş xuya dibe ku Kurd hêj di van deman da - 4000 sal B.Z. - li hemberê xwe rastî gelek xwehermend û gelên dijmin hatine: Sûmîr, Akad, Elam, Hitît, Misr... Kurdên Mîtanî ji van peymaneyên ku bi Misriyan ra girêdan û bi wan ra merivatî danî tu sûd û behre ne dît. Misrî bêbext derketin, ji hevalbendên xwe Mîtaniyan ra alîkarî ne kir. Hitît li pey hev êrîş dikirin. Şerên Mîtanî û Hitît tucaran kêm ne dibûn. Misrî yek car ne çûn gaziya hevalbendê xwe !

Cengên Mîtanî û Hitît bi sedsalan dirêj kir. Paşê Mîtanî şikiyan, Imparatoriya Mîtanî wenda bû, pirraniya Mîtaniyan kişiyan Zagrosan û Araratan, ba birayên xwe.

Berî wendabûna xwehermenda Mîtanî, padîşahên Asoran xwehermendeke leşkervan û xurt anî meydanê. Padîşahên Asor kopa xwe ya pêşîn li şahînşahiya Kasiyan lêxist ! Pirrên Kasiyan bi padîşahên xwe va hilkişiyan Zagrosan. Hinek ji Kasiyan gihîştin xwehermenda Anzan ku Kûtiyan ji mêj ve li bakurrê Elam sazandibû.

Kasiyên ku kişiyabûn Zagrosan çendakî bi şûnda vegeriyan û şerê Asoran kir, ew şikandin û cardin li Babîlê sed sal fermanferma bûn.

Institut kurde de Paris

Paşê, careke din Asor bû xwehermendeke xurt û bi ferûtab. Padîşahê Asor bi awakî nedîtî, bi malmîratî, şikencdarî û zorbatî dest bi karûkoş kir. Hawîrdora xwe tirsand, rojberoj xurttir û dijwartir bû. Jimarên cengawer ên wan ji zû da sed hezaran derbas kiribûn. Leşkerên van Padîşahên Asoran mêr bûn, şerevan bûn, pir rind zanawer û karûbarkirî bûn. Dora paytextê xwe, bajarê Nînwa, bi bendeke sed kîlometre dirêj pêçabû. Ji bo bicîkirina sed hezaran leşker cengcih û dej û barû ava kiribûn.

Xwehermenda Asor ev ferûtabê wêranker û zorba, di demeke hindik da Mêzopotamya giş, kişwerê Hitît, Anadol, Sûriya, Filistîn, Îran û Misr vesendin. Asor di van deman da xurttir, zortir û firehtirên Imparatoriyan serrast kiribû.

Germîçanka vê xwehermendê axa Kurdistan bixwe bû ! Hem jî armanca mezin a Asoran wendakirina Kurdistan bû !

Kurd, pey sazandina xwehermenda Asor, ji sedsalan bêtir rojek asûdegî û bihindarî ne dît. Kurdan rojekê bê ceng, bê kuştin û bê xwînrijandin derbas ne kir ! Bi rastî, xwehermenda Asor di axa Kurdistanê da bingeha xwe danîbû. Kurdên Kûtî ev kişwer ji Sûmir, Akad û Elam bi xwîna sor stendibûn ! 2500 sal bû ku ev erd niştimanê Kurdan bûn ! Kurdan berî ku Nînwa ava bibe - 2000 sal berê - ji Araratan heta Sûriya û Filistînê vesendibû, di van kişweran da 2000 sal fermanferma bûn.

Kûtî-Amerdî li bakurê Elam xwehermenda Anzan serrast kiribû û Kasî jî li Babîlê ferweranî dikir. Di van hengaman da, Sûbarî ku birrekî Kûtî ne, li Araratan, li roavayê Araratan û li kişwerê Nîfast - Bedlîs, Diyarbekir, Dêrsim - ta li Torosan û Antî-Torosan gihîştibûn û xwehermend, ferweran û mîrî sazandibûn : Mîtanî, Hûrî Narî, Mûşkî, Xaltî û Alarodî li rohilatê Araratan: Madê Biçûk, Anzan, Mannaî û Madê Fêris imparatorî, şehriyarî û ferweranî çê kiribûn. Sînorên Mad gihîştibûn Hindistanê, çemê Send. Paytextê wan ê bertir bajarê Belx bû.

Institut kurde de Paris

Wuha ye ! Babil û Asor, ev gelên biyanî, xwe xistibû navika Kurdistanê ! Kurdan dê çi bikira ? Li ber kujrişa mezin, Kurd dê çi tevger bistenda ? Li pêş vê ordiya mezin mêr û cengawer bi tabûfer û bestûbend, rapêçayî û karûbarkirî dê çi bikira? Li van sipahan û li padîşahên wan ên xurt û xwînrêj û bêdad dê serfirû bikira an Kurd dê xwe bavêta bextê wan ? Na ! Kurd rûreşiyên wusa nake ! Kurd gendûgemarî, nizmpayetî li xwe danaynîne !

Asor li bin fermana yek padîşahê zormend û ferûtab pir xurt û gewre bû. Di van hengaman da, li cihanê xurtiyek di vê endazê da tu nebû.

Herçend ku di van deman da du imparatoriyên xurt û mezin ên Kurdan, Mîtanî û Kasî, ji meydanên koşiş û werziş cuda bûbûn, dîlawerên Kurdan bêumîd ne bûn. Ji van her du xwehermendên mezin pêva, padîşahên din hebûn, mîrên din hebûn û li derûberan belavbûyî giloreyên din ên Kurdan hebûn. Ji Sûbariyan, ji birrên Kûtiyan, Nayrî, Mûşkî, Xaltî û Alarodî, ji Araratan ta Torosan ferweranî dikir. Li Nîfasê bermayiyên Mîtaniyan û bê jimar mîrên Hûriyan hebûn. Wêda, li aliyê rohilatê, Anzaniyan (Kûtî-Amerdî), Kasî, Lolo, Mannaî, Kimrî ... û paşiya paşîn ji Kurtî (Madê fêris û birrên wî) hebûn.

Belê, çawa ku me li jor gotibû, Kurdan her sê aliyên xwehermenda fêris a Asor girtibûn. Ev xwehermendên Kurdan û ferweranên wan, mîr û giloreyên derûberan ji hezar û ev çend sal da asûde ne man, aştî ne dît, bihn ne da xwe, bi leşkerên zorewer ên Asoran xerpişîn, kopişîn û xwîna xwe, malê xwe dirîx ne kirin. Hezar û evqas sal şer kir, ceng kir, pevçûn kir, birîn kir, hatin birîn kirin û hatin kuştin, lê ne reviyan !

Hezaran hezar kurên Kurdan ji bo birayên xwe, ji bo rûmet û namûsa xwe bûn gorî. Padîşahên zorba yên Asoran, ordî û sipahên dêwasa yên Asoran

Institut kurde de Paris

Kurdistan seraser wêran kir. Lê, padîşahên Asor û xwehermenda Asor Kurd "nakawt" ne kir !

Asoran Kurd kuştin lê ne pelişandin ! Ji şermsariya radestê (teslîm) ra qîma xwe ne anî ! Ta dawiyê, Kurd pêdarî (sebat) kir. Kurd bi her renc, şikenc û êş qîma xwe anî : bi tunebûnê, bi birçîtî, tazîtî, xwasî, bi hertiştî qîma xwe anî, ji bo yek demik bixwe ji xurtiya wî ra, mêraniya wî ra, qehremaniya wî ra ziyan ne hat.

Dawiya dawîn, Kurd ji ceng û pevçûn û xerpişên hezar û ev çend salan bi serbestî derket ! neyarê xwe yê hezaran sal, Asorê zorba, şikand û wenda kir ! Navê Key Aksar, şahînşahê Kurdan, di dîrokan da bi kişwergîrî hat nivîsandin !

Min li vir koşiş û pehlewaniyên hezar sal ên Kurdan bi kurtebirî derkenar kirin. Bi vêrastî, di nivîswara min da ev gertevên han pejilandî nivîsandî ne. Xweşber, li vir bi kurtebirî, di nivîsandina min da meramek heye : ez dixwazim xwendevanên min bi hêsanî van çend pelan bixwînin û zû bi zû fehm bikin ku Kurd di nav 6000 sal da çiçend canfeşanî kiriye, çawa wek çeman xwîna xwe leyandiye û ji bo niştimanê xwe çawa bi milyonan Kurd xwe kirine gorî.

Û cardin merama min ev e : xwendevanên min zanibin ku li dawiyê, bi van ceng û koşişên xwînalûd û dilgudaz, hin behremendî kete destê Kurd û Faris. Faris bi çar nex û deh nex ji van encaman behrtemen bû. Lê gelo Faris di van ceng û koşişên dirêj ên hezaran salan da çi canfeşanî û karûkoşî kir ?

Di şer û koşişên Sûmîr, Akad û Elam da, bûniş û tevgerên Faris çi bûn ? Gava Hitît, Misr û Kildan, nemaza Asor ku wek gurê devbixwîn dirêjî welatê wan kir, Paris li ku, çi gav û çawa bi van neyaran ra şer kir ? Û xwendevanên min bizanibin di van salan da "Dasenda Kurd û Faris" çi bû, çawa bû.



Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS · BIBLIOTHÈQUE ·

Lê, ez pir baş zanim ku xwendevanên min ji vê dîrokçeya 6000 sale ya Kurdan, ya pir xwînrêj û pir dijwar, ku min ji wan ra jimartin, tiştê yegane ku jê hîn bûn ev e : Farisan di van 6000 salan da, di hengama koşiş û xerpişên Kurdan ên pir dijwar û hovnak da, tu havil û tevger ne kir, destên xwe ne dan tu sar û germiyê û alîkariyeke biçûçik ji wan çê ne bû ! yek dilop xwîn ji wan ne rijiya !

Xwendevanên hêja ! Gelo we têderxist ? Hûn têgihîştin Kurd kete çi bûnişê ? Kurd di çi bûnişê da ye ? Bûnişa Kurd çi bûnişeke dilgudaz û hovnak e ?

Kurd bi neyaran ra şer kir, wek leyiyan xwîna sor şûşikand, niştiman û axa xwe fireh kir, sînorê Kurdistanê çû xwe hihand Hindistanê. Ji aliyê roava çû xwe gihand Deryayên Reş û Sipî. Çiyayên Qefqasan bûn sînorê Kurdistana bakurr. Kurd ji aliyê jêrîn bûn hevsiyên Hebeşistanê. Di van hengaman da niştimanê Kurdan bû gewretirê imparatoriyên cihanê.

Kurdan di van şeş hezar salan da bitenê şer û ceng ne kir. Aştî jî kir, peyman jî girêdan. Carna dostanî jî sazand, bi Fîrewnan, bi Qralan merivatî jî danî. Kurd di van şêst sedsalan da bi gel û hawişên bê jimar ra hatin mizişandin (temas). Çawa ku ji şehrevanî, pîşewerî, hunerweriyên van hawişan behremend bûn, ji şehrevaniya xwe jî, ji zaniş û agahiyên xwe jî gel û hawişên din behremend kirin.

Kurd tenê bi mêranî, bi çekbazî, di şeran da bi hunerwerî, di meydanên cengan da bi pêdarî û tebûtiya xwe xweşnav û xweşdeng ne bû. Kurd di bazirganî, pîşewerî, avadanî, zaniş û haydarî, bi kurtebirî Kurd bi karûkoşan û bi şehrevanî û hunerweriyê jî jêhatîbûna xwe nîşan da.

Padîşahên Asor, bi nivîsandinên ku li ser zinar û beryadan kolane, pir caran Kurd pesinandine û

Institut kurde de Paris

hergav ji bo avakirin û xemilandina Nînwa endezan, avadanker û pîşewer ji Kûtî û Loloyan dibirin û bi niwaziş û zêran ew dilxweş dikirin. Rohilatzanên Awrûpayî jî di nivîswarên xwe da hunerwerî û karaşînayiyên Kurdan pesinandine.

Xwendevanên camêr ! Min ji şeş hezar sal beriya zayîna Îsa ta vekirandina Nînwa bi destê Kurdan, ano di van şêst sedsalan da, "Dasendên Kurd û Faris" li ber çavên we raxistin. We jî wek min dît ku Kurdan ceng kir, xwîn rijand, koşiyan û xebitîn. Farisan - çawa ku di herşeya venijandî (merbût) xuya ye - di navbera kenarê Tengava Faris û Pasargadê da û di erdekî teng da cî girtibû û jimara wan jî ji dehan yek a Kurdan hindiktir bû û hîç ne koşiyan, ne xebitîn, dilopek ji xwîna xwe ne rijand; çawa ku Hêrêdot gotiye, bac dida xwehermendên Mad, Kilde û Asor, cotkar bûn û tucar ji erdê xwe derneketibûn û berbendên Padîşahan, ano Kûtiyan, bûn. Çawa ku Hêrêdot dibêje, Paris hîç ji welatê xwe derneketibûn, bi gel û hawuşên din hîç ne hatibûn mizişandin (temas), çar hezar sal jîneke yabanî derbas kir. Ev jîna wan hîç ne guherî, tum şivan bûn û şivan man.

Xwendevanên hêja ! Hûn jî wek min bibînin : hawişên Faris wek kûsiyan di nav qalikê xwe da jîna xwe derbas kir, tu nîşaneya pêşveçûnê ji wan xuya ne bû. Çar hezar sal dûrî şehrevaniya cihanê man, bi belengazî û tirsonekî bac da, canê xwe yê şêrîn rizgar kir.

Eger em bên kişiş û werzişên Kurdan, ev Kurdên jîndar û çalak û hişyar ji şeş hezar salan ve - 2000 sal berî peydabûna Farisan - demikek bê xebt, bê pevçûn derbas ne kir. Kurd ji bo jîn, jîndarî, ji bo hebûn û manişa enzan, çi divabû jê bi şûnda ne man : bi hezaran keriyên hesp, ga, çêlek û pez diçêrandin, cotkarên jêhatî bûn, baxçevanî, rezvanî dikirin, gund û bajar ava dikirin, avadanî sazandin û şehrevaniyeke zor anî meydanê.

Lê Kurd berî hertiştî divabû welatê xwe, rûmet û namûsa xwe qedxen bike û ji neyaran biparêze. Kurd ji kêmbextiya xwe rastî neyarên fêris, xurt û şerevan hatibûn : Sûmîr, Akad, Elam, Hitît, Misr, Kildan, Asor ... Kurd wek Farisan payejêrî û şermsarî ne kir, rûreşî ne pezirand û bednavî ne anî ser xwe. Kurd xwîna xwe rijand, canfeşanî kir, ji ber neyaran ne reviya, navê revê ne anî ser xwe !

Kurd di mêraniyê da, di şerevanî û cengaweriyê da navûdeng bir. Lê Kurd ku di şer û pevçûnê da pir zorawer û dijwar e, carê destê wî ne çû birîndarekî, carê ji girtî û dîlan ra dest bilind ne kir. Ji kêmketiyan ra, naçîz û rebenan ra arîkarî kir, dilovanî kir, bû mihrivan ! Nemaza namûs û dawpaqijî li ba Kurdan homanwer, pirfiraz û giramîdar (muhterem) bû û hergav ji çepelî û kirêtiyê dûr dima.

Ev Kurdê dilîr û cengawer, dilovan û mihrivan di şêst sedsalan da bû xudanê kişwerekî zaf mezin û gewre, bi gel û hewuşên bê jimar mizişî, kişwer û bajar dîtin, bi ordiyan û leşkeran ra danûstend; bi zana û feylesofan, bi weşbest û nivîsmendan, bi bazirgan û hunerweran ra rabû û rûnişt. Ji her tiştî, ji her kesî para xwe stend, zanebûn û hunera xwe jî firote wan. Kurd bi zîrekî û lêhatiniya xwe di her birr û zûlê şehrevaniyê da pêş ve çû, bişkivî, wek Farisan çar hezar sal tembel û bê tevger ne ma û rûnenişt !

Ez ji bo aşkartina van angaştên xwe mîneyên (mîsal) jêrîn ji zanayên Rohilat û Roava distînim û dinivîsînim, û ez dê dawiya birra sêyim "Dasenda Kurd û Faris" bînim û dest bi nivîsandina birra çarim bikim :Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 148 : "Di 1288 B.Z. da, Padîşahê Asoran, Salmanazar, bi Kûtiyan ra pir caran şer kiriye. Ev padîşah ji Kûtiyan ra ewha dibêje : "Kûtiyûm, ji Araratan ta Torosan dirêj dibû. Kûtî di ezmanên van hengaman da wek stêran diçirisîn. Bitenê ne di lewendiyê da, belkî di perjendî (xurtbûn), sûrgivêjî (şiddet), hovnakî (dehşet) û perçokiyê (texrîb kirin) da jî bi navûdeng bûn".

Institut kurde de Paris

## 4 - DERCÎKIRINA KEY AZDIYAK, KEY XUSREWÊ MEZIN Û PEYHATIYÊN WÎ

### ISKENDERÊ MEZIN Û DASENDA KURD Û FARIS

Di danava (bahs) duyim a "Dasenda Kurd û Faris" da, min zexeliyên Farisan danîn meydanê û danava sêyim da jî min aşkart ku Kurd şeş hezar sal bi pênc neyarên xurt û fêris ra bê aram û bê bihnvedan şerine dijwar kirin !

Nuha dest bi danava çarim a "Dasenda Kurd û Faris" dikim. Lê, ji bo ku ez karibim xahez (doz) û mafê Kurdan bi awakî zelal û diyar biaşkirînim, divê ez li ser rûyeya (usûl) nivîsandina dîrokên kevnare û dîrokên nû hinek zanişwerî bidim : heya berî du sed salan, pirên zanişweriyên kevnare yên dîrokan - gelên cihanê giş - ji efsane û çîvanok û çîrçîrokan li hev dianîn. Lê, du sed sal vir de, Awrupayiyên jêhatî û zana, çawa ku di her zanişwerî da pir pêş ve çûn, di zanişweriya dîrokê da jî gelek pêş ve çûn.

Bi sîdariya zanayên Awrupayiyan, pêşveçûnên zanişweriyên arkêolojî, antropolojî ... bi gavên dêwane pêş ve çûn û nivîswarên dîrokên kevnare ku bi çewtbawerî û çîrçîrokan tije bûn û hebaneke çewtbaweriya çîrçîrokan bûn çiriyan û bûn zîrûzeber.

Belê, zana û arkêologên Awrupî ji du sed sal vir da li çar aliyên cihanê gerdpiş (teherrî) kirin û kolanên zor çê kirin. Ji bo ku dîrokên kevnare yên enzanan ji çewtbawerî û efsane û çîrçîrokan pak bikin û bi awakî durust û xurû bînin meydanê, gelek emek dan, pir zêr rijandin. Ev Awrupayiyên xebatker û jêhatî û zana îro, ji berê bêtir, canfeşanî dikin û dikoşin.

Nemaza ji girêdana peymana Lozan bi şûn da - Peymana Aştî ku Awrûpiyan û Mustafa Kemal di sala 1923 da girêda - ji Emerîka, Fransa û Ingiltere

Institut kurde de Paris

ra destûr hat dayîn ku di kişwerê kevn ê Osmaniyan û Eceman da li kevnerêçan bigerin. Ji zana û arkêologan ra Kurdistan bû bergirantira meydana xebatê.

Di perçeyên Kurdistanê : Îran, Iraq, Sûriye û Tirkiye da, ji 1924 heya îro, ano heya 1971, bi gerpiş û kolanên arkêolojîk di gihaja buhêrka Kurdistana kevnare da hezaran perçe "kevnerêç" derketin meydanê. Ciyên bergiran ên ku bûn meydanên kolanê ev der bûn : Ararat, serekaniyên Dicle û Ferêt, bakurrê Diyarbekir, Mêzopotamya, Loristan, Bextiyarî, Hewlêr û dora wê, Mûsil û dora wê, Boxaz-Köy, Cerablûs, Serê Kaniyê ... Li Sûriye û Filistînê.

Bi sîdariya gerpişên evçend fireh, pir ciyên dîroka Kurdistanê ku ji enzanan ra nenuma û veşartî mabûn derketin meydanê û ronak bûn.

Bi germweriya arkêologên Awrûpayiyan xuya bû ku berî zabûna Îsa bi şeş hezar sal Kurd ji Araratan heya Hindistanê û ta Torosan fermanferma bûn, bajarê Belx Paytextê wan bû. Cardin bi xebtûkoşên zana û arkêologên germewer ên Awrupayiyan hat aşkartin ku di 3700 B.Z. da Padîşahê Kûtiyan, Anrî-Daprîz, Padîşahê Akadan, Naramsîn kurê Sargonê binavûdeng, şikand û Paytextê Akadan, Lakaş, vekirand û xwehermenda Kûtiyûm sazand. Kûtiyan bi sedsalan di vî kişwerî da ferweranî kir. Loloyan jî di van hengaman bixwe da Lolobûm serrast kir. Sarlaq, Padîşahê Kûtiyan, di sala 2800 B.Z. da li bakurê Elamê Padîşahiya Anzan anî meydanê. Di 1977 B.Z. da bi Kildaniyan ra şer kir û ew şikandin, Babîl vekirand û bi navê Kurdunya xwehermendeke fêris serrast kir. Kurdan li Babîlê 600 sal ferweranî kir. Kasî di sala 1171 B.Z. da, di hengama Tîklatnîn, Padîşahê Asor, bênev (mecbûr) bûn û bi padîşahê xwe va Babîl berdan, kişiyan Zagrosan. Hinek ji Kasiyan gihîştin Anzana ku di sala 2800 B.Z. da Kûtiyan ew berbihev anîbû.

û cardin bi koşiş û germewerî û camêriya zana û arkêologên Awrûpayiyan hat aşkartin ku di sedsalên 13 û 12im da navê malbata padîşahên ku di Anzanê da ji Kûtî-Amerdiyan ra ferweranî dikir "Texîxî-Xenî" bû. Ev malbat heya 560 B.Z. - dema Padîşahiya Kûrişê mezin li Kurdistanê gişî - di Anzanê da du hezar sal bêtir ferweranî kir.

Min di danavê padîşahiya Anzanan da nivîsandibû ku di van salan da li Anzanê, di gevera Bextiyariyan da, bi gerpiş û kolanên arkêolojîk di gihaja Kurdan da kevnerêçên pir bergiran derketine. Lê, ez dixwazim vê danavê carek din jî di vê rûpelê da binivîsînim :

Di van salên nêzîk da, li Îranê, li geverê Bextiyariyan, di sê ciyan da : Mala Mîr, Gola fireh, Şkefta Suleyman (39), kolanên arkêolojîk hatin çê kirin. Çend nivîstekên pir hêja peyda bûn. Ev nivîstekên han di gihaja sedsalên 13im û 12im da bûn û ji padîşahê "Texîxî-Xenî-Kûtî-Amerdî" mabûn. Dr Says'ê Hollandî ev nivîstek wergişandibûn : "Vî Padîşahî, di van nivîstekan da, ji bo xwe Padîşahê Anzan gotiye û avakirina welatê xwe û çêkirina riyan nivîsîne. Ji mabûdên xwe ra spasan dike û aferînan dixwîne, ji bo ku wan kişwerê Anzan jê ra bexş kiriye û ew kiriye padîşahê Anzan û Kûtî-Amerdan. Pûtên ku ji bo Xudanên xwe çikandine û ji bo wan dast û stranyezdiyên (ilahî) ku li dîwaran neqirandine giştik yek yek jimartine. Navê xwe û malbata xwe wuha dibêje : "Ez ku Texîxî Kûtî-Amerdî padîşahê Xenî me".

Li Anzanê, ji ezbeta "Texîxî-Xenî Kûtî-Amerdî" gelek padîşah ferwanî kiriye. Kûriş, berî ku bibe Key Xusrewê Mezin, Padîşahê Anzan bû, ji ezbeta Texîxî-Xenî - Amerdî bû, û gava zaro bû navê wî "Agirdad" bû. Dîrokzanên rohilat û roava vê rastiyê ji zû da nivîsiye.

Gava nivîstekên padîşahên Anzan ku di gihaja sedsalên 13im û 12im da bûn di vê nêzîkayiyê da derkete meydanê, zanişmendiya me di gihaja Key

Institut kurde de Paris

Xusrewê Mezin da bicarek aşkifî. Rohilatzanan bi spartinên van nivîstekan dibêjin : Ezbeta ku ji du hezar sal bêtir li Anzanê padîşahî kiriye, navê wê yê rast "Texîxî-Xenî" ye. Pirsa "Examenî" ji vê gotinê çewtwer bûye.

Bi hêsanî tê gihaştin ku Eceman pirsa "Hexamenşî" şapînoz kiriye, çawa ku bi "sivikdestî" û "çerpdestî" Pêşdadî kirin padîşahên Eceman ! Key Xusrewê "Agirdad", Key Xusrewê Anzanî û Kûtî-Amerdî û Kurd kurê Kurd kirine "Hexamenşî" û padîşahê Pasargadê ! û bi xweşikî ji nav derketin !

Em vê doza vêrast û bi nav bidemînin :

A- Dîroka Merdûx ku di 1906 P.Z. da li Tahranê çap bûye, di derpêç I, rûpel 181 da wuha dinivîsîne: "navê Kûriş ê vêrast Agirdad e".

Çi aşkartina ferweş ji vê pirsê, ji pirsa "Agirdad" ferweştir çi gotin heye ku bi evçend bişkavtiş (wuzûh) bikare biaşkirîne ku Key Xusrew Kurd e, kurrê Kurdan e ?

Belê, eger Kûriş ne kurrê Kurdan ba, Bav carê navê Kurdan lê dikir ? ji kurrê xwe ra "Agirdad" digot ?

Parisbav ji Fariskurr ra navê Paris datîne. Eger bavê Kûriş Paris ba, ji kurrê xwe ra "Ateşdad" dê bigota. Ji bo Kurdbûn kurrê Kurdbûna Key Xusrew ji vê ferweştir aşkariş dibe ? Hîç dudilî naxwaze. "Examenî", ano "Texîxî-Xenî", Kurd in û Kûriş, ano Agirdad, kurrê Kurdan e.

B- Dîrokzanên Awrûpayî gişên wan û Rohilatzan yek deng in ku Kûriş Padîşahê Anzan bû û ne Padîşahê Pasargad bû.

C- Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 135 : "Di hengama Padîşahiya Kûriş da, paytextê kişwerê Mad Hemedan bû. Paşê paytextê kişwerê Mad bû Isfahan. Di defterxaneya Isfahan da fermana Kûriş peyda bû.

Institut kurde de Paris

Ev ferman ji bo nûvandinkirina Quds bû. Di vê fermanê da navê Kûriş "padîşahê Mad" nivîsandiye. Di Tewratê da, li benda 6im pejilandî ye".

D- Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 180 : "Di Tewratê da, nivîswara Ezra, li benda 6im nivîsandiye : Paytextê Kişwerê Mad Paytextê Kûriş e".

E- Û cardin di dîroka "Tarîhî Rîşeyî Kurd" ku li Tehranê çap bûye, rûpel 121, 122 da, Ihsan Nûrî Paşa bi farisî nivîsiye : "Mesûd El Tebenî, di El Esfar da, ezbetên Kurdan jimartine û gotiye ku Ûd Ibn Isfendiyar Ibn Çehr bavpîrê Pişdadiyan e. Ev nivîsvan zanişweriyên xwe ji serê kaniyên Pehlewiyan stendine û bavpîrên Kurdan gihandine şehriyarên Îranê".

"Ev aşkaftin, ji cudayiyeke (istisna) tenê pêva, ponja ku di nivîswara me da hatiye gotin dipiştîne (tyîd dike). Ev cudayî ji ev e : Kurd ne ji ezbetên şehriyarên Îran in. Belkî şahînşahên Îran ji ezbetên Kurd in û paşê ev komel tevde navê gişkî, ano navê "Kurd", stendiye".

"Şehriyarên Îranê ji van birrên Kurdan bûn :

"Kiyûmersî : Kûtî"

"Cemşîd : Kasî"

"Ferîdûn û paşhatiyên wî : Mannaî"

"Hexamenşî : Kûtî-Amerdî-Kasî".

F- Wek hemî dîroknivîsan, min jî di nivîswara xwe da ji bo dercîkirina Azdiyak ji Textê Keyan nivîsandibû. Lê, ez dê cardin binivîsînim : Belê, Azdiyak padîşahekî pir bedpaye û gewzeger (sefih) bû. Nesezayê text û tacê Keyaniyan bû. Loma, fermandaran û leşkeran - pir bi maf û pir bi cî - tevî rûsipiyan, gel û tûde giş ustubarê niştimanparêziya xwe anî cî û Ixtovîko ji textê Keyaniyan dercî kir. Van niştimanparêzan Azdiyakê naseza ji text dercî kir û di ciyê wî da padîşahekî kurd û pirr seza, padîşahê Anzani-



Institut kurde de Paris

yan, padîşahê Kûtî-Amerdiyan ji ezbeta Texîxî-Xeniyan, Agirdad, Kûriş, Key Xusrewê Mezin li ser textê Kurd, li ser Textê Keyan rûniştand.

Niştimanparêzên Kurdan, generalên Kurdan, gewremerdên Kurdan li ser Textê Kurd, li ser Textê Keyan, yek Paris ne da rûniştandin, ne karibû bidin rûniştandin ! Eger Kûrişê Mezin Paris bûya, Kurdê mêrxas, şerker û ciwanmerd gelo çawa ewê Parisekî carê şernekirî û cengnedîtî bianiya ser textê Kurdistanê? Kurd kengî pespayetiya weha pax dikir ?

Heredot ku pîrê dîrokzaniyê ye me pirsên wî li jor ne nivîsandin ? Paris ne berbendên Pişdadiyan bûn? Ji Madan, Kilde û Asoran ra bac ne didan ?

Dîroknivîsê Parisan bi zexelî û sivikdestî ji şep û wesan behremend bûn û çawa xwe kir Pişdadî wusa jî Key Xusrewê Anzanî, Key Xusrewê Padîşahê Kûtî-Amerdî kir Padîşahê Pasargadê û jê geriyan.

G - Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 171-172 : "Kurrê Key Lehrasep, Key Kiştaseb, di destpêkê da, wek bavê xwe, li Belxê Padîşahî kir. Paşê Paytextê xwe rakir bajarê Istexir (Persepolîs). 668-602 B.Z.".

"Key Behmen ji Hindistan ta Habeşistanê sînorê xwe fireh kir. Çawa ku di Ahdî Atîq, kitabî Esîr da eşkere nivîsiye, kişwerên bê jimar fermanfermabûna Key Behmen nivîsandiye : "Key Behmen bi dadkerî û şerdewerî (hikmet) nav biribû û ji bo xweşgerandina kişwerê xwe rêdarên hêja hevandibûn. Hevandin û rêzandina wan rêdaran ji Key Behmen ra navekî bilind û mezin dabû".

Şehriyariya Key Behmen ji 602 ta 533, ano 69 sal, ajot. Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 180 : "Bi her awayî dîroka hundir û derva wergerka Mad kirdarişek hundirî zanin".

"Mad ev wergerka ha bi destên xwe çê kir. Kurrê padîşah sezayê Textê şehriyariyê ne dît, ew rakir, li ciyê wî neviyê padîşah da rûniştandin. Hem ji vê

Institut kurde de Paris

guhartinê ra bi çavekî xistina Mad ne nihêrt û di hengama Daryus û Key Serxes da jî ji xwehermenda Kûriş ra xwehermenda Mad digot. Çawa ku li Tewratê di nivîswara Azra, bend 6 da nivîsandî ye, ji paytextê Kûriş ra paytextê kişwerê Mad gotine. Çi kişwerê Paris, çi jî kişwerê Paris û Mad gotine".

Ji dîroka Merdûx û zanişweriyên ku min derbasî jor kirin derjeyên han derdikevin : paytextê neviyê Key Kubbadê Kurd, Key Lehraseb, Belx bû. Key Kiştaseb, kurrê Lehraseb, Paytextê xwe rakire Istaxir, ano Kişwerê Paris, û li Istaxir 66 sal şehriyarî kir. Gava Key Kiştaseb mir jî, li Şîrazê hat veşartin. Wuha ye : B. Z. Îsa, di dora salên şeş sedî da, li van doran tu Padîşahê Paris tune bû, Paris berbendên Mad bûn. Eger ji Kişwerê Paris Padîşahek şehriyarî bikira, Key Kiştaseb li Istexir 66 salan Padîşahî nikaribû bike û di mirina wî da jî Şîraz ne dihat veşartin.

Wuha ye. Van terraneyên han jî "Hexamenşiyan li Pasargadê, yaxut li Istexir, Padîşahî kir" efsane û nigaşên Eceman bûn. Wek efsane û nigaşên berê, çawa ku Ecem şehriyariya Pişdadiyan kiribû ya xwe !

H - Paşê, Key Behmen, ku kişwer û bajar ji Hindistanê ta Habeşistanê vekirandibûn û navê "Cihangîr" stendibû, di van hengaman da, ano dema ku Azdiyak dercî kir û Kûriş kir Padîşahê Kurdan, Key Behmen li Suvêş (nêzîkî Bexdê) rûdinişt û şehriyarî dikir. Gelo çawa Key Behmen dihişt ku Parisek bînin, li ser Textê Keyan bidin rûniştandin ?

Key Behmenê Madî, Key Behmenê Cihangîr tu caran Parisek li ser Textê Keyan ne karibû bibîne, ne karibû rûmetşkeniyeke evçend mezin bipezirîne !

Di gihaja Kûriş da, bi rûpelan min nivîziş nivîsandin. Min ev nivîzişên xwe wek serêjeke (mesele) pir dijwar a "aljêbr" bi buxuşk (hesab) û pazend (kitab) û bi hoşmêjî (mantiq) û bi awakî pevbend (muretteb)

û hevandî (munazzam) veçirand (hal kir) û ji hev derxist : Kûriş Kurd e, padîşahê Anzan e, padîşahê Kûtî-Amerdiyan e. Kurdan sezabûn û hêjabûna Kûriş nas kir, ji paytextê Anzan, ji paytextê biçûk rakir, ew bir li ser textê gewre yê Hemedanê da rûniştandin.

Kûriş bi xebtûkoşa xwe, 29 sal bi hoş û zîrekiya xwe, aşkart ku ew şayesteyê Padîşahiya Mad e.

Kûriş sînorên Kurdistanê fireh kirin, Lîdya û Hindistan vekirandin û navê mezinatî stend, bû Key Xusrewê Mezin.

Kûriş bi zanatî û bilindrewaniya xwe, bi dilovbanî û enzaperweriya xwe jî mezinbûna xwe nîşan da. Ordiya firazbaz û navbilind a Kurdistanê gewretir û xurttir kir.

Kûriş bi kirdiş aşkart ku padîşahiya Mad û padîşahiya Anzan yek tişt in. Her du jî Padîşahiyên Kurdistanê ne. Anzan jî Kurd e, Mad jî Kurd e.

Kûriş ji pismamên xwe yên Paris ra xweşdarî kir. Kûriş çêtirand ku Paris bi cotên xwe kariwer bibin û li konevanî û leşkerî têkil nebin.

Kûriş ji gelê xwe ra durust ma. 29 sal bi kamwerî şahînşahî kir û paşê gelê xwe û ordiya xwe ji kurrê xwe Key Kawûs ra spart û ji vê cihanê koç kir.

## 5- KEY DARAYÊ MEZIN Û KURRÊ WÎ KEY SERXES Û DI VAN DEMAN DA "DASENDA KURD Û FARIS"

Key Xusrewê mezin bi xebtûkoşên xwe yên 29 salan pir qenc aşkart ku ew sezayê padîşahiya Mad bû û ew sezayê Tacê Kurdistanê bû. Key Xusrew yek deme ji bîr ne kir ku ew Padîşahê Kurdan e, Anzan perçeke Kurdistanê ye. Key Xusrew, ta mirina xwe, bi padîşahiya Mad serfiraz bû. Key Kawûs jî vî rewanê pak û vêrast ji xwe ra kiribû rêber. Bav jî û kur jî aşkart ku peyhatiyên Key

Institut kurde de Paris

Kubbad û Key Aksar in. Wan her du jî ji bîra xwe dernexist ku girewa yegane ji bo parastina Kurdistanê ev ordiya pir şan û tab e, ev ordiya ku ji wan ra diyariya şehriyarên Keyaniyan e. Xwejber, wek Key Kubbadê Kurd, wek Key Aksar, di zanwerî, karûbar û bendûbestê ordiyên xwe da tu kêmanî ne hişt. Ordiya Kurdistanê bi fermandarên xwe û bi cengawerên xwe li ba van her du padîşahan wek roniyên çavên wan, wek kurrên wan bûn.

Ev her du padîşah berborên (sifetên baş) pesnwer ên Keyaniyan jî mirhate girtibûn. Key Kubbadê Kurd bûbû avakerê mezin ê Kurdistanê. Key Tos bûbû avadankerê (mimar) bajaran, piştemêrê cotkar, bazirgan û pîşeweran. Ji enzanîtiyê ra hinaweriya (ders) aştî û asayiş dabû, di kişwerê xwe yê fereh da ruyedadî (usulê muhakeme) vêrastiye û nûvandiye, ruyeyê daweriya geroke (seyyar) nûvandiye û bi danîna rêdarên nûjen ji kurrên welêt ra dad û ewlemendî bexş kirine.

Kamweriya Key Aksar a mestir ev e ku ordiyeke fêris û firazbaz anî meydanê (41) û pê şahînşahiya Asorê zorba û şikencedar wenda kiriye. Ev Asor hezar û evçend sal xwîna kurd vexwar û yek roj ji Kurdan ra bîhn ne da.

Key Behmen û Key Xusrew weka ku hemdem in. Key Xusrew çawa ku ordiya Key Aksar û ruyeyên stratêjîk û taktîk ên wî mirate girtibûn, ewha jî ji Key Behmenê kişwergîrê Misr, ji dadkerî, şerdeweriyên (hikemiyat) wî û ji rêdarên ku hevandibûn gelek hinave (ders) girtibûn.

Bi vî awayî, Kûrişê Mezin çiçend bi kişwergîriya xwe navûdeng stendibû, evçend jî bi zanişmendî û agahdariya xwe berguzîn bû û ji van pêşhatiyên xwe yên hêja û şanfiraz, ji aliyê cengawerî, şehrevanî û enzanparêzî, pir tişt hîn bûbûn.

Kûrişê Mezin jî û kurrê wî Key Kawusê Kişwergîrê Misr jî xûy û berborên (adet) pêşhatiyên xwe yên



Institut kurde de Paris

pirfiraz : Key Kubbad, Key Tos, Key Aksar û Key Behmen, di riya rewşxweşî, enzanî, civatî û dadkeriyê da yek bihn ji şopa wan venegeriya. Wan kurdbûna xwe carê ji bîr ne kir, ordiya xwe ya gewre pirr evînand, ji fermandar, serceng, gerceng û leşker û cengaweran giştikî ra evîna biratî û dilovaniya bavîtî nîşan dida. Hergav bi karûbar, livbaz (talîm) û zîbatiya ordiyên xwe kariwer bûn. Ew ordî ku yegane pasevan û piştevanê Kurdistanê bû, ew ordî bitenê engîza rizgariya niştimanê Kurd bû.

Gelo Key Dara û kurê wî Key Serxes çawa bûn ? Ev her du Padîşah jî Anzanî bûn, Kûtî-Amerdî bûn, ji ezbeta Texîxî-Xenî (Examenî) bûn, padîşahbûna xwe ya kişwerê Mad divegehand (îtiraf dikir) lê ne dûrbîn bûn û dûrendîş bûn, ne karibûn dûrûkûr bibînin. Xweşber, bav û kur yekbunyad ne bûn. Nemaza di aferişên wan ên gêndîtî (şexsî) da cudayiyeke mezin hebû.

Key Dara xwediyê du kêmaniyên mezin bû. Berî her tiştî pirgûman û bi wasiwas bû. A duyim jî, di şêtijî (qabiliyet) û zanedariya leşkerî ya xwe da ne sezawerê Text û Tacê Keyaniyan bû. Hemj, Dara ewçend ji payefirazî û cahşukûhiyê ra berxwar bû ku ziyankarî dida ji kenzineyê xwehermendê ra. Xuya ye ku gevzewier û şayîneger (sahibê zewq û kêf) bû Key Serxes - em dê paşê dûrûdirêj bibînin - bi kêrî tiştekî ne dihat, bitenê payexwaz bû û gewzemendîtî, meyxurî û dildadetî dikir.

Lê Key Dara li hemberî van kêmaniyên xwe tiştine hêja bire serî. Bi şêtijiyên hêja ji Kurdistan ra karkeriyên mezin kir : di kargerîniya kişwerî da, di aram û asûdegiya welêt da kamweriyên mezin bire serî. Jixwe dîrok ji vî Padîşahê Keyaniyan ra ûd û sernavê "Mezin" loma daye, çima ku ew sazemendekî mezin û karkerînekî mezin bû.

Darayê Mezin çiçend di sazmendî û karkerînî da mezin bû, eger evçend jî di şerevanî û stratêjiyê da

mezin ba û padîşahekî rind dûrbîn ba, Kurdistan ne diket vî nirxê dilşewat û dilgudaz.

Wê gavê, çi Iskender, çi Ereb, çi jî Tirk û Mongol karibû Kurdistan wêran bikin. Di sala 521 B.Z. da, Darayê Mezin gava li textê Keyaniyan, li Textê Mad, li Textê Kurd rûnişt, di hundirê welêt û hin ciyan da tevdanî û serrakirin çê bûn. Dara ev serrakirin zû vemirandin. Lê, pey van tevheviyên biçûk du mîrên Mad jî ser rakirin. Van mîran padîşahên Anzaniyan li ser Textê Madan ne dixwestin, çavnebarî dikir û mafê xwe, mirîhatê xwe dixwestin. Ev der du mîr Çetertexme û Ferawertiş bûn. Min li ser van gertevan di nivîswara xwe da dûr û dirêj nivîsiye, ducare nakim. Lê divê bi kurtebirî vêya bêjim : Dara ev herdu serrakiran bi hêsanî beralî ne kirin. Sê caran li bin fermandarên xwe yên Ermenî sipah şandin û her sê caran jî sipahên Dara şikiyan. Cara çaran Dara bixwe sed hezaran leşker kişandin ser her du mîran.

Çetertexme di meydana cengê da hate kuştin. Ferawertiş bi birîndarî hat girtin. Dara ew anî Hemedanê û ew bi işkence kuşt.

Van serrakirinên her du Mîrên Madan Dara ku pirgûman û wasiwas bû xist dilaşiftî, dilkutî û endîşeke mezin. Êdî ji Tac û Textê xwe pêva li tiştekî din birdarî ne dikir. Ji vir pêda ji Mîrên Kurdan û ta ji gişên Kurdan tirsiya, veciniqî, dilreş bû. Dara çare û endizeke yegane ji xwe ra dît : Kurd ji saraya xwe û ji ordiya xwe dûr xistin. Saraya xwe û ordiya xwe ji biyaniyên bi dirav kirîn û tije kirin. Ji tunebûna dûrendişî, ji çewtşînasiya Darayê mezin, seray û ordiya Keyan kete destê Parisan û Biyaniyan. Ev Parisên ku carê bi karûkoşên xwehermendî, leşkerî û konevanî kariwer ne bûbûn li saraya Keyaniyan piçikîn û xurtî û tebûtiya Keyaniyan hatin ji bîr kirin. Ordiya Keyanî bicarek ji meydanê, li ciyê ordiya fêris û firazbaz a Keyaniyan komeleke Enzanên Paris ên pepûk û nizmpaye û biyaniyên diravkirî û kurtêlxur peyda bû.

Derjêya vê gerwera (hal) pirendûh û purxun di 12 Êlûn, 490 B.Z. dagihîşte şermsariya "Maraton".

Di van geşteceng û şeran da, Mardonyosê biyanî û zavayê Dara serlekşerê ordiya Darayê Mezin bû ! Eva, di hengama Darayê Mezin da, bi piçikandin û kombûna Parisên cotkar û şivan saraya Keyaniyan, "dasenda Kurd û Paris", gihîşte vê rûreşî û tahlayiya hanê !

Em werin çîroka Key Serxes : pey şkestina şermsar a Maraton, Dara wehirand (qerar da) ku ew bixwe serleşkeriya ordiya xwe bike û ji bo vî şerê mandê (musteqbel) bê rawestan û bê bîhndan amandişeke (ihzarat) zor kir. Lê temenê Dara jê ra rê ne da. B.Z. 487.

Key Serxes amandişên bavê xwe - çawa ku bi awakî pejilandî min di nivîswara xwe da nivîsandiye - tûmandin (ikmal kirin) û ji reşayî û ji deryayê direjî Yewnanistanê kir. Lê, çi sûd ! Ordiya Key Serxes ji ya Dara şerpezetir û perîşantir bû û reviya. Piraniya leşker û fermandarên wî bi diravan, ji heftê û du gelan û ji Parisên jar û pepûk berbihev hatibû û bê werzwerî, bê zanwerî, bê xweziş û bê armanc bû.

Key Serxes ji textekodan (kelek) li Geliyê Çanakkale pirek dabû çê kirin, li pêşiya Ordiya xwe ya milyon bi firazdarî ji geliyê Çanakkale derbas bû. Key Serxes ne haydar, nezan û bê azmayiş (tecrube), ji karûbarên kişwerî û leşkerî bê agah, pirumîd, pirgewz û xwedîtî bû.

Gava Key Serxes ji geliyê Çanakkale derbas bû û direjî Yewnaniyan kir keştîcengên wî yên pirjimar û pir xurt jî ji Deryayê Egê dûr ketin û berê xwe da Deryayê Yewnanistanê. Çawa ku we di nivîswara min da xwend, li tengava Salamînê û li ber çavê Key Serxesê gerdenfiraz (maxrûr) keştîcengên wî bi awakî xwînî û hovnak şkestin û bi perîşanî reviyan. Key Serxes, pey temaşakirina vê şkestinê û

Institut kurde de Paris

şûnbextiya (mexlûbiyet) tahl û şermwer, tavil tevî ordiya xwe reviya, çû welatê xwe. Paşê, ta mirina xwe - hêj rastî jardadayîna xwe - ji aliyê fermandarê ordiya bendewar Artabanos di Sarayê Suz da bi meyxurî, saz û hayûhuy gewzendetî kir. B.Z. 465.

Me li jor xwend : Mardonyosê biyanî yê Ûrim zavayê, Darayê mezin, çawa ku di şerê Maratonê da serleşkerê mezin bû, cardin di şerê Salamînê da jî serleşkerê serleşkeran bû !

Key Serxes gava ji Yewnanistanê reviya, Mardonyosê zava yê serleşker bi 300.000 cengawer li Yewnanistanê hiştin. Mardonyos serê buharê dirêjî Yewnaniyan kir, di şerê Pêlatê da, di meydana cengê da, hat kuştin. Ordiya pejmurde ya Key Serxes, ku navê ordiya Keyaniyan lê bû û bi sed hezaran bû, li pêşberê çend qehremanên yewnanî reviyan ! Ên berşûrmayî suwarî keştiyan bûn, bi şermsarî û rûreşî bazda ! Li kenarê Deryayê Egê, li hindava Mîqal, şerekî din kiribû û ordiya Key Serxes cara duduya jî şikiya.

Hezaran efsûs ! Ev ordî, ordiya Kurdistanê bû ! Navê bilind ê Kurd lê bû ! Ew ordî ji Parisan, ji biyaniyan berbihev hatibû, seleşker û fermandarê wî jî biyanî bûn ! Ev ordiya heftêreng û sedreng ku li ber Yewnaniyan ranewestiya û di reşayî û deryayê da şkest nabedîd û nabûd bû !

Di hengama Key Serxesê gewzende û gewende da eva "dasenda Kurd û Paris" ! We dît ? Bi tevbûna Paris li karê mêran, li karê Kurdan, çi rûreşî çê bû? Ordiya Keyanan, ordiya Kurdistanê, çiçend serfiraz bû ? Çawa gihîşte şan û şukuhan ?

Yewnaniyan hêj wê gavê, ano berî 2450 sal, ji van şeran ra : Maraton, Salamîn, Mîqal ... şerên reşayî, şerên deryayî, şerên "Mad û Yewnanan" gotibûn. Dîroknivîsên wan jî "şerên Madî" nivîsîbûn. Îro jî di nivîswarên dîrokên Cihanê gişî da navê van şeran "şerên Mad û Yewnan" hatine nivîsandin.



INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Elbet, Yewnaniyên wê gavê zanibû li pêşiya wan kîjan padîşah heye, kîjan gel heye, bî kê ra şer dikir. Eger li pêşiya wan Padîşahê Paris, gelê Paris heba, "şerê Paris û Yewnan" dê binivîsandana. Yewnaniyan çi dît, ew nivîsand û rastî got (42).

Yewnaniyên kevn ku di zanişwerî û hunerweriyê da mamostayên "enzanî" yên îro ne, neyarên ku di hemberê wan da şer dike gelo dibe ku nizanibin kî ye ? Ev vêrasteke eşkere ye. Ji bo vêya ji dudiliyê ra engîz tune.

Darayê Mezin û Key Serxes Mad bûn, Padîşahên Madan bûn, ne Paris bûn û ne Padîşahên Parisan bûn. Vêrastiya hanê her du Padîşah jî bi eşkeretî pezirandiye.

Heredot di 484 B.Z da za û di 425 da mir. Key Serxes jî di 484 da li ser Text rûniştibû. Di 465 da Artabanos ew jardadayî kiribû. Seyaheta Heredot li Paris berî mirina Key Serxes bi bîst sal e. Ano, gava ku Heredot çûbû Paris, Kûrişê Mezin 120 sal berî vê çûnê padîşahî kiribû û her sê paşhatiyên wî - Key Kawus, Key Dara, Key Serxes - jî li dû hev padîşahî kiribû. Cihan giş zane ku ev Padîşah kişwergîrên gîtî ne. Eger ev her çar padîşah Paris bûna, jixwe Heredot ji vê kissê divê agahdar ba û ev padîşah di nivîswara xwe da dê padîşahên Paris binivîsanda. Heredot çima ji Parisan ra bi awakî sade wuha dibêje : "Paris carna bi serê xwe bûne, lê pir caran destbendên Pişdadiyan bûn û bac dida xwehermendên Mad, Asor û Kildan" ? Çawa bûye ku Parisan ji van padîşahên fêris û cihangîr yek pirs ji Heredot ra ne gotine ? Eger Kûrişê Mezin û Darayê Mezin padîşahên Paris bûna Heredot dê nebihîsta ?

Xuyaye ku berî 2300 sal, gava Heredot çûbû nav Parisan, wan di van hengaman da hînê derew û lîzbazî ne bûbûn, li xwe dananîbû û padîşahên ku neyên wan bûn ji Heredot ra ne gotibûn padîşahên me ne û bi derewan ew ne xapand.



Institut kurde de Paris

Pey jehirandina Key Serxes bi destê fermandarê ordiya bendewar, ji Anzaniyan çar padîşahên din li ser Textê Keyan rûniştin. Paş van padîşahiyên han, Darayê sêyim di sala 351 B.Z. da li ser Textê Keyan rûnişt. Ji Darayê sêyim ra Key Darayê Madî dibêjin. Ji ezbeta Key Kubbadê Kurd e, neviyê Keybanû Humay e.

Key Darayê Madî xebatkar bû, çakdilxwaz bû û dûrendîş bû. Çi sûd ! Ordiya ku ji Darayê Mezin jê ra mîrate mabû, ordiya biyaniyan bû !

Key Darayê Madî li deşta Erbîlê bi Iskenderê Mezin ra şer kir, hat kuştin. Ordiya wî şkest. Iskender Kurdistan seraser leyand ! Kurd jî, Faris jî, giş bûn dîlên berdestên Iskender !

Eva "Dasenda Kurd û Faris" di hengama Key Darayê Mezin û peyhatiyên wî ku 190 sal ajot da. Ji sûc, guneh û vajên (xeta) Darayê yekim Kurdistan gihîşt çi sermsarî û çi encameke cigersûz !

Min li alîkî xebtûkoş û şanûşukuhên Kurdan ên 6.000 sale bi kurtebirî berbend kirin. Li aliyê din jî min roşimana (hal) Farisên biçûçik, pismanên Kurdan, berbend kir. Ew, ano Faris, pey bicîbûna Kurdan li Mezopotamyayê 2.000 sal bi şûnda li kenarê tengava Faris peyda bûne. Û paşê, min ev her du pismaman bi hev berendizandin (muqayese) û jêdera berendizî ya min hîç jî ji bo Farisan qenc derneket !

Niha, hin pirsiyarên din tên bîra min. Ez dixwazim ji pismamên Kurdan, ji Farisan bipirsim : gelo hûn jî hay ji xwe hebûn ? Gelo we roşmana xwe ya qels û pepûk zanibû ? Gelo we zanibû pismamên we yên Kurd di nav 6.000 salan da çi xwîn rijand ? Çi cefa kişand ? Çi mêranî û canfeşanî kirin ? Hîç tiştine wusa ji we ra dan fehimandin ? We ji bo van pismamên qehreman - ku hûn îro wan pir belengaz û naçîz dibînin - di nivîswarên xwe da tiştek xwendiye ? Gelo hûn pê zanin ? Kurdistana

Institut Kurde de Paris

rengîn ku îro bi stemkerî û îşkence di navbera çar xwehermendên misilman - Îran, Iraq, Sûriya, Tirkiye - da bi qîma dilan hatiye perçe kirin di çi roşiman û bûnişên purxun û dilgudaz da ye ? Gelo we hîç bihîstiye ? Ev pismamê we yê kevnare û gewregurz (muazzam) ku ji mêj ve li ser ruyê erd xwehermendên girsegir, imparatoriyên gerraze sazandiye û şehreyarî, şahînşahî, padîşah, cihangîr û qehreman gihandine ? Ku xudan avayî, avadanî, şehrevaniyên zîwer û ziba bû ? Û ku di zanişmendî, hunerwerî, pîşeweriyê da pir pêş ve çûbû ?

Lê çi sûd ! Ev Kurdê çeleng û zîwer, ev Kurdê zîrek û hêja, ev Kurdê mêrxas û cengawer îro çend sal e ku bi yekdestiyên zorbatî, barbarî û xwînxwarî yên van her çar xwehermendên misilman di nezaniyê da, di nezaniyeke kûr û reş û tarî da maye ! !

Gelo we carê ev bedbextiya pismamê xwe yê Kurd bihîstibû ? Ev her çar xwehrmendên misilman dixwazin ku vi gelê cuwanmerdtir, kevnaretir û hêjatirî gişî di bêdadiyê da, di nezaniyê da bihêlin û vî Kurdî hunda bikin ! !

Û cardin pirsiyareke din tê bîra min : li Ecemistana berê û Îrana îro, ji dema ku sazmaniya debistan û medresan dest pê kir, gelo Ecem, yaxud Îran, ji bo pismamê xwe yê Kurd tu tiştekî nivîsî ? Ji mezinatiya Kurd, ji gernasiya bêtabker (şehameta îcazkar) a Kurd, ji kirdariya dijmin kopa Kurd, û ji ringî (metanet), firehbînî, girbarî (tehemmul), xurtî, mêrxasî, dijminkujiya Kurd, û ji şehrevanî, zanişmendî, hunerdarî, pîşeweriya Kurd gelo we du gotin, du pirs nivîsandin ? An bitenê hertiştê Kurd, dîroka Kurd, şerevaniya Kurd, qehremaniya, bajargîriya Kurd, dilovaniya Kurd, mihrivaniya Kurd bi lîzbazî û bi destcerbî (elçabûqlixî) we kir ji xwe ra, ji Faris ra ? Û ji nav vî karî - pak û paqij - bi hêsanî derketin û paşê jî we navê xwe danî "Fursî Qedîm" ? !!

Institut kurde de Paris

Xwejber, ez ji berî da zanim ku bersivên pirsiyarên min nawer (menfî) in, û ez pir baş zanim ku îro li çar nekarên cihanê bi sed hezaran, hatta bi milyonan nivîskarên dîrokan destê (mal) Kurd, mafê Kurd, dîroka Kurd û hebûna Kurd kirine destê Faris û ser navê Faris nivîsîne ! ! Ereb "Fursî qedîm" gotine. Tirk "eskî Faris" gotine. Awrûpayî jî "ancienne Perse" gotine, xwe jê pak kirine ! !

Meriv kare dîroknivîsên Ereb, Ecem û Tirk bimerzine (mazûr), çima ku ev xwehermendên misilman zorba û despot in. Gel û tûde, zana û nezan, piçûk û mezin giş bendeyên van despot, stemker û bêwicdanan in ! Lê zanayên Awrupa ? Vana çawa maf û vêrast û rastiyê ne dîtin ? Eger dîtibin, maf û rastiyê ji bo çi ji hemû cihanê ra ne da nas kirin ? !! Bi rastî, ev tişt pir sosretwer û şigeftwer e ! !

Van dîroknivîsên Awrûpayî ma hîç carek nivîsandinên zana û arkêologên ku - wek wana - Awrûpayî ne ne xwendin ? Van dîroknivîsan bira carek li herşe (xerîte) binêrin ! Lê herşeyên bê zexelî, bê vir û çewtî !

Ev kişwerê gerraze (pir fireh) ku jê ra bi sedsalan Ecemistan gotin, anha jî navê wî kirine Îran, bi rastî bi destê Farisan hat meydanê ? Faris bi Sûmîr, Akad, Elam, Kildan, Asor, Hind, Hitît, Misr, Pont, Kapadokya, Lîdya, Yewnan, Roma ... ra ceng kiribû ? Şeş hezar sal, ma Faris xerpişî ? Bi van gel û hawişên rengbireng ra gelo kê danûstendinê kir ? Ên ku bi şehrevaniyên gûnazgûn mizişîn (temas), şeş hezar sal xerpişîn, koşiyan, bazda, perpitîn û gellek azmayişan (tecrube) dîtin ma kî bûn ? Faris bûn ? Elbet ku na !

Lê, gelo Faris çigav û çawa ev sextekariya ha berbihev anî ? Faris bi çi awayî ev şep xiste destê xwe ? Ez dê bersîvên van pirsiyaran di benda "Leyandina Kurdistan bi destê Ereban" da bidim.

Institut kurde de Paris

## 6- HENGAMA SELEFKE (SÊLOKOS) Û "DASENDA KURD Û FARIS"

Pey mirina Iskenderê Mezin, kişwerên gerraz ku wî vekirandibûn di navbera sê generalên wî da hatin par kirin. B.Z. 312.

Kurdistan bû para Selekos. Lê, xwehermenda ku Selekos li Kurdistanê sazand dûrûdirêj paydar ne bû. Di sala 255 B.Z. da, ano 57 sal pey hatina Selekos, li Kurdistana navîn, Kurdan "Xwehermenda Mad" serrast kir. Di sala 225 B.Z. da, "Xwehermenda Aşkaniyan" hat meydanê. Wuha ye. Xwehermenda Selefkiyan a Ûriman ji 87 sal bêtir li Kurdistanê paydarî ne kir.

Ez li vir, ji bo Selefkiyan tiştek nanivîsînim. Camêr-kesên dilxwaz karin nivîswara min bixwînin. Tenê, di dema şerên Selefkiyan da, ez dê li "Dasenda Kurd û Faris" bigerim. Padîşahên Anzanî, Darayê yekim û kurê wî Serxes û peyhatiyên wan, li serayên Sûz û Babîl û Istexir ji tovrindên (esîlzade) Farisan weşbest, sazende û nazenîn, general, fermandar û bergeştmendên (muşawir) biyaniyan tije kiribûn. Ev du sed salên "meyxurî û dilbazî" ji bo Farisan rojên gewzûşadî bûn ! Roj rojên Farisan bûn ! !

Xwejber, Kurdên paknejad ji van civanokên gewzen-degî û genîwerî dûr reviyabûn. Kurd li benda roja giran, roja kurê bavan bûn.

Darayê Madî, Darayê bedbext, gava hat ser Text, xwejber ev gurûhên sarayê, tev ên tovrindan, weşbest û kurtelxuran giş, wek sûsikan belabela bûn !

Min bertir jî gotibû : hawişê Faris şer û pevçûnê ne dievînandin. Gewz û asûdegî û tenperweriyê diçêtirandin. Loma, gava şer dest pê kir, ew ji ber çavan hunda bûn, ketin qulûmilan ! Lê, dema ku Selekos xwehermenda Selefkiyan sazand, ev aqayên Ecem derketin meydanê, bi konetî, bi tekapû xwe gihand Selefkiyan !

Institut kurde de Paris

Lê, tevgera Kurdan, tevgera kurê bavan, bi awakî din bû ! Van kurên qehremanan, pey gerteva dilkuj û şermsar û ya rûreşî ya Hewlêrê (Erbîl), hêj berî mirina Iskender, rahişt gurz û şûran, xencer û tîran.

Ji bajarên mezin, ji rêbuharên ordiyan pêva li deverên din ên Kurdistanê, ji sînorê Hindistan ta çemê Halis (Kızılirmak), li her aliyê Kurdistanê Kurdên behadir û dilîr birrên canbêzar serrast kirin, bi şevxwînan, bi dorpêçan, bi rêbirrîn û bi êrîşan, bi şev û roj leşkerên Ûriman, leşkerên Iskender êşandin, westandin, tu aram ji wan ra ne da.

Mîrên Kurdan ji alîkî bi canbêzarên sivik û çalak û wek gurên devbixwîn Ûrim dikopandin, diêşandin, û ji alîkî jî, ji bo manda Kurdistanê, ji bo vegerandina serxwebûna Kurdistanê bernave û projeyên bergiran bi awakî fireh disazandin.

Li dawiyê, wan ordiyên Ûriman şikandin. Kurd di 255'an da di nîveka Kurdistanê da, bingeha xwehermendeke serbixwe danî. Paşê, sî sal bi şûnda, di 225 B.Z. da, ji ezbeta Key Kubbadê Kurd, neviyê Key Darayê Madî, Aşek ala şorişa serxwebûnî rakir. Kurdên ku karibûn rahêlin gurz û xencer û çekan, giş bi hev ra, kişiyan ber bi gaziya rehaxwaz û şorişger, Aşekê Madî !

Aşekê (Arşak) pehlewan ordiyên Ûriman şikandin. Kurdistan bi germaweriya (himmet) kurên xwe yên dilîr û hêja ji nû da gihîşt serxwebûn û azadiya xwe.

Di van hengaman da, di van rojên ceng û kuştinê da, di roja kurê bavan da, gelo tevgera kurikên Ecem ên me çi bû ? Hergav çawa bû, cardin ewha bû ! Ecem dilopek xwîn ne rijand û ji qulika xwe der ne ket ! Ji gewza xwe bi şûnda ne ma ! !

Eva ! Di hengama Selefkiyan da û di hengama danîna Aşek bingeha xwehermenda Aşkaniyan da "Dasenda Kurd û Faris".

Lê, pey gellek sedsalan bi şûnda, gava Faris rabûn ji xwe ra dîrok binivîsînin, ev qehremaniyên Kurdan, xwînfeşaniyên Kurdan, ev şerên dijwar û xwînrêj ên Kurdan kirin ên Farisan ! !

Çawa ku Eceman Pişdadî û Keyanî kiribûn bermewên xwînfeşaniya xwe, Aşkanî ku Aşekê Kurd bi xwîna Kurdan anîbûn meydanê cardin kirin dastê Eceman û bi navê xanedana sêyim a şehriyariyên Eceman bi dîroka xwe va nivîsîn ! !

## 7 - DI HENGAMA SASANIYAN DA "DASENDA KURD Û FARIS"

Institut kurde de Paris

Erdeşîrê Babekî di sala 226 P.Z. da xwehermenda Aşkaniyan wergerand, bi navê bavê xwe Sasan xwehermenda Kurd a Sasaniyan sazand.

Sasan ji ezbeta Behmenê cihangîr e. Wuha ye. Erdeşîr neviyê van Kurdên Qehreman e û Kurd e û kişwerê ku ferweraniya wî dike Kurdistan e. Usa ye. Çawa gûman tê li ser kurdbûna xwehermenda Sasaniyan ? (43), (44), (45).

Lê Ecem, bê fedî û şerm, Sasanî jî kirine malbata çarim û li dîroka xwe nivîsîne !

Yezdê Kurd, şehriyarê bedbext ê Sasaniyan ê dawîn, di 656 P.Z. da bi ordiyên Omer Ibn Xettab ra ceng kir, şikiya, hat kuştin. Erebê xwas û rût Kurdistana ava û firawan û gumreh û bextiyar leyand û xist bin destê xwe. Bilêc (qetliam), talan, agir, şikenc û barbarî, paymala namûs ... Kurdistan seraser bû wêranezar û kambax ! !

Kurdan, pey şerên Qadisiye û Nihawend, çekên xwe ji dest berdan, ceng û pevçûnên xwe demandin. Di pir ciyan da, şerên Kurd û Ereban sî sal dirêj

kirin. Kurdan, ji bo ola xwe ya homanwer, ji bo niştimanê xwe yê şêrîn û pirfiraz û buhadar, ji bo namûs û rûmet û navê xwe şer kir. Kurd mirinê ji dîlketinê çêtirand.

Eger hûn pirsiyara Farisan dikin ? Xwejber, Farisan xuya xwe ya şîrîn ji dest berneda ! ! Tavil bûn misilman û ketin quncik û qulikan û bi gewz û jîniş demxweş bûn ! ! (46). Eva ! Di hengama Sasaniyan da "Dasenda Kurd û Faris".

## 8 - DI HENGAMA LEYANDINA EREBAN DA "DASENDA KURD Û FARIS"

Di sala 637 P.Z. da, Omer Ibn Xettab imparatoriya pirtab û pirşanfiraz, şehriyariya Kûtî û Kurtiyan, hunda kir, şahînşahên wê kuştin û paş sê salan, ano di 659 da, ji nû da du ordî şandin ser Kurdistanê.

Faris hêj berî sê salan bûbûn islam û "eger xuahî selamet der kenaret" gotibû û kişiyabûn quncikekê û rûniştibûn. Lê, Kurdên mêrxas li ola xwe ya kevnare durustbext (sadiq) mabûn, ola Islamê ne pezirandibû. Kurdan çi ji Omer perwa dikir, çi ji mirin ! Yek ustubarê Kurdan hebû : parastin û qedxenkirina Kurdistan !

Di nivîswara min da, li ser kissa leyandina Ereban min têra xwe nivîsandiye. Cardin li ser vê gerteva dilkuj û rûreşî çi binivîsînim !

Di van şeran da Kurd şikiyan. Ordiya Omer Ibn Xettab Kurdistan seraser da ber lingê xwe. Bêdadî, barbarî, rûreşî û ruswatiya ku Ereban li Kurdistanê kir tu caran û li tu ciyan çê ne bûne ! !

Pey Omer Emewî hatin ser kar. Ev bêdadî, ev rûreşî û ruswatî nêzîkê sed sal dirêj kir !

Çawa ku we di nivîswara min da bi awakî pejilandî xwend, cardin qehremanekî Kurd derket meydanê ! Ev qehremanê rehakar Eba Muslimê Xoresanî bû !



Institut kurde de Paris

Eba Muslimê Xoresanî Kurd, niştimanê Kurdan, hemj Faris û kurên Hezretî Elî, ji barbarî û stemkariya Emewiyan reha kirin û xelîfetiya Abbasiyan sazand.

Emperyalîzma Ereban, ku 1350 sal berî hîngî hat meydanê, bê gûman bi awakî hovnak û stemkertirê "Nazîsm û Faşîsm" bû ! Nemaza di hengama Omer Ibn Xettab û Emewiyan da, ku sed sal bêtir demand, ji agirê Dojeyê dijwartir bû ! Nîvê kesên Kurdistanê bilêc kir, bi milyonan keç û bûkên nazenîn ên Kurdan talan kirin. Di bajaran da pazendgeh û nivîswergeh şewitandin ! Ev kenzên bêbuha bûn arî!

Kurdên ku ji êrîşên Ereb ra bi dijwarî wergerştibû, Ereb ji bo wan enirîbûn ! Loma, ji bo Kurdan her celeb êş û stem û şikence destûre bû. Eger qehremanek wek Eba Muslim dernehata, îroj li cihanê Kurd tu nebû !

Faris ji vê hengamê ji destê Ereban bi bişa (nisbet) Kurdan pir siviktir derket ! Faris ne serhişk bû ! Xwe ne êşand ! Lezûbez bû misilman ! Xwîna xwe ne rijand ! Şadiman û xurrem rûnişt ! (47) Nemaza gava bi sîdariya Eba Muslimê Xoresanî yê Kurd li Bexdê xelîfetiya Abbasiyan sazimend bû, û pey gelek salan bi şûnda zimanê Farisan li der û beran xuya bû dereng dereng farisî bû zimanê nivîzişê; û paşê, gava ku Şêx Ismaîl bi camêriya murîdên xwe yên Kurd bû Şah Ismaîl, şehriyariya Sefewiyan sazimend kir, Farisî kir zimanê fermwer (resmî). Berî van deman, zimanê Faris bitenê zimanê dora Şîrazê bû. Rind xuya dibe ku Faris bi camêriya pismamên xwe yên Kurd bi hêsanî bûn xudan ziman. Lê, em baş zanin, li roja ceng û kuştinê Farisek ne çû gaziya Eba Muslim û dilopek xwîna Faris ne rijiya !

Lê zimanê Kurdan, ji mêj va, ji hezaran salan va, ji Belxê ta Iskenderonê zimanê gişkî bû. Ji hengama Padîşah Kandij, Padîşah Yezdê Kurd ê bedbext, di vî kişwerê fêris da zimanê gişkî kurdî bû. Belê, ev

Institut kurde de Paris

ziman çawa zimanê gişkî bû, usa jî zimanê fermwer bû. Di sarayên Pişdadiyan, Keyaniyan, Aşkaniyan, Sasaniyan da kurdî zimanê fermwer bû. Çawa ku nivîswarên dîrokan nivîsîne, "Awîsta" pazendê Zerdeşt jî kurdî ye, nivîzişên Key Darayê Mezin li Bih-Sutûnê jî kurdî ye. Nameya Şehir-Banû Xatûn ku ji bavê xwe ra, ji şehriyarê bedbext ê Sasaniyan ra, ji Yezdê Kurd ra nivîsiye cardin kurdî ye.

Hezaran esef ! Zimanê Kurdan ê xweşaheng û xurt û şêrînsaz û pir suda bi leyandina Ereban hunda bû û zimanê Farisan bi erzanî kete şûnê ! ! Eva di hengama leyandina Ereban da "Dasenda Kurd û Faris".

Institut Kurde de Paris

9- VEKIRANDINA BEXDA Û HUNDABÛNA ABBASIYAN BI DESTÊ HULAGU

ŞEHRIYARIYA SEFEWIYAN

DÎLBÛNA KURDAN LI BIN DESTÊ TIRKAN

Û "DASENDA KURD Û FARIS"

Di hengama Abbasiyan da Kurdan û Farisan hinek bîna xwe stend. Ji Kurd û Farisan pir kes gihîştin diyarciyan. Hemj, Kurd di gellek ciyan da bûn xudan mîrî, xanî, padîşahî û şehriyarî. Van xanedanên Kurd ên serbixwe li çar nikarên Kurdistanê bê jimar dej, kel, singer, bircûbarû û şato ava kirin.

Di sedsala yazdeyim da, Tirkan, Tataran û Tirkmenan ber bi Kurdistanê dirêj kir. Van leyandinên Tirk û Tataran ji çar sed sal bêtir ajot. Kurdan, bi sîdariya van dej û singer û şatoyan, bi erzanî - çiçend ku ji destê wan hat - ji destê koçerên talanker xwe rizgar kir.

Ziyan, kul û derdên ku Kurd û Faris ji destên van kulîkêzên talanker dîtin pir giran û pir dijwar in. Eger Ereban bi behana belavkirina ola islamê emperyalîzma "ûrûbe" ne ajotana û imperatoriya Kurdan hilneweşandana, eger ola islamê wek mesîhi-

yên îro bi dilovanî û nermî û mihrivanî, bi şîret û bi şorindan belav bikirana, şûrê xwe nekişandana, Kurdan bilêc nekirana, Kurdistan, ku çend hezar sal wek bendek ji polad û mifriq li ber êrîş û leyiyên Tirk û Tataran sekinîbû, ew dê weke her gav ustubarê xwe yê girsegir û bergiran bidemanda û wêrankirina cihanê ji van kulîkêzên Mongol wê dê nidar bikira.

Omer Ibn Xettab ev dûrbînî bîr ne bir, fahm ne kir. Emperyalîzma "ûrûbe" ber çavê Omer reş kiribû ! Derjeya wî çi bû ? Kurên Mongolan ji alîkî gihîştin sînorê Hebeşistanê, Meke, Medîne û bajarên Qureyş vekirandin, ji aliyê din xwe gihand bedenên Viyana, Bîzans, Bulgar, Sirb, Yewnan ... dan ber lingên xwe, di xwîn û agir da feşirandin. Tugrulan, Alpan, Kılıçan, Cengîzan, Hulaguyan, Kayhanan, Tîmûran, Karan, Akan ... cihan gişî şewitand, kizirand. Sed milyon Ereb bi sedsalan bûn dîlên Tirkan ! !

Ez Ereban dipitinim (tenqîd). Serzinişa min, gazina min ji Farisan e. Eger pismamên Kurdan, Farisan, jî wek pismamên xwe yên Kurd ji ceng û şeran ra kêrhatî û jêhatî bûna, û wek Kurdan rahiştana gurz û xencer û şûran, direjî Ereban bikirana, yek ji van bobelatan ne dihat serê Kurd û Faris.

Belê kak Ecem ! Tu ne mertalgêr î û şûrhingêv î ! Şer û ceng naevînî ! Lê paşê, gava dest bi nivîsandina dîrokan dikî, dibî birincî ûsta (ostayê yekim), şehriyarên Kurdan, cihangîrên Kurdan, kurên qehremanan û dilawerên Kurdan dikî yên xwe û li ser navê xwe dinivîsînî ! Di lîzên destan da, sivikbaz î, hunerbaz î ! !

## BINGEHDANÎNA PADÎŞAHIYA SEFEWIYAN

## û "DASENDA KURD û FARIS"

**Neviyê Cengîz Xan, Hulagu Xan, di 1258 P.Z. da**

Bexdê vesend, xelîfe kuşt, bajar talan kir û paşê bilêc kir.

Hulagu Xan ji Hindistan ta Deryayê Reş, di vî kişwerê fireh da, ano di Kurdistana kevnare da, bi navê Alhaniyan imparatoriyeke fêris sazand. Lê Hulagu pir ne ma, heft sal bi şûnda mir, çû dojehê. Imparatoriya Alhaniyan jî di nav çend salan da hunda bû.

Pey van deman, li Kurdistanê, li dora Geylanê, ji ezbeta Hezretê Alî, Şêx Ismaîl, Şêxê Neqşbendiyan, kurê Şêx Sefaeddîn hebû. Şêx Ismaîl murîdên xwe yên Kurd da dora xwe û dirêjî Gurcistanê kir, bajarê Şerwan ji Gurciyan stend.

Di nav çend salan da, Tebrîz, Xoresan, Hemedan, Bexda, Diyarbekir û Mereş, ev bajarên Kurdistanê, vesendin. Di sala 1500 da, Tebrîz ji xwe ra kire paytext û serxwebûna xwe bang da. Şêx Ismaîl di nav çend salan da Mardîn, Mûsil, Kirmanşah û Bedlîs jî stendin û bû Şah Ismaîl.

Gava Şah Ismaîl bi vî awayî gellek ciyên Kurdistanê ji Tirk û Tirkmenan deranîn, di van şerran da gellek Kurd û mîrên Kurdan di bin ala wî da canfeşanî dikir. Kurd ku ji hezar sal vir da şehriyarî û serxwebûna xwe hunda kiribûn û resteyê (muhtac) aştiyê bû û dilxwazê dadmendî û mihrivaniyê bû, jê ra wer bawermendî hatibû ku eger li dora Şah Ismaîl, kurê Hezretê Alî, xwe bide hev, yekîtiya Kurdistanê dê bê meydanê û Kurd tiştên xwe yên hundabûyî dê bigihîne destê xwe. Loma, Kurdan giş xwe da dora şahê xwe yê nû û ji her fermana wî ra ji dil û can serfurû bûn.

Pir muxabin ! Gava Şah Ismaîl kişwerê xwe fireh kir û xurtir û tuwangertir bû, riya rast, riya biratiyê hunda kir û kete riya xwebînî û gerdenfiraziyê. Û li dora Şah Ismaîl hin gewremerd û bergeştmendên ne Kurd û bedxwaz peyda bûn, çewtşîret danê û ew xapand. Şah Ismaîl tevgera xwe guhart, bi

mîrên Kurdan ra dest bi dasendê kir, leşkerê xwe kişand ser mîrên Sinendej û Kirmanşah, ev her du mîr şikandin û kişwerên mîrate yên bav û kalên wan ji wan stendin. Ev kirdariyên Şah Ismaîl ne bes bûn, rabû rêola "Şî'e" jî kire rêola fermwer ! Van her du çewtriyên mezin ên Şah Ismaîl mîrên Kurdan jê dûr xistin. Mîrên Kurd ji Şah Ismaîl sar bûn û jê reviyan.

Yavuz Sultan Selîm, Padîşahê Osmaniyan, ev nahenga (nifaq) Şah Ismaîl û mîrên Kurdan wek firawaniyeke azmanî dît û ji vê şepê behremend bû. Bi alîkariya Melle Idrîsê Bedlîsî mîrên Kurdan ber bi xwe anîn û li xwe bend kirin. Kurd û Tirk bûn yekdest û peymannave navişandin.

Van her du yekdestan direjî Şah Ismaîl kir. Li deştika Çildêranê leşkerê Şah Ismaîl şikiya, Sultan Selîm bi hêsanî Tebrîz stend, nigaşa sazandina imparatoriyeke mezin a Şah Ismaîl pûç bû, ket ber avê !

Padîşahên Osmaniyan ku pey Sultan Selîm hatin ji Kurdan ra bêbextî kir, peymana bapîrên xwe şikand, peymannaveyên kalikên xwe çirandin, mîriyên serbixwe yên Kurdan yekoyeko ji meydanê rakirin û bi milyonan Kurd bûn dîlên bindest ên Tirkan ! Eva ! Di hengama Şah Ismaîlê Sefewî da "Dasenda Kurd û Faris".

## DERJÊ

Derjêya van nivîzişên dûrûdirêj ev e : Berê zayîna Îsa bi 10.000 sal hawişekî Endo-Awrupayî li Araratan cî girtibû. Ev hawiş Kurdên îro ye. Kurd, gava hatin Araratan, du birr bûn : Kûtî û Kurtî.

Kûtiyan ji Araratan ta Antî-Toros, Toros, Sûriya û Filistîn girtin, peyabûn Zagrosan û daketin pehnavên Dicle û Ferêt. Li van doran, rastî sê xwehermendên şehrevan hatin : Sûmîr, Akad û Elam. Bi vana ra

şer kirin, di kişwerên wan da fermanferma bûn û bi navên Kûtiyûm û Lolobûm du xwehermend serrast kirin.

Paşê, weşbestên nigaşperwer ên Farisan navên van her du ferweraniyên Kurd kirin "Pêşdadî" û kirin ên Farisan !

Kurdan nivîzişa Mîxî a Sûmîran pezirand û ji pîşewerî û şehrevaniyên wan behremend bûn. Di demeke hindik da, ji van her sê xwehermendan di şehrevaniyê da pêşvetir çûn.

Kurtî li Araratan demeke dirêj rûneniştin, çima ku darayên keriyên bêjimar ên tarişan bûn : hesp, ga, cêl û pez. Ararat û dorên wan ji milyonan tariş ra têr ne dikir. Loma, Kurtî Ararat berdan, çûn ber bi rohilat. Ji Gola Urmiyê ta Hindistanê - Çemê Send - û çarmedorên Deryayê Kaspîn (Deryayê Kasiyan) ta Deryayê Umanê girtin. Ev kişwerê fireh û gerraze ji bo hezaran sal bû niştimanê Kurtiyan.

Gava ev gertevên han li dora Dicle û Ferêt dibûn, navên Kildan, Asor û Faris li cihanê ne bûn. Ev her sê hawiş paş du hezar sal li van doran xuya bûn.

Kildanî li rexên Ferêt bi cî bûn û li biniya Bexdê, li kenarên Ferêt, bajarê Babîlê ava kir. Asoriyan li rexên Diclê - nêzîkî Mûsila îro - Nînwa ava kir. Ev her du hawiş, ano Kilde û Asor, dest bi saxitandina (teqlîd) şehrevaniya Sûmîr û Akadan kir. Her du jî du xwehermendên leşkerî anîn meydanê. Nemaza Asor peykerek zorba û şeştare stend. Kildanî ji nejadên tevlihev çê bûne, lê Asorî giş Samî bûn. Farisan li hin kenarên bakur û rohilat ên tengava Faris cî girt. Faris jî, mîna Kurdan, ji nejadê Endo-Awrûpayî bûn, hawişek piçûçik bûn, bi cot û şivanî kariwer bûn, ji ceng û pevçûnê dûr direviyan, serê wan pê ne xweş bû. Farisan asûdegî, aştî û aram dievînandin. Eger hevsiyên wan li wan dirêj bikirana, Farisan dest ne dibir xwe, şer ne

Institut kurde de Paris



INSTITUT KURDE DE PARIS · BIBLIOTHEQUE

dikir, xwîna xwe ya şêrîn ne dirijand. Çêtir ew bû: bac bidin neyaran û li quncê asûde rûnin !

Îro nivîswarên dîrokê yên cihanê giş çewterêyek girtine : dêlva ku "kişwergîriya Kurd a kevnare" û "şehrevaniya Kurd a kevnare" binivîsînin, carna ji nezaniyê, lê pir caran ji bêdadî, ji nankorî, ji bêbextî, li ser navê Farisê piçûçik, Farisê pepûk û reben nivîsîne. Dêlva ku "Kurd" binivîsînin, bi çewtî "Faris" nivîsîne ! Û paşê, ev nivîsvanên dîrokan pir pêş ve çûne, evçend mezinayiya Kurd kirine Faris û Farisê pepûk bûye "Fursî qedîm", "eski Faris", "ancienne Perse" ! !

Lê, weka ku we xwend, ev kisseya ku min navê wê daniye "Dasenda Kurd û Faris", min di nav her neh bendên wê da bi awakî pejilandî da fehm kirin : kişwerê girsegir ê ku nivîswarên dîrokan bi çewterêtî û bê maf navê wî kiriye "Fursî Qedîm", ano "Farisê Kevnare", Kurdan bi Kûtî û Kurtiyên xwe û bi tena xwe, bê Faris û Maris, bi pehlewan û qehremanên Kurdan, bi van box û beranan ev şehriyarî, ev imparatorî, ev şehrevanî anîne meydanê. Kurdan, berî zayîna Îsa bi 4.000 sal, bi şikandinên Sûmîr û Akad rahişt vê xebtûkoşa girsegir û pir zorfersa. Û ji van karûwerzişên dewasa yek bîn asûde ne man : Babîl û Sûz û Lakaş vekirandin, bi xebtûkoşên xwe yên bê aram ji van gelên bindestê xwe pêşvetir çûn : di zanişmendî, pîşewerî, hunermendî, bazirganî, konevanî, leşkerî û di her zaniş û hunerên şehrevaniyê da ketin pêşiya her gelî. Padîşahên Asor endezvanan, hunerweran ji van Kurdan bijartin. Padîşahên Asor di her wesanê da zanişwerî û hunermendiya Kurdan pesinandine.

Di nav van neyarên Kurdan da, ji Asor dijwartir û xurttir tu nebû. Lê Kurdan ji padîşahên Asor ên şeştare û hovnak ra carê tekapu ne kir, ustuyê xwe xwar ne kir. Kurdan nêzîkî du hezar sal, şev û roj, havîn û zivistan bi Asoran ra ceng kir, penc bi penc, gewrî bi gewrî pev çûn, xerpişîn; hêdî

Institut Kurde de Paris

hêdî, bi bihna fireh, ev dijminê xwe Asor, ev dijminê xwe yê hezaran sal ji ruyê erdê rakir û bi awakî demande (ebedî) hunda kir. Ev pîrozbextî, ev kamweriya fêris û firazwer ku di cihanê da bê heval û yekta ye, bi xebat û werzişên 4000 sal hatin meydanê. Farisan di van salan da yek dilop ji xwîna xwe ne rijand. Farisan di van 4000 salan da tu xebatek, tu karek nîşan ne da.

Kurdan bi ev çend jî qîma xwe ne anî : Gurcistan, Armeniya ku hêj nû ji Trakya hatibû, Pont, Kapadokya û Lîdya vekirandin. Kurd paşê bûn fermanfermayên Misrê jî.

Di van hengamên dirêj da, di van 4000 salên kop, xebt û şeran da, tu liv, ger, west û emegên Farisan xuya ne bûn. Faris cotkar bû, şivan bû, carê ne guherî, tum cotkar ma, şivan ma !

Em binêrin paşê, pey van hengaman, di dema Azdiyak bi şûn da çawa bû ? Kurd bi destê xwe Azdiyakê gewende û pespaye dercî kir û di şûna wî da Agirdad, ano Kûriş, padîşahê Anzan - ew Anzanê ku ji 2000 sal da niştimanê Kûtî-Amerdiyan bû - anî, li Hemedanê, li ser Textê Keyaniyan rûniştand. Ûdê (leqeb) van padîşahên Anzanê Texîxî-Xenî ye. Paşê bi dem û gavan bûye Examenî, paşê Ereb kir Hexamenşî. Kevnerêçên ku di van salan da li Zihabê (Îran) derketine pir baş nehrevanî dikin û diaşkirînin ku xanedana Texîxî-Xenî, ano Examenî, padîşahên Anzan in, Kûtî-Amerdî ne û Kurd in, ne Faris in, Anzanî ne, ne Pasargadî ne. Tarîxa Merdûx, derpêç 1, rûpel 180, ronak û eşkere dinivîsîne : "Padîşahên Hexameniyan ku li Hemedan, Babîl û Sûz, li ser Textê Keyaniyan rûniştin sed sal ji xwe ra Padîşahên Mad gotine". Padîşahên ku di vê sedsalê da padîşahî kir Key Xusrewê Mezin, kurê wî Key Kawûsê kişwergîrê Misrê, Key Darayê Mezin û kurê wî Key Serxes in. Wuha ye. Ev her çar padîşahên Anzanî yên pêşîn bi wegehên xwe Padîşahên Mad bûn, Padîşahên Kurd bûn, ên Faris ne bûn.



Institut kurde de Paris

Em werin Key Darayê sêyim, ano Darayê Madî. Ev padîşahê bedbext dawînê padîşahên Keyaniyan e û bi nav û laşê xwe Kurd e, lê ne Kurdê Anzanî ye, Kurdê Kubbadî ye, neviyê Key Behmenê Madî, Key Behmenê kişwergîr, e.

Nuha ez ji we dipirsim : xanedanek heye ku çar bavên wê yên pêşîn ji xwe ra Mad dibêjin û bavê wê yê dawîn jî dibêje "ez Mad im". Gelo çar hûrikên givrik ên navîn çawa dibin Faris ? Nemaza ku ev her çar ên navîn ne angaştine, ne gotine "em Faris in" ! Ev tişt eşkere ye : ev xanedan ji serî ta binî Kurd e, Anzanî ye, Kûtî-Amerdî ye. Farisbûna wê fendûfût e, şapînozê "şairên" Eceman e ! !

Min bi awakî ronak û zelal Kurdbûna Xanedana Hexameniyan, ano Texî-xî-Xeniyan, aşkaft û danî ber çavan. Îcar dora Aşkaniyan, Arşakiyan û Sasaniyan e : Kurdbûna van her sê xwehermendan min di nivîzişên xwe yên berê da xweş pejilandî û qenc zûlandî nivîsiye. Di vê kisseyê da tu gûman û vajî ne maye. Ev her sê şehrevanî û ferweranî jî Kurd in : gelên wan 90% Kurd in û bingehdarên her sê şehriyarî jî Kurd in : Aşek, Arşek û Erdişîrê Babekî. Padîşahên han her sê jî neviyên Key Kubbadê Kurd in.

Êdî hûn çi dixwazin ? Gelên wan Kurd, padîşahên wan Kurd, elbet xwehermendên wan jî, şehriyariyên wan jî, şehrevaniyên wan jî Kurd in, ne Faris in.

Ji van "derjê"yên bingehî yên ku nivîzişên min bi awakî vêrast, eşkere, zelal û aşkaftî danîn meydanê hêj aşkarişên din ên givrikî jî hene :

Padîşahên Anzanî, sê padîşahên mezin ên pêşîn : Key Xusrewê Mezin, Key Kawûs, Key Darayê Mezin, bi kişwergîriya xwe, bi rahijmendiya girsegir a xwe, bi hozanî û zîrekiya xwe, gava bi germweriyeke nêrûfersa ji bo aştî, bextiyarî û bilindiya Kurdistanê dikoşiyan Padîşahên Key Kubbadî jî, ku bajarê Belxê paytextê wan bû, ji bo asûdegî û gumrehiya Kurdistan di xebt û koşa xwe da kêmanî ne dihişt.

Nemaza Key Kiştasep, kurê Key Lehrasep, hêj di sala 660 B.Z. da paytextê Belx berda, hat gevera Faris û bajarê Istexir ji xwe ra kire paytext. Ev gerteva sade ji me ra pir ronak dide xuya kirin ku di van salan da, li van deveran, tu Padîşahê Faris tu nebû û ku li gevera Faris padîşahên Mad ferman-ferma bûn. Faris weke berê destbendên Kurdan bûn.

Key Kiştasep 69 salên xwe li Istexir buhartin, Istexir fireh kir, xemiland, qoq kir, li paytextê xwe pir guh dida. Kişwerê wî seraser ava, bextiyar û şadiman bû. Padîşahê ha bi sazandina rêdarên dadmendî û şehrevanî navûdeng stendiye. Bi vî awayî xweş xuya dibe ku Key Kiştasep di avakirina welêt û sazandia rêdarên dadmendî û kişwerî da ji Darayê Mezin ra rêberî kiriye û ji Darayê yekim ra bûye mamosta. Key Kiştasep 150 sal berî Key Dara ji welatê xwe ra û ji enzanetiyê ra riya şehrevaniyê vekiriye.

Ji ezbeta Key Lehrasep, Key Behmenê Madî bi kişwergîriya xwe nav biribû. Evçend jî hozan, zana û gewre bû, mêrek pakbunyad bû û bi dawerî û mihrivaniya xwe nav stendibû. Paytextê Key Behmen bajarê Şuweş bû. Ew alîdarê dercîkirina Azdiyak bû. Eger Kûriş, hîn rasttir Agirdad, Anzanî ne bûya, ji ezbeta Kûtî-Amerdî ne bûya û Faris bûya, li ser Textê Hemedanê ne dida rûniştin û Key Behmen bi vî tiştî karibû bindirîne (manî bibe). Di van deman da, padîşahê xurttir ê Kurdan, hemj ê cihan giş, Key Behmen bû. Padîşahek mîna Key Behmenê Madî yekî Faris - ku ji hezaran salan da destbendê Kurdan e - ne dikir şahînşah û li ser Textê Mad ne dida rûniştin.

Eva, min bi sedan nivîswarên dîrokên zanişmendan xwendin û bi mûşikaftin min xwendemendî kir, û li dawiyê min ev jêderê deranî : Faris hawişekî piçûçik bû, cotkar bûn, şivan bûn, şer û pevçûnê ne dievînand. Eger zor li wan bihata, bac didadan û dikişiyan quncika xwe û bi asûdegî û aştî rûdiniştin !

Institut kurde de Paris

Nemaza, dema ku Key Kubbadê Kurd padîşahiya Mad serrast kir û Hemedan kire paytext, dirêjî Asoran kir û ev padîşahên zorba û bê wicdan şikandin, Faris bicarek bû benddestê Kurd, û ji wê demê da, ano ji 763 B.Z. bi şûnda ta hatina Iskender, 430 sal Faris bi tumî man di bin destê Kurdan da.

Paşê, ano pey qewurandina Selefkiyan ta kuştina Yezdê Kurd û hundabûna şahînşahiya Sasaniyan, ev bûniş demand. Ano, Faris berbendê Kurdan man : ziman zimanê Kurd bû, ferwermendî û ferweranî yên Kurd bûn, şehrevanî jî şehrevaniya Kurd bû. Wê gavê hêj "Fursî Qedîm" tu nebû ! Paşê Ereb ji ber xwe çêkir ! ! Di vê hengamê da, ev imparatoriya fêris û pehnawer a Sasaniyan Kurd bû ! Ev kişwerê bê payan Kurdî dipeyivî, zimanî gişkî Kurdî bû. Keça Yezdê Kurd Şehrîban Xatûn ji bavê xwe Yezdê Kurd Padîşah ra bi kurdî reşbelek dinivîsandin ! Xwejber, çawa zimanî gişkî kurdî bû, wuha jî hertiştê vî kişwerî kurdî bû : welat, padîşah, gel, şehrevanî ... giş Kurd bû.

Ta vê demê, Faris, zimanê Faris, şehrevaniya Faris li meydanê tu nebû.

Omer Ibn Xettab û Xelîfeyên Emewiyan gelê Kurd, şehrevaniya kurd, zimanê kurd, hebûna kurd, her tiştê kurd hunda kirin ! !

Paşê, cardin qehremanek û pehlewanekî Kurd derket meydanê ! Ev Kurd Eba Muslimê Xoresanî bû ! Vî Kurdî bi germdilî, bi camêrî û bi kurdperweriya xwe Emewî hunda kirin. Eba Muslimê Xoresanî Ebbasî li şûna wan rûniştandin û Faris bi camêrî û mêraniya Kurdekî ji Erebbûnê reha bûn. Ji vê gertevê du sed sal bi şûnda, zimanê Farisî eşkere bû, derket meydanê (48) û aheng û xweşbestên Farisî dest pê kir !

Li hengama dawîn a Ebbasiyan - hemj hîn rasttir, pey Ebbasiyan çend sedsal bi şûn da - di dema Sefewiyan û peyhatiyên wan da, nemaza gava ku ji

bêbextiya padîşahên Osmaniyan Kurd bûn gorî, destê wan hat girêdan û devê wan hat girtin û meydan bicarek ji Farisan ra ma, Farisan wesanekê bi qîma xwe xist destê xwe, lîzbazî û sivikdestî kir, bi dek û zexelî û saxtekarî her tiştên Kurdan: firazbazî, navdarî, şanûbilindî, kişwergîrî, şehrevanî... ya Kurdan gişk kirin dasa xwe û li ser navê Faris nivîsandin.

Di destpêkê da ev dek û zexelî ku min navê wê kiriye "sivikdestî" bi awakî bîrnebirî (bê hiss) bû. Weşbest û çîrokbêjên Farisan ên pazên (derece) duyim û sêyim di van deman da hin çîrok û efsaneyên qehremanî ber bi hev dianîn, li çayxanan, li şato û malan, li der û beran dixwendin û pê nanê xwe pêk dianî. Lê, li vira şayanê bernihêrî tiştek heye: weşbest û çîrokbêjên Eceman - ji tunebûna qehremanên Eceman - bênev mane, qehremanên Kurdan pesinandine : Zal û kurê wî Rustem.

Di van salan da - sedsalên 13im û 14im P.Z. - ferweraniyeke nû serrast bûbû. Navê vê ferweraniyê "Xeznewiyan" bû. Sultan Mehmûdê Xeznewî yê Tirk ji van çîrok û weşbestên qehremanên efsaneyî pir dilgewz dibû. Sultan Mehmûd civandin û nivîsandina van destan û çîrokên efsaneyî ji weşbestê navwer Firdewsî xwest û jê ra gotin û newîd da ku ji bo her xaniyê weşbestekê ewê dê zêrek bide.

Firdewsî ev çîrok û çîrçîrok pir baş ji ber kiribûn û di aheng (wezn) û bareyê (qafiye) da bê heval bû. Firdewsî bê aram û west sî sal ev efsane bi awakî zîba û zîwer, bi xweşahengî û bare, nivîsandin. Dawiya dawîn, ji heftê hezar cotik destaneke qehremanan anî meydanê ! Ev destaneke qehremanên nigaşan bû ! Efsaneke efsanan bû ! !

Ecemên wan deman û Îraniyên îroj ku van çîrok û destanên vir û derewan pir dievînin gelo wek gertevên dîrokî yên vêrast godariya wan dikin û pê bawer dibin ?

Paşê, pêy sedsalan, ji Awrûpa û Hindistanê çapxane hatin Ecemistanê jî. Û gava Eceman nivîswar çap kirin, ev nivîswarên efsanan jî çap bûn. Berê sedsalekê, gava Ecemistan xwendegeh sazandin, ji wan ra nivîswarên dîrokan jî divabû. Dîroknivîsên Ecem ji bo nivîsandina dîrokeke "hawişî" ev çîrokên efsaneyî ji xwe ra kirin serekaniyeke dîrokî ya hêja. Nemaza benda Pêşdadiyan pirs bi pirs ji efsaneyên Firedewsî jêgirt (kopya kir). Keyanî, Aşkanî, Sasanî û Sefewî jî bi hêsanî bi ser Pêşdadiyan efzûnandin (ilawe kirin). Dapara (istihqaq) Kurd tarac kiribû, destê wî girêdayî, devê wî girtî bû, meydan ji Faris ra mabû, kesê ku ji Faris ra bipaşîne (îtiraz bike) ne mabû !

Bi vî awayî, Faris bi "sivikdestî" û bi hêsanî li ser dapar, dast û mafê Kurd venişt ! !

## ÇEND PIRS DI GIHAJA FIRDEWSÎ DA

Li gel agahiya min bi ziman û wîjeya (edebiyat) farisî, min ne karîbû heftê hezar cotikên Firdewsî gişî bixwînim. Li gel vê yekê, min ji destana farisî ya Firdewsî çend sel malikên bijare, çîlwerk (bi mubalexe) û dilhej xwendine. Firdewsî bi vê yadbera xwe pir baş aşkartiye ku ew di aheng, bare, çîlwerî, nigaş û efsanefiroşiyê da hunerwerek yekta ye.

Ev yadbera dêwasa ji aliyê danişweriya dîrokî ne hêjayê tiştek e. Yek ji malikên wê nikare ji dîrokê ra bibe sparte.

Bi bawermendiya min, Firdewsî gava ku "Şahname"ya xwe nivîsî, bi kevirek sê çûkan dixwest bikuje :

1- Bawermendiya wî di gihaja Ereban da çi ye deyne meydanê :

"Ji şîrîşûtur xurden û sûsimar

Ereba becayî resîdeste kar

Kî tacî Keyan ra kuned arezû
Tufû bertu ey çerxîgerdan tufû".

2- Evîna xwe ji ola Zerdeşt ra pêş xwar dike :

"Kî ma ra ez dînî kuneh neng nist.
Be gîtî bih ez dînî Hoşeng nist.
Heme rahî dad est ayînî mi hir
Nezer kerden ender şumarî sipêhir".

3- Herdemî û xurtiya zimanê Faris :

"Besî renc burdem der în salî sî
Ecem ra zinde kerden be in farisî, m."

Firdewsî çûkekî din jî dê lêxista : ji Sultan Mehmûdê Xeznewî hezaran zêr dê bifiranda ! Gewremerdên (wezîr) bedbunyad ne hişt. Firdewsiyê naçîz yek pere ne kir bêrîka xwe !

ARMANCA MIN DI NIVÎSBEJA (MEQALE) "DASENDA KURD Û FARIS" DA

Ev kisseya ku min navê wê daniye "Dasenda Kurd û Faris", ji nivîsandina wê armanca min ev e :

Ez dixwazim ku serhatiyên Kurdan ku 6.000 sal berî zayîna Îsa dest pê kirine û ku hê jî didemînin bi kurtebirî bidim fehmandin. Kurd bi buhayê xwîna xwe, bi canfeşanî, pêdarî, mêranî, zîrekî û bi jêhatiniya xwe niştiman, dîrok, kişwergîrî, navawerî (şuhret), firazdariyên ku anîbûn meydanê, bi leyandinên Ereban ji nişkava û bicarekê hunda kirin û Faris bi saxtekarî ev tiştên Kurdan kire dapar, dast û mafê xwe.

Ezê vê yekê qêr bikim li cihanî gişî ! Nemaza ji

Institut kurde de Paris

zanayên dîrokê ra wê bidim zanîn û vê çewtûxwariya pir mezin a dîrokê bidim rast kirin û bi enzanên cihanê gişî bidim bihîstin !

Min bi nîşaneyên dîrokî, bi jimardekan (reqem), bi dares (muhakeme) û bi hoşmêj (mantiq) aşkart ku Faris dapar, maf û dastên Kurd tarac kirine. Ez vegera dad û maf dixwazim û wehrija (qerar) xwe ya dawîn didim : "Fursî Qedîm" tune ! "Eski Faris" tune ! "Ancienne Perse" tune !

"Qedîm" Kurd e ! "Eski" Kurd e ! "Ancienne" Kurd e !

## 10- DASENDA KURD Û FARIS A ÎROJ

Di 1925 P.Z. da, Riza Xanê Pehlewî, dawiya Xanedana Kacaran anî û xanedaneke nû, Xanedana Pehlewî, saziman kir. Kurd hemû ketibûn umîdeke mezin. Xwendemendên Kurdan pirsa "Pehlewî" çi ye baş zanîbû. Pehlewî - hîn çêtir "Pehleyî" - şêrîntirê zaravên Kurdî ye (49)

Riza Xanê buhuştî gava navê xanedana xwe ya nû kire "Pehlewî", ji Kurdan ra umîdeke mezin dabû. Kurdan zanibû ku Riza Xan ji êla Mezindiran e û ku ev êl jî ji kevntirên êlên Kurdan e. Van Kurdên xwendemend cardin zanibûn ku bapîrên wan - Kûtî û Kurtî - ji hezaran salan va di giloreya Îranê da çi roline bergiran lîztine, û bawermendiya van Kurdan hebû ku eger îro jî Kurd şep û wesan têke destê xwe, ew dê rolên bapîrên xwe yên hezar salan cardin karibin bilîzin û ji giloreya Îranî ra pir bi kêr bên. Ji bo ku Riza Xanê ronakrewan ku ji êla Mezindiran bû û ji xanedana xwe ya nû ra jî navê Pehlewî stendibû, Kurdan gûman biribû ku roja wan a azadiyê hatiye ! Ew azadiya ku Kurd hezar û çar sed sal e li benda wê ne !

Zehî nigaşt ! Umîdên Kurdên bedbext, gûmanên wan, baweriyên wan zû bi ber bê çûn ! !

Institut kurde de Paris

Gava Riza Xanê Pehlewî lixava şahane li dest girt, li roavayê Îranê tûdevaniya Mustafa Kemal Paşa nû serrast bûbû. Ev tûdevaniya nû ya Mustafa Kemal Paşa û Ismet Paşa ji benîdaran (sahibî ebîd) û kolonyalîstan ra nifir dixwendin, newîd (soz) dikirin, sond dixwarin û peyman didan ku kolonîtî, benîtî û zorbatî ji kişwerê kevnare yê Osmaniyan ew dê rakin. Van paşan, di 1919 da, li Erzeromê, li Sêwazê, di "qonxir"an da bang kir û got : xwehermenda nû ku ew dê bingeha wê deynin xwehermenda Tirkan û Kurdan e ! !

Mustafa Kemal Paşa û Ismet Paşa bi alîkariya Kurdê camêr û mêrxas Yewnan avêtin derya û tavil van Paşan newîdên xwe jî, bedihên xwe jî ji bîr kirin ! Ji Kurdan ra xweş maf dan ! Mêrxas radestên mirarkeran (qatil) kirin, jin û zarûk jî xistin kadînan, agir berda wan û şewitandin ! Milyonek Kurd - pirê wan pîr û kal, jin û zarûk - bi işkence, agir, êş û nalînan hunda kirin ! !

Mustafa Kemal Paşa newîdên ku dabûn Kurdan çawa bi zûka ji bîr kirin, Riza Xan jî navê bilind ê Pehlewî ji bo engîzeke çiçend pirfiraz û giramîdar stendibû, pir zû ji bîr kir !

Riza Xan ku di gellek tevgerên xwe da Mustafa Kemal diminand, ji mirarkeriyên wî û Ismet Paşa ra jî dilbijokî kir ! Riza Xan ji birayên xwe yên xurû ra, ji Kurdên ku ji sedsalan ve ji bêdadkerî, renc, êş û rûmetşkeniyê pêva tiştekî din para wan ne bûbû, mîna Mustafa Kemal û Ismet, her babet stemkerî û malmîratî kirin !

Riza Xan birayên xwe yên xurû şandin sêpêyan, dan ber tîran, bi hezaran bêguneh - pîr û kal û zarû - qewirandin, bê mal û bê gund hiştin, dûrandin (nefî kirin) ! !

Paşhatiyê pîrozbext, puserê Riza Xanê Pehlewî hêj nû li Textê giranbext ê Îranê rûniştibû, gertevê xwînî ê Mehabadê Kurdên stemdîde bi bûnişên reş




Institut Kurde de Paris

Nexşeya Kurdistanê : Ev nexşe li nav "Mêmorandumeke li ser rewşa Kurdan û daxwaziyên wan" ji Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (O.N.U.) re, li Parîsê, di 1948 de hat pêşkeş kirin.
Wêneya nexşê bixwe di Nîsan 1946 de hat çêkirin.

û pir bi êş nalandin. Ez naxwazim van birînên dijwar, van kulên kûr nû bikim. Ez niyazmend im ku Kurd, ano birayê mezin ê gloreyê Îran, ta ku cihan payidar e, careke din jî dilxwîniyeke wuha nebîne !

Gava ez van rêzên han dinivîsînim, li pêş min herşeke Kurdistan û Farisistan raxistî ye û ez bi ettayî (diqqet) lê çav digerînim. Ji aliyê din jî, nivîswara Merdûx li pêş min e û ez ji rûpel 48 van rêzan dixwînim : "Ma mî tuwanîm bigoim ki luxetî kurdî der temamî wîlayetî Îranî kî Iskenderî Makdonî ber an hukumfermayî kerde umûmiyet daşte". Wergişa wê bi kurdî : "Em karin bibêjin ku zimanê kurdî di gişî wilayetên Îranê kevnare da, ku Iskenderê Makdonî fermanfermayî dikir, zimanê gişî bû". Û di tenişta min da du ferhengên farisî hene: fransizî-farisî, farisî-fransizî. Lê, muxabin, pirsên ku ez ji van du ferhengan dixwazim ji dehî yek dikeve destê min ! Zimanê farisî yê îroj 90% Erebî ye ! ! Kurd 1300 sal e ku di bin givaja Ereb, Ecem û Tirk da ye. Spas ji Yezdan ra ! Zimanê Kurdan ne ketiye roşmana zimanê farisî û tirkî.

Min ev nivîswara dîrokê bi zaravê kurmancî nivîsand, paşê min ew li tirkî wergişt. Di nêzîk da ez dê wê jî çap bikim. Ez pir niyazmend im ku bext bi min yawer bibe, farisî û fransiziya wê jî çap bikim. Ev nivîswara min a dîrokê 300 rûpelî ye. Tê da yek pirsa biyanî tu neye. Lê, eger nivîswareke farisî û bi 300 rûpel bê çap kirin, divê em 10.000 pirsên erebî bişorînin.

Ez naxwazim vê kisseyê, "Dasenda Kurd û Faris", bêtir dirêj bikim. Loma, dawiya nivîzişa xwe tînim û di mandê (rojên li ber me) da dasenda Kurd û Faris dê çi bibe dipirsim. Ez pir hêvîdar im û niyazkar im ku ji bo her duyan - Kurd û Faris - ev "mand" bi kêr û bi sûd bibe. Ez pir hêvîdar im ku ew rojên tal û reş bên ji bîr kirin.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## KURTEYEKE KRONOLOJÎK

## IMPARATORÎ, DEWLET Û MÎRIYÊN KURDÎ

### 1- BERÊ ZAYÎNA ÎSA

**10.000 B.Z.**

Koçbariya Giştî ji Iskandînavya ber bi Çiyayên Qefqasyê. Wê gavê bapîrên Kurdan du beş bûn :

**A- KÛTÎ** (Kurdên Rojava). Li dora Araratan bi cî bûn. **B- KURTÎ** (Kurdên Rojhilat). Çûn Deryayê Kaspînê, sînorên Hindistanê û Deryayê Umanê.

Institut kurde de Paris

**4.000 B.Z.**

**A- KÛTÎ**

10 dewlet ava kirin : Kûtiyûm, Hûrî, Lolobûm, Anzan, Kardûnya, Mîtan, Nehrî, Xaltî, Mûşkî, Alarod (Ûrartû) :

**1- KÛTIYÛM (welatê Kûtiyan) : 4.000 - 3.100 B.Z.**

Dewletek gelek fireh û pêşketî bû. Ji Çiyayên Araratê heta başûrê Çiyayên Zagrosê dirêj bû. Li Şehrezor (Suleymaniye) û dora wê û piştre li Toros, Anti-Toros û heta sînorên Misrê hukm kir. Bi Sûmir, Akad û Elam re şerr kir.

**Paytext** : **Lakaş**, ku padîşah Anri-Dapriz di 3.700 de ji padîşahê Akad û Sûmir, Naramsîn, stend.

**Şahên navdar : Anri-Dapriz, Anatom I, Anatom II, Kûtiya, Lokal-Zakis, Tirikan, Sarlaq.**

Vê dewleta Kûtiyûm 900 sal ajot, piştre hunda bû. Lê gelê kûtî di 620 B.Z. de xwe gihand Imparatoriya Mad.

**2- HÛRÎ : 4.000 - 1.200 B.Z.**

Ji zozanên bakurê Mêzopotamya heta Diyarbekir, Xarput û Dersimê dirêj bû. Ji sala 2.000 heta 1.200 B.Z. Hûrî tevî Mîtaniyan bûn. Sûriye û Filistîn stendin. Ji 1.483 heta 1.463 B.Z. bi Misr, Firawn Thutmes, re şerr kir. Piştî 1.200 B.Z., Hûrî û Mîtanî ji aliyê Hitîtan hatin hunda kirin. Piraniya wan xwe gihand Nehriyan.

**3- LOLOBÛM (welatê Loloyan) : 3.700 B.Z.**

Di navbera Kirmanşah û Bexdadê de dirêj bû. Bi Akad re, bi alîkariya Kûtiyan, û bi Asor re şerr kir. Di şehrevanî û hunermendiyê de gelek pêş de çû bû. Di 620 B.Z. de xwe gihand Imparatoriya Mad.

**Paytext : Zimrî**, di 900 B.Z. de. Piştre Asor ew stend.

**Şahên navdar : Lasirab, Satûn, Amobanîna.**

**4- ANZAN : 2.800 B.Z. - 800 B.Z.**

Ji başûrê Zagros heta bakurê Elam. 2.000 sal ajot.

**Şahên navdar : Texîxî-Xenî-Kûtî-Amerdî, Kûrişê Mezin**. (Gotina Hexamenşî ya farisî û Achaménides ya fransî ji Texîxî-Xenî hatiye. Kûriş şahê Anzan e, ne - weka ku Faris dibêjin - şahê Pasargad e).

Institut kurde de Paris

**5- KARDÛNYA (welatê Kasiyan) : 1977 - 1.277 B.Z.**

Kasî ji Zagrosan hatin bakurê Babilistanê û kenarê Çemê Diclê vegirt. Bi Babil re şerr kir. Di 1765 B.Z. de, bi alîkariya Kûtî û Loloyan, Babil stend. Di 1760 de, dewleta Akamil, nêzîkî Sûmir stend. Kardûnya yek ji 4 imparatoriyên mezin ên wê demê bû : Kardûnya, Mîtan, Hittît, Misr. 700 sal ajot. Di 612 B.Z. de xwe gihand Imparatoriya Mad.

**Şahên navdar : Akûm-Kakrîm, Kandij.**

**6- MÎTAN : 1.600 - 1.200 B.Z.**

Imparatoriyeke mezin zû çêkir : Kurdistana rojava, Sûriya, Amûr, Arafa û Asor stendin. Di 1483 B.Z. de, bi alîkariya Hûriyan, bi Misr re şerr kir. Vê Imparatoriyê 400 sal ajot, piştre ji aliyê Misr hat hunda kirin. Di 1.200 B.Z. de, bûn Mîtanî bûn tevî Hûrî û Nehriyan.

**Paytext : Vaşo-Kanî.**

**Şahên navdar : Sosatar, Artatama, Tadu-Hepa (Nefertîtî).**

Institut kurde de Paris

**7- NEHRÎ : 1.500 - 612 B.Z.**

Li Çiyayên Araratê xuya bûn. Dewleta wan ji Kaniyên Dicle û Firatê heta Çiyayên Nîfast - Bitlis, Diyarbekir, Xarpût, Dersîm -, Çiyayên Toros û Geliyê Zabê dirêj bû. Di dema Iskederê Mezin de, ji vî welatî re "Kurduwan" dihat gotin. Di 1.128 B.Z. de dest bi şerrê padîşahê Asor, Tiklat Palazar, kir. Şerrê Nehriyan bi Asor re 2.000 sal ajot. Di 612 B.Z. de, bûn tevî Imparatoriya Mad.

**Paytext : Tospa (Van).**

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

**8- XALTÎ : 1.500 B.Z.**

Li Araratan, li Kurdistana navîn, dewleteke xurt danî. Piştre daketin Antî-Toros û kenarên Deryayê Reş. Hêrodot ji wan re Alarod digot.

**Paytext : Tospa (Van).**

**9- MÛŞKÎ : 1.100 B.Z.**

Welatê Mûşkiyan ji bakurê rojava yê Kurdistanê heta Kapadokya û Kîlîkya dirêj bû. Di Tewratê de navê wan "Maş" e. Di 770 B.Z. de, tevî Kurdên Araratê, dijî padîşahê Asoran, Sargon I, şer kir. Di 612 de bûn tevî Madan.

**10- ALAROD (ORARTO, ÛRARTÛ = ARARAT) : 829 B.Z.**

Ûrartû ji yekbûna hemî Kurdên Sûbarî : Hûrî + Mîtanî + Nehrî + Mûşkî + Xaltî bûne. Wan hergav bi Asor re şerr dikir. Di 612 de gihîştin Imparatoriya Mad.

**Paytext : Tospa (Van).**

**Şahên navdar : Minwaş, Sardorîs I, Arkîtses, Sardorîs III, Mîna-Arî.**

**B- KURTÎ**

**1- MANNAÎ**

Ew ji yekbûna Partas (Part), Gimrî û Sît bûn û dewleteke piçûk li başûrê Gola Urmiyê (Kurdistana Îranê) danî.

**Paytext : bajarê Urmiyê (îro : Rizaye).**

**Şahên navdar : Artîsarî, Îranzo, Aza, Olosono, Diyago.**

Institut kurde de Paris

**2- MADÊ PIÇÛK**

Beşek ji Madan dewleteke bi navê "Madê Piçûk" li Azerbaycana îro, ku ji berê navê wê Atorpatka bû, ava kir. Di 853 de, di dema Key Kubbadê Kurd de, xwe gihand Madê Mezin.

**3- MADÊ MEZIN (IMPARATORIYA MAD A MEZIN) :**

**4.000 B.Z.**

Madan wê gavê nîvê Kurdistanê vegirti bû : ji sînorên Hindistanê heta rojhilata Çiyayên Zagrosê û ji Gola Urmiyê heta kenarên Xelîcê Umanê. Wê gavê, Faris bitenê li ser erdekî piçûk, li kenarê Xelîcê Farisî, diman.

**2.800 B.Z.**

Xuyabûna padîşahiya yekemîn a Madan. Padîşahê wan bi Akadan re "lihevkirina aşîtiyê" imza kir.

**2.100 B.Z.** Şer bi padîşahê Asor û Kildan, Nîne, re kir.

**Paytext : Belx (li Afganistana îro).**

**Padisahên Medan ên navdar :**

**853 B.Z. : Key Kubbadî Kurd** Ji aliyê piraniya Kurdên Kaspînê hat bijartin. Qanûnên bingehî danîn û leşkerekî gelek xurt û rêkûpêk dijî Asor pêk anî. Dijî Sardanapal, padîşahê Asor, şerr kir û ew şikand. Bi waliyê Babil, Bîlezis, re lihevkirinekê imza kir û Farisistan xist bin destê xwe.

Di 759 B.Z. de mir. 120 jiya û 94 sal hukm kir.

**Paytext : Hemedan (Ekbetan) (Kurdistana Îranê).**

**759 B.Z. : Key Kawus**

Kurê Key Kubbadî Kurd. Gelek ciyên Hindistanê

Institut kurde de Paris

vegirtin. Bi Hamawran "Yemen" re şerr kir. Piştre pê re aşîtî kir û bi keça padîşahê wê, Zu El-Azar, re zewicî.

Di 715 B.Z. de, bê zarok, mir. 44 sal hukm kir. Piştî mirina wî, du padîşah hatin bijartin : Key Lehraseb ku paytextê wî Belx bû û Key Tos ku paytextê wî Hemedan (Ekbetan) bû.

**a) Padîşahên Med ên Belx :**

**715 B.Z. : Key Lehraseb**

Tiştekî zêde ne kir. Bitenê Zerdeşt III parast û Ola Zerdeştiyê fireh kir. Di 667 B.Z. de xwe kişand û tacê xwe da kurê xwe Key Kiştaseb.

**667 B.Z. : Key Kiştaseb**

Kurê Key Lehraseb. Piştî çend salan Belx berda û bajarê Istexir, li Farisistanê, kir paytextê xwe. Ew gelek dadmend û zana bû. Bi avahiyên mezin û qanûnên cezaî û mulkî navdar bû. Di 601 B.Z. de li Şîrazê mir. 66 sal hukm kir.

**601 B.Z. : Key Behmen**

Gelek navdar bû û gelek navên wî hebûn : Erdişîrê Dirêjdest, Axşewîros, Behmenê Madî. Cihangîrekî mezin bû : heta Hindistan û Hebeşistanê vegirt. Bi tenzîmên idarî jî navdar bû. Alîkariya Yahûdiyên Babilê kir. Paytextê wî Şewêş (nêzîkî Bexdadê) bû. Di 532 B.Z. de mir. 68 sal hukm kir.

**533 B.Z. : Keybanû Humay**

Keça Key Behmen û şahbanuya pêşîn a Kurdan e. Paytextê wê Tîsfon, nêzîkî Medayin, bû. Di 494 B.Z. de mir. 40 sal hukm kir.

Institut kurde de Paris

**b) Padîşahên Med ên Hemedan**

**715 B.Z. : Key Tos**

Padîşahekî gelek mezin bû. Dewleta wî ji dora Belxê heta Deryayê Reş û ji bakurê Deryayê Kaspînê heta kenarên Deryayê Umanê dirêj bû. Ji aliyê nizamê dewletê gelek navdar bû : qanûnên medenî û cezaî derxistin û xistin nav yek pirtûk bi navê "Pazend". Li bajaran dadgeh (mehkeme) û li gundan dadgehên seyyar danîn. Qanûnên eskerî jî derxistin: mecliseke bilind ji 7 endaman danî. Yeke din a firehtir jî ji bo şîretê danî. Protokol û awayê tevgerê li ber Şah pêk anîn. Hemedan gelek xemiland : 7 dîwarên rengîn ên bajêr da ava kirin. Dîwarê 6mîn zîvkirî û yê 7mîn zêrkirî bûn. Çandin, bazirganî, sinaet ... gelek pêş de birin.

Ji aliyê siyaseta derve jî gelek jîr bû : bi kesî re şerr ne kir û tukes jî ne diwêriya ku şerrê wî bike. Di 655 B.Z. de mir. 60 sal hukm kir.

**655 B.Z. : Key Ferîbrez**

Kurê Key Tos e. Sînorên welatê wî li Rojhilatê Çemê Ceyhûn (Amoya) û li Rojavayê bakurê Mêzopotamya û Toros bûn. Lîdya, Kîlîkya û Fînîqya bac dida wî. Yahûdiyan û Misr lihevkirinekê çêkir û ketin bin parastina wî.

Navenda ayina Zerdeşt ku heta nuha li Belxê bû anî Hemedanê. Bi Asor re şerrekî mezin kir. Di şerr de, di 625 B.Z. de, mir. 30 sal hukm kir.

**625 B.Z. : Key Aksar (hundakerê Asor)**

Kurê Ferîbrez. Amanca wî ya yekemîn şkenandina Asor û stendina heyfa bavê xwe bû. Leşkerekî gelek xurt amade kir. Ji bo vê yekê, bi Babil re aşîtiyê imza kir û keça xwe da Boxotonasar, kurê padîşahê Babilê "Nabobalasar". Tevî leşkerê Babilê



Institut kurde de Paris

çû ser Nînwa, paytextê Asor. Lê neçar bû ku dorgirtina wê berde ji bo ku Sîtan - ku ew jî gelekî kurd bûn û pirr şerker, talanker û dijwar bûn - biqewirîne. Piştî şkandina wan, Key Aksar vegeriya Asor.

Di **612 B.Z.** de Nînwa stend. Asor bicarek hilweşiya. Piştî vê hilweşanê, hemî Kurd : Kûtî û Kurtî (Kurdên Rojava û Rojhilat) xwe gihand Medan û Imparatoriyeke gelek mezin û xurt danîn.

Sînorên Madistanê gelek firehtir bûn : Hundirê Hindistanê, Çiyayên Qefqas, Gurcistan, Ermenistan, Pont û hemî Anadolû, giravên Ege, Qibris, Misr, Lîdya, Sûriye û Filistîn. Gelek caran, leşkerê Med çû Habeşistan û Yemenê.

Di 584 B.Z. de mir. 41 sal hukm kir.

### 584 B.Z. : Key Azdiyak (Ixtoviko)

Kurê Key Aksar. Mezinayiya padîşahên din li ba wî tu nebû. Wezîrên wî neçar bûn ku wî rakin û dêlva wî Key Xusrew (Kûriş), padîşahê Anzan, deynin.

### 560 B.Z. : Key Xusrewê Mezin (Kûriş)

Neviyê Key Azdiyak. Padîşahekî gelek mezin û navdar bû. Li Rojavayê, şerrê padîşahê Lîdya, Krêzos, kir û Lîdya ragihand Imparatoriya Mad. Piştre çû Babilê û izn da Yahûdiyên ku bi salan di bin dîlîtiyê (esaret) de bûn ku vegerin Filistînê. Sînorên xwe fireh kirin heta Çemê Send li Hindistanê û heta Qefqasan : Ermenistan, Pont, Kapadokya, Deryayê Reş û Gurcistan.

Di 531 B.Z. de, piştî birîndarbûna xwe di şerrê Massajêtan de, mir. 29 sal hukm kir.



Institut kurde de Paris

**531 B.Z. : Key Kawus**

Kurê Key Xusrewê Mezin. Di 524 B.Z. de bi Misr re şerr kir û ew şkand. Piştre ket Lîdyayê. Gava ku vegeriya Sûriyê, ji vebûna hin birînan, di 521 de, mir. 10 sal hukm kir.

**521 B.Z. : Dara I**

Ji bo ku Key Kawus kur ne hişt, Key Dara bi hilbijartin hat ser text. Ew ji mîrên Anzan û Kûtî-Amerdî bû. Kurd bû, ne Faris bû.

Ji Key Kawus Imparatoriyek û leşkerekî yekta stendibûn : sînorên wê li Rojhilatê Hindistan û geliyên Send bûn. Li Bakur Çemê Ceyhûn, Deryayê Kaspîn, Çiyayên Qefqas, Deryayê Reş, Marmara, Deryayê Ege. Li Rojava : Deryayê Sipî. Li Başûr : Deryayê Uman, Misr, sînorên başûr ên Lîbya û Hebeşistanê.

Lê, mixabin, Dara li serayê xwe wezîr û generalên Faris tayîn kirin. Keça xwe da Mardonyosê Yûnanî û ew kir serokê leşkerê xwe. Generalên wî jî Ermenî û ji gelên din bûn. Leşkerê xwe bi serbazên (esker) biyanî yên cihê tije kir. Herkes dijî vê siyasetê derket. Li her der serhildan çêbûn. Dara ew şkandin. Lê, di warê idarî de gelek baş bû, nemaze di pêkanîna nizama Postê de.

Li Rojhilatê, çû serrê Hindistanê, ji bo ku sînorên xwe di ewlehiyê (emniyet) de bihêle. Li Rojavayê, çû şerrê Yûnanistanê : li ser riya xwe şerrê Sîtan kir, lê bi wan - li Trakya - nikarî bû, vegeriya. Piştî salekê, vegeriya Yûnanistanê û şerrê Maraton ê navdar di 490 de kir, lê şkest. Di 487 de mir. 34 sal hukm kir.

**487 B.Z. : Key Serxes**

Kurê Dara I. Misr ku ser hilda bû şkand. Piştre çû şerrê Yûnanistanê, ji bo ku heyfa bavê xwe bistîne.

Li geliyê Termopîl, li Isparta, general Lêonîdas ew şkand. Piştre şerrê limanê Salamîn kir û cardin, di 479 de, hat şkestin. Di 465 de mir : generalê wî yê Yûnanî, Artabanos, ew jahr kir. 22 sal hukm kir.

**465 B.Z. : Key Erdisîr I**

Kurê Key Serxes. Gava ku bû padîşah, hîn zarok bû. Qet şerr ne kir. Di 424 B.Z. de mir. 41 sal hukm kir.

**424 B.Z. : Key Dara II**

Her du birayên xwe kuştin û li ser text rûniştt. Serhildanên hundirî pirr bûn. Di 404 B.Z. de mir. 20 sal hukm kir.

**404 B.Z. : Key Erdisîr II**

Kurê Key Dara II. Birayê wî, Key Xusrew, dijî wî şerr kir û hat kuştin. Bi generalê leşkerê Isparta, Ksênofon, re şerr kir "Vegera 10.000an". Di 358 B.Z. de mir. 46 sal hukm kir.

Institut kurde de Paris

**358 B.Z. : Erdisîr III**

Gelek stemkar (zalim) bû. Şerrê Fînîq û Misr ku ser hilda bûn kir. Di 338 B.Z. de mir. Generalê wî yê misrî, Bogoas, ew kuşt. 20 sal hukm kir.

**338 B.Z. : Key Dara III (Darayê Madî)**

Ji nifşê (nesl) Anzan û neviyê Şahbanû Humay bû. Iskenderê Mezin ê Yûnanî êrîş kir. 3 şerr çêbûn : di 334 de, li Kenarê çemê Nîfos, nêzîkî Deryayê Ege. Di 333 de, li Kîlîkya (Adana), nêzîkî Ipos = Tersos. Di 331 de, li Erbîlê. Di her sê şerran de jî Dara hat şkestin. Iskender hemî Madistan stend :

ji sînorên Hindistanê heta Deryayê Reş. Ji Qefqasan heta Hebeşistanê.

Iskender li Babilê di 323 de nexweş ket û mir. Piştî wî, generalê wî Sêlêkos ciyê wî stend û padîşahiya Selefke danî.

## LI KURDISTANA NAVÎN, DEWLETA MAD: 255 B.Z.

Di bin Imparatoriya Selefke de, piştî serhildaekê, çêbû. Gelek zanîn li ser destpêka wê nîne. 200 sal şûnde, di 35 B.Z. de, Padîşahê Aşkaniyan Venûn bû. Xelk ew rakir û dêlva wî padîşahê Mad, Erdişîr III, danî. Piştre, padîşahê Mad, Erdiwan III, paytextê Aşkaniyan, Medayin, stend û her du dewletên Mad û Aşkaniyan yek kir. Vê dewleta yekbûyî sedsalek ajot.

Institut Kurde de Paris

## LI KURDISTANA NAVÎN, DEWLETA AŞKANIYAN : 225 B.Z.

**(Ewropî jê re "Parthe" û Ecem, Ereb û Tirk "Fursî qedîm" dibêjin)**

Dijî Selefke ser hilda û dewleteke serbixwe çêkir. **Arşek = Aşek** ew danî. Ew ji neviyên Dara III bû, ji Belx hati bû. Vê dewletê gelek mezin bû : ji Hindistanê heta Deryayê Reş. 451 sal ajot. 37 padîşahên wê hebûn. Yên navdartirîn : **Arşek, Mihirdad I, Ferhad II, Hûrd I.**

**157 B.Z. : Mihirdad I**

Padîşahê 6mîn bû. Baxterî, Babil, Hemedan, Mêzopotamya stend. Li Rojava, di 148 B.Z. de, padîşahê Selefke, Dîmîtriyos, êrîş kir. Dîmîtriyos hat şkestin û dîl hat anîn Medayin. Piştre, Mihirdad çû, ket Hindistanê. Di 138 de mir. 9 sal hukm kir.

**139 B.Z. : Ferhad II**

Kurê Mihirdad. Antokyosê 7mîn, padîşahê Selefke,

êrîş kir û hat şkestin. Di 127 B.Z. de ji aliyê leşkerê xwe hat kuştin. 12 sal hukm kir.

**55 BZ. : Hûrd I**

Dijî êrîşên Roma, di bin serokatiya Krêzos de, şerr kir. Di 37 B.Z. de mir. 18 sal hukm kir.

**DEWLETA ARŞAKIYAN : 132 B.Z.**

Pismamê Mihirdad I, **Agirşak**, bû waliyê Ermenistanê, ku perçeyek ji dewleta Aşkaniyan bû. Navenda wî bajarê Erdiş bû. Piştî mirina wî, kurê wî **Arşek** bû waliyê Erdiş.

**132 B.Z. : Arşek**

Arşek şerrê Pont kir û ew ragihand Ermenistanê. Ji Ermenistan û Pont dewleteke nuh, bi navê Arşakiyan, danî. Di 114 B.Z. de mir. 18 sal hukm kir.

Institut kurde de Paris

**114 B.Z. : Erdesîs**

Kurê Arşek. Şerrê Aşkaniyan kir û bajarên Amed (Diyarbekir), Serê Kaniyê (R'as El-Eyn), Ruha (Urfa) stendin. Nuseybîn kir paytextê xwe. Di 89 B.Z. de hat kuştin. 25 sal hukm kir.

**89 B.Z. : Dikranê Mezin**

Kurê Erdişîs. Şerrê Selefke kir û paytextê wan Antakya stend. Piştre, bi Roma re şerr kir û ew şkand. Di 71 B.Z. de, Roma ew li Diyarbekirê şkand û bajêr têk da (xera kir). Di 66 B.Z., Dikran dijî Pompeyus, serleşkerê Roma, şerrekî mezin kir û hat şkestin. Piştî vê şkestinê, dewleta Arşakiyan hêdî hêdî hunda bû.

## 2- PIŞTÎ ZAYÎNA ÎSA

**226 P.Z.**

**SASANIYAN**

Vê imparatoriyê 426 sal ajot. Gelek mezin, xurt û şehrevan (medenî) bû. Avakerê wê, **Erdişîrê Babekî**, ji nifşê Key Kubbadê Kurd û Key Behmen bû, ango ji Kurdên Mad bû, ne Faris bû. Bi Roma re hergav li ser Gurcistan, Pont, Ermenistan, Kapadokya, Lîdya û Mêzopotamya Jorîn şerr dikir.

28 padîşahên Sasanî hebûn. Ên navdartirîn : **Erdişîrê Babekî, Şapûr I, Şapûr II, Nûşîrewan.**

**226 P.Z. : Erdişîrê Babekî**

Di 226 P.Z. de, wî bi padîşahê Aşkaniyan ê dawîn, Erduwan, re şerr kir û ew kuşt. Padîşahiya Aşkaniyan hunda bû. Erdişîr padîşahiya Sasaniyan danî.

Şerrê Roma kir û şkest. Di 233 P.Z. de hemî Mêzopotamya ket destê Roma. Di 240 de mir. 14 sal hukm kir.

Institut kurde de Paris

**240 P.Z. : Şapûr I**

Kurê Erdişîrê Babekî. Şerrê Roma kir û di 244 de Mêzopotamya, Îbîrya, Ermenistan, Kapadokya, Antakya û Hums ji destê wan stendin. Piştre Kîlîkya (Adana) û gelek ciyên Sûriyê stendin.

Di 260 P.Z. de, piştî şerrekî mezin, Roma li nêzîkî Urfa hat şkestin û Imparatorê wê Valêryen hat dîl kirin. Di 271 de mir. 31 sal hukm kir.

**310 P.Z. : Şapûr II**

Kurê Hurmuz II. Gava ku bû padîşah, hîn zarok bû. Şerrê Roma li Çiyayê Sincar kir. Piştre, Imparatorê

Roma Nuseybîn muhasere kir, lê nikarî bû bistîne, vegeriya. Piştî wî, Imparatorekî din ê Roma, Julyanus, Şapûr vegerand heta Mûsilê. Lê paşê, Julyanus aşîtiyê kir, Nuseybîn teslîmî Şapûr kir. Lê Diyarbekir ji Roma re ma. Piştre Şapûr êrîşî Diyarbekir kir û bajêr têk da.

Imparatoriya Roma bû du perçe : ya Rojava, paytextê wê Roma bû. Ya Rojhilat, paytextê wê Istanbul bû û navê imparatorên wê Kayser bû. Piştre navê vê imparatoriyê bû Bîzans. Kayserê Bîzans êrîşeke mezin li Şapûr II kir. Şapûr leşkerê wî kişand heta Medayin û ew perîşan kir. Kayser reviya Istanbûlê.

Şapûr nêzîkî 50 sal bi Roma û Bîzans re şerr kir û ew qewirandin. Di 380 P.Z. de mir. 70 sal hukm kir.

**531 P.Z. : Nûşîrewan**

Ew padîşahê 20mîn e û ji hemiyan birûmettir (qedr) e. Loma bi navê Nûşîrewanê Adil hat nasîn. Wî Roma, Tirk û Hindî şkandin. Şam, Anbar û Qefqasya stendin. Sînorên dewleta xwe gihandin sînorên Tirkistan û Hindistanê. Di 562 de, Kayser Justisyanus bicarek şkest. Nûşîrewan di 579 de mir. 31 sal hukm kir.

## 3- PIŞTÎ ISLAMÊ

**922 - 1240**

**7 DEWLETÊN KURDÎ (di dema Abbasiyan de)**

**1- LORÊ MEZIN (Fadlewiyan) : 922 P.Z.**

Piştî leyandina Ereban di 620 de, Xanedana Fadlewiyan

Institut kurde de Paris

ser hilda û li Loristan û dora wê (başûrê Kurdistana Îranê) dewleteke serbixwe danî. 500 sal ajot. 35 padîşahên wê hebûn.

**2- AXŞADIYAN : 993 P.Z.**

Li Şamê serrast bû. Li Sûriya û Misrê 40 sal ajot. 4 padîşah jê derketin.

**3- DÎLEMIYAN (Peweye) : 940** P.Z.

Li Bexdadê ava bû. Elî Imad El-Dewle, ji Kurdên Dîlemê, ew danî. Li Îran û Iraqê, heta hatina Selçûkiyan padîşahî kir.

**4- HESNEWIYAN : 981** P.Z.

Hesnewî, kurê Huseyn, ji Şehrezorê (Suleymaniye), ev dewlet li Şehrezor û Demar ava kir. Leşkerê xelîfeyê Bexdadê şkand. Vê dewletê 141 sal ajot. Di 1122 P.Z. de, bi destê Tataran hunda bû.

**5- MERWANIYAN : 1009 P.Z.**

Ehmed, kurê Merwan (Nasir El-Dewle), ew li Amed (Diyarbekir) danî. 52 sal padîşahî kir. Dewleta Merwaniyan 91 sal ajot. 5 padîşah jê derketin.

**6- EYYÛBIYAN : 1177 P.Z.**

Avakerê wê, qehremanê Şerrên Xaçparêzan, Selaheddînê Eyyûbî : Kurdistan, Ermenistan, Sûriye, Misr û Yemen stendin.

**7- XORISTAN û SÎSISTAN : 1240 P.Z.**

Piştî êrîşên Cengîz Xan bi çend salan, Şemseddîn Muhammed padîşahiyeke kurdî li Xoristan û Sîsistan ava kir. 130 sal ajot. 8 padîşah jê derketin. Di 1370 de, bi destê Timurlenk hunda bû.

Institut kurde de Paris

## MÎRIYÊN KURDAN DI BIN ABBASIYAN DA

**39 MÎRÎ :**

1- Erdelan (Kelhor) : a) Pilingan b) Derteng
c) Tahîdest

2- Siyahmensûr

3- Cengî

4- Zengene

5- Pazûkî

6- Somay

7- Sehran (Soran)

8- Mahmûdî

9- Mukrî

10- Baban

11- Biradost

12- Behdînan

13- Hekkarî (Sîno)

14- Mikis

15- Bedlîs

16- Mûş

17- Sipayerd

18- Sasûn (Hezo)

19- Botan : a) Azîzan b) Gurgîl c) Fenik

20- Hesenkêf

21- Sêrwan : a) Kufra b) Kefrî c) Iron

22- Xerzan

23- Farqîn

24- Zirkî : a) Derdin b) Gurdkîkan c) Hatax (Licê)
d) Tercil

Institut kurde de Paris

25- Batman

26) Qulp

27) Cebaqçûr

28) Gênc

29) Mirdasî : a) Egil b) Palo c) Çêrmûk

30- Siwêrek

31- Çemîşgezek : a) Mencîkurd b) Pêrtek c) Sekman

32- Koçhîsar

33- Dûrik

34- Egîn

35- Rişwan

36- Entab

37- Kilîs

38- Mendêlan : a) Mêrdin b) Qesrîk

39- Sorikan

Institut kurde de Paris

* * *

## XANEDANÊN KURDÎ LI ÎRANÊ

### 1- SEFEWIYAN : 1501 P.Z.

Şêx Ismaîl, kurê Şêx Seyfeddînê Erdebîlî, li Geylan (Kurdistana Îranê) serokê olî (dînî) yê Kurdan bû. Tevî murîdên xwe êrîş kir Gurcistanê. Piştre, di 1500 P.Z. de, padîşahê Akkoyunluyên tirk şkand û kuşt. Piştî salekê, di 1501 de, êrîşî Tebrîzê kir, xwe padîşah îlan kir û serxwebûna dewleta xwe anî.

Şêx Ismaîl bû Şah Ismaîlê Sefewî. Ew Kurd bû, ne Faris bû. Wî Xoristan, Hemedan, Bexda, Diyarbekir û Maraş ji Akkoyunluyên tirk û Sinendej û Kermanşah

ji mîrên Kurdan stendin û dewleteke mezin ava kir. Mezhebê şiî kir fermî (resmî). Paytextê xwe jî kir Tebrîz (li Îranê). Di 1524 de mir.

Ji sedema du çewtiyên wî : stendina Sinendej û Kermanşahê ji destê Kurdan û fermîkirina mezhebê şiî, hemî mîrên kurd dijminayiya wî kir û di şerrê Çil-Dêran, ku di navbera wî û Sultan Selîmê tirk di 1514 de çêbû, de bûn hevalbendên Sultan Selîmê sunnî.

Bi vî awayî, Kurdistan ji sedsala 16mîn heta ya 19mîn bû du perçe : di navbera du imparatoriyên islamî de, yek tirk û sunnî û yek îranî û şiî.

**2- XANEDANA PEHLEWÎ : 1925-1979 P.Z.**

Avakerê wê, Riza Xanê Pehlewî. Xanedana Kaçaran ku li ser textê Îranê bû daxist û xwe şah îlan kir. Ew Kurd bû, ne Faris bû. Ji êla Mezindiran bû. Pehlewî, yan Pehleyî, ango ji navçeya Pehle. Di zemanê Madan da, ji navçeya Tehran û Isfehanê re Pehle dihat gotin. Zaravê pehleyî yek ji zaravên Medan bû. Di zemanê Sasaniyan de, ew bû bû zimanê fermî. Ev xanedan di 1979 de, bi destê Ayetullah Khumeynî, di dema şoreşa islamî de, hunda bû.

Institut kurde de Paris

* * *

## 4- DI SEDSALA XXmîn DE

### a) ÇEND BÛYERÊN DÎROKÎ YÊN GIRING

**<u>1920</u> : <u>Peymana Sêvr</u>**

Civata Neteweyan (Société des Nations) biryar

stend ku serxwebûnê bide perçeya Kurdistanê ku di bin destê Imparatoriya Osmanî de bû (ango, Kurdistana Tirkiye, Iraq û beşek ji ya Sûriyê).

**1923 : Peymana Sêvr**

Civata Neteweyan biryara xwe ya jorîn kişand, ji bo ku Tirkiye û Ingiltere (ku Iraq vegirtibû û dest danî bû ser petrola Mûsilê) dijî wê derketin.

Piştî vê Peymanê, Kurdistan ji aliyê Ingilîz û Fransiyan di çar perçan de hat beş kirin.

## b) KURDISTANA IRAQÊ

**1922 - 1923 : Şêx Mehmûd Berzencî û navçeya kurdî ya otonom**

Di 24. 11. 1922 de, Ingilîzan, ku Iraq vegirti bû, û hukûmeta Qral Faysal ji Rêxistina Neteweyên Yekbûyî "ONU" re bi awakî fermî da nasîn ku mafê otonomiyê didin Kurdistana Iraqê. Wan vê yekê kir ji bo ku ferzend nedin Mustafa Kemal "Ata Türk" ku dixwest Mûsilê girêbide Tirkiyê û ji petrola wê kelk bigire. Şêx Mehmûd Berzencî xwe walî îlan kir, pûlên malî weşandin û rojnameke kurdî derxist. Lê, di 3.10.1923 de, Ingilîzan Suleymaniye bombe kir û Şêx Mehmûd reviya Îranê.

**1974 : Melle Mustafa Berzanî û Kurdistana Otonom**

Piştî şerrekî xwînî û gelek dirêj ku di 1961 de dest pê kir, Kurdan beşek ji Kurdistan Iraqê, 35.000 km2, ji leşkerê iraqî stend û li ser wî axî otonomiyeke rast û fireh danî. Ji dema Komara Mehabadê ya Kurdistana Îranê ku di 1946 de ava bû, Kurdan mafekî ewqas mezin ne stendi bû. Wan hukûmetek di bin serokatiya Samî de danî. Neh wezaret tê de hebûn û xebateke ceddî dikir. Paytextê wê **Hac Umran** bû. Lê, di 6 Adar 1975 de, Iraq û Îran li



INSTITUT KURDE de PARIS BIBLIOTHEQUE

Cezair, di civîna OPEP "Rêxistina Welatên Xwedî Petrol", li hev hatin û bi hev re Kurdistan bicarek pelixand.

**1992 : Piştî Şerrê Xelîc, Kurdistana nîv-serbixwe**

Piştî êrîşê Saddam Huseyn li Kuweytê û Şerrê Xelîc ê mezin, Kurdên Iraqê 3/4 axa xwe kontrol kir û heta nuha jî dikin. Wan di 19.4.1992 de hilbijartin çêkir : 105 parlementer ku 5 ji wan fille bûn bijart. Di 16.6.1992 de jî hukûmetek ji 16 wezîr hat danîn. Ji van wezîran 1 jin û 1 Asorî ne. Ev bûyera mezin dilê hemî Kurdan gelek şah dike, li gel rewşa aborî ya gelek giran ku Kurdên Iraqê tê de dijîn.

### b) LI SOVYÊTISTANÊ NAVÇEYA KURDÎ YA OTONOM

**1923-1929 : Kurdistan Sor**

Di 1923 de, di dema Lênîn de, **di nav sînorên Komara Sosyalîst a Azerbaycanê de - di navbera Karabax û Ermenistanê de** - navçeyeke otonom ya kurdî bi navê "Kurdistan Sor" ava bû. Paytextê wê **Laçîn** bû. Şaredariyên wê : Kelbajar, Gubaltî, Kurd-Aci, Murad-Xelîl û Kara-Işlax. Xwendegehên kurdî vebûn. Rojnameyek bi navê "Kurdistan" û pirtûk hatin weşandin. Enstituyeke pêdagojîk û rêxistinên çandî li bajarê **Şûşî** vebûn.

Lê, mixabin, di 1929 de, Stalîn ev navçe rakir û Kurdên wê sirgûn kirin Kazakstan û Tirkmenistanê. Ronakbîrên kurd hatin mehkeme û îdam kirin. Di 1944 de, alfabeya kurdî ya bi tîpên latînî, ku di 1928 de hati bû danîn, bi tîpên kîrîlîk hatin guhertin.

### c) KURDISTANA ÎRANÊ

**1946 : Qazî Muhammed û Komara Kurdî ya Mehabadê**

Di 1941 de, di dema Şerrê Cihanê yê 1mîn de,

Institut kurde de Paris

leşkerê sovyêtî bakurê Kurdistana Îranê vegirt (işgal kir) û hevalbendên wî yên ingilîzî jî başûrê Kurdistanê stend. Di navçeya navîn a di navbera her du leşkeran de valayiyek çêbû û Kurdan karî bû xwe pêk bînin û dewleteke piçûk a serbixwe deynin. Komela Jiyanî Kurd, û piştre K.D.P.Î., hatin ava kirin. Di 22.1.1946 de, Qazî Muhammed bû serokê Komarê. Ji aliyê siyasî, idarî û civakî gelek pêşveçûn bû. Kurdî bû zimanê fermî yê sazende û xwendegehan. Radyo, pirtûk, kovar ... bi kurdî hatin weşandin.

Lê, di 17.12.1946 de, leşkerê Îranê hemî endamên hukûmeta kurdî girtin û di Adar 1947 de hatin mehkeme û îdam kirin. Vê Komara Kurdî bitenê salekê ajot.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## TÊGIHANDINA HIN GOTINÊN NIVÎSKAR BI (*)

(*) Nivîswar : pirtûk, kitêb

(*) Newîd : soz

(*) Engîz : sedem, sebeb

(*) Gertev : bûyer, hadise

(*) Hengam : dem, zeman

(*) Ano : ango, yanî

(*) Debistan : dibistan, xwendegeh, mekteb

(*) Leyandin : vegirtin, işgal

(*) Enzan : mirov, insan

(*) Nivîswargeh : pirtûkxane

(*) Kişwer : navçe, mentiqa, welat

(*) Hawiş : gel

(*) Pes : teslîm

(*) Mîna : weka

(*) Balyoz : sefaretxane

(*) Konevanî : dîplomasî

(*) Rewan : can, ruh

(*) Şep : ferzend, firset, mecal

(*) Weşbest : helbestvan, şair

(*) Nebexetî, deha (erebî) : jîrbûna mezin.

(*) Firawan : nîmet

(*) Hulûlk : kole, ebd

(*) Zexelî : lîz, hîle

(*) Cawbirr : meqes

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## NÎŞANK

(1) Nivîswara Emîn Zekî Beg bi lehçeya soranî - lehçeya Suleymaniye - hatiye çap kirin. Paşê, bi awakî durust û sade, ronakrewan (merhûm) Muhemmed Elî Ewnî Begê Siwêrekî ku li Misrê cî girtibû ew vegerande Erebî.

Ronakrewan Muhemmed Elî Beg hevalekî me yê hêja bû, ji Universita "Camî El-Ezher" guwahnave girtibû. Di Seraya Misrê da li ser nivîsan û wergerkan (tercume) bû. Lehçeyên Kurmancî, Soranî û Zazatî zanîbûn. Erebî, Farisî, Tirkî û Ingilîzî ji pir baş zanîbûn.

(2) Enzan pirseke kurdî ye. Ereban ji Kurdan stendiye, kiriye "insan".

(3) Zanayê dîrokê, Hakkî Paşa yê Tirk, ji bo ola Zerdeşt di nivîswara xwe, Ibrahim Hakki Tarihi, da, rûpel 119, ewha dinivîsîne : "Di mezhebê Zerdeştiyan da, kesê ku ji bo pêşveçûn û dewlemendiya welatê xwe û ji bo Qenciya enzanî bixebite pir bi rûmet e. Cot kirin, tuxum çandin, bax û baxçe çê kirin qenciyek pir mezin bû".

(4) Dîroka Ibrahim Hakki, derpêç (cild) I, rûpel 66: "Di dema dirêjkirina Misriyan da, ev kişwer (arazî) - Sûriye - di destê hawişekî (qewm), ano Kûtî, ku milletekî mêrxas û dijwar bû, da bû".

(5) Navê rast û kevn ê Azarbaycan "Aderbanan" bû. Paşê Ereban kir Azarbeycan. Aderbanan, yanî pasebanê agir. Di dema Zerdeştiyan da, li Aderbanan agirgehek mezin hebû.

(6) Kûtiyan bitenê xwehermenda Kûtiyûm li Mêzopotamya, ano di erdê Akad, Sûmîr û Elaman da, serrast ne kiriye. Belkî Kûtiyan ji Araratan ta Deryayê Sipî û Sûriya xwehermend, ferwerî û mîriyên din serrast kirine.

(7) Tûranî jî Arî ne, ne Mongol in, ano Tûranî ne pismamên Kurd û Paris in. Pismamên Tirk, Tatar û Mongol nîn in.

(8) GROUSSET René, Histoire d'Asie, rûpel 16.

(9) Waşokanî = Weş-Kanî = Kaniya xweş. Mîtanî çawa Kurd bûn, navê paytextê wan jî bi kurdî bû. Rojhilatzanan sûda (mana) Waşokanî fehm ne kiriye. Loma gotine em nizanin ev bajar li ku ye ! Waşokaniya kevnare "Serê Kanî"ya îro ye. Îro ev bajar li Sûriya ye, bajarekî biçûk e, li ser Çemê Xabûr e. Ji wêranezarê wê yê fireh tête zanîn ku ev bajar berê Paytextekî mezin bû. Serê Kanî = Ras El-Eyn (erebî). Îro jî ew wargeha Kurdan e.

(10) CONTENEAU Georges, Les civilisations anciennes du Proche-Orient, Presses Universitaires de France.

(11) Hêrêdot ji vî hawişî ra ne gotiye Alarod. Alarod navê ciyê wan e. Ji Ararat ra Alarod digotin. Kesên wî Xaltî bûn. Navê ciyê wan Alarod bû. Vê paşiyê, navê ferweranê xwe jî kiribû Alarod. Alarod ne bitenê ciyê Xaltiyan bû. Ew ciyê gişî Kurdan bû, ciyê Sûbariyan bû; hîn rasttir, ciyê Kûtiyan, ano bapîrên Kurdan, bû.

(12) Di vê hengamê da, li Madistan mîrên jêrîn ferweranî (hukumdarî) dikir :
Astîbars, Heştîbors, Mandos, Mencik, Suzarmos, Aspada, Artîka, Astîka, Arbiyan, Armî, Arten, Parisûnd, Artenî, Arjeng, Arbas.

(13) Tarîxa Pîrniya, rûpel 15. Tarîxa Milelê kevnar ên Rohilat, rûpel 378. Tarîxa Ayine î Iskender, rûpel 118. Tarîxa Qedîm a Oraman, rûpel 118.

(14) Di van salan da, rohilatzanên arkêolog nivîstek û nehrevanên nû peyda kirin. Ji van kevnerêçan xuyabûye ku Sît Endo-Awropayî ne û birrekî Kurd in.

(15) **Tewrat, Nivîswara Estir, faslê 1im, nivîswara dîrokên kevnare yên kurdî ...**

Institut kurde de Paris

(16) Ev gertev, ano guhartina Bileser bi kurê Camas, Kûrîş, nîşan dide ku Babîl di bin ferweraniya Key Behmen da bû.

(17) Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 135 : "Di dema padîşahiya Kûrîş da, paytextê Mad Hemedan bû. Paşê paytextê Mad bû Isfahan. Di nivîspelgeha (defterxane) Ispehanê da, ji bo hêvisandina (tamîr) deregahê pirfiraz (beytîmuqeddes), fermana Kûrîş bi dest ket. Di vê fermanê da, navê Kûrîş padîşahê Mad hatiye nivîsandin".
Tarîxa Merdûx, derpêç I, rûpel 180 : "Tewrat di kitêba Ezra, fasl 6 da, ji bo paytextê Kûrîş paytextê kişwerê Mad nivîsandiye".

(18) Leşkerên yewnanî ku bê serleşker mabûn ji xwe ra Ksênofon (Xênophon) general bijart. Ji leşkerên yewnanî deh hezar peya jîndar mabûn. Ksênofon ev deh hezar leşkerên mayîn bi hezar êş û tengayî ji çiyayên Kurdistanê û ji Armênya derbas kirin û ew gihandin rexê Deryayê Reş. Paşê ji rexên derya çûn û ji geliyê Istanbûlê derbas bûn, gihîştin welatê xwe.

Li bin fermandariya Ksênofon ev vegera 10.000 Yewnanî di nivîswarên dîrokan da bi nav û deng e. Di dîrokan da ji vê vegerê ra "vegera deh hezaran" dibêjin. Li ser vê vegerê, Ksênofon di 400 B.Z. da nivîswarek nivîsiye û navê nivîswara xwe kiriye "Vegera deh hezaran". Ji bo Kurdan dûr û dirêj pir tişt nivîsîne : di heft rojan da, ji Kurdistanê derbas bûye, navê Kurdan kiriye "Kardux", çima ku di wan deman da navê wan dora Kurduwan bû. Di devê Yewnanan da, "Kurduwan" bûye "Kardux".

Gellek gel hene ku 5 û 6 navên wan hene. Ez heft navên Yewnaniyan zanim : Yewnan, Yûnan, Exrik, Grêk, Hêlên, Rûm. Ksênofon ji bo Kurdan wuha dinivîsîne : "Kurd tîravêjên dijwar bûn, tîrên ku Kardux diavêtin, me ev tîran ji xwe ra dikirin "javelo", (ano rimên destan). Kuştî û serêşaniyên heft rojan ji destên Karduxan, ji kuştî û tengayiyên

ku me di sê mehan ji destê ordiya Erdişîr dîtibûn bêtir bûn".

General Ksênofon di nivîswara xwe da ji bo Kurdan çi nivîsiye, me ji we ra got. Îcar jî, li ser vê "Vegera deh hezaran", zanayê dîrokê yê tirk çi dibêje, em dê binivîsînin : Tarîxa Ehmed Refiq, derpêç I, rûpel 39 : "Deh hezar Ispartî ji nav xwe Ksênofon kir serleşker. Ksênofon deh hezar Yewnanî ji Babîl, Asor, Ermenistan, ji nav Îran, ji zoriyan, ji welatê neyaran, bi karaşînayî, dûrbînî, ew derbas kirin û gihandin kenarê Deryayê Reş ...".

Ksênofon di nivîswara xwe da dibêje : "Ez ji welatê Karduxan derbas bûm, me pir kuştî dan, pir tengahî kişandin. Tîrên ku Karduxiyan diavêtine me, me ev tîran ji xwe ra dikirin "javelo", (ano rimên biçûk).

Ehmed Refîq Beg nabêje Ksênofon ji welatê Karduxan derbas bû. Ehmed Refîq Beg naxwaze navê Kardux, navê Kurd bîne ser zimanê xwe. Ew dibêje ji Babîl, Asor, Ermenistan derbas bûn ! Ya Ehmed Beg ! Ya Refîq Beg ! Gava ku Ksênofon ji van deran derbas bû, Babîl, Asor, Ermenî mabûn ? Ji van deman du sed sal bertir, padîşahê Kurdan "Key Aksar" Asor wenda kiribû û padîşahê Kurdan "Key Xusrew" Babîl standibû. Ermenya jî kiribû satrapeke (wilayet) xwe. Di van deman da, sînorên imperatoriya Kurdistanê ji Hindê heya hundirê Hebeşistanê diajot.

(19) Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 178 : "Bi gotina Herodot, Parisiyan di welatê xwe da, ano li tengava Paris, pirtirên wan bi çandinî û şivantî karuwer bûn. Carna bi serxwebûnî jî jîne. Lê, pir caran li bin destê Pişdadiyan bûn, yaxut ji xwehermendên Mad, Asor û Kildan ra bac didan. Tucar ji erdê xwe derneketine".
Strabon, birr 13 : "Parisî li tenvaga (xelîc) Paris rûdiniştin. Heya wendabûna Mad, ji kişwerê xwe **derneketine"**.

Institut kurde de Paris

(20) Iskenderê Mezin, kurê Fîlîp, qralê Makêdonya, xurt, zorbazû, şûrhingêv, mertalgêr û tîravêj bû. Di çekbaziyê da pir hunermend bû. Gellek bedenbaz û canbaz bû. Pir zana, xudançand (museqqef) û xwendemend bû : leşkervanî, kargerînî, nivîsvanî, fîlozofî ... di giş van danişmendiyan da destdirêj bû. Van zaniş û huneran ji zanayê dengîn Aristo hîn bûbû. Belê, Iskender şagirdê Aristo bû. Iskender, pey mirina bavê xwe, bû Qral. Wê gavê bîst salî bû. B.Z. 336.

(21) Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 41 : "Ji serê kaniyên Dicle û Ferêt heya rexên Deryayê Paris, zimanê kurdî dihat peyivandin. Germiçanka vî zimanî berê Ararat bû, paşê Zagros, paştir Ispahan, paştir Hemedan û Medayin bû. Weha ye, em dikarin bibêjin li Îrana kevn, ku Iskender tê da fermanwerî kir, zimanê kurdî zimanê gişkî bû".

(22) Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 41 : li (19) binêre.

(23) Roma, Imparatoriya nû û cuwan, Awrûpa giş vekirandibû. Îcar doza cihangîriyê dikir, dest pê kiribû dirêjî Asya bike.

(24) Dîrokzanê bi nav û deng ê ingilîz, Sir Jan Malkin, di nivîswara xwe da wuha dinivîsîne : "Aşkanî ku ordiyên Yewnaniyan ji pey hev şkandin, perîşan dikirin û ji hev dijendin, û ku serxwebûna Îranê cardin bang kir, Parstawa bûn, ano Kurd bûn".

(25) Dîroka Saîd Paşa, Mîratî Îber, derpêç I, rûpel 122-129.

(26) Qamûsa Şemseddîn Samî, Sasan : "Sasan bavê Erdişîrê Babekî ye. Erdişîr bingehdar û serekê Xwehermenda Sasaniyan e. Sasanî kirasê çarim ê Padîşahên Îranê ne. Ew bixwe kurê Sasan e. Ji ezbeta Keyaniyan, Behmenê Kurd ê Isfendiyar e. Pey ku Iskender Îran vekirand, di pey mirina wî ra mîrî çê bûn. Wê gavê, bavpîrên wî li kişwerê Paris

Institut kurde de Paris

dijîn. Ew şivanê yekî bû ku navê wî Babek bû û keça wî mar kiribû. Ji vê markirinê Erdişîr çê bû û bû Padîşah. Herçend ku ûda xwe li ser navê kalikê xwe "Babekan" kiribû, ezbeta padîşahiya xwe kir "Sasaniyan".

(27) Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 123 : "Abdullah Ibn Omer paşê çû Pawe, ev der jî bilêc kir û giş jin û keç û zaro bûn para leşkerên islamê. Fermandarê ereb, Abdullah Ibn Omer, avadaniyên mezin dan çê kirin, jin û keçên Kurdan xistin van avadaniyan. Meaz Ibn Cebel û bedewî bûn xwediyên van jin û keçan. Zarûk çê bûn û ezbet serrast bûn. Heya nuha jî Pawe û dora wê malbat û bavpîrên xwe digihînin Meaz Ibn Cebel û van bedewiyan".

(28) Tarîxa Merdûx, derpêç I, rûpel 41.

(29) Dîroka Ibrahîm Haqqî, derpêç 7, rûpel 98; Şemseddîn Samî, Qamûsa Alam, rûpel 3835 : "Bingehdarê vê Padîşahiyê Şemseddîn Muhammed bû. Di sala 1240 P.Z. da, bingeha vê padîşahiyê danî. Kişwerên Hurad, Xorisan, Xerecistan, Sîsistan, Serbidaran di bin serdariya wan da bûn. Di 1370 P.Z. da, dawiya wan hat".

(30) Ji kevn da, ji gevera (mintiqa) navbera Zaxo û Sêêrt ra Botan dibêjin. Li Botan sê mîrî hene : Azîzan, Gurgîl û Fenik. Wuha ye, Botan navê geverek e û tê da sê mîrî hene, bitenê navê yek mîrî nîne. Gotinên Mîrê Botan, Mîriya Botan ne durust e. Gotinên durust ev in : Mîriya Azîzan, Mîriya Gurgîl, Mîriya Fenik; û Mîrê Azîzan, Mêrî Gurgîl, Mîrê Fenik.

(31) Dîroknivîsên tirkî "Çel Dêran" kiriye "Çaldiran". Lê rastiya vê pirsê Çel Dêran" e. "Çaldiran pirseke çewt e". "Çel Dêran" pirseke kurdî ye. Tiriya wê "Kırk Kilise" ye.

(32) Dîroka Ahmed Rasim, rûpel 278 : "Şah Ismaîl di nîvê zivistanê da çar şandiyên xwe, bi diyariyên giranbuha, azadkirina jina xwe "Taclı Hanım" hêvî

kir. Padîşah şandî avêt zindanê, jinik jî li "Kadi Asker Hidir Çelebi" mahr kir. Ev tevgera Selîm bi rastî ne hêja bû".

(33) Gelek beg û axa hebûn ku bi zexelî, nîrengî (desîse) û xapên Tirkan dixapiyan, û hin ji wan jî ji gelê xwe ra bêbextî dikir, zêr û dirav digirtin, dibûn dost û hevalên Tirkan. Xweşber, ev Beg û Axa jî wek van Şêx û Melan bêbext bûn. Ew jî şayesteyên (layiq) nefrînê bûn. Lê, pirên van Beg û Axan bi xapandina Şêx û Melan ev bêbextî dikirin. Loma, em bawer dikin ku engîzvanên rastîn Şêx û Mela bûn. Gunehkarên mezin ew bûn.

(34) Dîroka kevnare ya Enzanan pir tarî ye, pir kêm e û pir çewt e. Di van salên dawîn da, ji kolanên arkêolojîk pir nîşane û şope derketine meydanê. Bi van nîşaneyên nû çewtî û kêmaniyên nivîswarên dîrokên kevn hatine durust kirin û tekûz kirin. Di vê navê da, li ser dîrokên Kurd û Ermeniyan jî zanişên nû bi dest ketine. Bi alîkariya van nîşaneyên nû bûnişên cografî û dîrokî yên Kurd û Ermeniyan em dê berjend (îzah) bikin, em dê bixebitin, xwarî û çilweriyan bidin alî û rastiyê derxînin meydanê !

(35) Li Trakya, bi navê Frîjyen hevsiyekî Ermeniyan hebû. Di dîrokan da, ji bo nejadên her du hawişan ra "Trako-Frîjyen" dibêjin. Ji van berjendkirinên jorîn xuya dibe ku Kurd û Ermenî, her du jî Endo-Ewrupayî ne, lê ne yek birr in. Kurd ji birrê "Ariyan" in, Ermenî ji birrê "Trako-Frîjyen" in.

Ermeniyan çend hezar sal li Trakyayê derbas kirin. Paşê, di sedsala 6im B.Z. da, Trakya berda, ji Bosforê derbas bûn, kenarê Deryayê Reş girt û ber bi rohilat hatin, li dora Qars û Eriwanê cî girt.

Di wan hengaman da, ano di 625 B.Z. da, hawişê Sît ji bakurrê Deryayê Kaspînê ber bi nîvro dirêj kir. Sît Arî ne, ji Ezbeta Kurdan in. Sîtan, li ser riya xwe, Gurcistan, Armenya,. Pont û Kapadokya

Institut Kurde de Paris

talan kirin, wêran kirin û ber bi Lîdya û roava kişiyan.

(36) Di nivîswarên dîrokên Ermeniyan da, ji bo Padîşahî û Padîşahên Ermeniyan nivîsandinên pir çelwerî (mubalaxa) hene. Pirên van nivîsandinan xurû nîgaş in. Konevanên Ermeniyan, bi van konevaniyên xwe yên çewt, ji gelê Ermenî ra ziyanên mezin gihandine û dikarin cardin jî bigihînin. Nemaza, gava cuwan û xortên Ermeniyan ku ev çilwerî xwendine û bawer kirine, sibê mezin bibin, bikevin jîna kar û xebatê, ev nîgaşên han dê bifirin, li roşimana (waziyet) vêrast agah bibin ew dê bibin bedbext û bedbîn.

Hengama gûrîpaşiyên Ermeniyan ew gav e ku Ermenî li bin berbendiya Roma bûn û serleşkerên ermenî di bin fermandariya Roma da bi salên dirêj bi Kurdan ra şer kir. Carna ordiya Roma diket Kurdistanê, Ermenî jî bi wan ra ketine Kurdistanê û ji vê keysê behremend bûne û li hin koşeyên Kurdistanê bi cî bûne.

Hemj (hatta), hin fermandarên jêhatî yên Ermeniyan carna ji Roma padîşahî jî çirpandine. Lê, di vêrastiyê da, ev tevger giş numayiş bûn. Ermenî berbendên Roma bûn û wan tucar padîşahiyeke tebût bi dest ne xistiye.

Ermeniyan, çawa li bin siya Roma li Kurdistanê ji bo çend rojan padîşahiyên nîvco bi dest xistine, ewha jî ji bo çend demên kin li Anadolê, li dora Çiyayên Torosan padîşahî kiriye. Ev padîşahî jî di dema Xaçparêzan da bi camêrî û alîkariya Awrûpayiyan bûn. Gava Xaçparêz şkestin û vegeriyan Awrûpayê, padîşahiya Ermeniyan jî herifî, çû.

(37) Ji bo vê kissê, di benda "Leyandina Ereban Kurdistan" da me dûr û dirêj nivîsiye.

(38) Eger hûn pirsa Ermenan dikin, di wan deman da Ermenî li roavayê Bosforê (Geliyê Istanbûlê), li Trakya rûdiniştin. Ermen û Frîjî hevsiyên hev bûn.

Ji wan ra "Trako-Frîjyen" dihat gotin. Ev her du hawiş bicîbûna Kurdan û serrastkirina xwehermend û şehriyariyên Kurdan bi 6000 sal şûnda ji Trakyayê derbasî Anadolê bûn. Frîjî li dora Qonyayê man. Ermen hatin dora Rewanê.

(39) Eger em baldar bin, dibînin ku her sê nav jî bi lehçeyên Kurmancî ne.

(40) Tarîhî Rîşeyî Kurd, rûpel 104.

(41) Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 175 : "Siwarên rêzanwer ên Kurdan di hunermendiyê da ji siwarên rêzanwer ên Asor serbesttir bûn. Ji bo ku siwarên Kurdan, di bezê da, bi hunerbaziyeke hêja tîravêjî dikir. Û cardin hespên Kurdan bi rindî û bez û çalakiyên xwe li cihanê deng daye".

Dîroka Ibrahîm Haqqî, derpêç I, rûpel 120 : "Key Aksar, ji bo ku di kişwergîriyê da kamwer bibe, bi awakî bingehî rahişte kar û xebatê : Key Aksar leşkerê xwe pir baş rêzand û koq kir. Ji bo her çekî lekên cihê durust kirin. Ji bo her birrî fermandarên cihê danîn. Bi vî awayî, xwehermenda Mad û mêraniya gelê wî ku ji berê da naskirî ne bûn xwdiyên Ordiyeke tekûz û tebût".

(42) Dîroka Merdûx, derpêç I, rûpel 188 : "Nivîswarên cihanê giş, di dîrokan da, ji vê wergerka hanê ra gerteveke hundurî gotiye û wuha jî nas kiriye. Di hemdema Kûriş bixwe jî da, ji vê Xwehermendê ra xwehermenda Kişwerê Mad got. Li Tewratê, di birrê 6im da nivîsandiye".

(43) Şemseddîn Samî, Qamûsî Elam : "Sasan bavê Erdişîrê Babekî ye û ji ezbeta Key Behmen e. Bapîrên wî, gava ku Iskender Îran vekirandibû û paşê mîrî çê bûn û di nav Farisan da mabû, ji ezbeta Key Behmenê Madî bûn. Bavê Erdişîr şivanê merivekî dara, bi navê Babek, bû û keça Babek mar kiribû. Ji vê mêrjiniyê (zewac) Erdişîr hat cihanê, bû Padîşahê Sasaniyan. Sernavê (leqeb) xwe ji bavê diya xwe stendibû, bûbû "Babek". Lê şehriya-

riya wî bû ser navê bavê wî, bû ya Sasaniyan".

(44) Şemseddîn Samî, Qamûsî Elam, Pehlewî : "Pehlewî zimanekî kevn ê Îranî ye. Di hengama Sasaniyan da bûbû zimanê fermwer (resmî). Ev ziman, gevera ku jê ra "Pehle" digotin - Rey û Isfehana îro. Yewnaniyên kevnare jê ra "Mîdya" nav dida - zimanê wan bû.

Di leyandina islaman da, ev ziman bicarek rabû, nivîzişê wî jî hat ji bîr kirin. Pey çend sadsalan, gava ku Îraniyan dest pê kir zimanê xwe bi tîpên erebî binivîsînin, bi lêhatinek (tesadufî) zimanê gevera Faris, ano Farisiya îro, pêş ve çû û bû zimanê wîjeyî (edebî) û nivîzişê".

(45) Ihsan Nûrî, Tarîxî Rîşeî Nejadî Kurd, rûpel 97: "Merhûm Serdar Nasir Elî Sincabî dibêje : "Min li ba Abdullah Xanê Qoç ê Mîdixem, ji Sultanê Kelhor, nivîzişek dît ku keça Yezdî Kurd (Padîşahê Sasaniyan ê paşîn) Şehirbanû Xatûn, ji bavê xwe ra nivîsandibû. Di vê nivîzişê da digot : "Babo, ruyê te reş be ! Bo çi namê î Peyxember pare kerdî", ku bicarek Kurdî bû".

(46) Maurice Pernot, L'inquiétude de l'Orient en Asie Musulmane, rûpel 113 : "Nûrullah - zanişmendek ji Şîrazê - dibêje : "Pir caran hatiye gotin ku ola islamê bi darê zorê bi me dane pezirandin. Lê, ez bawer im ku rastî bi awakî din e. Parisiyên Zerdeştî ji Erebên kişwergîr pirsîn : "Hûn bi kî baweriya xwe tînin ?". Û Ereban li wan vegerand : "Em bi Xudanekî yekta, pir pak û pir firaz baweriya xwe tînin, ku bi şandiyekî, bi pêxemberekî bi me hatiye nas kirin". Farisan weha qêr kir : "Baweriya me jî wek baweriya we ye".

Di nav bera her du olan da cudadiyeke pir tu nebû. Paris giş zûka bûn misilman".

(47) Nivîsbêja (meqale) zanayê Fransiz, Maurice **Pernot, rûpel 243.**

Institut Kurde de Paris

(48) Li (44) binêre.

(49) Pirsa "Pehlewî" ji du birran çê bûye : "Pehle" û "wî". "Wî" erebî ye. Ereb jê ra "wawê nisbî" dibêjin. Bi kurdî "î" ye. "Pehlewî" bi erebî mensûbê "Pehle" ye. "Pehleî" bi kurdî sendeyê "Pehle" ye. "Pehlewî" çi ye ? Di hengama Madan da, ji dora Tehran û Isfehanê ra Pehle digotin. Ev der giş welatê Mad bûn. Di nav zaravên (şîwe) Madan da, zaravê Pehle şêrîntirê gişan bû. Di dawiya Sasaniyan da, zaravê Pehle, şêrîntirê zaravên Kurdan, bû zimanê fermwerî.

Institut kurde de Paris

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHEQUE

Institut kurde de Paris

PEYNAVEYÊN NIVÎSWARAN
ÊN BERGERIŞ (MURACEET)
"ÇAVKANÎ"


ROJHILATÎ (farisî, erebî, tirkî) :

ABAD Fîrûz, Qamûs.

ALOSÎ ZADE, Rûhul meanî.

AYETULLAH Aqa, Tarîxî Merdûx, 1906, Tehran.

Asarî Acam.

Awîsta.

Ayîneî Iskender.

BEDLÎSÎ Şerefeddînê, Şerefname.

BEG Feyzullah, Tarîxî Kurdistan.

Burhanîqatî.

Cemî' el-ensab.

DEHLAN S. A., Futûhat el-islamiye.

Debistanul-mezahib.

Dewleti Osmaniye tarihi.

EBUL FIDA, Teqwîm el-buldan.

EL-MELEK Sadiq, Hedîqe Nasirî.

EWLIYA Çelebî, Seyahetname.

El-feth qesî fî feth el-Quds.

El-tesqîb.

FIRDEWSÎ, Şahname.

FRÛXÎ, Tarîxî mil elî qedîmeî şerq.

Farisname.

HACÎ Xelîfe, Tarîxî cihannuma.


Institut kurde de Paris

HEMEWÎ Yaqût, Mu'cem el-buldan.
KIHAN M., Coxrafiyaî mufassal Îran.
Kurd der muqabilî Turk.
IBN EBÎ DEBER, Qesîdatul umem.
IBN ESÎR, Tarîx el-kamil.
IBN HEWKEL, Dîwan el-sedaqe.
IBN HEWKEL, Mesalik el-memalik.
IBN MESKUYE, Tecarub el-umem.
IBN ŞEDDAD, Sîretu Selaheddîn.
IBN WEHŞIYE, Şewq el-musteham.
HEMDULLAH, Tarîxî guzîde.
MELLA Abdullah, Tarîxî cedîdî Greman.
MELLA Qadirî, Tarîxî qedîmî Greman.
MELLA Şerîf, Behceî Mistafawiye.
MELLA Şerîf, Teqwîm el-tewarîx.
MELEK Sadiq, Tarîx el-Ekrad.
MESÛDÎ, El-tebîne.
MESÛDÎ, Murewic el-deheb.
MUSTEWFÎ H., Nuzhetul-qulûb.
Mealim el-usûr el-wusta.
Mecme' el-tewarîx.
Mecme' exbar Kurd.
Me'rifet şehriyarî Oramî.
Mesalik el-ebsar.
NECM EL-DEWLE, Kifayet el coxrafî.
NESÎRÎ, Eşq we saltanat.
NÛRÎ PAŞA Ihsan, Tarîxî nejadî Kurd.

Institut kurde de Paris

Neîma tarihi.
Nuxbetul-ezheriye.
PAŞA Cevdet, Tarîx.
PAŞA Said, Ismail Hakki tarihi.
PÎR ORAMÎ Camas, Camasname.
PÎRNIYA, Tarîxî Îranî qedîm.
RASIM Ahmed.
REFIQ Ahmed, Tarîxî umumi.
Rawdatul-safa.
SAMÎ Şemsuddîn, Qamûsî E'lam.
SULTAN Memdûh, Tarîxî umeraî Ekrad.
SUWEYDÎ, Sebaik el-zeheb.
ŞEREF Abdurrehman, Tarîxî umûmî.
Dr. ŞÎRKUH Belc, El-qeziye el-kurdiye.
TABARÎ, Tarîxul-umem wel mulûk.
TUDARÎ Seyid Ebd Semed, Nûrul-enwar.
Tarîxî el-umeraî Abbasî.
Tarîxî mantiqî.
Tarîxî umûmî muerrixîn.
Tewrat.
Tuhefetul-edeb fî tewarîx el-ensab.
Tarîxî Sînan.
WECDÎ, Dairetul-mearif.
XADARÎ, Tarîxul-umemil-islamiye.
ZEKÎ Emîn, Tarîx.

EWRUPÎ :

Ansîklopêdiya Almanî.

Institut kurde de Paris

Ansîklopêdiya Fransizî.

Ansîklopêdiya Ingilîzî.

BEIDAR Paul, Acrumîyeî Kurdîye (Grammaire kurde), Paris 1956.

BEASTED James Henry.

BINDER Henri, Au Kurdistan, en Mésopotamie et en Perse, Quantin, Paris, 1887.

CHAMPDOR Albert, Saladin, le plus pur héros de l'Islam, Albin Michel, Paris, 1956.

CONTENEAU Georges, La civilisation des Hittites et des Hurrites du Mitanni, Payot, Paris, 1948.

CONTENEAU G., La civilisation d'Assur et de Babylonie, Payot, 1951.

CONTENEAU G., La civilisation iranienne, Payot, Paris, 1952.

FREIJ Roks.

GIAMIL, Monte Singar, Roma, 1900.

GRAUSSET René, Histoire de l'Asie.

HOLL M.

HERODOT, Histoire d'Hérodote, Paris, 1894.

JERNIEK Joseph.

MIGERSON.

MISTAER Dare.

NIKITINE, Les Kurdes, C.N.R.S., Paris, 1955.

NORMAN.

PERNOT Maurice, L'inquiétude de l'Orient.

RUTTEN Margueritte, Babilon.

SIR MILKIM John.

SIR SMITH Sidney.

Institut kurde de Paris

SPEISER, Dr Ephraim A.; Southern Kurdistan in the Annals of Ashurnasirpal and today; in Annals of American Schools of Oriental Research, vol. VIII, pp. 1-33, New Haven, 1926-1927.

STRABON, Oeuvre géographique. 60 av. J.-C.

SIR SYKES Mark, Journey in North Mesopotamia, London, 1907.

SIR SYKES Marc Percival, The Kurdish tribes of the Ottoman Empire; in Journal of Anthrop. Inst., vol. 38, pp. 451-486, London, 1908.

SIR SYKES Marc Percival, A history of Persia, 2 volumes, Ed. Macmillan, London, 1915.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## JÎNENÎGARIYA EKREM CEMÎL PAŞA

Ekrem Cemîl Paşa li Diyarbekirê, di **1891** de, bû. Di **1912** de xwendina xwe li Stembolê, li Sultani Lisesi, qedand. Di wê salê de wî, tevî meriv û hevalên xwe, rêxistina **Hêvî** danî. Vê rêxistina xwendekaran rojnameyên **Rojî Kurd** û **Hetawî Kurd** derxistin. Piştre ew çû Ewropayê ji bo xwendina bilind. Berê li Zanîngeha Lozanê, li Swîs, û piştre li ya Gand, li Beljîkayê, hendese xwend. Ew li Lozanê bû berpirsiyarê Hêvî. Di **1914** de, gava Şerrê Cihanê yê 1mîn dest pê kir, ew neçar bû ku vegere Stembolê. Di şerrê Rûsyayê de bû topçî. Di **1918** de, li Diyarbekirê bû serokê **Kürdistan Cemiyeti**. Piştre, bavê wî, Qasim, ev serokatî kir. Şaxên vê rêxistinê li gelek ciyên Kurdistana Tirkiyê zû vebûn. Rojnama wê **Gazî** bû. Di **1919** de, Mustafa Kemal û hevalên wî yên Ittihad ve Terakki Cemiyeti ew neçar kir ku ji Diyarbekirê bireve Stembolê. Li wê derê, alîkariya hevalên **Kurdistan Teali Cemiyeti** û rojnama wê **Jîn** dikir û di rojnamên tirkî de dinivîsî. Xwendekarên Zanîngeha Stembolê ew kir serokê fexrî yê Hêvî. Di **1920** de, piştî Peymana Sêvr, Kürdistan Teali Cemiyeti ew şand Kurdistanê. Lê, li wê derê, Ata-Türk gelek propaganda dijî Kurdan kiri bûn, loma ew neçar bû ku cardin vegere Stembolê. Di rê de, Abdul-**kerîm, axayê gundê Çêlikê Eliyê Remo, nêzîkî Midyatê,**



Institut kurde de Paris

ew teslîmî Tirkan kir. Di **1922** de, vegeriya Diyarbekirê. Heta **1925**, tarîxa serhildana Şêx Seîd, li gundên bavê xwe Qasim dixebitî. Di **3 sibat 1925** de, li Diyarbekirê, li malê hat girtin. li girtîgeha Kastamonu 4 sal, ango heta **1929**, ma. Piştre, tevî hin endamên malbata xwe, reviya Sûriyê. Berê li Helebê man. Ew der bû bû navenda rêxistina **Hoybûn** ku di 1927 de ava bû bû. Piştre, çûn Cezîrê - Kurdistana Sûriyê - û Şamê. Hoybûn alîkariya serhildana Çiyayê Agirî ya Ihsan Nûrî Paşa kir. Di **1932** de, tevî Celadet Bedir Xan û hevalên din, kovara kurdî **Hawar** li Şamê weşand. Ji **1940** heta **1946**, Ekrem bû nimînendeyê Hoybûnê. Di **1962** de, çû Kurdistana Iraqê, ji bo ku rehberiya rojnamevanê Amerîkî Dana Adams Schmidt bike. Evê dawîn pirtûkek bi navê "Journey Among Brave Men" di **1964** de nivîsî û tê de gelek li ser Ekrem, di bin navê "Bavê Comerd" de, peyivî. Ji **1967** heta mirina xwe di **1974** de, piştî ku hukûmeta Sûriyê axên Kurdan stendin, li Şamê ma. Piraniya jiyana xwe li gundê Talikê, nêzîkî Dirbêsiyê, li Cezîrê derbas kir. Bi bexçevanî û hînkirinê, nemaze bi fêrkirina zimanê kurdî, mijûl bû. Wî kurdî, tirkî, farisî, fransî û erebî zanî bûn. **Di 1972** de, ev pirtûk bi kurdî û piştre bi tirkî nivîsî. Bi pismamê xwe Qedrî Cemîl Paşa (Zinar Silopî) re li hev hat ku ew dîroka Kurdistanê ya kevn û Qedrî jî ya nûjen (Doza Kurdistan) binivîsin. Di **1973** de, jînenîgariya xwe bi tirkî "Muhtasar Hayatım" nivîsî. Li Şamê, di **1974 de**, **wefat kir.** 83 sal jiya.

Institut kurde de Paris

## NAVEROK


Pêşgotin 3

Amerziş (Beyanê Uzur) 5

Kurtebira Dîroka Kurdistan, Pêşgotin 7

Beşkirina nejadê enzan û Kurd ji kîjan nejadî ne 15

Kurd ji kê derê hatin Kurdistanê û çi gav hatin ?
Kurd çend ezbet û bir bûn ? Çawa erd fireh kir ?
Paşê çawa Imperatoriya Kurdistan wenda bû 27

Ferweriyên Kurdên Araratan : Lolobûm, Gûtiyûm,
Kardûnya, Hûrî, Mîtanî, Nehrî, Mûşkî, Xaltî, Alarod 33

Ferweriyên kurd ên Kaspiyên Mannaî, Madê Biçûk
û Madê Mezin 61

Firehkirina Imperatoriya Kurd 83

Pey mirina Iskenderê Mezin, xwehermenda Selekos
li Kurdistanê 119

Wendabûna Şehriyariya Selefke li Kurdistanê,
xwehermendên Kurdan 121

Xwehermenda ku Aşek bingeha wê danî,
Xwehermenda Part an Aşkaniyan e ? 133


Institut kurde de Paris

Şehriyariya Sasaniyan 137

Kurdistan di hengama leyandina Ereban da 153

Standina Bexda û wendabûna Abbasiyan
bi destê Hulakû

Padişahiya Ismaîlê Safawî û serhatiya Kurdan 199

Yekîtiya Kurd û Tirk

Serhatiyên dilkuj ên Kurdan li bin destên Tirkan 203

Di sedsalên 19im û 20im da, Kurdistana Roava

Hengamên Sultan Hamîd, Jön Türkan
û Mustafa Kemal 221

Armenya li Asyaya Biçûk 231

Dasenda (Munasebet) Kurd û Faris 247

Kurteyeke kronolojîk
Imperatorî, dewlet û mîriyên kurdî 299

Têgihandina hin gotinên nivîskar bi (*) 321

Nîşank 323

Çavkanî 335

Jînenîgariya Ekrem Cemîl Paşa 341

Institut kurde de Paris

## WEŞANÊN DIN ÊN ENSTITUYÊ

1) Bultena sêmehî ya agahdariyê, bi 4 zimanan : kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî.

2) Dossier Kurdistan, dosyeke li ser dîroka Kurdistanê û rewşa Kurdan a îroyîn ji aliyê siyasî, civakî û çandî, li welêt û li Ewropayê, bi fransî, 136 rûpel. Çapa 1mîn 1988, a 2mîn 1989 û a 3mîn 1992.

3) Dossier Koerdistan, wergerandina "Dossier Kurdistan" bi hollandî. Çapa 1mîn 1988, a 2mîn 1991.

4) The Kurdistan File, wergerandina "Dossier Kurdistan" bi ingilîzî, 1989.

5) CEMIL PAŞA Ekrem, Muhtasar Hayatım, jînenîgariya nivîskar, bi tirkî, 104 rûpel. Çapa 1mîn 1989, a 2mîn 1991.

6) SOREKLÎ Şahînê Bekir, Jana Heft Salan, helbestên bi kurdî, 155 rûpel, 1990.

7) BIRO Taharê, Memê û Eyşê, şano (tyatro) bi kurdî, 162 rûpel, 1991.

Institut kurde de Paris

8) ŞAKELÎ Ferhad, Kurdish Nationalism in Mam û Zîn of Ahmad-î Khanî, têzeke zanîngehî li ser destana Mem û Zîn, bi ingilîzî, 146 rûpel, 1992.

9) Kurdistan, broşureke dirêj bi foto, bi zimanê fransî, li ser rewşa Kurdan a giştî, bi hevkariya rêxistina beljîkî Solidarité Socialiste û alîkariya maddî ya Kommisyona Ewropayê, 12 rûpel, 1993.

10) HASRATYAN Manvêl A., Kurdên Tirkiyê di dema herî nuh da. Wergerandina rûsî-kurdî : Tîmûrê Xelîl Muradov. 405 rûpel, 1994.

Weka ku xwendevanên me dizanin, ji berê, ango ji 1978 heta 1989, navê rêxistina me Têkoşer bû. Di wan salan de me kovareke çandî ya sêmehî bi zimanê kurdî, bi navê "Têkoşer" derdixist. Jê 43 hejmar derketine. Piştî ku me navê xwe guherand û kir Enstitu, me ew kovar rawestand û di ciyê wê de bultena agahdariyê ya sêmehî derxist. Ji derveyî kovarê, me wê gavê gelek broşûr û dosye, bi zimanên cihê, li ser Kurdan derdixistin. Em wan li vê derê nabêjin ji bo ku êdî zemanê wan buhuriye.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Ekrem CEMÎL PAŞA.
DIYARBEKIR 1891 - ŞAM 1974.
Di 1912 de, tevî hevalên din, rêxistina xwendekarên kurd Hêvî li Stembolê danî. Piştre çû Ewropayê, li Lozan û Gand hendese xwend. Di 1918 de li Diyarbekirê bû serokê Kurdistan Cemiyeti. Di 1920 de hat girtin. Di 1922 de vegeriya Diyarbekirê. Di 1925 de, di dema serhildana Şêx Seid de, çar sal hat girtin. Di 1929 de çû Sûriye û Kurdistana Sûriyê. Di rêxistina Hoybûn de xebat kir. Di 1932 de, alîkariya kovara kurdî Hawar kir. Ji 1940 heta 1946, bû nimînendeyê Hoybûnê. Di 1962 de çû Kurdistana Iraqê. Di 1972 de ev pirtûk bi kurdî û piştre bi tirkî nivîsî. Di 1973 de jînenigariya xwe bi tirkî, "Muhtasar Hayatım", nivîsî.

Institut kurde de Paris